

# Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ




- ▶ Rewşa Kurdan û Konferansa Netewî **Süleyman Çevik**
- ▶ Seydayê Mela Muhyedînê Xîzanî **M. Reşîdê Hirîfî**
- ▶ Çavkaniyên Edebiyata Kurdî **Receb Dildar**
- ▶ Bersivêk ji bo seyda Seîd Dêreşî **M. Xalid Sadînî**
- ▶ Bêhes mabûn di xewê da **Hasan Hüseyin Çevik**
- ▶ Bi girî çav bi derya kim, sebrê bi sehra xînim **Hafîzê Şîrazî**
- ▶ Di dema Stalîn de polîtîkaya tehcîrê û rewşa Kurdan **Anjelika Pobedonostseva-Kaya**
- ▶ Kula 24 salan bajarê birîndar Helebçe **M.Saît Temel**
- ▶ Labîrenta Cinan **İslam Geliş**
- ▶ Di bin 'Siya Mem û Zîn'ê de xirabkirina çanda Kurdan **Abdulkadîr Gok**
- ▶ Şerefname de Mîreyê Mirdasîyan **Wisif Zozanî**
- ▶ Zazakî de Metnê Dînî **Mehmed Yergîn**
- ▶ Çîrvanokên Kurdî û pirtûka M. Xalid Sadînî **Lokman Polat**
- ▶ Berriya Mêrdînê û rola jinê di civaka Kurdî de **Konê Reş**
- ▶ Hevparên jiyanê; jin û mêr **Murad Celalî**
- ▶ Zîn û keser **Hafîce Mollakendî**
- ▶ Şîrîk **Ali Karadeniz**
- ▶ Ehmedê Xanî muzîk, armonî û nîzam **Cengîz Mamo**
- ▶ Sînem **Feqiyê Teyran**
- ▶ Wan li benda we ye **Adil Yıldırımçakar**



JIMAR  
119






SAL: 19 CILD: 16 BIHA 5 TL





Yekemîn biyografiya  
berfireh ya hunermend,  
gotinnivîsar û çalakvanê  
mafê mirovan Şivan Perwer,  
ku beriya weşanê ji aliyê wî ve  
hatiye xwendin, ji nav weşanên  
Nûbiharê derket.

Nasnameya kitêbê:  
Şivan Perwer–Efsaneya Zindî  
Abdullah Incekan  
312 rûpel, 48 rûpel wêne  
ISBN: 978-605-5402-53-2  
Weşanên Nûbiharê



Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık  
Ltd. Şti. (adına)

**Xwedî û berpirsiyarê Nivîsaran**  
(Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü)  
Süleyman Çevik

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş  
Merkezi No: 22/29 Vezneciler/  
Beyazıt - İstanbul  
Tel&Fax: (0212) 519 00 09  
www.nubihar.com  
nubihar@gmail.com

**Navnîşana Nameyan**  
P.K. 80 Fatih - İstanbul

**Nûnertiya Almanya**

Burhan Kaya  
kizilkaya\_burhan@yahoo.de  
Tel: 0234 - 7922968

Kovara Nûbihar ji 3 mehan carekê;  
Payiz, Zivistan, Bihar û Havînê  
tê weşandin.

**Berg û rûpelsazî**  
Dawud Rêbiwar

**Çapxane**

Alioğlu Mat. Bas. Yay. ve Kağ. San.  
Tic. Ltd. Şti Orta Mh. Fatin Rüştü  
Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa/İST.  
Tel: 212 612 95 59

**Yayın Türü:** Yerel Süreli

**Berdêla abonetiya salane**  
Tirkiye: 25 TL  
Welatên din: 25 EURO, 30 \$

**Jimareyên Hesaban**

Hundirê Tirkiyê:  
Postgiro (Posta Çeki)  
Süleyman Çevik: 658265  
Süleyman Çevik, İş Bankası Laleli  
Şubesi: 1084-0363459  
Derveyî Tirkiyê: Süleyman Çevik,  
İş Bankası Yavuz Selim Şubesi:  
1079-30100-3118770

Mesûlyen ramanên  
nivîsaran ûde nivîsaran e.  
Berhemên hatine sandin bi şûn de  
navên vegereandin.

Rewşa Kurdan û Konferansa Netewî	
<b>Süleyman Çevik</b> .....	3
Çend gotin li ser mirin û jiyana Seydayê Mela Muhyedînê Xîzanî	
<b>M. Reşîdê Hirîtî</b> .....	5
Çavkaniyên Edebiyata Kurdî	
<b>Receb Dildar</b> .....	8
Azad im ez ji hebûnê	
<b>Mewlana Celaleddînê Rûmî</b>	
<b>Ji Farsî: Hayrullah Acar</b> .....	12
Bersivê ji bo seyda Seîd Dêreşî	
<b>M. Xalid Sadînî</b> .....	13
Bê te bûn	
<b>Kamran Simo Hedilî</b> .....	17
Bêhes mabûn di xewê da	
<b>Hasan Hüseyin Çevik</b> .....	18
Bi girî çav bi derya kim, sebrê bi sehra xînim	
<b>Hafîzê Şîrazî</b>	
<b>Ji Farsî: Hayrullah Acar</b> .....	18
Di dema Stalîn de polîtîkaya tehcîrê û rewşa Kurdan	
<b>Anjelika Pobedonostseva-Kaya</b> .....	19
Kula 24 salan bajarê birîndar Helebçe	
<b>M.Saîd Temel</b> .....	25
Bi(h)ar	
<b>Îmad Bernas</b> .....	28
Labîrenta Cinan	
<b>İslam Geliş</b> .....	30
Di bin "siya Mem û Zîn"ê de xirabkirina çanda Kurdan	
<b>Abdulkadîr Gok</b> .....	35
Sih û çar gulle	
<b>Mehmet Bozkoyun</b> .....	38
Şerefname de Mîreyê Mirdasîyan	
<b>Wisif Zozanî</b> .....	39
Seydayê Evînê	
<b>Mihemed Cezawîr Hemkoçero</b> .....	46
Zazakî de Metnê Dînî	
<b>Mehmed Yergîn</b> .....	47

Çîrvanokên Kurdî û pirtûka M. Xalid Sadînî	
<b>Lokman Polat</b> .....	<b>54</b>
Berx û gur	
<b>Seyda Ronahî</b> .....	<b>57</b>
Berriya Mêrdînê û rola jinê di civaka Kurdî de	
<b>Konê Reş</b> .....	<b>58</b>
Ya Muhemmed (s.)	
<b>M.Ziya Miksî</b>	
Ji tîpên Erebî: Cesîm Yolcu .....	<b>61</b>
Bahoza Hêrsê	
<b>Dilêr Zana</b> .....	<b>63</b>
Hevparên jiyânê; jin û mêr	
<b>Murad Celalî</b> .....	<b>64</b>
Roboskî	
<b>Zafer Berdestî</b> .....	<b>67</b>
Zîn û keser	
<b>Hatîce Mollakendî</b> .....	<b>68</b>
Şîrik	
<b>Ali Karadeniz</b> .....	<b>71</b>
Birca bilind hêlîna xeman	
<b>Kasim Bugurcu</b> .....	<b>73</b>
Zivistan	
<b>Hesen Polat</b> .....	<b>75</b>

Epîlog	
<b>J.Ahmed Yıldız</b> .....	<b>77</b>
Şivanê Kurd	
<b>Paşa Amedî</b> .....	<b>78</b>
Ehmedê Xanî muzîk, armonî û nîzam	
<b>Cengîz Mamo</b> .....	<b>80</b>
Di Kurdî de kurtkirina navan û sedemên wê	
<b>Emre Mehenî</b> .....	<b>82</b>
Hişyarî!	
<b>Mihemed Soysal</b> .....	<b>84</b>
Sînem	
<b>Feqiyê TEYRAN</b>	
<b>Transkrîpsiyon: Xweşmêr</b> .....	<b>86</b>
Berfdumsk	
<b>Yavuz Acun</b> .....	<b>87</b>
Wan li benda we ye	
<b>Adil Yıldırımçakar</b> .....	<b>88</b>
Prensese bizinan	
<b>Elveda</b> .....	<b>90</b>
Rexne	
<b>Mehmet Şîrîn Filiz</b> .....	<b>93</b>
Meke!	
<b>Mehmed Emîn Hêvîdar</b> .....	<b>95</b>



- \* **Radyo Medya ji sala 1995'an û vir ve bi guhdarên xwe re ye.**
- \* **Radyo Medya di 1996'an de dest bi nûçeyên/xeberên kurmancî kir.**
- \* **2006'an de cara yekem bû ku bi fermî bi du zaravan/lehçan û du zimanan (zaravayên kurdî kurmancî û dimilî û bi erebî) weşanê dest pêkiriye.**
- \* **Li ser înternetê (www.radyomedya.net/radyoyayini.com) li tevahiya cîhanê, li ser radyoyan jî li rihayê bi şepola 94.8'an têye guhdarîkirin.**
- \* **Di nav weşana xwe ya 24 saetî de, 20 saetan bi kurdî weşanê dike.**
- \* **Radyo Medya bi xêzika xwe ya Îslamî û hemiyetkarî ve dilê guhdarên xwe hênik dike.**
- \* **Bi behîstoka 0414 315 55 51'ê ve hun dikarin reklamên xwe bidinê.**
- \* **Radyo medya dengê dilê we ye. Ji îsota tujtir ji hingiv şêrîntir e.**

# Rewşa Kurdan û Konferansa Netewî

**SÜLEYMAN ÇEVİK**

ceviksuleyman@hotmail.com

**B**eriya ku dewleta Osmanî li ser piya bû, parçeyek erdê Kurdan li Îranê, parçeyê mezin jî li nav erdê Osmanî bû. Piştî belavbûna Împaratoriya Osmanî, li ser erdê wê gelek dewletên nû ava bûn û li cihên ku di bin hukmê vê dewletê de bûn û herweha li Kurdistanê îstiqrar xirabtir bû.

Di vê rewşa tevlihev de erdê Kurdistanê di navbera dewletên ku nû ava dibûn de hate parve kirin û digel Îran û Tirkîyê, dewletên wekî Iraq û Suriye jî ketine piyasê. Lêbelê dema Kurdan daxwaza heqê xwe yê insanî kirin ev daxwaz bû sebebê gelek gengeşî û şerên giran...

Kurd ji aliyê nifûsê ve di rojhilata navîn de li pey Ereb, Faris û Tirkan milletê çaran e. Gelek derdorên pispore yê durist û objektîf jî qebûl dikin ku Kurd ji aliyê ziman, çand, folklor û mûzîkê ve jî gelek dewlemend in. Li rûyê erdê gelek millet hene ku bi xisûsiyetên xwe qet nagihêjin Kurdan, lê dema meriv hebûnên wan milletan û yê Kurdan dide ber hev, meriv dibîne ku di vê qiyasê de Kurd ji gelek tiştan bêpar in...

Milletekî ku ewqas xwediyê hêjayîyan e divê meriv li ser bifikire ku çima îro ji van nîmetên dunyayê bêpar maye. Bi rastî jî dema em van hêjayiyên Kurdan û rewşa ku Kurd tê de ne didine ber hev, ev rewş bi meriv normal xuya nake. Meriv dipê ku di cîhanê de gereke dewletek Kurdan jî hebe, li cîhanê unîversiteyên wan hebin, li ser ziman û çanda Kurdan xebat bên kirin...

Coxrafyaya Kurdan, dewlemendiya erdê Kurdistanê, parçebûna welatê Kurdan, ji îxtîlafa Kurdan îstîfadekirina neyaran a jî vê rewşê, nexwendinî û cehaletî, hîleyên dewletên li ser Kurdan hesaban dikin û sebebên wekî din li hember Kurdan asteng in û nahêlin ku Kurd jî wekî milletên din ji dunyayê îstîfade bikin.

Îro Kurd di nav hidûdên çar dewletan de belav bûne û her herem li gorî şertên xwe bi pirsgrêkên xwe re rûbirû ye...

Cara yekê di sala 1639an de bi peyman Qesra Şêrîn welatê Kurdan di navbera Osmanî û Îranê de parçe bûye. Îro jî sînorê Tirkîyê û Îranê ev peyman tayin dike.

---

Ev demeke di nav Kurdan de behsa konferanseke neteweyî tête kirin. Hêvî tê kirin ku ji çar parçeyên welat kes dê beşdarî vê konferansê bibin û ji bo xêra Kurdan di bin siya aşî û selametiye de zemîneke adil ava bibe

---



Îrana ku îro navenda mezhebê Şîtiyê ye, di dewra xwe de dewletek qedîm û reqîbê dewleta Osmanî bû jî. Ev Îrana ku di rojhilata navîn de xwedî giraniyek weha ye, mixabin di dema me ya îro de jî bi Kurdan re pirsgirêka xwe çareser nekiriye...

Dewleta Tirkîyê jî di sala 1923yan de wekî dewama dewleta Osmanî ava bûye; evê dewletê jî li ser qencî selametiye tu tişt ji bo Kurdan ava nekiriye. Ne dewra Osmanî ya dawîn, em tenê dewra cûmhuriyetê jî bigrin ber çavan, eqlê meriv li hember zilm û zordariya rejîma cûmhuriyetê disekine... Ji aliye xirabiyê çî heye li vî welatî li para Kurdan ketiye... Tirkîyê jî di dema me ya îro de pirsgirêka xwe ya bi Kurdan re çareser nekiriye...

Sînore Tirkîyê û Suriyê jî bi peymanên ku di salên 1921, 1926 û 1939an de li Enqerê hatine îmzekirin şeklê dawîn girtiye... Dewleta Suriyê jî di sala 1946an de serxwebûna xwe bi dest xistiye û ev peymanên beriya serxwebûnê bi îrada Erebên Suriyê nebûye.

Kurdên di navbera Suriyê û Tirkîyê de, hinek li jor, hinek jî li jêr li seranserê hidûdê herdu dewletan de rêz bûne. Ji Kurdên Suriyê nifûsek mezin bê nasname ne û tu mafê wan li Suriyê tune. Pirsgirêka Kurdan ya bi vî dewletê re jî çareser nebûye û gihastiye dema me ya îro...

Sînore Tirkîyê û Iraqê jî di sala 1926an de bi peymanê ku Tirkîyê û Îngilîzan îmze kiriye gihastiye şeklê xwe yê dawîn... Kurdên Iraqê bi salan ji bo bi destxistina mafên xwe bedel û mucadeleyên mezin dan. Piştî evê ked û xebatê, îro rewşa Kurdên vî heremê çend sal e ji her derê baştir e.

---

## Lazim e ev konferans jî li gor vî giraniyê, bi hesasiyeteke mezin bête sazkin û divê hemû hêz û partî di vî konferansê de temsîl bibin

---

Bala xwe bidinê, tu roleke Kurdan di xêzkirin û tayinkirina van hidûdên ku dinyaya wan parçe parçe bûye de tune. Kesên li ser û binê xetê, yan jî li wê hêl û vî hêla xetê mane, her yek di devera xwe de, bi derdê xwe re rûbirû maye.

Kurd li her heremê, bi dewletên ku li wan hikûm dikin re ketine berxwedanan û hetanî îro jî bedelên mezin dane... Bi salan li Tirkîyê, Îranê, Iraqê û Suriyê mucadeleya hebûna xwe, nasname xwe dane û di dawîya vî mucadelê de înkâr, kuştin, talan û sirgûn li para Kurdan ketiye.

Xerîte û hidûdên dewletên rojhilata navîn jî îngilîz û Fransîzan tayin kirine. Herdu dewletan bi peymanê Sykes-Picot erdên rojhilata navîn di nav malbat û coxrafîyan de parve kirine û di van erdan de dewletên nû ava kirine.

Kurdên ku bi hezaran salane ku li vî coxrafîyê dijîn ji dewletbûnê para xwe nestandin. Milletê bêdewlet ji gelek tiştan mehrûm e. Di wê demê de eger Kurdan jî ji xwe re wekî her milletê dewletek ava bikirina, dê edebiyata xwe pêş de bibirana, wendariyên xwe ji kûrahiya tarîxê derxistana, zarokên xwe ji asîmîlasyonê muhafeze bikirana û zimanê xwe di nav xelkê xwe de belav bikirana.

Lê îro em dibînin ku ev kirinên Kurdan ji bo wan bûye qebahet û

guneh. Cezayê sedeqeta xwe yê bi xelîfetiye, cezayê mayina li ser soz û bextê mêraniyê û cezayê xayintiya ku li hevalên xwe nekiriye dikşînin...


Ev salek zêdetir e ku bi navê "bihara Erebî" li rojhilata navîn îqtîdar tene guhertin û dizayneke nû didine evê dunyayê...

Li çend dewletên Erebî îqtîdar bi rehetî hatin guhertin. Lêbelê ev ji saleke zêdetir e li Suriyê her roj bûyerên mezin dibin, meriv nizane dê sibê çî bibe û ji vî rewşê Kurd tesîreke çawa bigrin.

Ev demeke ku di nav Kurdan de behsa konferanseke neteweyî tete kirin. Tê payin ku ji çar parçeyên welat kes beşdarî vî konferansê bibin û ji bo xêra Kurdan, li ser zemîna aşî û selametiye, ji bo çareserkirina pirs û pirsgirêkên Kurdan nîqaş bêne kirin.

Di vî wexta ku dunya ewqas tene guhertin de mixabin li çar welatên ku Kurd lê dijîn, problemên Kurdan hê jî çareser nebûne. Divê ev konferans ji bo çareserkirina derdê Kurdan bibe zemîneke xurt û deng bide dunyayê ku Kurd gotina wan di van mafên însanî de yek e.

Lazim e ev konferans jî li gor vî giraniyê, bi hesasiyeteke mezin bête sazkin û divê hemû hêz û partî di vî konferansê de bêne temsîl kirin. Herwisa, ne tenê partî û rêxistin, maqûl û rewşenbîrên Kurdan jî di vî konferansê de cih bigrin û zanîn û tecrûbeyên xwe di konferansê de bînine ziman.

Hêviya me ew e ku Kurd bi awayekî serkeftî bikarin wê konferansê li dar bixin û di zemîneke medenî de li hevdu guhdarî bikin û ji pirs û pirsgirêkên xwe re li çareyan bigerin...

# Çend gotin li ser mirin û jiyana Seydayê Mela Muhyedînê Xîzanî

M. REŞÎDÊ HIRÎTÎ

**P**êxemberê me wisa emir kiriye: "موت العالم مصيبة لا تجبر، وثلمة لا تسد" "Mirina aliman musîbetek e ku nacebire û neqebek e ku nayê girtin." (1), Di hedîseke xwe de jî wiha ferman dike. "Mirina alimekî wek rijandina stêrkên li asîmanan e." (2) Êdî wexta alim bi ilmê xwe emel bike û di emelê xwe de jî muxlis be; yanê e' melê xwe ji bo razîbûna Xwedayê Mîhrîban bike, bêguman musîbeta mirina wî girantir û mezintir e. Dema diyar bû ku wî 'alimî, exlaqê medresa pêxember êxistiye nav xelkê xwe, ew musîbet hin diwartir dibe.

Belê yek ji wan alimên ku xwediye wan wêfên me gotî, Seydayê Mele Muhyedînê Qursincî bû.

Seydayê Mele Muhyedîn di sala 1936ê zayînî de, li gundê Qursinca bi ser navçeya Xîzanê hatiye dinyayê. Li ber destê Seydayê Mele Mihemedê Bercumî dest bi xwendina xwe dike. Piştî ku Seydayê Mele Mihemedê Bercumî diçe rehetê, Seydayê Mele Muhyedîn wê demê suxte an feqî bûye. Yanê hînê xet, qi-

raet, tecwîd, serf û nehwe bûye. Mirov dikare bibêje êdî wî, t'am û zewqa xwendevantiya li medresê bi i'lmelyeqîn û bi e'ynelyeqîn zanîbû. Ji ber hindê wekî her feqîyek Kurd li Medreseyên Kurdistanê li ber destên alimên cuda cuda dest bi perwedehiya 12 ilmên ku dihatê xwendin dike:

Edebiyat û rêzimana Erebfî  
Hiqûqa Îslamê  
Hedîs  
Tefsîr  
Eqîde  
Kelam  
Mantiqa (Felsefa) Îslamê  
Beyan û Belaxet  
Dîrok  
Dîroka Îslamê  
Usûlul- Fiqih  
Usûlul- Hedîs

Ew alimên ku seydayê Mele Muhyedîn li ber destê wan xwendiyê çend hep ji wan ev in; Seydayê Mele Mihemedê Zinzêqî, Seydayê Mele Ebdullahê Dîbo, Seydayê Mele Zahirê Tendûrekî û dawîya xwendina xwe li ber destê Seydayê Mele Uzeyîrê Qemerî xilas kiriyê. Li cem wî Seydayê qedirbilind

---

Seydayê Mele Muhyedîn di sala 1936ê zayînî de, li gundê Qursinca bi ser navçeya Xîzanê hatiye dinyayê. Li ber destê Seydayê Mele Mihemedê Bercumî dest bi xwendina xwe dike

---

Beriya her tiştî ilmê wî saf û zelal û bi bereket bû. Ji fikir û meqsedên tarî tamaya dinê dûrketîbû. Li gor Seyda, zanîn ji bo zêdekirina baweriyê bû, ne ji bo peydakirina zewqên vê dinyaya derewîn bû. Ew zanyarekî mutteqî bû

Îcazet ango destûrnameya xwe distîne. Îcaze bi wateya destûrnameyê ji bo feqiyê ku xwendina xwe qedandiye bi kêrî melatî, seydatî û fitûdanê tê. Di bin ronahiya Qur'an û sunnetê de dikare rêveberiya civaka xwe bike. Îcaze wek zincîreke xelesa pêşî bi Hz Muhemmed (s.) dest pê dike û ya dawî jî bi mucaz diqede.

Piştî ku Seydayê Mela Muhyedîn îcaza xwe distîne. Ew jî wek 'alimên Kurdistanê li gundên herêma Tetwanê bê ku mehanyê ji saziyê dewletê bistîne dest bi melatî û perwedehiya feqiyên dike. Wek mînak li gundê Kirtwan, Kindiras, Xaxwuz û Avetax melatî kiriye. Wihareng e gelek feqî perwerde kiriye û îcaze daye. Paşê derbasî navenda navçeya Tetwanê dibe. Kurê wî di heman demê de mucazê wî Mela Nizameddîn dest bi melatiya Mizgefta Medîne dike. Di bin mizgeftê de jî Medresekê ava dike. Dest bi perwerdehiya feqiyên dike. Her wiha Seydayê Mela Muhyedîn heta dawiya sala 1998ê li wê medresê bi dersdayîna temenê xwe diborîne.

### Exlaq û ilmê wî

Beriya her tiştî ilmê wî saf û zelal û bi bereket bû. Ji fikir û meqsedên tarî tamaya dinê dûrketîbû. Li gor Seyda, zanîn ji bo zêdekirina baweriyê bû, ne ji bo peydakirina zewqên vê dinyaya derewîn bû. Ew zanyarekî mutteqî bû. Hay ji ferman û qedexeyên Xwedê Tealâ hebû. Fermanên wî pêk dianî, xwe ji qedexeyên Wî vedikêşa, wihareng e xwe ji rehma wî bêhêvî nedikir. Zanîn û jiyana wî lihevhatî bû. Tevgerên wî tefsîra vê ayeta pîroz bi bîra meriv dixist: *"Bi rastî ji bendeyên wî bes zanyar ji Allah Teala bi duristî ditirsin."*(3) Wî ji xort û ciwanên sedsala nû re li ser esasê hevraziya gotin û kirinê, wiha digot: "Hûn heya sibehê nîqaşa serweriya şerîetê dikin bes nimêja sibê derbas dikin." Seyda girîngiyeke mezin dida dostanî û dostên rastîn. Ji bo dostaniya wî xira nebe her cureyê fidakariyê pêk



dianî, wek mînak dema nexweşiya xwe ya giran de jî, ziyaretkirina dostên xwe îhmal nedikir. Diyar bû ku Seyda, ev wesiyeta Ehmedê Xanî ku em ê li jêr binivîsin derbasî jiyana xwe kiribû:

Yarî û birayî û muaxet  
Nabit bi riyayî û meqalet

Yarî ne hêsariye cefa ye  
Meqsûd ji yariyê wefa ye

Axir tê eger nekî wefayê  
Ewwel mede ber xwe wê cefayê

Seydayê Şêx Ehmedê Xanî di vê beyta xwe de diyar dike ku biratî û dostanî bi gotin û devkî û durûtî nabe. Dostanî rehet û hêsan nîne. Ew pir zehmet e. Mebest ji dostaniyê fîdakarî û durustî ye. Eger tu yê heta dawiyê nebî wefadar ya qenc ew e ku hê di serî de zehmetî nekêşî û bi kesî re biratî û dostaniyê nekî.

Seydayê Mela Muhyedîn wek hemû alimên rastîn; dilnizm bû. Wî, xwe di vê dinyayê de wek rêwîng didît. Her dema ku min jê re Dîwana Melayê Cizîrî dixwend û beyta jêr hêstir ji çavên Seyda dibarand:



Bi hebabê mebe mexrûr wiha sergeşte Mela  
Ba vî ber keftiye wê beyhûde segeşte hebab  
Wî baş fêm kirîbû ku Seydayê Cizîrî di vê beyta  
xwe de behsê ji dinyaya fanî dike û wiha dibêje: Bi  
wê dinyaya fanî ku tu heqîqetek jê re nîne nexape.  
Lewma ew wek belboqa li ser avê ku ba ketiye navê  
û bê feyde û bêwate dizivire.

Dinya jî, di rastiya xwe de ne tiştek gewherî  
ye; bes wek wê belboqê wê bi nefxa sûrê zû ji  
hev biçe.

Çar xisletên ku mirov pê digihîste Xwedê bi  
Seydayê Mela Muhyeddîn re hebûn: Îlim, emel,  
'ixlas û edeb wî kurkê edeb. Di gel van xisletên  
xwe însanekî ehlê zikir jî bû; heta dema nexweşiya  
xwe de jî ku tu kesek nas nedikir bes zimanê wî ji  
zikra Xwedê xalî nedibû.

Ger em behsê ji camêrî û comerdiya wî ya madî  
nekin wê behs kêmbimîne. Seyda mêvanperwer  
bû. Gelek ji mêvanan hez dikir. Bi taybetî wextê  
Seydatiya medresê dikir her dem taştîya şibehê  
feqîyan li mala wî dixwarin.

### Di kesayeta wî de niştimanperwerî

Beriya her tiştî wî bi zimanê zikmakî dest bi jiyane  
kir. Bi zimanê xwe xewnên zaroktiya xwe qese kir.  
Dîsa bi zimanê xwe nêzikî bi sedan feqî û mela per-  
werde kirin. Di medresa wî de feqîyan, li şûna Gu-  
listana Şîrazî, Dîwana Melayê Cizîrî û Mem û Zîna  
Ehmedê Xanî dixwendin. Feqiyên di medresa wî de  
perwerde bûne parêzvanên cewherên xelkê xwe ne  
ku Îslamiyet însaniyet û milliyet e. Belê bi kurtebêjî di  
medresa Seyda de hem şîret hem hikmet hem zanîn  
hem evîn hem bîrdozî hebû.

### Wefata wî

Seydayê Mela Muhyeddîn di sala 1999ê de nex-  
weşiya xwînariya mejiyê û felc lê peyda bûn. Nêzikî  
11 salan bi vê nexweşiya giran re hevaltî kir. Zeman  
hat ku wî malbata xwe, zarokên xwe nas nediki-  
rin; bes wî şehîdên dozê baş nas dikir. Heta carekê  
hevrê û hevalên Seydayê Mela İzzeddîn ji bo ziyaret-  
kirina Seydayê Mela Muhyeddîn hatibûne Tetwanê.  
Em li mala wan rûniştibûn; hevlekî jê pirsî, "Seyda  
tu mêvanên me nas dikî?" Wî got, "belê ew hevrê  
û hevalên Seydayê Mela İzzeddîn in, Seydayê Mela  
İzzeddîn şehîdekî heqîqî ye." Her wiha dîsa carekê

piştî ku kesekî ji malbata xwe nas nedikir jê hate  
pirsîn tu ji kê hez dikî, wî bersiv da got: "Ez ji feqiyên  
Medresê hez dikim."


Bi rastî dema behsa Seyda tê kirin "em li hember  
Seyda hurmetdar û rêzdar in tiştekî ku em di heqê  
wî de bêjin tune. Ew xweyê kesayetek wisa bû ku  
dost û dijmin her kesî jê hez dikir. Min dehsalan  
feqî û hevaltiya wî kir, min nedît ku kesek bi nebaşî  
behsa Seyda dike.

Seyda di 22yê sersala bihara 2011ê de berêvariya  
roja sêşemê wefat kir. Cenazeyê wî yê pîroz li gundê  
Kutumê hate definkirin. Bi vê ayeta pîroz em sersala  
seydayê payebilind pîroz dikin: "Ey nefsa bi bawer  
û emîn, piştrast û hedînê vegere bal Xwedayê xwe  
ve; razîbûyî, razîkirî bikeve nav bendeyê min yê  
hêja û bikeve bihiştê min."

Bi hêviya ku Xwedê di dawiya jiyana me de  
emanetê xwe li ser kelîma pîroz ji me bistîne û me  
bi hev re bibete heşrê.✎

### Çavkanî:

- 1.2 Elmetalibûl aliye: İbnû Hacer Esqelanî
3. Suretê el-Fecir



# Çavkaniyên Edebiyata Kurdî

RECEB DILDAR

*Zargotina Kurdî kaniya  
edebiyata Kurdî ye.  
(Qanadê Kurdo)*

**W**ekî ku li jor Qanadê Kurdo jî gotiye, kaniya edebiyata Kurdî zargotina Kurdî ye. Zargotin bi devên dê û bavan, bi devên çî-rokbêj û dengbêjan, ji nîfşekî derbasî nîfşekî bûne û gihîştine hetâ roja me. Gelek kesên li ser Kurdan lêkolîn kirine jî destnîşan kirine ku zargotin di nav Kurdan de gelek xurt e. Di nav Kurdan de xurtbûna zargotinê helbet ne belasebeb e. Li ser vê mijarê meriv dikare çend sedeman bijmêre.

Sedema yekemîn ew e ku piştî zayîna Îsa dewleteke Kurd ya bi rêk û pêk çênebûye. Ji ber ku dewlet tunebûye saziyên ku wê li nivîsê û edebiyatê xwedî derkevin jî çênebûne. Mîrîtiyên ku di piştî sedsala 15ê de çêbûne jî dengbêj xwedî kirine lê li helbestkaran zêde xwedî derneketine. Yanî ji ber ku saziyên dewletê tune bûne, çanda nivîsê di nav Kurdan de geş nebûye.

Sedemeke din jî ew e ku nivîsên berê hatine nivîsîn negihîştine ber destên nîfşên nû. Arkeolog niha destnîşan dikin ku gelek tabletên (kevalên) nivîskî ji dewletên Hurî-

Mîtanî, Hîfît û Ûrartûyan mane. Lê ji ber sedema bêdewletbûnê, kesên ku li wan tabletan xwedî derkevin çênebûne, ji ber wê jî niha tu tîkiliya nîfşên nû û wan tabletên tîk qalkirin tune. Dîsa ji ber sedema bêdewletbûnê li ser dewleta Med lêkolînên baş nehatine kirin û nivîsên aydî wan nehatine dîtin.

Dîsa meriv dikare erdnîgariya ku Kurd li ser dijîn jî wek sedemeke xurtbûna zargotinê destnîşan bike. Kurd ji Çiyayên Amanosê bigre, Çiyayên Toros û heta Zagrosan li ser vê xetê jiyane. Yanî aliyek zozan û çiya bûye, aliyê din jî deşt û berrî bûye. Jixwe li dinyê jî ev xet bi navê “Hîvîka Bereketê” tê zanîn. Di dewra berî çandiniyê de, Kurdan heywan xwedî kirine û li dû heywanên xwe havînê derketine zozanan, zivistanê jî daketîne berriyê/deştê. Îcar gava cî û warekî te yê mayende tune be, di şûna nivîsê de zargotin bi pêş dikeve.

Piştî ku koçerî kêm dibe û bajarvanî xurt dibe jî hinek îstîsnayên biçûk ne tê de, Kurd li

---

Di zargotinê de çavkaniyeke herî girîng jî Kurdên ola xwe neguhertine, yanî Êzîdî ne. Ji ber ku zimanê dua û îbadetê jî Kurdî ye, zargotin gelek zindî maye. Îcar ji ber ku her tim rastî êrişan hatine û di rewşa parastinê de bûne, tim xwe ji nivîsê dûr hiştine

---

ser axa xwe tu carî nebûne desthilatdar. Jixwe piştî hatina Îslamê, di nivîsê de giranî ketiye ser Erebi.

Sedemeke muhîm jî ev e ku erdnîgariya Kurd di warê çavkaniyên ser erdê û bin erdê de gelek dewlemend e. Ji ber vê sedemê jî li herêmê kîjan dewlet xurt bûye êrîşî Kurdistanê kirine û dewlemendiyên wê talan kirine. Li vê herêmê ji Asûran bigre heta Ereban, Ji Farisan bigre heta Tirkan ji Mogolan bigre heta Makedonan her xelkên ku bi hêz bûne, ji bo êrîşê berê xwe dane welatê Kurdan. Îcar ji ber vê talan, wêrankirin û şewatê nivîs û edebiyat qels ketiye lê zargotin her tim zindî maye.

Di zargotinê de çavkaniyeke herî girîng jî Kurdên ola xwe neguhertine, yanî Êzîdî ne. Ji ber ku zimanê dua û îbadetê jî Kurdî ye, zargotin gelek zindî maye. Îcar ji ber ku her tim rastî êrîşan hatine û di rewşa parastinê de bûne, tim xwe ji nivîsê dûr hîştine. Kitêbên hatine nivîsîn jî her tim veşartî bûne. Loma qewl û beytên xwe her tim di nav sînga xwe de veşartine. Ev jî di nav Kurdan de sedemeke din ya xurtbûna zargotinê ye.

### Çavkaniyên berî Îslamê

Di vê dewrê de, ji ber ku çavkaniyên nivîskî di destê me de tune ne, emê bala xwe bidin ser çavkaniyên devkî. Me li jor hinek behsa sebebên tunebûna çavkaniyên nivîskî kiribûn. Em dikarin çavkaniyên devkî wisa rêz bikin:

-Çîrok	-Zûgotinok
-Destan	-Gotinên Pêşiyar
-Stran	-Nifir
-Lorîk	-Jimartok
-Pêkenok	-Lihevanînok
-Tiştanok	-Şabûnok

Mirov dikare vê dewrê wek dewra çîrok û destanan jî bi nav bike. Ev destan û çîrok bi wesita çîrokbêj û dengbêjan gîhane heta roja me. Meriv dikare taybetiyên devkî yên vê dewrê bi vî awayî rêz bike:

- Anonîm in
- Dewra çîrok û destanan e
- Edebî ne
- Mijar: Mêrxasî, şer, hurmeta mezinan, evîn û hezkirina welat e
- Ziman: Xwerû Kurmancî ye, bandora zimanên din gelek kême.

-Di wan de bandora olên kevn hene lê piştî Îslamê ev revîze bûne.

Gotinên pêşiyar him orf û edetên me, him jî şeweya jiyana me ya wê çaxê radixin ber çavan. Ji bo di hiş de bimîne gelek ji wan helbestkî hatine gotin.

Di çîrok û destanan de ji bilî qehremanên se-reke, karakterên wek dengbêj, çîrokbêj, Hekîmê Loqman û Kalê/Pîr Xizir hema bibê her tim hene. Û her qehremanek xwedî hespekî taybet e. Di çîrokê de rolên qehreman û hespekî gelekî nêzî hev in.

Dîsa di van destan û çîrokan de merasîmên wek nêçîr, dawet û şahî, zayin û mirin, derketina ser text gelek zêde cî digrin.

Mijarên sereke egîdî û evîn e.

Egîdî divê qenc be, serketî be, dilovan be ku gava bimre hemû civat şîna wî bigre.

### Destan

Destan berhemên edebî yên herî kevn in.

Meriv dikare destanan bike du beş:

- 1-Destanên devkî
- 2-Destanên Edebî

Destanên devkî, bûyereke rastîn gava ji nifşekê derbasî nifşekê din dibin û di nav demê de dikemilîn. Bûyerên rastîn û yên derîedetê tevî hev bûne. Qehreman xwedî hêzên derîedetê ne, ananom in. Destan fikrên civatê yên hevpar temsîl dikin. Mijarên destanan dîrokî û civakî ne, li ser mêrxasî, evîn, dostanî, mirin û hezkirina welat hatine gotin.



Li dinyayê Gilgamêş, Îlyada û Şehname destanên gelekî navdar in.

Di nav Kurdan de jî destanên wek Memê Alan, Siyamend û Xecê, Kerr û Kulik, Dewrêşê Evdî, Xanê Çengzêrîn, Zembîlfiroş Ristemê Zal, gelek navdar in.

Gava destaneke devkî ji aliyê nivîskarekî/ê ve were nivîsîn ew jî dibe destana edebî. Li dinyayê mînakê herî navdar "Komedya Îlahî" ya Dante ye. Li Rojhilata Navîn jî "Şahname" ya Fîrdewsî gelek navdar e.

Gelek destanên devkî yê Kurdan jî veguherîne ser destanên edebî, em dikarin mînakên wan wisa rêz bikin:

- Memê Alan: Mem û Zîn (Ehmedê Xanî)
  - Dewrêşê Evdî: Dewrêşê Evdî (Eyup Kiran)
  - Kerr û Kulik: Kerr û Kulik (Ahmet Aras) Bilîcan (Perwîz Cîhanî)
  - Siyabend û Xecê: Siyabend û Xecê (Semendê Siyabendov)(Ahmet Aras)
  - Rustemê Zal: Ristemê Zal (Xurşîd Mîrzengî) (Edîp Polat)
  - Xanê Çengzêrîn: Dimdim (Ereb Şemo) Kela Dimdimê (Jan Dost)
  - Şêxê Senan: Şêxê Senan (Feqiyê Teyran)
  - Leyl û Mecnûn: Leyl û Mecnûn (Xaris Bîtîsî)
- Zargotina Kurdî ji aliyê gelek kesan ve hatiye berhevkirin, lê di nav wan de sê berhemên gelek berbiçav derketine pêş, di van her sê berhemên de jî xebatên gelek hêja hatine kirin. Her sê berhemên sereke ev in:
- Folklorê Kurmanca: Heciyê Cindî- Emînê Evdal
  - Zargotina Kurdî: Ordîxan û Celîlê Celîl
  - Xwençe: Zeynel Abîdîn Zinar

### Çavkaniyên piştî Îslamê

Çavkaniyên piştî Îslamê di bin bandora Îslamê de hatine nivîsîn. Di serê gelek berhemên de pesnê Xwedê û Pêxember hene. Meriv dikare çavkaniyên berhemên wê çaxê wisa rêz bike:

- Ayet, hedîs, tefsîr, fiqih
- Dîroka Îslamê
- Felsefeya tesewûfê
- Mîtolojiya erdnîgariyê
- Çîrok û mucîzeyên li ser pêxember
- Kes û bûyerên dîrokî, kesên efsanewî û mîtolojîk
- Zanista wê demê

-Çand û folklorê Kurdan

-Çîrokên ewliyan

-Jiyana wê demê: Newroz, şahî, şîn..

### Çavkaniyên edebiyata şer

Edebiyata şer ew e ku di berhemê de wek mijar şer hatiye hilbijartin. Di nav Kurdan de jî edebiyata şer heye, lê ji ber ku edebiyat li welatê me qels dimeşe edebiyateke şer ya bi taybetî çênebûye. Di Şerefnameyê de gelek teswîrên şer hene. Li ser şer bi devkî gelek helbest hatine gotin. Di edebiyata şer de berhemên herî navdar li ser "Dimdim"ê hatine nivîsîn. Emê li ser edebiyata şer, çend mînakên bijarte li jê rêz bikin:

- Dimdim, Ereb Şemo
- Kela Dimdimê, Jan Dost
- Jana Gel, Îbrahîm Ehmed
- Dewrêşê Evdî, Eyub Kiran
- Viyan, Newroz Saîdpour
- Rojên Etûn, Koban Sindî
- Hêvî Herdem Heye, Hesên Huseyîn Denîz



## Çavkaniyên Êzîdiyatîyê

Ji bo edebiyata Kurdî meriv dikare çavkaniyên Êzîdiyatîyê bike du beş.

1-Çavkaniyên devkî

2-Çavkaniyên nivîskî

Wek çavkaniyên nivîskî meriv dikare, Mishefa Reş û Kitêba Cîlwe bijmêre. Lê ji ber êrîş û talanan ev herdu kitêbên pîroz her tim hatine veşartin û di nav Êzîdiyan de jî zêde belav nebûne. Ji ber vê sedemê jî meriv dikare bibêje ku çanda Êzîdiyatîyê çandeke devkî ye.

Di nav Êzîdiyan de zargotina Kurdî gelekî xurt e. Him ji ber ku dua û îbadet bi Kurdî bûne him jî ji ber ku wek civateke girtî mane, tesîra derve li ser wan zêde çênebûye, Kurdiya wan xwerû maye. Qewl û beyt ji nîşan derbasî nîşan bûne û heta roja me hatine.

Ev zargotina xurt di romanên wek "Hewarî" ya Heciyê Cindî û "Xezeba Xwedê" ya Eskerê Boyik de xwe didin der. Dîsa vê çanda devkî bandoreke xurt li berhemên Kurdên Qafqazyayê kirine. Di nav Kurdên Qafqazyayê de gelek berhemên koçberiyê û çêkirina jiyaneke nû hatine nivîsîn. Lewra piştî ku koçberî Ermenistanê dibin li wê derê rastî sîstem û jiyaneke nû tên û berhemên xwe li gorî vê jiyana nû dinivîsin.

## Edebiyata pexşan

Ji bo destpêka edebiyata pexşan ya Kurmancî Amîr Hassanpour di berhema xwe ya bi navê "Li Kurdistanê Neteweperestî û Ziman" de wisa dibêje: "Kurmancî di helbestê de kok berdabû û Kurmancî heta di sala 1898ê de rojnameya nivîskî ya pêşîn derket jî bi pirranî helbestê bi kar anî." Amîr Hassanpour di heman berhemê de dîsa wisa dewam dike: "Berhemên pexşan ku hejmara wan gelek kêman in, yê berî sala 1898ê derketine bazarê ne edebî ne. Ew berhem bi armanca perwerdeyê hatibûn nivîsîn."

Di sala 1850yê de li ser ricaya konsolê Rûs yê Erziromê, Mela Mehmûdê Beyazîdî gramera Kurdî û gelek kitêbên li ser orf û edetên Kurdan û Dîroka Kurdistanê ya Şerefxan Bîtlîsî berhev dike û werdigerîne. Tevlî hinek destnivîsên din ev berhem di salên 1950yê de li kitêbxaneyê Yekîtiya Komarên Sovyetên Sosyalîst derdikevin meydana.

Li gorî lêkolînanan, di salên Herba Cîhanê Ya Yekem de, dîsa yekî bi navê Mele Seîd ji bo Basîle

Nîkîtîn gelek berhemên pexşan dide ser hev. Ev herdu ceribandî jî nîşanî me didin ku di pêvajoya pêşketina edebiyata zimanên standart de, faktorên ji derveyê ziman çiqas girîng û bi bandor in.

Di zimanê Kurdî de du hewldanên hêja hene ku him ji bo edebiyata Kurdî ya pexşan bûne wek destpêk him jî bûne çavkanî.

Hewldana pêşîn ya Kurdên Qafqasê ye. Nivîskarên Kurd di nav sînorên Ermenistanê de li dora Rojnameya "Rêya Teze" dicivin, him karên berhevkarîyê dikin, him jî berhemên edebî derdixin meydana. Ji ber van xebatan e ku romana Kurdî ya pêşîn li ser vê axê tê nivîsîn. (Şivanê Kurmanca-Ereb Şemo.) Dîsa divê meriv destnîşan bike ku elfabeya latînî ya Kurdî cara pêşîn li ser vê axê hatiye bikaranîn.

Hewldana duyem ya "Hawarî" ye. Celadet Bedirxan û hevalên xwe, di Hawarê de him elfabeya latînî didin rûniştin, him jî gelek berhemên edebî belav dikin. Di Hawarê de gelek çîrokên Celadet Bedirxan, Osman Sebrî, Qedrî Can û Nûredîn Zaza tên weşandin.

## Encam

Zimanê Kurdî xwedî zargotineke gelekî xurt e. Û vê zargotina xurt li ber asîmîlasyona dewletên dagirker zimanê Kurdî parastîye. Ji ber ku Kurd nebûne xwedî dewlet, xwedî sazî û pergal jî zimanê Kurdî heta roja me zindî maye û qels be jî bûye xwediyê edebiyatekê. Hemû lêkolîn nîşanî me didin ku bingeh û çavkaniya edebiyata Kurdî zargotina Kurdî ye.

Piştî desthilatdariya Îslamê, bi taybetî helbest bi pêş ketiye, destanên di nav gel de ji aliyê çîrokbêj û dengbêjan ve dihatin gotin, hêdî hêdî wek berhemên edebî hatin nivîsîn. Berî Şerê Cîhanê yê Yekem hinek destnivîs, pexşan jî di nav de, ji aliyê biyaniyan ve tên berhevkirin û tên parastin.

Piştî salên 1920î de li nav sînorên Ermenistanê, piştî salên 1930yê li nav sînorên Sûriyê du êkolên ku wê ji edebiyata Kurdî re bibin bingeh û çavkanî bi pêş dikevin. Ev pêşketin piştî salên 1980yê li Ewrûpa, piştî salên 2000î jî di nav sînorên Tirkîyê de pêşketina xwe didomîne.

Lê ji bo edebiyata Kurdî di qada dinyayê de bikaribe bi edebiyatên neteweyên din re têkeve pêşbirkê, divê zimanê Kurdî wek zimanekî fermî li dibistanan bê xwendin.✶



# Azad im ez ji hebûnê<sup>1</sup>

Mawlana Celaledînê Rûmî

Ji Farsi: Hayrullah Acar

Azad im ez ji hebûnê, ji sirra 'alem bihûrîm  
Çima û çawa û çilo? Ji van pirsan jî bihûrîm




Mîna dayika muqeddes bi şîrê lûtf perwerandim  
Kevrê şermê dê ça bê min? Ji van xeman jî bihûrîm

Wer fetisîme'd nebûnê, ku yara min dibêje min:  
"Were cem min demek rûnê", jî maşûqan jî bihûrîm

Ew dema ku hat wicûdê Adem ku bi yek lehzeyê  
Ji wê demê jî bêzar im, ji wan lehzan jî bihûrîm

Fizûlane çi dibêjî? J'yê ku ne'l ser heşê xwe ye  
Hezar carî ji mî'r gotin, ji van peyvan jî bihûrîm

1 Mawlana Celaledîn-i Rûmî, *Kulliyat-i Diwan-i Şems*, (Neşr-i Bediuzzaman Fruzanfer),  
Intişarat-i Behzad, cild, II/669, Tehran, 1329.



# Bersivêk ji bo seyda Seîd Dêreşî

M. XALID SADÎNÎ

**S**eydayê birêz Seîd Dêreşî, amadekarê berhema bi navê “Dîwana Feqiyê Teyran”, “Kelhên Ava” û gelek kitêbên din; nivîseke balkêş li ser me û du camêrên din nivîsiye. Navê nivîsê “Talankirina Dîwana Feqiyê Teyran e”. Heta niha ev nivîs çar caran hatiye weşandin û belavkirin. Cihên ev nivîs lê hatine weşandin ev in:

1-Kovara Havîbûn, jimar, 25-26, 2010, Almanya.

2-Bermayêd Dîwana Feqiyê Teyran, Ji Weşanên Zankoya Dihokê, 2011, Dihok.

3-Dîwana Feqiyê Teyran, çapa tîpên Latînî, Weşanên Lîs, 2011, Amed.

4-Kovara Nûbihar, jimar 117, Stenbol.

Birêz Dêreşî di destpêka gotara xwe de dibêje ku: “Min çu car neviyaye, di nivîsê xwe de kesekî bişkênim, heta eger xeletî jî di rasta min de kiribin, gelek kesan rexna min kiriye û hindekan jî li vêrê û wêrê he nivîsînêt min li ser navê xwe belav kirine, lê min bersiva wan nedaye û tiştek di rasta wan de nenivîsiye. Du ca-

ran jî dîwana Feqiyê Teyra ya ku min twîjandî hate dizîn, herwisa min xwe bêdeng kir.”<sup>1</sup> Belê tam piştî van gotinan berevajî gotinên xwe tevgeriyaye û daye navê... tawanbariyên wekî dizî û talanê li aliyekî; heqaretên wekî lawaz, neker, lenger, serberdayî, karkinî, “te lingê xwe şikandiye” hwd. jî li ser zêde kirine û pê de çûye. Îddîa wî ji serî heta binî ew e ku xebata me ya li ser Feqiyê Teyran, jê hatiye dizîn û xebatên li ser Feqiyê Teyran malên wî ne. Xala ku di temamê nivîsa xwe de li serê disekine û balê dikêşîne serê “talankirina dîwana Feqiyê Teyran” e. Ango me sermiyanê wî yê ku li ser Feqiyê Teyran aniye ser hev, talan kiriye û me bi keda wî şohreta xwe zêdetir kiriye. Dîsa nuqteyêke muhîm a di rexne-nivîsa wî de bala mirov dikêşe ew e ku dibêje “berhema me” û pişt-re jî peyva “diziyê” bi yên din ve dizeliqîne. Dema meriv hevokên wisa dixwîne, meriv dibêje qey berhema mewzû-behs malê Seîd

---

Cara yekem dema min xwestî ku ez li ser Feqiyê Teyran tiştekê binivîsim herwekî min di pêşgotina Feqiyê Teyran de jî gotiye, kitêba Seîd Dêreşî û Pêzanê Elîxan û Dîwana Kurmancî ya Seydayê Ebdurreqîb Yûsif berdest bûn. Lê piştî ez li dû hin çavkaniyan çûyîm, min dît ku xebata me di wir de bi cih nabe. Ji ber hindê, me xebata xwe xweser kir

---

1 “Talankirina Dîwana Feqiyê Teyran” Nûbihar, Jimar 117.

Dêreşî bi xwe ye û vehandin aîdî wî ye. Ji gotinên "berhema me" û tawanên zêde, zû bi zû nayê bîra mirov ku mijara em li serê diaxivin "helbestên Feqiyê Teyran" û vehandinên ku êdî malê xelkê ne... Birêz Dêreşî mijarê ew qasî manîpule û ajîte dike ku tu dê bêjî qey, ji xeynî wî kes nikare li ser Feqî vekolîne bike û helbestên wî biweşîne...

Bi bawerîya min ev cure helwest û fikirîn jî, ji ecemîtiya me Kurdan û nezanîna me ya metodolojiya ilmî diqewime. Berî niha, melayekî berhemek ji tîpên Erebbî bikira tîpên Latîni, digot êdî ev berhem a min e. Te hew dît ku merivek bi transkîbeyî bûye nivîskar û bi dehan berhemên wî hene!

Ez bawer nakim ku meriv li welatekî pêşketî, hay ji metodên ilmî heyî û bi zanistê re hemhalbûyî, rastî nîqaş û gengeşiyên bi vî rengî were. Lewra mijara berhevkarîyê û xebatên li ser berhem û şexsiyetên tarîxî, wekî malê hemî kesan têne qebûl kirin. Her kes dikare li ser wan vekolîne bike. Dema hûn dikevin înternetê, hûn dibînin ku hemî berhemên 70-100 sal di ser wan re derbas bûne wekî pdf di malperan de weşandine û kî bixwaze dikare wan ji xwe re bigire û li serê bixebite. Ez bawer nakim ku di lîteratura welatên medenî û pêşketî de têgiheke wekî "dizîna helbestên tarîxî" hebe û ev mijar bibe sedemê serêşiyê.

Lê di nav gelên wekî me yên dûtî usûl û metodên ilmî, ji zanistê bêpar û evîndarên reşkirinê, alozî û gelemşeyên wisa pir zêde ne.

Mînanakîna helbesta Mela (ya li ser melayê Finikî) û îfadekirina meramê di ser wê helbestê re jî,



ecziyet û rebeniya me anî bîra min. Di gel ku me ew xebata birêz Dêreşî û Pêzanê Elîxan, pevne kirine, çend caran di pêşgotina xwe de qal kiriye û me wekî çavkanî daye jî, ew dubare-ducare, biisrar û te'kid dibêje: "Kerê min û barê min."

Heke me qet behsa wî, keda wî û berhema ku di gel Pêzanê Elîxan amade kirine nekiriba û me keda wan berze kiriba, min dê xwe sûcdar û kedxwir dîtiba. Min dê wê demê birêz Dêreşî mafdar dîtiba û tawanbariyên wî qebûl bikira. Lê ji çapa ewilî heta ya dawiyê, me di pêşgotinê de behsa çavkaniyên xwe kirine û me kîjan helbest ji ku anîbe, ew diyar kiriye. Baş e, çima birêz, van tiştan yekê jî nabîne û hema meselê li ser diziyê û talanê digerîne?

---

Heke me qet behsa wî, keda wî û berhema ku di gel Pêzanê Elîxan amade kirine nekiriba û me keda wan berze kiriba, min dê xwe sûcdar û kedxwir dîtiba. Min dê wê demê birêz Dêreşî mafdar dîtiba

---

Mîzansena dizî, talan, neker, lenger, serberdayî û karkiniyê jê re balkêştir tê bawer im!

Hindî ez im, ez bi xwe naxwazim bi uslûba Seyda bersivê bidim. Lewra ew Seydayê me ye. Min bi xwe gelek tişt ji wî zanîne û wî di xwendin û nivîsîna min de gelekî arîkariya min kiriye. Însanê mirov be, divê qedrê seydayê xwe bigire. Ma Îmamê Elî nabêje: "Yê herfekê nîşanî min bide, ezê çil salî koletiya wî bikim." Herwesa ez jî xulamê hemî seydayên xwe me.


Lêbelê divê ez jî di çend xalan de berevaniyê ji xwe bikim. Lewra Seyda ez gelekî di erdê vedame.

1. Berî her tiştî divê ez bêjim ku min çu carî berhevkarî û amadekariya kelepora Kurdî ji xwe re wekî pêlekaneye şohret û navdariyê nedîtiye. Ez çu carî neketime pey wê yekê ku zêde berheman derxînim û şohreta xwe pê zêdetir bikim. Ez bi xwe xebatkarekî kelepora Kurdî me û di vî warî de çî ji destê min were, ez wê dikim. Min çu caran û deman jî xwe wekî nivîskar nedaye nasîn û ez bi vî tiştî ranebûme. Rast e, deh-diwarzdeh kitêb hene ku navê min li ser wan e. Lê belê ew hemî jî berhemên xwendevaniya min û xebatkariya min in, ne yên nivîskariya min. Ji ber hindê gotina Seyda ya ku dibêje: "Hin kes bi van tiştên xwe tînin pêş ku civat van baş binase" ne rast e. Min çu caran xwe bi nivîskariyê neaniye pêş û ez naînime pêş jî. Ez ne dij civat im. Lê heke bibe babetê rastiyê civat gelek di xema min de jî nîne. Ez vê xwendin û berhevkirinê bes ji bo dilê xwe, rehetiya canê xwe

û tetmînkirina wicdana xwe dikim. Ne tiştêkî ji civatê hevî dikim û ne jî bendewarê teqdîra wê me. Dilê min çawa dixwaze ez wisa dikim. Yê min dinasin, dizanin ka ez ji şohretbûyîne û navdarbûyîne çend dût im. Her wesa ji siyasetê, derketina televîzyonan û tevlibûna semîner û kombûnên wisa jî dût im. Heke mecbûr nebim xwe têkilî van karan jî nakim.

2. Seydayê Dêreşî dibêje, helbestên Feqî cara yekem min çap kirine û Xalid jî ji wir wergirtine. Rast e, lê rastiyeke kême. Me jî çu carî înkara vê yekê nekiriye. Lê belê belkî xwendevan, hizir bikin ku kitêba me hin şîrên Feqiyê Teyran jê wergirtine, ev kitaba Sedî Dêreşî ya 2005ê ya li Dihokê û 2011ê jî li Amedê hatiye çapkirin be. Nexêr wisa nîne. Kitêba me hin şîrên Feqî jê wergirtin, kitêbeke biçûk bû. Sala 1989an li Bexdayê hatibû çapkirin. Herwekî min di pêşgotina Feqiyê Teyran de nivîsî û di babetê "jêderên vê kitêbê" de dût û dirêj 3-4 rûpel behs jê kirî, kitêba Pêzanê Elîxan û Seîd Dêreşî yê ku tê de, bes 10 helbestên Feqiyê Teyran hebûn. Jixwe min belkî deh caran zêde navê Seydayê Dêreşî û Pêzanê Elîxan aniyê. Xwendevan dikare lê bizivire û bibîne.

3. Her wekî xwendevan jî baş dizanin ku helbest bi darên Spîndarê yan bi darê Gûzê ve nayên. Heke hûn bixwazin lêkolînekê li ser babetekê bikin, hûn mecbûr in ku berê xwe bidin lêkolîn û berhemên berî xwe. Me jî eynî wisa kiriye. Û her berhama ku me tiştêk jê girtî, me behsa wê dût û dirêj kiriye û kunya



(Dîwana Feqiyê Teyran  
Seîd Dêreşî, Pêzanê Elîxan, 1989)

wê nivîsiye. Ji bilî ku em kunya kitêbên me jê girtî binivîsin, me ya wan bi xwe jî nivîsiye. Her kes dikare, li xebata me binêre, ji çapa yekemîn heta ya pêncemîn di hemî çapan de heye.

4. Cara yekem dema min xwestî ku ez li ser Feqiyê Teyran tiştêkê binivîsim herwekî min di pêşgotina Feqiyê Teyran de jî gotiye, kitêba Seîd Dêreşî û Pêzanê Elîxan û Dîwana Kurmancî ya Seydayê Ebdurreqîb Yûsif berdest bûn. Lê piştî ez li dût hin çavkaniyan çûyîm, min dît ku xebata me di wir de bi cih nabe. Ji ber hindê, me xebata xwe xweser kir. Lê li ser xîmên wê kitêba navborî. Ewe jî di gelek ciyan de me gotiye û nivîsiye.

5. Li aliyê din di kitêba S. Dêreşî û Pêzanê Elîxan de deh helbest hebûn. Hejmara beyt/malîk/çarînên van hemiyana 290 in. Lê di kitêba me amade kiriye de Şêxê Sen'an bi tenê 363 çarîn in. Ji bilî wê jî bi dehan helbest me ji hêve wêve berhev kiribûn. Yanî kitêba min du-sê caran ji ya wan mezintir lêhatibû. Ma çi heqê Xwedê ye ez xebata xwe di wir de berze bikim û tiştan bêyî wan jî bikim?

6. Ji çapa yekê heta ya dawî me tabloyek di xebata xwe de çêkiriye: "Tabloya jêderên helbestan". Kesê bixwîne dê bibîne ku ji bilî çar helbestan pê ve yê din hemî, di jêderên din de jî hene. Yanî helbestên bi navê "Bi Çar Kerîman", "Ez Çi Bêjim", "Ay Dilê Min", û "Qewî Îro Zeîfhal im" tenê di kitêba Dêreşî û Elîxan de hebûn. Di jêderên din de nebûn. Lê ji bilî van ên din hemî jî di dest me de hebûn. Heke ev her çar helbest ji wê kitêba me kême ban jî, kêmasiyeke mezin nedîxistin xebata me. Ji ber hindê Seyda di tawanbariyên xwe de piyê xwe hinekî bilind kiriye...


7. Seyda dibêje, xwe li benda derketina kitêba min girtine û "Dimdim" û "Bersîsê Abid" ji wir wergirtine. Ev îddia, bi tu awayî ne rast e. Lewra ez di sala 2002an de ji hebsê derketim. Piştî eskeriya Tirkan (ku mecbûrî piştî zîndanê ez çûm) sala 2004ê ez çûme Başûr. Min geryana xwe ya wan rojan, di Nûbihara havîna 2004an de nivîsîbû. Di vê geriyane de min Seyda Ebdurreqîb Yûsif jî dît.<sup>2</sup> Bersîsê Abid ya çapkirî wî bi xwe da min. Li gel Bersîsê Abid, destnivîseke kevin ya Dimdim jî dabû min. Lê min nikarî bixwînim. Min nîşanî Tehsîn Îbrahîm Doskî da. Wî got: "Ne hewce ye em bixwînin. Ebdurrehman Mizurî ev deq xwendiyê û di kovara 'Dengê Me' de heye." Bo min ew kovar anî, paşê min ew ji nû ve transkirîbe kir û havîna 2005ê li Nûbiharê hate belavkirin. Di heman demê de Bersîsê Abid

2 Seyda Ebdurreqîb Yûsif sax e û li Silêmaniyê dijî. Ew şahidê zindî yê vê yekê ye. Yê bixwazin dikarin vê mijarê jê bipirsin.

jî me transkirîbe kiribû, lê ji ber ku Nûbihar sê-çar mehan carekê derdikeve û metnê Bersîsî dirêj bû (211 çarîn) me hêla ji bo çapa nû ya pirtûkê. Mixabin ew jî gihîşte sala 2009an. Bes kêmasiyek me kiriye ku me jêderê van her du destanan nenivîsiye. Mixabin wê kêmasiya me heta niha jî dewam kiriye. Lewma me di çapa 4an de jî nenivîsiye.

8.Seyda dibêje: Min kitêba xwe yek cild derxist wan jî gotiye dê yek cild be. Ew jî rast e, lê dîsa rastiyeke e ne wekî gotina Seyda. Ji ber ku min berê hizir dikir ku berhemên Feqiyê Teyran dê du-sê cild bin. Min evdalê Xwedê ji ku dizanî ku Destana Dimdim 67 çarîn û Zembîlfiroş 60 çarîn e. Min hizir dikir ku, her destaneke Feqiyê Teyran de 400-500 çarîn in. Her wîsa me Qewlê Hespê Reş û Sîseban jî, ji bo Feqiyê Teyran hisêb dikirin. Lê heta niha çu deqên bi navê Feqiyê Teyran bi dest me neketine. Yên heyî jî ne yên wî ne. Ji ber hindê berhemên Feqî yên heta niha bi dest me ketî di cildekî de hiltên. Ev yek ji ber ku birêz Dêreşî wîsa kiriye, wîsa ye. Piştî ez ji zindanê derketim û min vekolîn û lêgeriyên dîr û dirêj li serê kirin, ez gihîştim vê qenaetê.

9.Helbestên Feqiyê Teyran yên wî ne û malê vî milletî ne. Hetta malê mirovahiyê ne. Çu kes ji me neşêtin xwe lê xweyî bike. Ji ber hindê sibê mirovek rabe ji wê xebata me ya naçîzane jêgirtinekê bike, helbestên Feqî bibe bi awayekî din biweşîne, çu heqê me û gazindê nabe. Lewra ew helbest min peyda kiribin yan kesekî din peydakiribin jî yên milletî bi xwe ne. Jixwe jî niha wê



de belkî bi dehan master û doxtora bêne nivîsîn li ser Feqî. Ma heqê min yan yê kesekê din heye ku dema helbestek yan hemî jî kitêbê hatine jêgirtin em bêjin "kitêba me talan kirine." Nexêr. Lewra ew ne talan kirine, hetta belkî jî nû vejandin e.

10.Seyda Seîd Dêreşî di kitêba xwe de di çar-pênc ciyan de behsa xebata me kiriye û wekî jêder bo xwe bi kar aniye. Gelo çima jêgirtin bo wî helal e, lê bo me heram e! Ecêb e ku dema ew digire, dibe karekî normal yê jêgirtinê, lê dema em digirin û çavkaniyê jî didin, dibe dizî û talan! Eve çî nakokî ye? Ka bila li kitêba xwe vegere, ka Şêx Sen'an ji ku aniye. Hem jî bi stayîşkarane behsa xebata me dike. Di Dîwana Feqiyê Teyran (Weşanên Lîs, 2011 Amed) rûpela 38an tenê behsa xebata me ye. Herwesa di rûpela 55an de jî behsa wê dike. Hetta Seydayê Dêreşî, di nav jêderên xwe de, du caran behsa wê xebata me kiriye (binêrin, ji rûpela 631ê heta 60an û 65an. Dîsa dixwazim pîrsa xwe dubare bikim: Gelo ev jêgirtin û sûdwegirtin çima ji bo wî helal û rewya ye, lê ji bo me dizî, talan û heram e?

11.Min xebata xwe di sala 1995an de, di zindanê de, di nav şert û mercên gelekî berteng de berhev kiriye. Bi çî halê heyî ev kitêb di Sibata 2000î de hatiye weşandin. Niha dê çapa 6an çap bibe. Yek ji wan kitêbên Kurdî ye ku zêdetirîn hatiye çapkirin. Gelo birêz Dêreşî van deh salan li ku bû, heta çapa 4an behs jê nedikir? Li aliyê din, di kitêba xwe de ya bi tîpên Kurdî-Erebî hatiye çap kirin de jî behseke wîsa nake. Gelo çî çêbû ku Seydayê Dêreşî wiha zêryayî heta xeberên ne di rê de ji me re bêje.

12.Ji dervayî van mijar û xalên me rêz kirin, em dizanin ku xebata nû ya Seîd Dêreşî li ser navê xwe çap kiriye, di heman demê de xebata Pêzanê Elîxan e jî. Lê Dêreşî çu behsa wî nake. Bes wekî jêder behsa xebata xwe ya hevpar dike. Lê ev tişt ne rast e. Lewra ew xebat a rehmetyê P. Elîxan e jî. Yan gelo Pêzanê Elîxan çûye rehmetyê, êdî heqê wî berze bûye? Hema qe neba ji bo xatirê wî divê navê wî lê nivîsîba. Ev çawa wijdan û dilsozî ye ku mirov xwe li mîrasa hevalê xwe yê mirî bike xwedî? Bila biryar û nixandina vê jî ji xwendevan û raya giştî ya Kurd re bimîne...

13.Li aliyê din, min çu "Dîwanên Feqiyê Teyran" çênekirine. Ya me monografiyeke besit e, li ser jiyan û berhemên Feqiyê Teyran. Jixwe Feqiyê Teyran bi xwe jî çu Dîwan nenivîsine. Tenê çend qesîde, helbest û destan nivîsîne. Şert û mercên dîwanê jî cuda ne. Ji bo Dîwanê divê, munacaet, ne't, qesîde û ji vana zêdetir jî xezel hebin. Lê di nav berhemên F. Teyran de belkî du yan sê helbest xezel bêne hesabkirin. Diyar



e seyda Dêreşî ev ferq û cudahî baş di ber çavan re negirtiye û ji berhevoka helbestên Teyran re gotiye "Dîwan". Di rewşeke ku em hê jî nîqaşa li ser "kîjan helbest a Feqî ye û kîjan ne ya wî ye" dikin de, çawa berhemeke bi navê Dîwanê li ser navê Feqî hebe? Ez nizanîm bê çima birêz Dêreşî gotiye "Dîwan", lê belê em baş dizanin ku çu "Dîwan"ên Feqî tunin.


14. Seydayê Dêreşî di çend ciyan de bi îsrar navê min wekî Mela Xalid Sadînî dinivîse. Divê bêjim ku ez ne mela me. Ew "M" ya li pêş navê min "Mihemed" e, ne "Mela" ye. Jixwe min jî navê xwe çu carî wekî "Mela" yan jî bi navlêkeke din nenivîsiye. Heke xerezêke seyda Dêreşî li hemberî melayan hebe û bixwaze bi vê wesîlê te'nekê li wan jî bide, ez ne muxatebê vê yekê me. Eger de'wa û dozeke wî bi wan re hebe, bila kerem bikin şerê xwe bikin, ez bi xwe ne di vî şerî de me...

15. Dawiya gotinê ev e ku Seîd Dêreşî di tawanbariyên xwe de neheqiyên mezin kirine û pîvanên edaletê ji dest dane. Hindî ji min hatî min hewl da ku ez di çarçoveya rêzdariyê û însafê de, bersiva tawanbarî û heqaretên li dor me hatine kirin, bidim. Wekî din çu derdekî min ê din bi seydayê hêja Dêreşî û kesekî din re nîne. Heke mumkîn ba, min nedixwest ku bikevim gengeşiyêke wisa jî, lê em carekê bi navê de hatin kişandin û me jî ji mecbûrî ev bersiv nivîsand.

Hêvîdar im ku kesê van berheman bide berhev heqîqetê çêtir bibîne. 🐾

## Bê te bûn

Kamran Simo Hedilî



ba hat û bêhna te anî  
bayê qasidê bêhna te  
ez maç kirim  
pêşî guh  
por  
çav  
rû  
çerm  
xwîn  
û  
lêvên min maç kirin  
dawiyê dilê min gez kir  
di babilîsoka hatina jînê de  
di maça baranê ya axa tazî de  
di berziya şadiya heyînê de  
di reşgirêdana bê binî de  
ez ji te hez dikim  
min ronî û tariya te vexwar  
xunava çavên bêxew  
sûlava hîsa ye  
bi kêmbûna werzên temen  
bi nêrîna siya çûkên koçber  
bi hesreta azadiya xwe  
bi wêrekiya tirskuştî  
ez ji te hez dikim  
min ken û giriyê te divê  
bê te şev û roj  
şeraba tevlî hev bûyîne  
bê te bûn  
jiyana bê oksîjan e  
bê te bûn  
rengê di çavên koran de ye  
bê te bûn  
xeyala evîndarên Enfalê ye  
bê te bûn  
ne hatina biharê ye

16.02.2012

## Bi girî çav bi derya kim, sebrê bi sehra xînim

Hafizê Şirazi

Ji Farisî: Hayrullah Acar

Bi girî çav bi derya kim, sebrê bi sehra xînim  
Bi vî rengî, dilê xwe ez bi çem û derya xînim

Ji dilê tengê gunehkar axînkê bikêşim ku  
Agir di nava gunehên Adem û Hewwa xînim

Dildar li ku derê be, şadî ji dil re ew der e  
Tê'd bikoşim ku xwe' b wî diyarê hêja xînim

Veke wan zend û bendan ey sox û şepala kûm-roj!  
Wek zûlfên te, serê evîndarê xwe'l ber linga xînim

Tîra felekê xwarime, mey bide ta sermest bim  
Girêkê li kemerbenda tîrkêşê Cewza xînim

Qûrtek ji meya camê'l ser vî textîrewanî kim  
Ku awaz û nexmeya çengê'l vê qûba mîna xînim

Hafiz! Bawerî bi 'emr û zeman xeta ye madem  
Ez çima kêf û şadî ya îro bi siba xînim?



## Bêhes mabûn di xewê da

Hasan Hüseyin Çevik

Bajarek dî devê rê da  
Min silava Xwedê lê da  
Qet wan kesan cewab neda  
Kar kiribûn, qedya bû kar  
Bêhes mabûn di xewê da

Bêsewt û seda û kerr û gêj  
Raketîbûn xewke dirêj  
Bêxem bûn rojî û nimêj  
Bêhes mabûn di xewê da

Li bahoza l'berf û baran  
Ş'ul kiribûn wekî mêran  
Raketîbûn xewke giran  
Bêdeng û hes di xewê da

Dar û diyar û şehristan  
Ajoşibûn bax û bostan  
Ya sorgul û diristan  
Ya saray û yaxud kulxan  
Îro bêdeng di xewê da

Zengîn û namerd û nekes  
Kes pîrsa kesî nake kes  
Ji hev bêxeber in herkes  
Huseyn dibê'm silav lê da  
Qet wan kesan cewab neda

# Di dema Stalîn de polîtîkaya tehcîrê û rewşa Kurdan

ANJELIKA POBEDONOSTSEVA-KAYA

**R**ûdanên ku di destpêka sedsala XXan de qewimîn tenê bandoreke neyînî li ser Împaratoriya Rûsyayê nekirin, pergala dewlet û hikûmetê jî guherand û bandoreke mezin li ser qedera gelê Rûsyayê jî kir.

Polîtîkaya Sovyetê ya heta sala 1953yan, du dem in: Di dema yekem de, xweseriya neteweyî û rêvebiriya herêmî hate dameziran-din û personelên neteweyî gihîştin. Di dema duyem de jî, ji bo pirsgirêka neteweyî helwesta dewletê guherî, bi vê guherînê di salên 1930an de koçberiyên komî û îskanên zerûrî derketin holê.

Di vê demê de, ev polîtîkayên tecrîdê li cihên cuda yên dinyayê dihatin dîtin. Yekitiya Amerîkayê zorê koçê kir, Brîtanayê Almanya ji qoloniyên xwe qewirandin. Piştî şer Rojhilata Ewropayê jî Alman sirgûn kiribûn, wekî din Tirkan Yûnan, Yûnanan jî Tirk ji cihên xwe rakiribûn. Koçên li Sovyetê jî, ji 1920an dest pê kir heta 1955an berdewam kir. Sovyetê netewên ku pê bawer nebûn ji sînoran koç dikirin. Di serî de sînorê Gurcis-

tan, Azerbaycan, Ermenîstan, Tacîkistan, Ûzbekistan û Turkmenistan, li nêzîkê 40 herêmên sînor koç pêk hat.

Di ser de, nezikê nîv sedsal derbas bû, lê zordestiyên Stalîn, sûcên ku ji hêla rejîma totalîter û otorîter pêk hat, hêj jî derneketine holê, bandorên wan hêj li ser nûjenkirin û nûkirina civaka Rûsyayê berdewam e. Heke li ser otonomiya Kurd û tehcîra Kurdan lêkolîn were kirin, sedem û encamên wan dê derkeve holê, wê bi giştî kiriyariyên ku ewê demê qewimîne bên fêmkirin.

## Herêma Kurdîstanê

Rûsyayê operasyonên leşkerî girt ber çavan û di encama xwestina firekirina axa xwe ve Kurd nas kirin. Kurd bi şiklek sîstematîk di sînorê Tirk-Îran, Rûs-Tirk û Rûs-Îran de hatine bicihkirin. Gelek gundên Kurdan di çaryeka pêşî û duyema XIX sedsalê de hatin koçkirin.

Rûsya di sala 1828an de bi peymanî Turkmençayê ve sînorê xwe yê Îranê, di sala 1919an de

---

Rûsyayê operasyonên leşkerî girt ber çavan û di encama xwestina firekirina axa xwe ve Kurd nas kirin. Kurd bi şiklek sîstematîk di sînorê Tirk-Îran, Rûs-Tirk û Rûs-Îran de hatine bicihkirin. Gelek gundên Kurdan di çaryeka pêşî û duyema XIX sedsalê de hatin koçkirin

---

bi peymanê Edîrneyê ve sînorê Tirkîyeyê diyar bû, li gor van peymanan, Rûsyayê hinek herêmên ku Kurd û Ermenî lê dijîn girtin bin kontrola xwe. Ji Kurdîstana Îranê Salmast, Xoye û Êrmiye, ji Tirkîyeyê jî, Wan, Erzirom û Qers ku wek bajarên Kurd û Ermenî dijîn tevî Qafqasyayê kir. Kurd di vê sedsalê de, li herêma Tîflîs, Surmeli, Erîwan û Îçmezînê, di bin desthilatdariya Împaratoriya Rûsyayê de wek Koçeran jîyan. Di dawîya sedsala XIXan de, rêvebiriyek eyaleta Tîflîsê, 9 parçe (Tîflîs, Akhalkalakî, Ahiska, Borchalî, Gorî, Dushetî, Sognahsky, Telavi, Tîonetsky) û navçeyek (Zagatala) bû. Piraniya nifûsa Kurdan li Akhalkalakî, Ahiska, Borchalî û li navçeya Borchaliyê dijiyan. Ev bajarana wek herêma Elîsavetpol dihatin zanîn. Xeynê van cihan, Kurd li jêrê Qafqasya Qers, Ardahan, Kaxizman û Oltiyê jî hebûn. Pirsgerêka Kurd ji nivê sedsala XIXê heta ku hikûmeta Sovyetê hate damezirandin tu car jî rojevê derneket.

Di sala 1921an de, li herêma Kurdan xela û birçîtî derket holê. Li ser vê mijarê gelek nivîs hatin nivîsandin û vê bûyerê di çapemeniyê de bi şiklekî fireh cih girt. Cara pêşî di vê demê de navê Kurdîstanê hate bikaranîn. Ew xela ya ku li herêma Kurdîstanê diqewimî dişibiya xelaya peravê çemê Volga yê ku jê re digotin "Povoljîya". Serokê Sovyeta Azerbaycan yê wê demê N.Narîmanov, di derbarê vê xelayê de, ji Lenîn re telgrafek şand. Lenîn piştî ku ji xelaya Kurdîstanê haydar bû, emrê alîkariyê da. Di Qomîseriyên Neteweyî de damezirandina Komara Kurdîstanê

## Tê îdfakirin ku, xebatên rewşenbîriya Kurdan di sala 1924an de, yanî bi mirina Lenîn ve bi dawî bû. Tê destnîşankirin ku Lenîn li Kurdên Sovyetê xwedî derdiket

hate nirxandin. Damezirandina Komara Kurdîstanê di bin serokatiya Stalîn de hate nîqaşkirin. Piştî van nîqaşan di 16.07.1923an de, bi talîmata Qomîteya Rêvebirîya Navendî ve Kurdîstana Sor, li herêma Qerebax ya Azerbaycan û navenda Komara Ermenîstanê hate damezirandin. Navenda Kurdîstana Sor, Laçîn bû. Di nav sînorê Kurdîstana Sor de, navçeyên ku piranî lê Kurd dijîn Qerekişlak, Kelbecer, Koturlu, Kubatli û Kurt-Xajî û Murathanli hebû. Li gor jimara nifûsê ku ew dem hate kirin nifûsa Kurdîstana Sor 51,200 kes bûn û ji % 73 vê nifûsê jî Kurd bûn.


Lê rewşa vê wilayetê di 8ê Nîsanê 1929an de guherî. Di Sovyetê de pergala wîlayetiyê guherî û rêvebirîya herêmî hat saz kirin. Rêvebirîya herêman jî kete destê komaran. Li ser vê

yekê, Kongreya Azerbaycanê rêxistina Kurdîstanê belav kir û ew navçe bi Qerebaxê ve girêda. Lê di 25ê Gulana 1930an de car din Kurdîstan hate qebûl kirin û vê carê jî navçeyên Zengelan û Cibreîl jî pê ve hatin girêdan. Lê di 23ê Tîrmeha 1930an de ev car bi biryara Qonseyê Rêvebirîya Navendî ya SSCBê dîsa ji holê hate rakirin.

Ev wilayeta Kurd ku paşê bû herêm di nav Kurdan de gelek girîng e. Hebûna Kurdîstana Sor bi pirsgerêka Qerebaxê ve girêdayî bû. Komara Demokrat ya Azerbaycan îdia dike ku, di nav salên 1918-1920an de, ji bo ku nifûsa Ermeniyên paqij bike, herêmek wek tampon çêkiriye û Kurd jî li wê bi cih kiriye. Sedem çî dibe bila bibe, lê ev rastî heye ku, di wê demê de Ermeniyên gundên xwe terk kirine.

## Xeyalîkîstî û Destpêkirina Zordestiyan

Tê îdfakirin ku, xebatên rewşenbîriya Kurdan di sala 1924an de, yanî bi mirina Lenîn ve bi dawî bû. Tê destnîşankirin ku Lenîn li Kurdên Sovyetê xwedî derdiket. Li welêt raye û hêz ki-





şandin navendê ji ber vê yekê li ser mixalefetê zordestî zêde bû.

Piştî salên 1930an dev ji polîtîkayên neteweyî yên kevn hate berdan û otonomiyên çandinî hatin tasfiyekirin. Piraniya van jî kêmeteweyên dîasporaya bûn. Dîrokasên nûjen, vê rewşê wek amadehiyên şer dinirxînin. Yek ji sedema van tasfiyeyan jî, polîtîkayên Stalîn bûn. Şoreşkerên dijber û muxalîfên polîtîkaya rejîmê, xebatên xwe zêde dikirin, yên li hemberî pêşesazî û kolektîfkirinê bûn, wek din, tahlîyekirinên kêmetewên bêhewa ku di bin desthilatariya SSCBê (KKSS) de dijiyan, gişî van sedeman di wê demê de wek amadehiyên şerê li dijî Almanya, Fînlanya û Japonya dihatin nirxandin. Bi vî şiklî piştî Baltîk Înrîa û Rojhilata Dûr Qafqasya jî wê bihata paqijkirin. Li gor Stalîn hejmara gelê Xamşîfî, Koreî, Kurd, Alman, Qereçay, Kalmîk, Çeçen, Înguş, Balkar, Teterên Qirimê, Rum, Tirkên

Mesetîn li vê herêmê zêde bûn û divê ev bihatana paqijkirin.

Qomîteya Navenda Partiya Komînîst, di 9ê Adara 1936an de, ji bo ku KKSSyê ji teror, gef û sixûran biparêze rêznameyek qebûl kir. Bi vê rêznameyê, ketina welêt ya penaberên polîtîk dijwar bû. Ji bilî wê li gişî KKSSyê ji bo ku ji rêxistinên navneteweyî were paqijkirin komîsyonek hate amadekirin. Guhertina Qanûna Bingehîn ya sala 1936an jî gelek girîng e, di dewsa Qanûna Bingehîn ya Lenîn, Qanûna Bingehîn ya Stalîn pêk hat. Di

---

Di dema van koçan de, perwerdehiya zimanê zikmakî û weşanên bi zimanên zikmakî hatin sekinandin. Wek din, folkloro neteweyî û cil û bergên kevneşopî qedexe bûn. Bikaranîna peyva Kurd jî qedexe bû

---

5ê Çileyê Pêşîn a 1936an de, di Kongreya 8ê ya Sovyetê de, piştî ku 6 meh hate nîqaşkirin, hate qebûl kirin.

“Qanûna Bingehîn ya Stalîn” ango “Qanûna Bingehîn ya Serkeftina Sosyālîzmê” îdeolojîk û polîtîka xurtkirina şoreşê dimeşîne. Dev ji fikra şoreşa dinyayê berdabû û şoreşa kesayetî derxistibû pêş. Dewlemendiya KKSSya gişî, mulkiyeta gel, qanûnên mafên mirovan (Mînak; wijdan, azadî, azadiya ramanan, guhdarîkirin, mafê teqûdbûyiyê) red dikirin. Mafê bikaranîna wan dewrê gel hatibû kirin. Lê hemî kesî ev yek baş dizanibû ku bi giştî ev guhertinan sembolîk in, rastî cûdatir e.

Qomîseriya Gel ya Karên Hundirîn (NKVD), di 11ê mijdara sala 1930ê de, wek gişî gelan, di derbarê Kurdan de jî, rêznameyên tund derxistin. Li gor van rêznameyan Kurdên ku li nav erdnîgariya Azerbaycanê dijîn hatin koçkirin. Di sala 1937an de, li Asya Navîn û Trans Qafqasyayê cihên taybet hatin çêkirin. Nifûsa li wê derê sewqê Asya Navîn hate kirin.

Li ser vê yekê, di salên 1937–1938an de, Kurdên li Azerbaycan û Ermenîstanê şandin Komarên Asya Navîn û Qazakîstanê. Wek sê – çar malbat li gundan dihatin belavkirin. Bi vî şiklî îskan pêk hat. Nêzikê 1325 Kurd li Qirgîzîstan û Qazakîstanê hatin bicihkirin. Di dawiya sala 1937an de, ji Azerbaycan û Ermenîstanê 1121 Kurd koçê Qazakîstanê (Almata û bajarên başûr) bûn. Di heman demê de, ji Îraniyan jî koçê vê herêmê hatin kirin, di nav wan Îraniyan de jî, ji % 10 Kurd hebûn.



Di dema van koçan de, perwerdehiya zimanê zikmakî û weşanên bi zimanên zikmakî hatin sekinandin. Wek din, folkloro neteweyî û cil û bergên kevneşopî qedexa bûn. Bikaranîna peyva Kurd jî qedexa bû. Çimkî heman rewş, li dewleta cîran Tirkîyeyê jî, li ser Kurdan hebû. Piştî serhildana Şêx Seîd, ev tiştana li Tirkîyeyê jî hatibûn qedexekirin. Kurdan, ji van polîtîkayên ku li ser wan pêk dihatin re digotin “Polîtîkaya Înkarê”.

Di dema Konferansa Lozanê û piştî wê, gelek caran rêberên Kurd ji hikûmeta Sovyetê alîkarî xwestin. Heta jiyana di bin himaye û rejîma Sovyetê de jî qebûl dikirin. Lê hikûmeta Sovyetê di wê demê de, dixwest bi Tirkîye û Îranê re têkiliyên baş bimeşîne. Ji ber vê yekê, tenê li hemberî zordestiya li ser Kurdên Tirkîyeyê bêdeng nema, helwesteke neyînî jî bi kar anî. Ev helwesta neyînî li ser Kurdên xwe jî pêk anî.

Zarokên ku di sala 1930an de nasname digirtin, destûr nedidan ku netewa xwe wek Kurd binivîsin. Heke di nasnameyê de, neteweya xwe milletekî din binivîse ji bo wê giştî maf hebû, ji ber vê yekê Kurdan netewa xwe vedîştartin. Hikûmeta Sovyetê bi vî şiklî hejmara netewên di nav xwe de kêm dikirin.

Li ser van polîtîkayan, pîranî di nasnameyan de xwe wek Azerî qeyd kirin. Kurdên ku li Azerbaycan man, ji bo wek Kurdên Ermenîstan û Naxçivanê neyên koçkirin, di nasnameyan de xwe Azerî nivîsbûn. Bi vî şiklî, li Azerbaycanê pîrsgirêka Kurd çareser bû. Yanê beriya tecrîdê li Komara Azerbaycan 50 hezar

---

**Asta pêşî ya van koçan,  
bi zilm û talan pêk hat.  
Gelek lêkolîner destnîşan  
dikin ku, ev koç bi kêrî  
Almanan ku di nav axa  
Sovyetê de pêşve diçûn,  
dihatin. Çimkî Almanan  
soza azadiyê dida wan  
gelên ku tûşî zilmê  
hatine**

---

Kurd dijiyan, di sala 1979an de kesek jî tune bû. Yanî heke gel tunebe otonomî jî tune ye. Li gor îstatîstîkên nefermî, dema em zêdebûna nifûsa Kurdistana Sor bidin ber çavan divê 300 hezar Kurd hebana. Zarokên Kurd ku, bê dibistan man, diçûn dibistanên Azerî, Ermenî û Gurciyan, ji seba ku dibistan ne bi zimanê wan bû, serkeftî nedibûn û ji dibistanê dihatin avêtin. Çimkî bi Azerî û Ermenî nizanibûn. Bi vî şiklî Kurd bê perwerde û nezan man, çandî Kurdî ku pêşve diçû, piştî van sepanandinan li paş ma.

Bi van koçan, Kurd ji kevneşopî û orf û ededên xwe yê sed salan dîr diketin, çand û kevneşopiya wan di hate tune kirin. Axa çandiniyê ku gelek baş bû, êdî ji bo çandiniyê nedihatin ajotin. Ji hêla din ve, di van deman de herb hebû, dema em mercên herbê jî bigrin ber çavan, zehmetiyên çawa hatine jiyîn mirov dikare fêhm bike.

### **Pêla tecrîda duyem**

Her çi ças Kurdistana Sor piştî demeke kurt hate belavkirin û Kurd koçên Asya Navîn hatibin kirin jî, serkeftiyên Kurdên Sovyetê, ji bo

Kurdên din wek mînak dihatin dîtin û ji bo çareseriyê wek referans dihatin girtin. Di demên pêşî yê avakirina Sosyalîzmê de, Sekreterê Ofîsa Asya Navîn A.Zelenskî, ji bo Kongreya 14ê ya Komîteya Navendê raporek amade kiribû. Di vê raporê de, di hate destnîşankirin ku, “Ji Hîndistanê gelek gel û eşîr koçî Sovyetê dikin. Di nav van gelan de, Belûcî, Kurd, Camîs, Xazerî û Berberî hene. Ev gel ji bo ji koletiyê birevin an jî pîrsgirêka gelên xwe çareser bikin koç dikin.

Kurdan, di sala 1941an de, ji bo ku artêşa Sovyetê derbasî Îranê bibe, alîkariyeke mezin dan. Wek qurye dixebitîn û êrîşê yekîniya cenderme û artêşa Îranê dikirin, bi vî şiklî artêşa Îranê qels dikirin.

Di destpêka Herba Cîhanê ya 2yemîn de, Almanên li Rojhilatê Ewropa koçê herêma KKSSê hatin kirin. Di nav sala 1924 – 1944an de, gelek netew hatin koçkirin. Evana; Fînî, Karmîkî, Çeçen, Înguşîan, Bulgar, Teterên Qirimê, Nûgîan, Tirkên Mesetin û Rûm bûn. Li gor qanûnan sedema koçan: Reva ji eskeriyê, alîkarîdayîna dijmin û yê ku li hemberî Sovyetê bûn. Evana wek sedema koçan dihatin dîtin. Di nav yê ku hatin koçkirin, kesên ku, zarokên wan di artêşa sor de wezîfe kirine jî hebûn.

Asta pêşî ya van koçan, bi zilm û talan pêk hat. Gelek lêkolîner destnîşan dikin ku, ev koç bi kêrî Almanan ku di nav axa Sovyetê de pêşve diçûn, dihatin. Çimkî Almanan soza azadiyê dida wan gelên ku tûşî zilmê hatine. Ev koç wek malzemaya propagandayê ji hêla Almanan ve di hate bikaranîn.

Divê neyê jibîrkirin ku, ev koç piştî sala 1944an ku Alman têk çûn û hatin qewirandin jî berdewam kir. Gelên ku zilma personelê îstîxbarata Stalîn dîtibûn alîkarî didan artêşa Alman. Bi taybetî jî Qafkasan. Stalîn piştî şer dîsa dest bi tecrîdê kir, ji seba girîngiya jeopolîtîk Gurcistan hedefa pêşî bû ev car.

Di bihara sala 1944an de, li Gurcistanê tehcîr dest pê kirin. Hejmara van koçberan 77,5 hezar kes bûn. Ev kesana li Rojhilatê Gurcistanê yanê li sînorê Tirkîyeyê dijiyan. Di dawiya meha Adarê de jî, 608 malbat, nêzîkê 3240 Kurd û Azerî hatin koçkirin. Yê ku, li Tiflîsê dijiyan şandin nav KKSSê. Piştî Gurciyan Stalîn vegeriya gelê Mislîman. Tirk, Kurd û Hemşîn (Ermeniyên mislîman) ku piraniyên van, di nav sînorê Tirkîyeyê û Sovyetê de, li navçeya Axalsik, Adige, Asbinzen, Axalkalik û Bogdan dijiyan.

Heta 3ê Tîrmehê, 76021 Tirk, 8694 Kurd û 1385 Hemşîn hatibûn koçkirin. Di dewsa wan de, 7 hezar gundî û 20 esker hatibû bicihkirin. Ev biryara tehcîrê, A. Kabulov, Îstîxbarata Gurcistan û Wezaretê Karê Hundir bi hev re meşandibû.

Di wê demê de, Tirkîyeyê di sînorê KKSSê de 30 henge artêş bi cih kiribû. Li Sovyetê jî artêşa Tirk zêdetir, ji kêmtewên nav xwe ditirsiyan. Şefê Polîsên Taybet ê Sovyetê Lavranti Beriya, di nameya ku ji Stalîn re dişîne de, destnîşan dike ku, "Xizmên van kesan li Tirkîyeyê hene, bi qaçaxiyê re mijûl dibin, fikrên wan yê cuda hene. Ji ber vê yekê, ji bo xebatên îstîxbarata Tirkîyeyê mercên erênî hene."



### Rehabîlîtasyona gelên hatin tehcîrkirin

Tehcîrê heta mirina Stalîn berdewam kir. Giştî rayederên KKSSê û Partiya Komînîst berpirsiyarên polîtîkayên van tehcîran in. Çimkî giştî rayedar û rêvebirî wezîfeya îmzekirina belgeyên "dijminê gelan" hebû. Gelek car operasyonên wisa li hemberî organîzator û îstîxbaratê jî pêk dihatin. Yanî yê ku tehcîr pêk anîne jî car car dihatin kuştin. Rayedarên wek G.Yagoda û N.I.Ejov ji wezîfeyê hatin girtin. Mirov dikare bibêje ku giştî rayedarên rêveberiya KKSSê di bûyerên tehcîrê de cih girtine. Piştî sala 1956an, ev tehcîr jî hêla kesên nav Partiya Komînîst ve li hemberî hev bi kar anîn. Hinek kes jî wezîfeyê hatin girtin. Lê tenê hinek kes jî seba ku tehcîr pêk anîne ji wezîfeyê hatin girtin. Berpirsiyaran ceza negirtin. Piştî sala 1964an tu kiryarî pêk nehat.

Statûyeke taybet a Kurdên ku sirgûn bûne hebû, ji wan re "Nişteciyan taybet" dihat gotin. Di 8ê Çileyê Paşîn ya sala 1945an

de, NKVD û SNK (Qomîseriya Gel ya Sovyetê) di derbarê nişteciyan taybet de, qanûnnameyeke taybet derxist. Mafê hemwelatîyê dîsa da wan. Zordestiya tund ya li ser wan rakirin. Lê mafên van yê koçê jî jiyana azad tune bû. Lê dîsa jî mirov direviyan. Heta di 01.10.1948an de, 2.104.750 kes reviyabûn. Kesên ku reviyabûn, ji % 2,2 Alman, ji % 3,5 Bakurê Qafkasya, ji % 4.4 jî Qırım û Teter reviyabûn.

Her tim hêzên taybet wek NKVD (îstîxbarata hundirîn) û SNK (Qomîseriya Gel ya Sovyetê) li cihên ku van koçberan dijîn hebû. Ji bo ku nerevin tevdîrên tund digirtin. Mînak; di 24ê Mijdara 1948an de, bi şiklekî tund ev tevdîr li ser Kurdan jî pêk hatin.

L.P.Beria di 26ê Adara 1953an de, ji bo Serokatiya Qonseya Sovyetê ya Bilind, raporek amade kir, di vê raporê de efû dixwestin. Rojek piştî vê raporê, yanê di 27ê Adarê de Serokatiya Sovyetê jî bo afûyê rêzîkname derxist. Di vê rêzîknameya afûyê

de, efûya mahkûmên siyasî hebû û destnîşan dikirin ku, tevî malbatên xwe bila serbest bin. Lê belê vê rêzîknameyê gelên ku hatine tehcîrkirin hêvîşikestî kir. Mafên wan nehatibûn dayîn û kiriyariyên ku li ser wan pêk dihatin berdewam bûn. Di nav 1954 – 1955an de, di kamp û qolîniyan de, bi lezgîni 88.278 kes ji hêla dadgehên Sovyetê ve hatibûn serbestberdan. Doza 32.798 kesan jî wê ji nû ve bihatana dîtin. Ji bo kesên ku, di navbera 1941 – 45an de alîkarî dabûn hêzên dagirker jî efû hatibû. Dîsa di heman salê de, ji bo niştecihên taybet, destûra pasaportgirtinê hate dayîn.

Xruşev di 25ê Sibata 1956an de, bi rapora “Esasiya Kesayeti û Encam” ve, ev qanûn ji holê rakir. Di sala 1956an de, pasaport û vîze ji holê rabûn. Destûra azadiya seyyehatê û xebata li Moskova û bajarên din hate dayin. Di 18ê Avrêlê de, ji bo Kurdan jî hinek serbestî hebûn. Azadiya seyyehatê hatibû dayîn û xeynî cihên ku jê hatine sirgûnkirin karibûn biçin cihên ku dixwazin.

Pêvajoya rehabilitasyonê, di desptêka salên 1980an, di dema Mîhaîl Gorbaçov û Alexander Yakovlev de, dîsa dest pê kir. Di sala 1988 – 1989an de 83.740 kes hatin rehabîlekirin. Qonseya Bilind ya KKSSê di meha cileya pêşîn ya 1989an de, di deklarasyonê ku derxist de wisa digot: “Di encama hovîtiya rejîma Stalîn de, piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn Balkar, Înguşîyan, Kalmîkîyan, Qereçayîyan, Teterên Qirimê, Alman, Tirkên Mesetin û Çeçen bi zorê hatine koçkirin. Polîtîkayên tehcîrê, qedera gelê Kore, Rûm, Kurd û yên din wek felaket li ser wan bandor kiriye. Qonseya Bi-

lind ya KKSSê, ceza dide sûcên ku li hemberî qedera gelan pêk hatine. Ev tevger li dijî zagonên navneteweyî û sosyalîzmê ne. Sovyet mafên mirovahiyê qebûl dike û tahût dide ku dê tu car tiştên wisa pêk neyne.

### Sirgûnê di hişê Kurdan de cih girt

Piraniya gelên ku hatin sirgûnkirin, di nav gelên din de asîmîle bûn. Mesela Kurdên ku di salên 1936–1941an de sirgûnê Qazakîstan û Tirkmenîstanê bûn, careke din paşve venegeriyên Kurdîstanê Sor. Polîtîkayên ku, di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de pêk hat tahrîbatên mezin pêk anîn. Di demeke dirêj ji bo ev tahrîbat bêne serastkirin hewl hatin dayîn. Hêj jî xebat berdewam in. Di 26ê Avrêla 1991an de, zagona Rûsyayê hate qebûl kirin. Li gor vê qanûnê, gelên ku bi zordestî hatine koçkirin û tûşê tundiyê hatine dê rehabîlîte bikin û sirgûn û koç hatin şermezarkirin.

Salên 1923 – 1936an, ji bo pêşveçûna çanda Kurdî û pêşketina rewşenbîriyê, mirov dikare wek demek girîng binirxîne. Di dibistanan de perwerdehiya zimanê zikmakî hebû. Di otonomiya Kurdîstanê de, pirtûk û rojname bi zimanên Kurdî hatin weşandin, dibistana mamostetiyê ya Kurdî vebû. Li Ermenîstanê dibistanên Kurdî û saziyên çapemenî û weşanê hatin damezirandin. Şanoya neteweyî ya Kurdî vebû. Ev rûdan li Gurcîstan, Ermenîstan û Tirkmenîstanê pêk hatin.

Lê salên sirgûnê di hişê Kurdan de, tahrîbateke mezin pêk anî. Piraniya Kurdan koçê qebûl nekirin, yên ku taswîb kirin jî ji azadiya kesayetiya xwe ditirsîyan, ji ber vê yekê qebûl kirin. Di dema koçan de, bi rêzîknameya taybet, nedihîştin ku mamoste an kesên ku perwerdehiyê bidin bikevin nav van koçberan. Lê tevî van mercan, li Asya Navîn hinek entelektuelên Kurd jî gihîştin, wek Nadîr Nadîrov.✍

#### Çavkanî:

- 1-Mevzûata SSCB Cîlt. 10, 1990.
- 2-Aliyeva S. Tak Eto Bilo: Natsionalniye repressii v SSSR. 1919-1952 godi. Cîlt 1. Moskova, 1993.
- 3-Arîstova T.F. Materialnaya Kultura Kurdov XIX - pervoy polovini XX v. Moskova, 1990.
- 4-Babayan D. Krasniy Kurdistan – Geopoliticheskiye aspekti sozdaniya i uprazdneniya. // “21-y VEK», № 2, 2005.
- 5-SBKP (Partiya Komûnîst ya Yekitiya Sovyetan) Sekreteriya Pêşî ya Qomîteya Navendê N.S. Rapora Hruşov Li ser bîngeha kesayeti û encamê wê 25 Sibata 1956. <http://lib.ru/MEMUARY/HRUSHEW/kult.txt>
- 6-Lazarev M.S. Kurdistan i Kurdskiy vopros (1923-1945). Moskova, 2005.
- 7-Stalîne Nameyên Beriyayê 10 Gulanê 1944 № 424/b. <http://vif2ne.ru/nvk/forum/archive/1498/1498956.htm>
- 8-Polyan P. Ne po svoey vole... Istoriya i geografiya prinuditelniy migratsiy. Moskova, 2001.
- 9-Uşakov A.G. Fenomen Ataturka. Moskova, 2002.
- 10-Arşivê Devletê ya Komara Kazakîstanê f. 1490.
- 11-<http://www.rian.ru/society/20091114/193419498.html>
- 12-[http://scepsis.ru/library/id\\_1237.html](http://scepsis.ru/library/id_1237.html)

# Kula 24 salan bajarê birîndar Helebçe

**M.SAÎT TEMEL**

**R**ojên wisa reş di dîroka însaniyetê de çi li hundir çi li derve gelek hene; lazim e li ser van hovîtiyên wisa gelek lêkolîn bêne kirin. Çi dibe ku însan li dijî hev wisa hovane dibe. Mixabin gelekî misilman çawa li dijî gelekî din ên misilman wisa çavsor dibin. Min ev mesele bi kurtahî lêkolîn kir û di sê beşan de ezê ji xwendevanan re şîrove bikim.

## Dîroka Iraqê

Dewleta alê Osmanê di Herba Cihanê ya Yekemîn de ji alê Îngîlîz û Frensiyan ve hatibû hilweşandin û Rojhilata Navîn -gotin di cihê xwe de be- bi cetwelê hatibû parvekirin. De îcar Surî para Frensiyan ketibû û Iraq para Îngîlîzan ketibû. Îngîlîzan welatê ku dagir dikirin li gorî berjewendiyên xwe ji nava wî welatê serokê li gorê xwe de didanin ser kar.

Li Iraqê cara ewil bi navê Qral Feysal ji malbatekî Erebe sunî bû, ew kiribûn serokê dewletê. Ewî jî dixwest ku dewletêka bihêz ji Suniyan ava bike, ji ber wê jî berteka Erebe Şîa û Kurdan gelek kişand. Û di sala 1930an de Iraqê serxwebûna xwe bi dest xist. Di sala 1932an de jî bû endamê NYyê (Netewên Yekbûyî).

Di sala 1933an de Qral Feysel mir, piştî mirina wî li Iraqê him mezhebî û hem jî netewî bêhizûrî çêbû. Di 1936an de bi navê Hîkmet Suleyman ku siyasetmedarekî kevn bû, û ew jî bi alîkariya Mîralayekî ku bi netewa xwe Kurd bû, navê wî jî Bekir Sitqî bû bi derbeyeka leşkerî rêveberî xiste destê xwe û piştî demeke kin wî albayî kuşt û bû hakimê dewletê.

Ji vê salê heta herba dinyayê ya duyemîn gelek hukûmet hatin ser kar û çûn. Cara herî dawiyê bi navê Qralgazî yek li ser kar bû, ew jî qezayeka hatûçûyî de (traffik) mir, anîn kurê wî yê çar salî kirin Qral lê belê ji hêla apê xwe ve hate birêvebirin.

Di 1941an de derbeyekî din jî çêbû, û her bêhizûrî dewam kir. Di 1945an de yekîtiya Ereban hate damezirandin. Di vê navberê de Iraq, Sûrî, Urdin û Libnanê biryara yekdewletiyê standin. Ev biryar ji alê Îngîlîzan ve hate destekkirin lê Misir dijî vê biryarê derket, lewra mezintiya Ereban ew dê ji destê wê derketiba. Û ev yekîtiya çênebû.

Îcar piştî Herba Cihanê ya Duyemîn Îngîlîz, Frensiyan û Almanan rola xwe ya Rojhilata Navîn

---

Di 13-14ê Adarê de çiyayên dora Helebçe bombe kirin, û pira ser çemê Derbendîxanê hilweşandin ku ev pire li ser rêya di navbera Îran û Kurdistanê de bû. Û gundên dora Helebçeyê dane ber topbaranê da ku xelk bikeve nav bajêr

---

ji dewleta DYA (Dewleta Yekbûyî yên Amerîkayê) re berdan. Lewra her dewletek bi serê xwe bo berjewendiyên wan li hev diketin. DYA mutesekulê ji tevan bû, yanê em dikarin bibêjin ku Meclîsa Ewropîyan ya serekî bû.

Vê carê di 1947an de avabûna dewleta Îsraîl û naskirina wê ji alê dewleta Tirkîyê ve di nav dewletên Ereban de gelek planên wan serûbin bûn. Û li dijî Tirkîyan nexweşiyêke mezin çêbû.

Di sala 1958an de general Ebdulkerîm Qasim derbeyeka eskerî kir û komar îlan kir. Peymana ku bi Tirkîyê re (Pekta Bexdayê) çêbibû fesh kir. Û li Iraqê bayê komînzîzmê û sosyalîzmê dest pê kir. Di 1967an de Ereb li dijî Îsraîlê ketin herbê, ku Îsraîlê bi çar cephan bi wan re şer dikir. Ereb bi feleketa zehf mezin re rû bi rû man. Û windayiyên zehf mezin dan. Di vê navberê de sosyalîstên wan bi navê **BAAS (ji nû ve vejîn)** bi hêz bibûn, bi derbeyeka bêxwîn rêvebirî xistine destê xwe. Sedam Huseyîn jî yek ji wan bû, di sala 1979an de bi serê xwe bi her awayî bû hakimê Iraqê heta sala 2003an ji aliyê Emerîkayê ve hate rakirin, û sistema ku em vê gavê dizanin hate ser kar.

De îcar em werin ser têkiliyên navbera Kurd û Ereban. Piştî şerê Dinyayê yê Yekemîn dewleta Osmanî pelişbû, hidûd ji nû ve hate çêkirin û Kurd di navbera Tirkîyê, Iraqê, Îran û Sûrî de hatin çar parçekirin. De vê carê pirsgerêka Kurd bû ya her çar dewletan û hêzên navnetewî. Serê vê mijarê jî Îngîlîzan dikişand, lewra Kurdan di Şerê Dinyayê yê Yekemîn de hevaltiya wan nekiribûn û ji gelek ew aciz kiribû. Ji vê dîrokê û pê de

---

## Sala 1975an bi vê peymanê rojên reş bi ser Kurdan ve hatin. Iraqê êrîşeke mezin anî ser Kurdan hinek reviyana sînorê Tirkîyê lê belê hukûmeta Tirkîyê ya hîngî ya ku ji koalîsyona CHP'ê û MSP'ê mutesekul bû rê neda wan. Lê Îranê sînorê xwe ji sivilan re vekir, û bi sed hezaran reviyane Îranê

---

her çar dewlet çiqas neyartiya hev bikirina jî lê di pirsgerêka Kurd de dibûne yek, lewra digotin di kîjan parçeyî de otonomî jî bi dest wan bikeve dê ji yê din re bibe mînak, serektiya wê yekbûnê jî Tirkîyeyê dikişand.

Li Iraqê di 1918-1946an de gelek serhildanên Kurdan çêbûn, lê belê bi alîkariya Îngîlîz û Frensiyan hatin pelçiqandin. Ji 1946an heta 1961an tu serhildan çênebûn, lewra bi derbeya 1958an de general Ebdulkerîm Qasim, bangî Mistefa Barzaniyê ku li Rûsyayê sirgûn bû kir. Û mafê Kurdan nas kirin, di hukûmeta nû de cih dane Kurdan, ev rewş heta 1961an dom kir. Lê belê piştî ku rêya ber lingê xwe dît, mafê Kurdan red kirin. Li ser vê rewşê şoreşa Îlonê dest pê kir û gelek şerên dijar di navbera wan de qewimîn. Piştî di sala 1967an de BAASî hatin ser rêveberiyê dîsa bi Kurdan re ketin nava têkiliyê. Di sala 1970an de peymanê herî meşhûr di nava Kurd û Ereban de hate îmzekirin. Li gorî vê peymanê, di nava çar salan de Kerkûk jî di nav de wê otonomiya Kurdan hatiba avaki-

rin. Heta ev meclîsa vê gavê ku Kurd bi kar tînin. Ew avahî hingê bi wê armancê hate avakirin. Vê carê tam bêhna Kurdan derketibû lê belê hêzên tarî dîsa li ser kar bûn. Dewletên herêmê li Cezayîrê îxtîlafê ku di nava Îran û Iraqê de li ser çemê Şatul Erebê hebû li ser wê peymanê hate çêkirin. Li gorî vê peymanê, wê Îran sînorê xwe li ser Kurdan bigre, wê Iraq jî çemê Şatul Erebê ji Îranê re berde. Piştî vê peymanê tiştên ku hatin ser Kurdan ji deh Helebçeyê girantir e.

Sala 1975an bi vê peymanê rojên reş bi ser Kurdan ve hatin. Iraqê êrîşeke mezin anî ser Kurdan hinek reviyana sînorê Tirkîyê lê belê hukûmeta Tirkîyê ya hîngî ya ku ji koalîsyona CHP'ê û MSP'ê mutesekul bû rê neda wan. Lê Îranê sînorê xwe ji sivilan re vekir, û bi sed hezaran reviyane Îranê. Îrada Kurdan tev hate şikandin, yên ku hatine kuştin, yên ku teslîm bûn, beşek hindik pêşmerge mabûn ew jî di nava xwe de bûn du beş û li dijî hev şer dikirin. Di 1979an de Mistefa Barzanî mir. Îdrîsê kurê wî kete şûna wî, sê sal şûnde ew jî mir. Vê carê Mesûd Barzanî bû serekê partiyeke lê rewşa Kurdan gelek xera bû. Di 1980an de piştî rejîma Şah li Îranê rûxiya, rejîma Îslamî hate ser kar. Iraqê ev rewş firsend dît peymanê Cezayîrê xera kir, û li dijî Îranê şer îlan kir. Kurdan jî di vî şerî de hevalbendiya Îranê dikirin. Lewra Îranê soza federasyonê dabû wan. Di 1988an de ku şerê Îran û Iraqê sekinî, Kurd dîsa bi tenê mabûn. Lê belê piştî şerê Xelîça Besrayê di wan mehên sermayê de BAASîyan bi sed hezaran berê Kurdan dabûn ser çiyayê bi berf û baran. Westê ev dîmen di Tv'yên dinyayê de hate weşandin Ewropa û دنیا rabûn ser piyan. DYA ne-



Foto: Ramazan Öztürk

çar ma ji NY (Netewên Yekbûyî) derbarê Kurdan de biryara xala 688an bistîne û di warê Kurdan de ji wan re cihê ewlehî saz bike. Wan ji êrîşa BAASiyên xelas bike. Evê biryarê nijadperestên Tirk û Erebban gelek aciz kiribû. Rewşa Iraqê îro li gorî min ji hemû caran zêdetir nêzîkî aramiyê ye lewra îro destûreke bingehîn li Iraqê heye, eger bi kêmasî be jî mafê her kesî tê de heye. Qet nebe ji çar salan carekê hilbijartin heye û her kes bi nasnameya xwe dikare beşdarî wê hilbijartinê bibe.

### Helebçe

Helebçe navçeyeke 85 km li başûrê Silêmaniyê ye û 16 km ji sînorê Îranê dûr e. Berî vê bûyerê nifûsa Helebçê li dora 140 hezarê bûye. Berê ji bilî misilmanên Kurdên sînî Fileh û Cihû jî hebûne. Di wextê bûyerê de Fileh û Cihû li Helebçê nemabûn.

Di 1988an di 11-12ê Adarê de Hêzên Îranê digel pêşmergeyên

Kurd êrîşeke mezin anîne ser devera Derbendîxan ku dikeve nav sînorê Helebçeyê. Ev der û dor tevahî ketine destê hêzên Îranê û bi ber bendava Derbendîxan de diherikî, bendava Derbendîxan ji Iraqê re gelekî stratejîk bû. Ku berî vê jî bajarê Umul Qesir ku dikeve ber Xelîca Besrayê ji destê wan çûbû, ji vê yekê BAASî zehf çavsorkî bûn. Sedam Huseyîn ser van pêkhatinan biryar da artêşa xwe û fermanدارê wî Elî Kîmyawîyê ku kurê xaltîka wî bû û ji vê hovitiyê re amadeyî dan destpêkirin.

Di 13-14ê Adarê de çiyayên dora Helebçê bombe kirin, û pira ser çemê Derbendîxanê hilweşandin ku ev pire li ser rêya di navbera Îran û Kurdistanê de bû. Û gundên dora Helebçeyê dane ber topbaranê da ku xelk bikeve nav bajêr. Roja 15ê adarê li gorî rojên berî xwe sakîn bû, dengê topan û balafirên nedihat lê belê gelê Helebçeyê BAASî gelek baş nas dikirin, dizanîbûn

ku ev bêdengî ne ji xêrê re ye. Xelkê vî bajarî ji çekên Kîmyewî jî ne bêxeber bûn lê texmîneka bûyereke wîsa nedikirin.

De îcar ji vir û pê de leşkerekî ku nobetdariya gorên Helebçeyê dikir em jê bibihîzin, **“Roja 16ê Adarê xelkê Helebçeyê weka her roj rabibûn ser karên xwe yê rojane lê belê destê wan li ser dilê wan dibû. Piştî wê têkçûnê wan dizanîbû ku BAASî rehet nasekin. Rojê biharê bû belkî weke her salan me yê haziriya Newrozê bikira, dinya gelek xweş bû, taveke zelal hebû, her der şenahî bû, lê dibêjin, bêdengiya berê tofanê. Saet li dora 11an du heb balafirên BAASiyên li ser Helebçê xuya kirin. Ewîl dora bajêr, di pey re nava bajêr bi bombeyên bi deng bombe kirin, da ku camê şibakan tev bişkîne ku jehrî bikeve xaniyan. Deng bi nava bajêr ket, gotin ku her kes ji xwe re betaniyên şil amade bikin û xwe bavêjin stargehan. Di pey wan re helikopterek li ser**



# Bi(h)ar

Îmad Bernas

*“Şax dide di dilê min de hisreta te her bihar  
her bihar bi guliyên nû dibîşkive her adar”*

Arjen Arî

Bihar hate ser gundano  
Befir dihele li nav çîmano  
Dilên bi evîn şilpizyano  
Cerg û hinav germişyano  
Wa şivano bilûrvano  
Wey dilkulo dilkovano

Serê salê dil mijyano  
Li gel berfê xem helyano  
Xemlê daye dar û gulano  
Kul û kovan qet nemano  
Wa şivano tembûrvano  
Wey dilmijo mirazvano

Tavê daye ser çiyano  
Şivan pez berda mêrgano  
Bêrvanan deng lê dano  
Şivan bilûr xist destano  
Wa şivano evîndaro  
Wey parseko peymandaro

Helebçeyê çû û hat û kaxiz berdane xwarê da ku bizanin ba ji ku ve tê. Saet li dora 11:30an heşt heb çêkerên Rûs balafirên MÎG li ser Helebçê jarî barandin. Bi carekê ev roja tavî; bû ewr, agir, jahrî, mij, dûman û tarîti bi ser bajarê Helebçê ve hate xwarê. Te digot qey bû şev. Ew jehriya ku davêtin bêhna sêvan jê dihat. Lê belê di nava du deqan de dil û kezeba însanan dişewitand, kef û kunc bi devê wan diket. Di nava du saetan de yên ku taştê dixwarin, yên ku karên xwe yên rojane dikirin. Li dora 5 hezar

însan mirin û dora 7 hezaran însan birîndar bûn.

## Omer Xunav

Çîroka wî bavê ku bi ser zaroka xwe de ketibû ku bûye simbola Helebçeyê gelek balkêş e, navê wî Omer Xunav bû, heşt keçên wî hebûn lê belê kurê wî tunebûn, Rebê Alemê ew sal du kur cêwî bi hev re dabûnê, wexta ku ev bûyer qewimî pîreka wî û heşt keçên xwe li odaya wî aliyê taştê dixwarin û bi ser sifra xwe de ketibûn û miribûn.

Omer Xunav baz dide oda din her du pitokên xwe ji dergûşê derdixê û direve derve lê belê qedera wî di devê deriyê derve de ew jî zeft dike. Ew wêneyê ji aliyê Remezan Ozturkê Meletî ve hatiye kişandin û ji Helebçeyê re bûye simbol.”

Dîsa rev û koçberî bibû neçariya Kurdistan, bi hezaran kes reviyên Îranê ku îro li Îranê bi sedan gorên Helebçeyê yên komî hene, lewra hejmara kuştiyên Helebçeyê di nava salên paşîn de bi 10 hezaran qediyên. Evê bûyerê neyîniyeka zehf xerab li ser psîkolojiya Kurdistan kir.

BAASiyên dixwest ku ser vê bûyerê bigrin lê belê rojnameya Îngîlîz ya Indîpendin bi alîkariya Îranê çend heb rojnamevan ku yek ji wan Remezan Ozturk bû, birine cihê bûyerê. Ji vê pê ve em li Remezan Ozturkê Meletî guhdarî bikin: **“Em bi helîkopterekê birin nav Helebçeyê, gotin: ‘dema we saetek e’ her dem dibe ku firokê BAASiyên dîsa werin. Her der termê însanan bûn, li hin cihan 4-5, li cihina 10-15, li cihina bêjimar term kom bûn. Ên ku devê wan kef û kunc bibûn, yên ku reş û tarî bibûn, yên bi ser xwarinê de ketibûn. Yên ku li ser avê civiyabûn, rewş ewqas xera bû, termên însanan ewqas zehf bûn ku me nizanîbû ku kîjanî em bikişînin. Lê belê şerqîna flaşên wênêkêşên me bûn, lê belê bi tirs çavên me jî li esmanan bûn ku firokên BAASiyên her tim dibûn ku werin. Di wê navberê de min wêneyê Omer Xunav jî kişandibû, di pey re vî wêneyî bala dinyayê kişand, bû simbola Helebçeyê.”**

## Rewşa Dinyayê

Ku ez vê rewşê bi hevokê bibêjim kesekî tiştê nekir. Piştî vê bûyerê heftiyê serokwezîrê Tirkîyê çû Iraqê û bi destê Sedamê xwînxur girt. Jixwe hingê TRT hebû. Wan jî di nûçeyên xwe de navê Kurdan hilnedidan, digotin: Sedam jehr avêtiye bajarê Helebçeyê ku dikeve Bakurê Iraqê û gelek însan li wê derê mirine. Hem bi çî şekî navê Kurdan hilnedan. Carna digotin **“Bakuriyên Iraqî”** carina jî **“Grubên Etnîkî”** û hwd.

Dewletên Erebb; ji bilî Sûrî yek dewleta Erebb ne televîzyonên wan, ne rojnameyên wan û ne radyoyên wan behsa vê bûyerê nekirin. Jixwe bûyer nedîtîn. Sûrî jî bela ku di şerê navbera Iraq û Îranê de hevalbendiya Îranê dikir. Piştî vê bûyerê yazdeh rojan li Kuweytê civîna wezîrê karên derve ên mislimanan çêbû. Kuweytiyan yek bi yek ji wezîrên wan dewletan re gotin: **“Kesek vê pirsê neyne rojevê”** û neanîn jî. Di wê navberê de Filistîniyan ku hazîriya îlana serxwebûna xwe dikir, Sedam Huseyin ji wan xwest ku serxwebûna xwe hema îlan bikin da ku bala dinyayê ji Helebçeyê here ser wê derê. Ev Filistîniyên me Kurdan ji bo wan di sala 1967an de ji bo têkçûna wan li dijî Îsraîlê di mala xwe de me şîna îlan kiribûn, me dawetên xwe betal kiribûn û milletê Kurd ji bo wan mewlûd dixwendin. Ev jî ji Sedam Huseyin re bûne hevkar û serxwebûn îlan kirin, bala dinyayê kişandin ser meseleya Îsraîl û Filistînê.

## Rewşa Ewropîyan

Rewşa wan jî ji dewletên mislimanan ne cûdatir bû. Lewra tu li

---

**Dewletên Erebb; ji bilî  
Sûrî yek dewleta erebb  
ne televîzyonên wan,  
ne rojnameyên wan û  
ne radyoyên wan behsa  
vê bûyerê nekirin. Jixwe  
bûyer nedîtîn. Sûrî jî bela  
ku di şerê navbera Iraq  
û Îranê de hevalbendiya  
Îranê dikir**

---

eslê meseleyê binêrî ên ku li dijî Îranê Sedam li piyan hişt ew bûn, ên ku çekên kîmyewî dabûn Sedam ew bûn, ên ku Kurd kiribûne çar parçe ew bûn. Jixwe dewletên emperyalîst tu caran ew destek nekiribûn. Di serhildanên Kurdan de daîm hevalbandiya dewletên hakîm kiribûn.

Tu car qêrînen Kurdan seh nekiribûn. Mafên Kurdan yê xwezayî û zimanê dayîka wan ji wan re zehf dîtibûn.

Di wextê vê qetlîamê de di rojnameya Hurrîyetê de manşeteke balkêş hatibû weşandin. Manşet eynî bi vî awayî bû: **“EM JÎ JI QETLIAMÊ RE BÛNE ALET”** û binê vê manşetê hinek wêneyên varêlan hebûn li ser wan wêneyan jehr hebû û digot ev jahrî ji dewletên Ewropayê hatin lengergeha Mêrsînê danîn û bi tiran birine Iraqê. Ji ber van sedeman dewletên Ewropayê ev bûyer bi hinek gotinên sivik derbas kirin.

Lê belê komelên mafên mirovan, yekîtiya rojnameyên navnetewî û rêxistinên navnetewî ketin nava têkoşîn û tevgerînê. Cara paşîn ew NY (Netewên Yekbûyî) ku bêdeng mabû neçar man li jeyek saz kirin ji bo ku vê meseleyê

lêkolîn bikin şandin herêmê, de îcar di vir de gotineke me Kurdan heye dibêjin: **“Tajiyê ku bê dilê xwe here nêçîrê dê ji xwediye xwe re çî nêçîrê bike.”**

Rapora ku wan amade kiribû emê li jêr binivîsinin jixwe her tiştî tîne ber çavan:

## RAPORA NETEWÊN YEKBÛYÎ

- Em çûne Tirkîyê me bi rêvebirên wan re hevdîtin çêkir.
- Em çûne Îranê me bi rêvebirên wan re hevdîtin çêkir.
- Em çûne Iraqê me bi rêvebirên wan re hevdîtin çêkir.
- Em çûne Helebçeyê me li cihê bûyerê lêkolîn çêkir.
- Em çûne Îranê nava kampên penaberan me bi şahîdên bûyerê re hevpeyvîn kir. Di encamê raporê de :
- Li Helebçeyê çekên kîmyayî hatine bikaranîn û gelek însan pê mirine.
- Em dibêjin li wê derê sûcê herbê hatiye kirin (Ne jenosîd)
- Li gorî lêkolînen me çekên kîmyewî ji balafirên hatine avêtin.
- Li gorî me ev balafir ji sedî not ji hêla Iraqê ve hatine avêtin. Yanê li gorî rapora Lijneya NY bûyera Helebçeyê failê meçhûl e, lewra efendiye wan ên ku ew şandibûn ev ji wan xwestibûn. Lê belê hikumeta Iraqê ya nû di sala 2007an de şeqameke mezin li wan xist. Li gorî destûra Iraqê, ev bûyer jenosîd e. Ev bûyer bi vî awayî ketiye destûra Iraqê û Helebçe di qada navnetewî de bûye kesîtiya Kurdan.✶

# Labîrenta Cinan

## İSLAM GELİŞ

islamgelis@hotmail.com

**C**ivaka Derengmayî Paşvemayîn bi xwe mijareke çîrok û romanên Kurdî ye. Ferhad Shakely pirtûka xwe ya bi navê “Hunera Çîroka Modern” de çîrokên Kurdî wiha dinirxîne.

### Diroka gelê Kurd

a-Têkoşîna gundiye karmend û ên di bin şert û mercên giran de dixebitin

b-Têkoşîna rizgarkirina gelê Kurd

c-Pirsgirêkên jinê

d-Paşdemayîn û pêşvenêçûn

Bi gor vê metodê em dikarin bêjin Hesênê Metê mijara romana xwe gelek esas girtiye û hişê xwendekaran li ser yek mijarê kom kiriye. Di romana *Labîrenta Cinan* de yek armanca nivîskar heye; ew jî rexnekirina civakek derengmayî ye. Her çiqas bûyerên di romanê de diqewimin, di nava gundekî de biborin jî, nivîskar qala pirsgirêkên gundiyan û karmendên di bin şert û mercên giran de dixebitin nekirîye. Bi taybetî, di jiyana civakên

feodal de pirsgirêkên namûsê, ên êşirtiyê û ên ax û avê pir in. Lê nivîskar bi zanebûn xwe ji wan mijaran dûr girtiye û bi tenê li ser cahilî, korfamî û nezanîna gundiyan sekiniye. Armanca nivîskar ew e ku bi rêya çend bûyerên di Gundê Dînan de qewimîne, bi tevahî civakên derengmayî hişyar bike û bi xwendekaran bide zanîn ku; tiştê herî zêde paşdemayî mejiyê însanan bi xwe ye.

Civaka Hesênê Metê kirî mijara xwe ji aliyekî ve civakek ji rêzê, dilgerm û paqij e. Ji aliyekî ve jî, civakek paşdemayî korfam û nezan e.

Bêguman çend sedemên paşdemayîna civakê hene:

1-Têkiliyên civakê yê feodalî,

2-Girêdayîna kevneşopiyên

3-Bandora şêx û meleyên ku dîn li gor berjewendiyên xwe şîrove dikirin

Li gor şêx û meleyên Gundê Dînan, dînî û nexweşiyên di nava gund de çêdibin, sedemên wan cin û şeytan in. Ji ber vê yekê jî, şêx û meleyên gund, çend ayetên

---

Bi gor vê metodê em dikarin bêjin Hesênê Metê mijara romana xwe gelek esas girtiye û hişê xwendekaran li ser yek mijarê kom kiriye. Di romana *Labîrenta Cinan* de yek armanca nivîskar heye; ew jî rexnekirina civakek derengmayî ye

---

der heqê cin û şeytanan de ji ber kirine û dema ku gundiyekek nexweş dikeve, diçin li ber serê wî/wê heta sibehê wan ayetan dixwînin. Tu car bijîşk, nexweşxane, dermanên modêrn nayê bîra tu kesî/ê. Her kes li hêviyê ye ku nefes û hewayê şêx lê bibe derman.

Ji xeynê Hesenê Metê, nivîskarên wek Hesen Qizilci û M. Emin Bozarslan jî, di çîrokên xwe de, qala aferîdên seyr û baweriya gel a li ser dînê dike.


Hesen Qizilci berhemên xwe yê bi navê "Nuşteke-y Amîne Xan" û "Xemilî Pemû" dîn wek hêzek li hemberî civakê dide nasîn.

Di çîroka "Nûşteke-y Amîne Xan" de, keça şêx a xwendin û nivîsandina wê tunê jî, dikare di şûna bavê xwe de, ji gundiyan re nivîştîyan çêbike (r. 75)

Piştî van agahîyan, ka em berê xwe bidin Hesenê Metê di romana xwe de bi çî awayî nêzikî vê mijarê bûye.

### Kurtneraverok

Mamoste Kevanot û xanima wî Nêrgîsa Koçer diçin Gundê Dînan. Lê li wî gundî ne tenê dînîti heye, her wiha dek û dolab, fesadî û vîrekî ên li wî gundî tîn kirin, bi têra sê bajarên hene. Ev gund, ji aliyekî ve cihê seyr, tije cin, şeytan û pîrebok; ji aliyekî ve ji şênîyên gund wekî civakêk ji rêzê; ciwanmêr, dilgerm û paqij in. Li vî gundî, çîrokên fantastîk û ecêb tu car jê kêr nebûyî, du rê li pêşîya mamoste Kevanot hene. An ewê bide li ser rêya gundiyan û dê mejiyê xwe bi çîrokên cinan, pîrebok û şeytanan tije bike. An jî ewê bikeve pîvana gundiyan û dê bi gor zanebûna xwe gundiyan serhişk, korfam û nezan hişyar bike.



Nivîskar di romana xwe de ji aliyê teknikî ve metodek gelek balkêş bi kar aniye, her wiha di pirtûka xwe de pirtûkêke din (pirtûka Gebranê Baço) bi cih kiriye û bi rêya vê metodê hem vebêjer hatiye guhertin, hem jî mijara romanê demek hindik de hatiye nivîsandin.

Mamoste Kevanot dikeve pey fikr û ramanên xwe ên ronahî! Û dixwaze gundiyan ji wan kolanên tarî û labirentên bê serî xelas bike.

Mamoste dema ku diçe gund, ji aliyê gundiyan ve bi dilekî germ û paqij tê pêşwazîkirin, qedr û qîmetek pir mezin dibîne. Bi zimanê gundiyan dipeyive, dikeve nav sihbet û şêvberkên wan, xwe ji gundiyan dûr naxe. Ev rewşa mamoste Kevanot gelek li gundiyan xweş tê û gundî dibînin ku mamoste jî bi wan re bûye gundî.

Lê Gebranê Baço -ê ku gundî bûyî sedem dev ji zanîngehê berdayî- derdikeve pêşîya mamoste û yek bi yek taybetî û nexweşiyên Gundê Dînan ji mamoste re dibêje. Gebran dixwaze ku bi dilekî paqij mamoste der heqê vî gundê serûbino de hişyar bike.

Mamoste ku tu dakevî pîvana wan, bawer bike tu yê li vir bimînî... Bi gotineke din, tê li pîvana wan de bihetikî, xoce... tu ê di pîvana wan de bifetisî û biçî di pîvan û dunyayên wan de ev kuçên gundê li te teng û zirav bibin, serê te ê bêşe, dilê te li hev bikeve û tu ê

verişî. Tu ê di xwe de verişî, di wan de verişî...tu ê bibînî ku kuçan de, di hewşan de, di penceran de çawa serê xwe dirêj kirine, weke cin û pîrebokan li vê rewşa te dinêrin. Bi kurtebirî, ev kuçên vî gundê ha li te bibin labirenteke cinan û tu ê ji nav dernekevî...(r. 55)

Lê mamoste Kevanot guh nade wan gotinên Gebran û dide pey fikr û ramanên xwe ên zelal!

Hêviyên mamoste hene ku gundî bidin pey wî û bi gor pedagojî û ramanên xwe yê di zanîngeha de fêrbûyî wan biguherîne. Haya mamoste jê nîne ku, gelek kesên wek wî xwedî fikrên idealîst hatine wî gundî û li kuçeyên wî gundî hiş û aqlê xwe winda kirine.

Gebran êdî hew dikare nav wê behra bê serî û binî de bijî. Ew berê xwe dide bajêr û gund dihêle ji mamoste Kevanot re. Gebran pirtûka xwe ya der barê gund de nivîsî jî dispêre mamoste û xwe ji çîrokên cin û pîrebokên wî gundî xelas dike. Gebran di pirtûka xwe de şanzdeh malên gund û taybetiyên wan yek bi yek nivîsîne. Nivîskar bûyerên

di pirtûka Gebran de dibûre, bi tevî aksiyonek nizm, xwendekaran li kuçe û labirentên civakek derengmayî digerîne û bi xwendekaran dide zanîn ku; labîrent û dehlizên herî tarî mejîyê insanan bi xwe ye.

Pirtûka Hesenê Metê ji gelek aliyan ve hewceyî nirxandin û şirovekirinê ye. Lê ez dixwazim bi piranî behsa teknîka nivîsê û çend motifên balkêş bikim.

### METOD Û RÊZIMAN

Nivîskar di romana xwe de ji aliyê teknikî ve metodek gelek balkêş bi kar aniye, her wiha di pirtûka xwe de pirtûkeke din (pirtûka Gebranê Baço) bi cih kiriye û bi rêya vê metodê hem vebêjer hatiye guhertin, hem jî mijara romanê demek hindik de hatiye nivîsandin. Nivîskar du vebêjer bi kar aniye. Vebêjerê, nivîskar bi xwe 'ew e' dema ku nivîskar cih dide pirtûka Gebran vebêjer jî tê guhartin.

Her çi qas di çend deverên romanê de ziman ne ewqas herikbar be jî, di hêla zimên de pirsgirêkên mezin xuya nakin. Nivîskar lêker û pêveber di cih de bi kar anîne û hevok bi giştî bi gor forma rêziman hatine ristkirin. Lêker bi piranî ji peyvên xwerû ne û di dawîya hevokê de hatine bicihkirin. Gelek caran jî lêker û pêveber yek peyv e.

### Çend Motîfên Balkêş:

#### Xewn û Mirin

Ne xewn û mirin, ne korfamî û nezanî tu car jî vî gundî kêmanabin. Nergisa Koçer, mamoste Kevanot, pismamê Gebran û çend lehengên din ên romanê, xewnên

---

**Nivîskar di romana  
xwe de ji aliyê teknikî  
ve metodek gelek  
balkêş bi kar aniye, her  
wiha di pirtûka xwe de  
pirtûkêke din (pirtûka  
Gebranê Baço) bi cih  
kiriye û bi rêya vê  
metodê hem vebêjer  
hatiye guhertin, hem  
jî mijara romanê  
demek hindik de hatiye  
nivîsandin**

---

balkêş dibînin. Dema ku gundiyek nexweş dibe, an jî dikeve bin bandora hêzên tarî de xewnekê dibîne. Xewna herî balkêş û dirêj jî ya Nergisa Koçer e. Ez bawer nakim di tu romanê de xewna lehengekê bi qasî ya Nergisa Koçer dirêj be. Ev jî di hêla nivîsê de jîrbûna nivîskar derdixe holê. Dema ku mamoste Kevanot hişê xwe winda dike û nexweş dikeve, dapîra xwe ya ku hêj ew bîst salî bû mirî, di xewna xwe de dibîne. Dapîra wî di xewnê de vê nexweşiya wî, yê ji me çêtir aniye serê wî bi nav dike. Mamoste li ser vê gotinê roj bi roj dîntir dibe û her roj bêhtir ber bi mirinê ve diçe. Lê carna jî hişê wî tê serê wî, dikeve ramanan, diponije, diqepije û xew nakeve çavan, di tevliheviyekê de ye û nikare ji nav derkeve, di dilê xwe de:

*"Meriv çi aferîdekî seyr, rengîn û reben e, Xwedê!..." dibêje, ew hemû tiştên ku di jiyana xwe de xwendiyê, bihîstiyê, dîtîye, yek bi yek zûzûka li serê wî dikevin û dipengizin, vedigere ser metod û formûlên zaniyaran ku têbigêhîje,*

*têbigêhîje ka ev meriv ê kambax çî ye û çendik û çend rengên xwe hene yek dudu, du hezar û du rengên wan di serê mamoste Kevanot de li hev dikeve û dîsa ji nav dernakeve..(r. 163)*

Ez bawer im ku nivîskar ev her du motif bi zanebûn bi kar anîne. Ji ber ku dinya her diçe ber bi pêşveçûnê ve diçe teknolojî jiyana mirovan diguhere. Ger hê jî di vê dinyayê de li gundekî tiştên evqas dûrî aqilan çêbibe, divê mirov di xewnekê de be, an jî ne li ser rûyê dinyayê be. Ji ber wê yekê nivîskar lehengên xwe xistine xewê û her tişt li ber çavên wan kiriye xewn.

### Malên Gundê Dînan

Nivîskar 16 malên di nava gund de bi saya pirtûka Gebranê Baço li me dide nasîn. Li vî gundî her malek xwedî taybetiyê girîng e. Nivîskar, xwendekaran yek bi yek di nav van malan û kolanên gund de digerîne û bi rastiyên civakê re rû bi rû dihêle. Ev mal, ne tenê gundekî her wiha civakekê sembolîze dikin.

### Mal 1

Mala gavanê gund e lê taybetiyeka vê malê heye, ew jî, ji keç û xortên gund re wek cihekî hevdîtîne ye. Mala poznikalê gavanê gund li kêleka bîra mezin e. Pencereyeka gavan di aliyê bîrê de heye. Lewra gelek xortên dildar di vê pencerê re li keçan dinêrin, destmalên xwe ji wan re dileqînin û tew carinan di vê pencerê re neynikan jî didine çavên wan. Ji ber vê yekê ye ku di berîkên hemû xort û heşaşên gund de her tim neynikek heye.


Haya gundiyan hemûyan ji wê sira vê malê heye û vê pencerê dizanin lê kes zêde dilê xwe teng nake jixwe gavan bi xwe wiha dibêje: *Ez ji we re vekirî bibêjim. Pencera mala min, pencera dilan e û pencerên wiha pîrozwer nabe ku mirov dîwar bikin.* (r. 73)

### Mal 2

Malek duqat e û mêrên vê malê hêj di xortaniya xwe de dest bi lêkirina dîwaran dikin. Lê taybetiyêke din a vê malê heye ku ev mala ha bi virekiyê, bi fesadiyê, bi dek û dolaban ciyê xwe çêdikin. Di nav malê de zatek bi navê Simbêlboq heye û xwedî du jinan û bêhejmar zarokan e. Simbêlboq li dora jinebiyên gund digere û wiha dibêje: bila tiştê neyê hişê we ez diçim ji wan re êzingan hûr dikim û alîkariya wan dikim. Dibêjin ne tenê mêrên vê malê her wiha jin û keçên vê malê jî wiha ne ji ber vê yekê ji vê malê re dibêjin mala doxînsistan û her wiha keça mala Simbêlboq, li piyan mîza xwe kiriye.

### Mal 3

Bi riya vê malê dîsa em li rastî çend rastiyên civakê û çewtiyên civakê tên. Sî û sê serî di nav vê malê de dijîn her êvar têrek arvan di hewşa vê malê de dibe hevîr û ser sêlê dibe nan. Endamên vê malê wek tayek efsûnî bi hew ve girêdane û tenê mirin dikare wan ji hev bike. Li vê derê em li rastî çewtiyeka civaka Kurd tên ji ber ku, çaxê birayekî wan dimire jina wî birayî, birayekî din li xwe mahr dike. Ew vê rewşê jî wekî namûsa wan nekeve destê xelkê de bi nav dikin. Dotmam û pismamên hev jî bi hev re dizewicin û ji vê dûr



Nivîskar li ser kesayeta mamoste Kevanotê îdealîst tî jî rexne kiriye û tenêtiya rewşenbîr a li nav civakê nirxandiye. Bi saya vê romanê, em dizanin ku civak guhartinan zû zû qebûl nake.

nakevin. Ji ber vê yekê çavên keçên vê malê her ji derve ne û dizanin ku dema bi pismamekî xwe re bizewicin heta mirinê dê di nava vê malê de bin. Yekî bi jinbiraya xwe re bizewice her çiqas dûrî aqilan be jî, lê mixabin ew rastiyeke civaka me ye.

.....

### MAL 14

Li taxa jorîn, li rojhilatî oda gundê me, bi qasî çend werîsan ji vê odê dûr, di binê dibistanê de malekî kevin lê bi rengdêriyê nû heye. Dema ku meriv li ser vê rengdêra nû bihizirin, meriv dê bibêje qeyê ew hemû guhertinên ku di dawiya sedsalên bîstan de li dinyayê çêbûne, tenê ji bo vê malê bûne. An jî bandora xwe tenê li vê malê kiriye û loma navê berberiyê li vê malê bûye.

Tew carina gundiya me î ku îro navê berberiyê li xwe kiriye, li mala xwe jî serê şênîyên gundê me çêdikir. Dema ku meriv diçûn mala wî, bi hurmet û berborên berê xêrhatinî li merivan dikir. Lê wek ku min got, xuya ye guhertinên ku di dinyayê de bûne li gundê me jî geriyaye.

### MAL 16

Li kujekî bakurê gundê me malek e... na ev ne mal e... ne mal e, ne kon e, ne şikeft e... ecêbeke giran e... endamên wê ne ji ademîyan e, ne ji asimaniyan e û ne jî ji cin û pîrebokan e... doxînê di tengala pişta xwe de dişidînin, zikê xwe piçûk dikin... ji bo ku birçî nebin, gûyê xwe nakin....(r. 105)


Nivîskar malên di nava gund de jî, wekî labîrentên di hişê şênîyên gund de cih kiriye. Dema ku em li nav wan 16 malan digerin, labîrentek wiha derdikeve pêşîya me.

### Têkçûna Mirovek Îdealîst

Nivîskar li ser kesayeta mamoste Kevanotê, îdealîstî jî rexne kiriye û tenêtiya rewşenbîr a li nav civakê nirxandiye. Bi saya vê romanê, em dizanin ku civak guhertinan zû zû qebûl nake. "Armanc û babetê gotinê çî dibe bila bibe... *tiştêkî ku heta niha li vî gundê ha bi kar nehatibe, cî nagire û nayê pejirandin jî...*"

Di navbera salên 1970-1980ê de xwendekarên zanîngeh dixwendin bin bandora îdeolojiya çepgiriyê û hişyarkirin diman û





## Kurtejiyana Hesênê Metê

Hesênê Metê nivîskarekî bê cih û war e. Ji ber ku hêj zaroktiya xwe (11 salî) de ji gundê xwe derketiye û piştî wê, jiyana wî a penaberî dest pê kiriye. Bi qasî sê salan li Amedê, çend salan li Nisêbînê û heft salan jî li Tarsus- Mêrsînê jiyaye. Çend caran hatiye girtin û di girtîgehê de maye. Di nava xirecira salên 1980ê de dev ji welatê xwe berdaye û berê xwe daye li derveyî welêt. Sê salan li Sûriyê, Îran û Iraqê geriyaye û di dawiyê de Swêd ji xwe re kiriye wargeha penaberiyê

Rêbaz, ziman û hûnaka berhemên Hesênê Metê, dikare di nav wêjeya cihanê de cihêkî ji wêjeya Kurdî re veke. Ji ber ku Hesênê Metê di berhemên xwe de rastiyan jiyane û hêmanên fantastîk bi hev re bender dîke û bi gor şewaza xwe tîne ziman. Cudahiyeye din a Hesênê Metê ew e ku di nava mijarên herî giran de jî hêmanên qerfî bi cih dîke. Lehengên Hesênê Metê mirovên di nava jiyana rojane de ne. Nivîskar her çiqas pê lehengên xwe bileyîze jî, di çavên xwendekaran de qedrê wî kêr nake.

Berhemên Hesênê Metê ên heta niha çap bûyî ev in. **Smîrnoff** (çîrok, 1991), **Labîrenta Cinan** (novel, 1994), **Epîlog** (çîrok, 1998), **Tofan** (novel, 2000) Hin kurteçîrokên gelêrî bi formeke edebî hûnandine û bi navê **Ardû** (1991) çap kirine. Ji xeynî van kitêban **Keça Kapîtan** (1988) a Pûşkîn, çend kurteçîrokên Çexov bi navê **Mirîna Karmend** (1989), romana Dostoyevskî **Merivên Reben** (1991) û kitêba Göran Tunström **Jiyana Rastîn** (2003) wergerandiye Kurdî.

pêşveçûna li ser xwe wek wezîfeyekê didîtin. Di heman demî de xwendekaran li nav gund û bajarên welêt dest bê kar dikirin, ev kar jî dimeşandin.

Bi vî çavî dema ku em li mamoste Kevanot binêrin wêneyek zelal dikeve pêşîya me. Mamoste Kevanot dema ku diçe gund bi hemû liv û tevgerên xwe ve mirovek îdealîst e û dixwaze tiştên di serî de dibûrin li vî gundî tîxe pratîkê lê dîsa

*-Ez tînegêhîjim bê çima pêşniyarên baş ê cî negirin? Ku meriv ji wan re bibêjin û wan serwextî başiya van tiştan bikin, çima nepejirînin, birayê Geb-ran?... (r. 54)*

*-Rast e, di jiyane de bi taybetî jî di jiyana gundîtiyê de meriv*

*rastî gelek tiştên seyr tîne. Îcar divê meriv hêdî hêdî, bi gotin, bi peyv û pratîkê yek bi yek wan ji van tevger û berborên naxoş dûrxin... (r. 59)*

Mamoste di serê romanê de mirovek wiha îdealîst e û hêvî dike ku gundiyan ji bin tesîra cin û şeytanan, ji nav bêaqilî, korfamiyê derbixe. Lê mixabin wekî Gebran jî gotî di dawiya romanê de mamoste dîn dibe û kuçe û kolanên gund li ber dibin labîrentek bêdawî.

*Bi gotina şênîyên gund, dîwarê hewşa dibistanê jê re dibe weke toqa şeytên û ew ji hundirê wê dernakeve der... (r. 190)*

*Şênîyên gund serwext dibin ku êdî bi kêrî karê xwe, bi kêrî hîndayîna zarokan nayê, destên*

*xwe jê dişon, lê dîsa jî dipên, bi hêviya ku Xwedê mezin e, bi hêviya ku cin ê rojekê lê werin dilovaniyê, dev jê berdîn û ew jî dîsa bibe mamoste Kevanotê berê. (r. 191)*

*-De werin û ji xewê re lê binêrin, ha!... erê, xoce!... ma tu jî zarok î, xoce!... tu şerm nakî?... ev çî karê te ye, xoce!... ma ev jî ders e, gidî!... tu dîn bûyî, xoce dîn!... (r. 193)*

### Çavkanî:

Ferhad Shakely, *Hunera Çîroka Nûjen*, Avesta, 1998

Hesênê Metê, *Labîrenta Cinan*, Avesta, 2000

## Di bin “Siya Mem û Zîn”ê de xirabkirina çanda Kurdan

ABDULKADÎR GOK

**G**elek rêberên dewletê ji bo galaya rêzefîlma “Siya Mem û Zînê” di 27î Sibatê de kom bûn û bi şahiyê mezin filma xwe ji gelê Kurd re pêşkeş kirin. Rêzefîlm di TRT6ê de hat weşandin.

De baş e; lê dema min û malbata xwe li ser ekrana TRT6ê rêzefîlma “Mem û Zînê” temaşê kir: Di serî de, ez û zarokên xwe ji bo qehremanên rêzefîlma “Mem û Zînê” em şaş bûn û me got; qey em li filma “Tek Tirkîyê” an jî li filma “Şefqet Tepê” temaşê dikin. Bi tenê cihêbûnek hebû ku di fîlmê de gotinên wê bi wergera Kurdî bûn. Min û zarokên xwe me bi sebir tamesê kir û me xwest ku hetanî dawiyê em ji bo naveroka fîlmê fêhm bikin û destana “Mem û Zînê” ho bibin. Lê mixabin, hezar carî mixabin ku bi şerefa destançîroka “Mem û Zînê” jî hatiye lîstin.

Eger, bi awayekî mucîzewî Ehmedê Xanî rabe û li rewşa şahesera xwe binêre û ew fîlma di binê siya Mem û Zînê de hatiye çêkirin lê temaşê bike; ez dibêjim qey ji bo Ehmedê Xanî qiyametê e. Bi rastî jî dagirkirina çand û kultûra Kurdan e; ku her kes li gor nijadperestiya xwe hebûna Kurdan parçe dike û li gor hesta xwe ya mîllî hebûna Kurdan tune dike.

Ma rewya ye?

Gelê Kurd bi hezar salan e, edebiyat û çanda devkî di civaka xwe da bi cih kiriye. Lê mixabin, di zemanê bêînsanîyetiyê de ew çand û kultûra mîllî ya Kurdan bi medyayê û bi weşanên modern tune dibin!!!

Rêzefîlma “Mem û Zînê” bi zanebûn xirabkirina destançîroka (efsaneyê) mîllî ya Kurdan e. **Tu nîrxên însanî vê xapandin û xirabkirinê qebûl nake.**

Ez, ji rêber û rayedarên TRT6ê re dibêjim ku; ev fîlma ku bi derewîn û bi xapandinê we bi navê destana “Mem û Zînê” dest pê kiriye, bi lez û bez navê wê biguherin û gelê Kurd bi destana Mem û Zînê nexapînin.

---

Eger, bi awayekî micîzewî Ehmedê Xanî rabe û li rewşa şahesera xwe binêre û ew fîlmê di binê siya Mem û Zînê de hatiye çêkirin lê temaşê bike; ez dibêjim qey ji bo Ehmedê Xanî qiyametê e

---



---

**Di fîlma “Mem û Zînê” de  
qerekerên Mîrê Botan û yên Cizîra  
Botan bi qasî zerrekî eleqeya xwe  
tune ne. Mîrê Botan, di dema xwe  
de bi qasî dewletekê desthilatiya  
Kurdan bi dest xwe xistiye**

---

Ey berpirsiyarên fîlma “Siya Mem û Zînê”! Eger, hûn behsa destanê dikan; di her dîmenên fîlmê de geger e hest û hîsa Kurdewarî hebe. Geger e, hesta mîllî ya Kurdan xwe xuya bike.

Di fîlma “Mem û Zînê” de qerekerên Mîrê Botan û yên Cizîra Botan bi qasî zerrekî eleqeya xwe tune ne û cîhûwar jî qet naşibin hev. Mîrê Botan, di dema xwe de û di zemanê xwe de bi qasî dewletekê desthilatiya Kurdan bi dest xwe xistiye.

Em li fîlma “Siya Mem û Zînê” dinêrin ku Mîrê Botan mîna serokê mafyakî ye an jî mîna qabadayekî bi eskeran re ye.

Ê maşallah, ne aqil ne wijdan qebûl nake ku serokê Mîrê Botan mîna mafyan desthilatiya herêmê bi dest xwe xistibel!!! Ya ku dîrok raberî me dike; em zanin ku her mîrekî eskerên xwe heye, dewleta xwe heye, pere û mohra xwe heye...

Ez, ji bo edebiyat û çanda Kurdan ya ku bi hezar salan e di nav gelê Kurd de bi awakî zindî xwe bereder kiriye, naxwazim ku bi destê medya qirêj were guhertin û xirabkirin.

Ez dibêjim ku hesabê xirabkirin û guhertina çanda Kurdan pir giran e. Ji bo dilreşan û ji bo fitne fesadan gotineke Bedûzzeman Seîdê Kurdî tînim bîra wan: “Însan zilmê dike, lê qeder edalet dike”.

Ehmedê Xanî, dema ku nivîsîna “Mem û Zînê” tamam kiriye, 44 salî bûye. Xanî li Kurdistana jorîn li bajarê Beyazîdê wefat kiriye. Gora wî li Beyazîdê ye. Xanî bi **Mem û Zîna** xwe a ku **destana neteweyî ya netewa Kurd e**, di dilê neteweya Kurd de cihekî bilind girtiye û bi vî awayî di nava gelê xwe de bûye «**Xaniyê Nemir.**» Di jiyana Xanî de (1651-1707)<sup>1</sup> pênc sultanên Osmaniyan hatin ser **textê hukûmdariyê**. Mezîniya Ehmedê Xanî ev e

1 Binêre li Mustafa Resul İzzettin, *Ehmedê Xanî û “Mem û Zîn”*, werger Kadri Yildirim, Weşana Avesta 2007/İst.

ku ew şêxekî, zanakî, civaknasekî, siyasetzanekî û miderrîsekî li **ser zemanê xwe bû** jî, lê derdê gelê xwe jî tu caran ji bîr nekiribû.

Destana Kurdan ya netewî “Mem û Zîn” bi sed-salan di nava gelê Kurd de bi devkî û destnivîskî jiyaye. Paşê gelek caran hatiye çapkirin. Cara pêşîn di sala **1919an de li Stenbolê**; paşê di sala 1947an de li Helebê, sala 1954an de li Hewlêrê, 1957an de li Şamê, 1960an de li Bexdayê, 1962an de li Moskovayê, 1988an de li Êrmîyê û 1995an de li Swêdê li bajarê Uppsalayê hatiye çapkirin. “**Mem û Zîn**” bi tîpên latînî cara pêşîn di sala **1968an** de, ji aliyê **M. Emîn Bozarlan ve li Stenbolê hat çapkirin**. Mamoste M.Emîn Bozarlan, bi munasebeta 300 saliya “**Mem û Zînê**” ew bi tîpên latînî û bi şirovekirineke hêja, di sala 1995an de ji nû ve çap kir.

Feylezoîfê Kurd, li hemberî zor û zordestiyê, li hemberî paşverûtiyê, ji bo pêşveçûnê rêya civakê vedike.

Tê zanîn ku fîlozofî raman û dîtina mirovan e. Raman û dîtîna jî, her gav girêdayî rewş û sazûmana civakî ne. Bi şêwekî din felsefe zanistekê civakê ye û bê hebûna civakê xwe nikane pêşda bide. **Ev mîsoger e ji bo hemû çêşîdên fîlozofî**, ji bo hemû beş û bîrên felsefî rast e.<sup>3</sup>

Ehmedê Xanî ji bo ziman û kultûra Kurdî pêşve here û netewa Kurd di civakê de bi cih bibe tevgeriyaye. Esliyeta Kurdan bi Kurdan daye hişyarkirin. Ehmedê Xanî, ji bo pirsgirêka netewa Kurd û gelek ramanan di destançîroka “Mem û Zînê” de tîne ziman e. Ehmedê Xanî di dîwana xwe de hişyarbûna Kurdan tîne ziman. Ji bo gelê Kurd weha balê dikîşîne:

***Bi ser me nediketîna ne Tacîk û ne Rom***

***Em (Kurd) nedibûn xiraba kund***

*Em, ne mehkûm dibûn ne jî bê çare*

*Bi ser me nediketîna Tirk û Tacîk*

*Rom û Eceman, em dorpêç kirin*

*Hemû Kurd çar parçe kirin*

*Kurd, di sînor da mîna miftah dibînin*

2 - Mustafa Resul İzzettin, *Ehmedê Xanî û “Mem û Zîn”*, werger Kadri Yildirim, Weşana Avesta 2007/İst.

3 - Mustafa Resul İzzettin, *Ehmedê Xanî û “Mem û Zîn”*, werger Kadri Yildirim, Weşana Avesta 2007/İst. Mijara Bûyera Kurdistanê, r. 65-66-67-68-69-70 binêre.



Tu heqê  
kesî û sazi-  
yan tune ku  
li ser destana  
Xaniyê nemir  
polîtîkayan bike  
û gelê Kurd  
bixapîne û çan-  
da Kurdî xirab  
bike

*Her aşîretek mîna qelê  
Mîna behrê dişibe Rom û Ecevan  
Ku çî demê derkevîne holê  
Kurd, di her terefî de dikevîne xwîna sor  
Mîna berzahan ji hev diketînin.  
Ku çîqas şerm e, Kurd bi Tacîk û Tirkan de  
girêdayî be  
Ew şerm, şerma rêberê Kurdan e.  
Ew bûyera ji rêberê Kurdan re fedîyeke mezin e.  
Di vî alî de ne hêza şairan ne jî hêza belengazan  
heye.<sup>4</sup>*

Xanî, baweriya xwe ya şoreşgerî rasterast tîne zimên:

*'Bê şer û tengasî û têkoşîn  
Qet vî karî xeyal mekin*

Xuya ye ku Xanî, bêceng û têkoşîn, bêtengasî xeyalkirina serkeftinê jî, rast nabîne. Sêsed sal pey vê gotina wî, demeke dirêj dîroka jiyana gelê Kurd diselmîne ku banga Xanî di cih de ye. Dîroka Kurdan, têkoşîn û karvaniya wan şahidê rastî, bîrewerî û dûrbîniya Xanî ne.

Ehmedê Xanî di dîroka Kurdistanê de ronakgîrekî bêhempa bû ku ji bo pêşveçûn û belavkirina vî 'Tovî gulên dara Çanda Kurdan' av daye. Ehmedê Xanî di

demeke windabûn û tunebûnê de ev 'Tov' di mêjiyê gelê Kurd de bi cih kiriye. Lê tu caran jî, di nav dîroka derbasbûyî de ronahiyên Kurdî ji bîr nekiriye.

Afirandina '**Mem û Zînê**', binavkirina '**Tovên gulên çanda Kurdî**', ji aliyê Ehmedê Xanî ve jî, piralî hatiye hîştin. Lê berî her tiştî pêwîst e were pîrskirin ka Ehmedê Xanî "Mem û Zîn" ji bo kê nivîsandiye?, Yan jî, ji bo çî têkoşîye?

**Esas gava min berhemên Ehmedê Xanî xwend, min dît ku hem li ser berhemê, hem jî li ser nivîskarê wê lazîm e bê sekinandin, hûr hûr bê tehlîlkirin û lêkolînên kûr li ser wan bêne kirin.** Hem agahiyên gelek hêja û balkêş di berhemê de hene, hem jî ji alî metod, uslûb û zîman ve, ew muhtacî lêkolînek û zelalkirineka ciddî ne.<sup>5</sup>

Min, ji dengên gelek dengbêjan destana Mem û Zînê guhdarî kiriye û min berhema Ehmedê Xanî ya li ser destana Mem û Zînê xwendîye; ku bi qasî zerrekî naşiba rêzefîlma "Siya Mem û Zînê". Ev rêzefîlma "Siya Mem û Zînê" ji bo şahesera Xanî qetlîamek e, xirabkirinek e û asîmîlekirinek e.

Tu heqê kesî û saziyan tune ku li ser destana Xaniyê nemir polîtîkayan bike û gelê Kurd bixapîne û çanda Kurdî xirab bike.✶

4 - Mustafa Resul İzzettin, *Ehmedê Xanî û "Mem û Zîn"*, werger Kadri Yıldırım, *Weşana Avesta* 2007/İst r. 95-96-97 (ji pirtûka Ehmedê Xanî, 'Mem û Zîn' r. 32yan istandîye).

5 Çaglayan Mehmet, *Şark Ulemasi*, *Weşana Çaglayan* /İst. mijarê r. 90-91-92

-*Ewliyalar Ansiklopedisi* c;2, r. 192-193 ji bo Ehmedê Xanî gelek şîrove hene, binêre..

# Sih û çar gulle

**Mehmet Bozkoyun**

*Ji bo zarokên welatekî bênav...*

Mirin rojeke sar e  
 Di ber banga rojeke zivistanê rê li min birrî  
 Xwîn herikî bi ser rûyê lat û zinaran de  
 Hêviyên zarokan dan ber gullên mawzeran  
 Mirin bû bombe  
 Û barîli ser serê zarokên qaçaxçî  
 Birîna vî dilî kevnare ye  
 Ez çibêjim  
 Îro cardin zarokên min bêxwedî man li erdekî bêpîvan.  
 Barê qaçaxê li min bû bar  
 Lorikên dayikan bi ber quntarê çiyayê Cûdî ketin  
 Cûdîhejiya, lê mirovahî kerr û lal  
 Bêhemdiyeke bihemd bû ev qîta.  
 Sih û çar gulle sih û çar ciwan  
 Şivan, Bedran, Şîrwan, Osman, Salih û Seyitxan  
 De rabe dayê îro hêla min a çepê diêşe  
 Ez bi sih û çar gullan birîndar im  
 Xwîna zarokên min herikî bi hevalbendiya botan  
 Memê, Zînê berda û berê xwe da Roboskiyê  
 Ewrên reş û tarî hevalên vî welatî ne  
 Bihar li dûr e, nexwiyaye  
 Deşt û zinar li lorîna dayikek dilbirîn guhdarî dikin  
 “De lorî lorî qaçaxçiyê min lorî  
 De lorî lorî berxê min lorî  
 De îro tu mêvanê qebra tarî  
 De lorî lorî bêkesêm lorî”  
 Sih û çar gulle sih û çar ciwan  
 Ev birîna ne birîna yekemîn e  
 Do bapîrên me li deşta Çaldiranê hatin kuştin  
 Do bavên me li newala Sefo hatin qirkirin  
 Do birayên me li ber çemê Zîlanê hatin parçekirin  
 Do li Dêrsimê, do li Amedê hevalên me hatin binaxkirin  
 Ax, ez kîjan birînen xwe derman kim  
 Ax, ez tola kîjan kuştiyên xwe bigirim  
 Cardin, îro para min kuştin ket  
 Sih û çar gulle sih û çar ciwan

# Şerefname de Mîreyê Mirdasîyan

## WISIF ZOZANÎ

Ş

erefnameyê Şerefxanê Bedlîsî semedê mîletê Kurdan çimeyêko wayirê qiyetî yo. Çar sey serrî verê cû destê yew Kurdê Kurmancî ra ameyo nuştiş. Her çiqas ke no kitab bi destê yew Kurmancî nusîyayo zi behsê heme şaxê Kurdan tede est î. Nê şaxan ra yew zi yê Kirdan o. Yanî yê dimilîyan o. Nê serranê peyênan de derheqê kokê Kirdan de zaf çîy vajiyayê. Labelê tu kesî xebatêka îlmî ser ra tebayêk nêvato. Ma nê warî de kêmasî dî û destê xo kerdî we û pancyê xo şamarney û ma kewtî miyanê xebate. Verê cû ma Şerefname de qisimê ke behsê mireyanê Kirdan kenê ma ney pêdima açarnayê Kirdkî. Ewilî Şerefname de qisimo ke behsê Suweydiyan keno o qisim ma açarna bi Kirdkî û neşr kerd bi. Nika zi ma hewna Şerefname de qisimo ke behsê mîreyanê Mirdasîyan keno, ma ey açarnenî Kirdkî ser. Qisimê Mirdasîyan hîrê şaxan ra yeno pê. Mîreyê Bulduqîyan, mîreyê Palo û mîreyê Çêrmûg. Ewil qisimo ke behsê mîreyanê Gêlî keno ma ey açarnenî dima

zi yê bînan açarnenî û neşr kenî. Semedê açarnayîşê nê qisimî zî metno Fariskî yê Şerefname ke bi destê V. Veliamenof Zernof serra 1860 de bajarê Rusya, Saint-Petersbourg de ameyo çap kerdiş ma o metn xo rê bînge girewt. Şerefxan heta serra 1597 behsê nê mîreyan keno. Na serre ra pey heta serra 1684î zi katibê mîreyanê Mirdasîyan Şem'î nuşt û kerd metnê Şerefxanî ser. Ma no îlawe zi açarna û kerd metnî ser.<sup>1</sup> Na xebata xo de ma çimeyê tarixê ê çaxî ra zî îstîfade kerd. Malumatê înan û metnê Şerefname ma na têver. Cay ke nameyê înan metn de viyartî ma fotografê înan zi guret metn. Ma waşt ke derheqê nê mîreyanê Kirdan de xebatêka îlmî bêro verê wendoxan. Nê xebatî îlmî hem tarixê ma Kirdan kenî zelal hem zi şek û şupheyan sereyê însanê ma ra wedarenî.

---


Na xebata xo de ma çimeyê tarixê ê çaxî ra zî îstîfade kerd.

Malumatê înan û metnê Şerefname ma na têver. Cay ke nameyê înan metn de viyartî ma fotografê înan zi guret metn. Ma waşt ke derheqê nê mîreyanê Kirdan de xebatêka îlmî bêro verê wendoxan

---


1 Metnê Şem'î bi destê Enwer Sultani ame çapkerdiş. Enwer Sultani no metn mi rê Londra ra erşawit. Semedê nê holiyê ey ez ci rê zaf teşekur kena.





Qubaya Pîr Mensurî

Screyê şecereyê mîreyanê Gêlî yê ke înan resênên Ebasîyan



Feslo diyin derheqê hukimdarênê Mirdasîyan de yo. No fesil hîrê şaxan ra yeno pê

Mergê vistanikanê hukimdarênê şabîyeyan ra û gulistanê eseranê mîreyanê namdaran ra boya nê xeberan vejîya û resa zinca nuştoxê nê kitabî. Nê xeberan gore nesebê hukimdarênê Mirdasîyano

pak reseno apê hezretî Mehemedî, yo pîl hezretî Ebas (Huma teala ci ra razî bo). Nînan ra merdimo tewr verên o.

**Pîr Mensur, lajê Seyîd Husênê lengî** yo. No dîndar yew zat û merdimêko wayîrê teqwa bi. Reyrey pê goşanê xo yê manewîyan sîrrê îlhamanê Homayî yê xeybî eşnawitêne. Şecero<sup>2</sup> ke hama ra zî qijanê eyi dest de yo tede des û hewt babîyan ra pey nesebê înan reseno Seyid Elî lajê Ebdulah lajê Ebasî. (Huma teala ci ra razî bo)

Pîr Mensur ewîlî welatê Hekarî de ciwîyen o. Tîya ra bar kerd şî welatê Gêlî (Egîl). Diza Gêl ra nêzdî dewa Pîran de na ro. Na dewe de xo dest ra yew îbadetxane viraşt û tede bi îbadet û teatî ya meşxul bi. Şew û roj riyazet û sûlik de bi. Şarê yê welatî teşwîqê îbadet û teatî kerdîn. No qayîde ser o şar û giragirê ê welatî derheqê ey de biy wayîrê qenaetêko baş. Xeylêk murîd û mensubê ey viraziyê. Wexto ke Pîr Mensur nê diyarê xapî dinya ra wedar bi şî serayê şabîyayîşî lajê ey **Pîr Musa** herinda babiyê xo de secadeyê îrşadî de ronîşt. Dewa **Pîranî** de xangahêke (tekke) viraşte. Semedê terbiye û averşiyayîşê murîdan ked û karê bêhesabî kerd ke nê nî humartiş. O tewir ke eşîra Mirdasîyan ra xeylêk merdimî binê bandurê hal û waziyetê Pîr Musa yê baş de mendî. Qalan û emelanê ey ra zaf tesîr wedarîtê. Însanî semedê xizmetê eyî heme welat û diyaran ra ameyî ey het. Roj bi roj vengê

2 Fotografê nê şecere, mi Tarik Konuksever ra guret. Ez ey rê zaf teşekur kena.


teqwa û îbadetê ey biy zîyade, nameyê holîyê ey zi bi berz. Esaye û dewijanê yê welatî semedê eleqeyê îbadetê ey û hîrakerdîşê secadeyê terîqetê ey zi zaf xebat kerdîn.

Wexto ke Pîr Musa şî alema ebedî **Lajê Pîr Musayî, Pîr Bedir** bi serekê gureyanê îrşadî. Pîr Bedirî goreyê xo ra, ver silsileyê terîqetî ra payeyo berz qezenc kerd. Îxlas û bawerîya eşîrê Mirdasîyan qasê mertebeyê ey bîy zîyade. Seltenetê şeklî û hukimdarîya manewî kerdê pêser. Pê quwetê baziye xo dizê Gêlî girewt kerd binê hukimê xo. Diza Gêlî sereyê kemerêko berz de ya. Na kemere o tewir çewto ke kam aye bivîno xof û ters kuweno zereyê yê merdimî. Rîwayeto ke fekan û ziwanan ser de yo ke vanî; holanê Homayî ra merdimêk resa no ca û no kemer mot ra(nawna) û bi Tirkî va **'Egîl'** yanî **'çewt bi'** bi hewl û quwetê Homa Tealayî o kemer bi çewt. Zanayîşo tewr baş Homay hetî de yo.

Eşîra ke na dize de û no welat de cuwiyena nameyê aye Mirdasî ya. Mirdas lajê Îdrîs lajê Nusayr lajê Cemîl, pîl û serekê eşîra Kîlabî yo. Bi eslê xo dormaleyê Heleb de cuwiyenî. O çax bajarê Helebî binê destanê hukimdarê Îsmâîliyan yê Misir de bî. Hukimdarê Misirî beynateyê yewbînan de xusumet û dişmenatî kerd. No rid ra şarê yê welatî perîşan kewtî. Wexto ke no waziyet Salihê lajê Mirdasê lajê Îdrîsî rê bi eyan niyetê hukimat-biyayîş ra eşt na dize ser. Mudeyêko zaf kilm de yê ke dize de mehsur mendibî hal û waziyet înan bi xirab. No rid ra dize teslîmê Salihî kerd. Wexto ke na xebere Misir de resa Zahîr lajê Hakîmê Îsmâîlî ca de tay merdimî erşawitî Heleb. Serra 420 ina hîcrî (1029 mîladî) de lajê Salihî ame kîştîş. Eşîra Mirdasîyan welatê Helebî ra wedarit û hetê Gêlî ra amey. Nê tarixî ra nato ke nê welatî de cuwiyenî. Welhasil Pîr Bedir pê destegiriyê eşîrê Mirdasî dize û welatê Gêlî girewt binê destanê xo. Yew mude xîlafê baw û kalanê xo de hukimdarî û mîretî kerd. Sultananê Selçuqîyan ra yewî çim verda welatê ey. Mecbur mend welatê xo ra rema. Teferuatê na mesela pê destegîrîya Homa Tealayî do cuwa pê bêro zikirkerdîş.


### **Şaxo ewîlin, derheqê hukimdarê Gêlî ra o ke bi nameyê Bulduqanî name beno yo**

Zaf gilange, merdimê ke bawerî bi înan bena, ma înan ra eşnawito. Semedo ke nameyê Bulduqanî diyo ci vanî, wexto ke Pîr Bedir Sultananê Selçuqîyan



Şerefname ra hebêk mînyatur o ke bajarê Gêlî mojneno

dest ra rema şî hetê Mufarqînî. Şî verê mîreyê nê bajarî Emîr Husamedînî het. Yew mude uca de nimitik cuwîya. Dima Sultan Alparslanê Selçuqî, Emîr Artuq nameyê xo ser o kerd waliyê Mardîn û Amed. O wext qijanî Emîr Artuqî zi heta Heleb û Bexdad hukim kerdîn. Tarixzanayî înan şaxanê mîreyanê Selçuqîyan miyan de hesibnayêne. İnan ra hewt tenî resayê payeyê hukimdarî. Serê hukimdariya Hesên Begê Bayindirî yê Aqqoyunlî de Melîk Nasiredîn ke merdimo tewr peyen ê na famîla bi, pê destê Hesên Begî ra ame kîştîş. Qetîlkerdîşî nê merdimî ra pey dewleta Artuqîyan dest pêkerd şîya we. Welhasil Emîr Artuq semedê guretişê dizê Mufarqîn Alparslan ra ferman girewt û ca de na ferman ard ca. Dormeyê na dize girewt. Merdimê ke na dize da cuwiyayêne, zaf tenganî de mendî. Fermanê Homayî ra teqdîrê ezman ame ca û tîrê çerxê felekî eskeranê Emîr Artuq dest ra vejîya û



Camiyya Lele Qasimi

şî hukimdarê dizê Mufarqin Husamedîn kişt û ey şawit dinyaya ebedî. Merdimanê Husamedînî ra zi vera Emir Artuqî de hêzê vindertişî nêmendbi. Roj bi roje eserê sistî û hal ra kewtiş û elametê eciztî û kemasî xo kerdibî eşkera. Hetanî ke yew şewe Emir Artuq pê cebr û zordarî na dize guret binê destanê xo. Dima zi şarê nê bajarî hemeyî nay kalmeyan fek a. Merdim û eskerê ke na dize de bî înan ra çewî ganî nêverda. Pîr Bedir zi no şer de şerbetê şehidî tehmnabi. Hukimdaranê Gêlî ra kes ganî nêmend. Tena cinîya Pîr Bedirî xelisaybî. A cinî hevî kerdêne ke Homa xiznayê keybî ra cewherêk û bircê seadetî ra estareyêk bido înan ke pê wareyê înan şên bibo. Her roje giragirê nê welatî ameyêne verê berî a cinî û

halê aye persêne. Roja biyayişê qijî ke bî nêzdî, ameyê verê berî. O wext zere ra merdimêk ame teber bi Tirkî va: **Çoq şukur Xudaya kî îstedugimîzî bulduq yanî Homa rê henzar bar şikir ke ma waştîşê xo dî.** No vate ser ra nameyê ê qijî niya pa Bulduq û pê nê nameyî bi namedar. Hukimdaranê Gêlî zi bi nameyê Bulduqanî name diyayî. Welhasil mîr Bulduq ame dinya û dadiya ey zi na hele merdibî. Pîl eşîrê Mirdasiyan mîr Bulduq sey pîlê xo dîne û qiymet dayêne ci. Mîr Bulduq wexto ke resa û bi pîl bi camerd pêro qewm û eşîrê yê welatî ey rê sere na ro û goşareyê koletî kerdî xo goşan. Mîr Bulduq herinda babiyê xo de textê hukimdarî de ronîşt. Veresîyê edalet û holî de eşîrê Mirdasiyan ser ra berê xirabî vera dinya gire diya. Zemanêk welatê Gêl de hukimdarî kerd. Cilê biyayişî hetê axretîya ser kaş kerd. Lajî ey o pîl mîr Îbrahîm goreyê qabiliyet û hunerê xo herinda babiyê xo girewt. Labelê hukimdarî nekerd. Veywê hukimdarî ra bi hîrê telaq abirya vera nê zehmetîyê qesrê axretî tercîh kerd û nê meqamê ferahî û weşî de ciwîya. Badê mergê ey lajê ey **Mîr Mehemed**<sup>3</sup> kewt herinda babiyê xo.


3 Derheqê nê mîrî de tarixzanê Memlukiyani **Meqrizî** wina vano: “*Serra 820 hîcrî û 1417 mîladî de hukimdarê Memlukiyani amebi welatê Semsur û eştbi diza Kexta ser. Mîrey ke dormeyê nê welatî de bî heme amey dergahê ey û ci rê sere rona. No hengame de qasidê mîreyê Egil/Gêl Mehemed bego lajê Dewletşah beg zi Diyarbekir ra ame û mefteyê diza Gêlî zi xo reyde ardbî. Mefteyê ey teptiya diyay ci û di heb qıyafetî*

Mudeyêk hukimdarî kerd û dima pey wehdeyê xo na dinya ra wextê dî şî axret. Ey ra hîrê hebî lajî delal û holî mendî.

Ewîlî **Mîr İsa** yo. Badê mergê babiyê xo kewt herinda ey û bi hukimdarê Gêlî. Dîyin **Mîr Timurtaş** o. Wexto ki babiyê ey weş bi o dîza **Baxîn** û dormeyê ci rê mîretî kerd. Hukimdaranê Palo neslê ey ra yê. Derheqê înan de şaxo dîyin de bi teşîlata ma malumat danî. Hîrêyin **Mîr Huseyn** o. O zi wextê babiyê xo Mîr Mehemed de mîretîya dîza **Berdinc** û bajarê **Çermûg** kerdî. Hukimdarê Çermûg neslê ey ra yenê. Labelê vateyê tay verînan gore Mîr Huseyn lajê Mîr Mehemedî niyo dedzayanê ey ra yew o. Mîr Mehemedî wextê hukimdarîya xo de mîretiyê Çermûg û dîza Berdinc teslimê ey kerdbi. Welhasil, derheqê Mîr Huseyn û qijanê ey yê bînan de pê destegirîyê Homayo ke wayîrê hewl û quwetî yo, şaxê hîrêyini de ma behsê înan kenî.

**Mîr İsayo lajê Mîr Mehemedî,** Badê mergê babiyê xo bi hukimdarê Gêlî. Bi bira û merdimanê eşîra xo de hol viyarna, şar û eskerê ey edalet û holiya ey ra weş û minetdar bî. Mudeyêk cuwa pey dawetê heqî ra va belê û hetê axret a şî.

*qumaşo atlasî ra bî ey zî diyay qasidê mîreyê Gêlî.*” Meqrizî, **el Suluk fî Me’rifeti Duwelîl Muluk**, tehqîqê Muhemmed Ebdulqadir Eta, Beyrut, 1997, cild 6, rîpel 444. Ma no îfade ra fehî kenê ke nameyê babiyê Mehemed begî, Dewletşah beg o. Çünke Meqrizî hemdemê nê mire yo. No ride ra ma çim de malumatê ey hina rast o.



**Dewletşah Beg<sup>4</sup> lajê Mîr Îsayî** Wasiyetê babiyê ey gore, pey destegirî û paştedayişê eşîra Mirdasî bi hukimdarê Gêlî. Mudeyek hukim kerd û dima merd. Lajê ey Mîr Îsayî textê mîretî de ronîşt. Şarê xo rê zaf hol bi. Wextê ey de welatê Gêlî bi yew cayêko mamur û şênayî. Hela ke merd ey ra di heb lajî mendî. Yew **Îsfendiyar<sup>5</sup>**, o bîn zi **Şah Mehemed** bi.

Şah Mehemed beg lajê Mîr Îsayî pê heqê xo kewt herin-



da babiyê xo. Labelê lez û bez na dinya ya fanî ra xatir waşt şî rehmet. Ey ra panc lajî mendî. **Qasim , Îsa , Mensur , Îsfahan, Emîran.**

**Qasim begê lajê Şah Mehemed Beg** pê Fazilet, zanayîş, cesaret, exlaq hol û xûyo rind miyanê hemserranê xo de yewek û vîjnaye bi. Kar û gureyanê welatê xo pawitiş û şarî xo sînayîş de miyanê mîreyanê Kurdistan de vera piyorê hemserranê xo û eqrananê xo de sereyê ey berz bi. Wextê hukimdariya sultanê

Berkoleyê mezelê Lele Qasimî

Qubaya Lele Qasim û birarzayê ci Murad begî

Aqqoyunlîyan de payeberz bi û îtibarê ey zi xeylêk ziyade bi. Aqqoyunlîyan, Mîr Qasimî qijanê xo ra yewî rê kerdbi lele. No rid ra miyanî şarî de bi nameyê **Lele Qasim** namedar bi.

Meşhur a ke sera 913 (1507-1508) de Şah Îsmailo Safewî Diyarbekir vist xo dest. Labelê Lele Qasim sere ey bin ra nêkerd û vera ci vindert. No rid ra Xan Mehemed Ustaclu esker ramit Gêlî ser û no welat Qasim begî dest ra vet û da Qizilbaşan ra Mensur Begî. Gêl hewt serî bîn zordariya înan de bindest mend. Şerê Çaldirana pey Lele Qasim pey destegirîyê Sultan Selîm Xan welatê bawkanê xo binê destanê Qizilbaşan ra vet û reyna textê hukimdarî de ronîşt. Goreyê yew vateyî vanî Lele Qasim wextê Qaraxan de pey xapa bacarê Amed Qizilbaşan dest ra vet teslîmê mîrêmîranê Diyarbekirî Mehemed Paşayî kerd. Wextê Osmaniyan de roj bi

4 Derheqê nê mîrey de Meqrizî vano: “Serra 836 hîcrî û 1432 mîladîde hukimdarê Memlukîyan Melik Eşref Mueyyed ame Amed. Mireyê Gêl Dewletşah beg şî ey vera. Melik Eşref ey hol kerd mêman.” Meqrizî, *el Suluk fî Me’rifeti Duwelil Muluk*, cild 7, rîpel 254.

5 Serra 903 hîcrî û 1498 mîladî de hukimdarê Aqqoyunlîyan Qasim lajê Cîhangir Îsfendiyar beg rê yew berat erşawit bi. No berat de Îsfendiyar beg ra bi leqabê Emîr-i A’zam Ekrem behs keno û welatê Gêlî ra teber îdareyê bajarê Bâxîn û Hênî zî dano ey. V. Minorsky, *A Soyurghal of Qasim b. Jahangir Aq-qoyunlu (903/1498)*, BSOS, cild 9, qisim 4, rîpel 929.





Nuşteyo ke tarixê viraştişê xanê Şerbetîn mojneno

roje payeyê Lele Qasim bî berz û aver de şî. Peynî de bi wehdeyê xo merd û şî axret. Tera qijjo lajî nêbi. No rid ra hukimdarîya Gêlî birazayê xo Murad begi rê weşiyet kerd.

**Murad Bego lajê Îsa Begi** Wesiyetê apê ey gore hukimdarîya Gêlî hetê diwanê Sultan Suleyman ra dîya ci. Murad beg merdimmo salih, dîndar, adil û holîyê şarî xo qayil bi. Merdimanê corînan û cêrînan, xerîban û nasan kam beno wa bibo tede hol vîyarnên. Mezelê apê xo ser a yew qubaya berz viraşt.

Kişt a ey de zi yew xan û karwanseray viraşt. Her roje merdimê ke amên uca û vîyêrtîn şîni, nan û wer diyên înan. Yanî kam ke bi amên tîya no wer ra îstîfade kerdîn. No ca bajarê Amed ra yew menzîl dûr cayek o. Bi nameyê xano Şerbetîn yeno name kerdiş.


Çend serrî hukimdarîya ey ser ra vîyart dima na dinyaya fanî ra wedar bi hetê cayo ebedî ser şî.

Ey ra bi nameyê Elîxan û Qasim di heb lajî mendî. Her di birayan zi pêdîma Gêl de hukimdarî kerd. Labelê hukimdarîya înan sey mewsimê gul û sunbulan zaf derg nêkerd. Lez û bez na dinyaya fanî ra bar kerd şî. Qasim begi ra bi nameyê Cafer beg û Xezener beg di heb lajî mendî.

**Cafer Bego lajê Qasim Begi** Badê mergî babyîyê xo serran de qij bi zi fermanê Sultan Selîm xan gore hukimdarîya Gêlî dîya ey. Nika tarîxo hîcrî de serra henzar û panc a, vîst serrî ra ziyede ya ke tîya de sey verê ho hukimdarî keno.

Cafer begi dima yew laj mend bi. Namê ey zi **Mumîn beg** bi Ehlê zewq yew merdim bi û meylê ci zi keyf û sefa ser bi. Çend girangî padişahê Osmaniyan reyde şî bi sefer. Nameyê ci her hetê welati de vila bi. Pey fermanê padişahê Osmaniyan Sultan Ehmed xan Gêlî rê bi mîre. Merdimê îdareyi û selteneî bi. Panc heb lajî ci rê bî. Nameyê eyin Merdan Elî, Xezener, Musa, Mistefa û (?) beg bi.


**Merdan Elî bego lajê Mumîn begi** begzadetî rê razî nêbi. Waşt ke Gêl rê mîre bo. Pey fermanê



Destnuşteyê Şem'î ke behsê mîreyanê Gêlî ra behs keno ey ra rîpelêk

Sultan Mehmed Xan Gazî bi mîreyê Gêlî. Merdan Elî beg yew merdimmo hol, namedar, seyard bi şeklê xo de mendîni şêrî. Mudeyek cuwa pey lajî Qucur beg Ehmed beg pey destegirîyê qeymeqam Mistefa paşa –ke cuwa pey bi wezîr- paytextê Osmaniyan ra semedê hukmatê Gêlî rê ferman vet û Gêl guret xo dest. naye ser Merdan Elî beg, Ehmed begî kişt. Babyîyê Merdan Elî beg Mumîn beg dest kar û gureyanê dinya ra antbi. Hukmatê Gêlî zi dabi lajê xo Merdan Elî beg. Dima Mumîn beg waşt ke şêro Beytullah ziyaret bikiro. No semed ra Homay ra dua waşt. Humay duayê ci qebul kerd. Mumîn beg şî hec tefawê xo kerd. Agêra bêro welatê xo rahar de Çêrmug de merd şî rehmet.

Badê cû lajê Mumîn beg o bîn **Musa beg** waşt ke herinda babyîyê xo bigiro. Na hêvî ra şî paytextê osmaniyan. O zi pey destegirîyê qeymeqam Mistefa paşa qeybi kiştişê birayê xo Merdan Elî beg diwanê osma-



Şerefname ra hebêk mînyatur ke diza Gêli mojnenno

**Şecreyê Mîreyê Mirdasiyan**

niyan ferman vet. Ferman bi nameyê waliyê Diyarbekir –ke verê cû defterdarî ra ame bi gu-retiş- vejîya. Waliyê Diyarbekirî na ferman ser Merdan Elî begî da kiştiş. Bade cû padişahê osmaniyan semedê seferê Emman eyaletê Diyarbekirî rê ferman erşawit. Na ferman ser eskerê eyaletê Diyarbekirî kewt rayîr. Musa beg zi miyanê nê eskerî de bi. Musa begî emrê Allahî ra aqil eşt û xo da têmiyan û dima zi vîndi bi.

Herinda ey birayê ci **Mistefa beg** pê fermanê padişahê osmaniyan guret û bi mîreyê Gêl î. Homa emir ey û dewletê ci heta roja qiyameti ebedî bikiro. Mistefa beg sey darê rêzî Îrem bi, hênîyê sexîti û keremî bi, medenê çewheran û wayîrê sifetanê kamilan, estareyê talih û îqbal bi. Her tim goşdariya şîir û qalê hikmatinan kerdîn. Welatê Kurdistan miyan de pey sexîti û

camerdî erjiyaye yew merdim bi û pey nê sifetan wesifyenî. Serra hezar û heştay û new ê hicrî de (1089/1678) Qeplan paşa waliyê Diyarbekir bi û diwanê Osmaniyan ra yew ferman vejîya ke va biyerîn seferê Çarin. Mistefa beg nê fermanî ser pa mîreyê Pali, Mehemed Qucur beg kewt rayîr şî sefer. Mîreyê Pali Mehemed Qucur beg camerdê sexî û egîd yew merdim bi. Mistefa beg û Mehemed Qucur beg vateyê xo kerd yew û miyanî xo pê heskerdiş û sînayiş viraşt. Yew hel zi yewbînan ra ca nêmendîn. Raywanîyê xo de xeylêk keyf û sefa kerdîn. Wexto ke pirdê bacarê Bender ra viyertî ca de a herind de xeymê xo û barê xo têkişte de rona. Bade cû zi des hezar eskerê mîreyi hetê diza Çehrîn kerdî rey. Hîn paw ke biresî dizê Çarin, muhafizê bendê osmaniyan ra Yusuf paşa ame înan hete û va hetan ke vîst hezar esker çin bi desturê padişah qeybi nê şerî çin a. Labelê

înan goş ey nêkuwa û xo da binê yeşê înayet û destegiriyê Homa yi. Yew wexto ke bimbarek de hela nêrojî de xeymê xo bar kerdî û tîreyde hetê diza Çarîn a kewtî rayîr. Homay destegirî da înan sax û silamet şer qedîna û xeylêk xenîmet kewt înann dest. Her diyan zi qeymeqam Mistefa paşa destî ra xelatê fexrî guret pira. Dima zi kewtî miyanê eskerê waliyê Diyarbekirî yê Qeplan paşa yî. Badê cû zi xizmetê padişahê osmaniyan de bî. Hurdi mîreyan zi her xusus de qedrê yewbînan zanenî û xatirê yewbînan pawitîn. Yew seraskerê qiralê Mosqowî ke namê ci Remedensko bi pa hîrê sey-çar sey hezar eskera Ozusu de taburê xo



rona bi. Fermanê wezîro pîlê osmaniyan Mistefa paşa waliyê Diyarbekir Qeplan paşa pa hendê ra beg û paşayanê xo bi sereskerê osmaniyan. Wexto ke şer û cerg têra bî, mîreyê Gêlî Mistefa beg û mîreyê Pali Mehemed Qucur beg egidîya pîl mot ra. Mîreyo erjiyaye Mehemed Qucur begî estorê xo ramit eskerê kafiran ser kafiran ra yew kişt. Kamî ke o dî,

ci rê heyran mendî. Yew estorê Mistefa beg zi pey topê kafiran ame kiştiş. Serra hezar û newayê (1090/1679) hicretê peyxemberî de (*selat û selamê Homay ey ser bo*) Mistefa beg şerê Çarin ra agera welatê xo û cuyê xo viyarna. Yew mude cuwe ra pey birazayê ci Qasim bego lajî Merdan Elî beg şî paytextê osmaniyan û mudeyêk uca de mend.

Aşmê Rebûlewê serrê hezar û neway panc de (Sibat 1684) Qasim beg diwanê osmaniyan ra hukmatê Gêlî xo rê girewt. Naye ser Mistefa beg şî paytextê osmaniyan û mîretiya Gêl hena pey de guret. O zi pey lutuf û destegiriyê Humay textê xo de ronîşt. Ma hêvî kenî ke emir û dewletê ci dewam biko.✶

## Seydayê Evînê

Mihemed Cezawîr Hemkoçero

*Diyarî bo Mela Ehmedê Cizîrî*

Seydayê evîna dilan  
Kaniya hest û aqilan  
Rûbarê derdan û kulan  
Dildarê dîlberê Mela

Ji çarsed salî bi şûnda  
Gulîzara te geş bîn da  
Li ser keç û kurên Kurdan  
Pel û rûpelên wê sî da

Siya baxê te ji hîn e  
Raman tevdîr û zanîn e  
Bêhna wê tora zengîn e  
Zanistî çand û evîn e

Ew gelek îro navdeng e  
Şepal û şox û pir şeng e  
Weke jêder û ferheng e  
Min dil bi wê re aheng e

Gupikên wê nuh pişkuvîn  
Gul û gulçînên wê peqîn  
Jê hildayî xweş hulm û bîn  
Zivingî\* jê da me telqîn

Ew gulşena ku te çandî  
Bi dilpakî av reşandî  
Wî gulek jê neqetandî  
Bi agahî wergerandî

Ji wê pirtûk û dîwanê  
Ji nameya wek Quranê  
Ji sorgulên gulistanê  
Bêhnê dayî Kurdistanê

Weko dibêjim diyar e  
Ew dîwana te bihar e  
Naverok bi gulîzar e  
Hemû bax û gul û dar e

Ew hest û ristên te bêtin  
Hestiyê'm pê hilavêtin  
Wek zarokên şîr divêtin  
Yên ku sîngê dê dimêtin

Zimanekî bes te nekir  
Bi çar zaran te rave kir  
Dilê xwe pê derman dikir  
Çil milyon dil jî dax dikir

Bi rewşa çand û bi wêje  
Bi babeta tu dibêje  
Îro pênûs li ser gêj e  
Bo te tim dike nimêj e

Xwedê dikim rojek hila  
Biliviya ev aqilê ha  
Rubî rubî hişê Mela  
Pêxemberê her dîlkula

Da min jî gulek biçanda  
Di her sibê av reşanda  
Bêhna evînê jê hilda  
Li ser gora canê Seyda  
2000

\*Zivingî: Ehmedê Zivingî ew kesê ku dîwana wî bi Erebi şîrove kiriye, di sala 1959ê de li bajarê Helebê çû ser dilovaniya Xwedê.

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ  
 یانمی بزانی پاک ئی ولوفان و سه ریان

بنامه هوما از دو کتا ابتدا  
 خالق ئی آرد و آزمین باد کتا  
 بیو عقیبو بکتابی ما و فیردو  
 کتبه بکازی کئی عمری خود کردو

صلاواتی یوانن رند و بولی  
 براسین پیدی مائی رسولی  
 \*\*\*

ژۆ حکایت فال کران توری برا  
 قدری مولودی بزانت جرا<sup>(1)</sup>  
 سوکا بغدادی میانندی بی چین

زیدی جی نیدی بی کس ارباب  
 (1) قدری مولودی بزانی سو قورا

۲۰

# Zazakî de Metnê Dînî

MEHMED YERGÎN

**E**llah (cc) Quranê kerîm, sûreya Rûmî, ayeta 22. de, derheqê ziwani de wina vano: “*Xeleqkerdişê erd û asmênî û cîyabîyayîşê reng û ziwananê şima ayetanê Ey [Homayî] ra yo. Bêguman naye de seba zanayan raşt a zî ayetî estê.*”

Bediuzzeman Seîdê Kurdî zî derheqê ziwani de, kulîyatê rîsaleyê nûrî ra rîsaleya *Dîwanê Herbê Urfî* de wina vano: “*Merdimî de muhrê qederî ziwano.*”<sup>1</sup>

Dinya ser o gelek famîlyayê ziwanan estê. Nînan ra tayê Hînt-Ewropa, Hamî-Samî, Çîn-Tîbet, Ural-Altay ûsb. Kurdî, nê famîlyayanê ziwanan ra mensûbê famîlyaya Hînt-Ewropa ya. Famîlyaya Hînt-Ewropa zî xo mîyan de çend grûbê xo estê. Kurdî nê grûban ra dekewena grûba Hînt-Îranî de qismê Ziwananê Îranî mîyan.

Kurdî xo mîyan de wayîrê panc lehçeyanê esasî ya. Nê

lehçeyî: zazakî, kurmanckî, sorankî, gorankî û lurrkî yê. Nê lehçeyanê Kurdî mîyan de lehçeya ke tewr erey pê nusîyayo zazakî ya.

Zazakî de metno nuşteki yo tewr verên, hetê ziwanzan Peter Îvanowîç Lerchî ra nusîyayo û ser ra 1857-1858 de St. Petersburg de weşanîyayo. Herbê Qirimî de tayn eskerê Osmanîyan hetê orisan ra esîr yenî girewtiş, nê esîran mîyan de Kurdî zî benî, Peter Lerch nê metnî fekê ê Kurdan ra arê dayî. Metno tewr verên o ke Kurdan bi xo nuştö **Mewlidê Kirdî** yê Ehmedê Xasî yo.<sup>2</sup>

Metnê ke hetanî ewro bi zazakî ameyê nuştene, mîyanê înan ra ma do metnanê dînîyan ser o vinderî. Ê ke resayî ma û ma pêhesyayê û ameyê weşanayene, ma do bi dore pêşkêş bikerî.



Ehmedê Xasî

1 Bediuzzeman Seîdê Kurdî, *İçtimai Dersler*, Zehra Yayıncılık, İstanbul 2004, r. 191

2 J. İhsan Espar, “Vate Çalışma Grubu ve Vate Dergisi Çalışmaları”, Zazakî. Net, 26 Sibate 2011, <http://www.zazaki.net/yazi/vate-calisma-grubu-ve-vate-dergisi-calismalari-155.htm>

### 1. Ehmedê Xasî û Mewlidê Kirdî

Ehmedê Xasî 1867 de nehîyeya Hezanî de ke girêdayeyê qezaya Licê ya Diyarbekirî yo, ameyo dinya. 18 sibate 1951 de Hezan de dinya ra bar kerdo şîyo. Mezelê ey Hezan de yo.<sup>3</sup>

Ehmedê Xasî eserê xo bi erebkî, fariskî, tirkî û Kurdkî (zazakî, kurmanckî) nuştê. Ey kitabê kirdkî yo tewr verên *Mewlidê Kirdî* 1892 de nuştö, 25 adare 1899 de Diyarbekir de çapxaneyê Lîtoğrafya de 400 nusxeyê ey ginayê çape ro û vila bîyê.<sup>4</sup>

*Mewlidê Kirdî*, hetê çend kesan ra alfabeya erebkî ra transkirîbeyê alfabeya latînkî bîyo. Reya verêna M. Malmîsanijî 1985 de tadayo û Parîs de kovara *Hêvî* hûmara 4. de weşanayo. Dima 1994 de Mihanî, 2005 de Mela Muhemedê Kavarî, 2008 de W. K. Merdimînî û Roşan Lezgînî zî 2009 de transkirîbe kerdo û keyepelê *Zazaki.Net* de weşanayo.<sup>5</sup>

Mewlidê Xasî yo ke hetê Mihanî ra transkrîbe bîyo, 1994 de hetê weşanxaneyê Firatî ra weşanîyayo. No kitab 54 rîpelî yo. Vernîya kitabî de Mihanî, vateyo verên de derheqê Ehmedê Xasî û Mewlidê Kirdî de bi kilmeyî tay malûmatan dano û tira pey Mewlid dest pêkeno.

Mewlidê Kirdî, bi wezn nusîyayo. Peymeyê eyê arûzê 11 (yewendes) hece yê. Qismo verêna pîya 16 (şiyês) qismî û pêro pêsero 365 beytî yê. Qafîyeyê Mewlidê Xasî, sey qafîyeyê mesnewî; aa, bb, cc, ... yo.

Sernameyê qismê verênî, "Mewlidun-Nebîyyî-l Qureyşîyyî Selewatullahî 'Eleyhî Fî Bukreten We-l 'Eşîyyî" yo û bi "Bismîllahîrrehmanîrrehîm" dest pêkeno, vano:

*Ez bi bîsmîllahî îbtîda kena.  
Razîqê 'aman û xasan pîya kena.  
Rebbî, hemd û şukrî ancax to rê bê.  
Kîbr û medh û fexrî pêro to rê bê.*

Û peynîya her qismî sey neqeratî bi na beyte qedîyena:

*Wazenê ger ma xelasîyya tamam.  
Vatişê ma, es-selatu wes-selam.*

3 Roşan Lezgîn, "Mewlidê Kirdî", *Zazaki.Net*, 05 Tebaxe 2009, <http://www.zazaki.net/haber/mewlid-neb-y-ehmed-xas-57.htm>

4 çc.

5 çc.

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ

بِنَافِی بَزْدَانِی بَاک نِی دِلُوْفَان و سِرْبَان

بِنَامِه هوما از دو کنا ابتدا

خالقی فی آرد و آزمین یاد کنا

بیو غنیو گنایی ما و فیردو

گنہیکاری کی عمری خود کردو

صلاواتی یوانن رند و بولی

براسین پیدی مائی رسولی

\*\*\*

زَوُ حِکَايَتِ قَالِ كِرَانِ تَوْرِی بَرَا

فَدْرِی مَوْلُودِی بَزَانِ تِ جَرَا

سو کا بغدادی میاندی بی جینین

زیدی جی نیدی بی کس ارباب دین

(1) فَدْرِی مَوْلُودِی بَزَانِی سَوَقْرَا

۲۰

### 2. Usman Efendîyo Babij û Biyîşa Pêxamberî

Usman Efendîyo Babij, serra 1853 de Sêwregi de ameyo dinya. Nameyê dewa înan Bab o, coka tira vanê Babij. Pîyê ey Hecî Eyub Efendî, Silêmanîye de qadîyîye kerda. Usman Efendî o wext Bexdad de unîversîte waneno, qedînenno û ageyreno bi Sêwregi. Demeyêk Sêwregi de maneno dima şino bi Misir. Weyra zî Unîversîteya Ezherî de waneno, qedînenno û reyna ageyreno bi Sêwregi. Sêwregi de muftîyîye, azayîya Neclîsê Pêroyî yê Şaristanî û mehkemaya Sêwregi de azayîye kerda. Seba ke şarê Sêwregi tirkî û 'erebkî nêzano tira vanê ma rê dimilî/zazakî w'ez û nesîhet bikere û mewlid biwane. No rid ra Usman Efendî dest keno pê w'ez û nesîhetanê xo zazakî keno û serra 1903 de zî namebê Biyîşa Pêxamberî mewlidêk nuseno û mîyanê şarî de waneno.<sup>6</sup>

6 Celadet Bedirxan, Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendî, *Hêvî*, Kovara Çandîya Giştî, Hejmar 2, Parîs Gulan 1984,

No mewlid 1906 de erşawîyayo Dîyarbekîr ke çap bibo, la Diyarbekir de kes nêşkayo biwano. Meşrûtiyet (1908) ra pey qeymeqamê qezaya Piturge yê Meletî Faîz Begê Bedirxanî (datîzayê Celadet Alî Bedirxanî yo), no mewlid berdo Îstanbul ke çap bikero la çî heyf ke weyra zî çew nêşkayo biwano. Dima no mewlid hawayêk dekeweno destê Celadet Alî Bedirxanî, Celadet di nusxeyanê nê mewlidî têver nano û nê mewlidî newe ra nuseno. Birayê Şêx Seîdê rehmetî Şêx Evdîrehîmî zî nawnenno û serra 1933 de Şam de çap keno.<sup>7</sup>

Mewlidê Usman Efendî bi wezin nusîyayo, peymeyê qafîyeyê ey 11 (yewendes) hece yê. Qafîye aa, bb, cc, ..., yo. Çend beytî mewlidî ra:

*Bi namê Homa ez do kena îbtida  
aliqê nê erd û azmîn yad kena  
Bibo 'efyû gunayê ma w' vêrdo  
Gunehkarey kî 'emrê xo di kerdo  
Selawatî biwanin rind û bolî  
Birasnên peydê ma ê resûlî*

### 3. Şêx Selaheddîn Firat û Beyatname


Şêx Selaheddîn (1910-1978), lacê Şêx Seîdê Palî yo. 1925 de serewedartişê Şêx Seîdî ra pey, Şêx Seîd ke hetê Komara Tirkîya ra dar de beno, Şêx Selaheddîn birayê xo yo pîl Şêx Elîrizayî reyde Tirkîya ra vejîno şono Kurdîstanê Rojhelatî (Îran). Weyra tay hedîseyan ra dîma şono Îraq û çend serrî weyra de maneno. Wexto ke Îraq de maneno Bexdad de akademîya eskerî de waneno, perwerdeyê eskerî vînenno. Wexto ke Tirkîya de ef vecîno, 1929 de agêreno welat. (Malmîsanij, 2002:4)

**Beyatname**, mewlidê Ehmedê Xasî û 'Usman Efendiyê Babijî dima kitabo hîrêyin o ke zazakî neşr bîyo. Weşananê zazakî mîyan de belgeyêko tarîxî yo. Kitabo verên o ke zazakî de bi nesir nusîyayo. **Beyatname** kitabêko werdî yo û sey biroşurêk vejîyayo. Hewt rîpelî yo û rîpelê ey henda çarîgê qaxidê A-4î yê. Sey kitabê tunikî yo. Rîpelê qepaxî ser o "**Beyatname Suretî**" nusîyayo.<sup>8</sup>

r. 77-85

7 Celadet Alî Bedirxan, "Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendî", Vate, Kovara Kulturî, Numre 29, İstanbul, Payîz 2007, r. 112-117.

8 Malmîsanij, "Şêx Selaheddîn Şêx Seîdî û Beyatname", Vate, Kovara Kulturî, Numre 16, Stockholm, Zimistan 2002, r. 8-9.



Beyatname nimitkî weşanîyayo, aye ra nameyê nuştoxî, weşanxaneyî, çapxaneyî, ca û tarîxê çapbîyayîşî kitab de çin ê.<sup>9</sup>

Seba ke no broşur bi alfabeya tirkî ya latinkî nusîyayo û alfabeya tirkî de zî herfê **Ê, Q, W** û **X** çin î, wendiş û fehmkerdîşê ey tikê zehmet o. Labelê seba ke hîna rehet biwanîyo û fam bibo, Malmîsanijî no broşur bi alfabeya Kurdî ya latînkî newe ra nuşto û 2002 de kovara Vateyî hûmara 16. de weşanayo.<sup>10</sup>

Şêx Selaheddîn Firat, şêxê terîqetê neqşîbendî yo. Serranê hewtayan de mintiqayanê zazayan de geyreno û zazayan îrşad keno. No broşur zî ê serran de semedê mirîdanê nê terîqetî nuşto.<sup>11</sup>

Sey heme metnê dînîyan, o zî bi Bismîllah, hemdê Homay û selat û selam ardişî pêxemberî, al û sehabîyanî ey ser o, dest pê keno. Dima şertanê îslamî ra "kelîmeya şehadetî", "nimaj", "zekat", "roje" û "hac" yew bi yew vano û îzeh keno. Bawerîya Homayî, emr û nehyê Homayî û bawerîya Hz. Muhamedî (asw) û wehya ke ci rê ameya û pê emelkerdişî ser o vindeno.

Paragrafêk de wina vano: "Kam bi sidq û rastî û bîmenfe'etê dinya, bi panc ruknê îslamîyetî emel

9 çc.

10 çc.

11 çc.

bikero û bi xîlafê vatişê Homayî û Resûlê Ekrem îta ve pê 'emel nêkero, beno ehlê sa'edet şino cennet. Kam zî xeyrê Homayê Te'ela (c.c) rê îbadet û îte'et bikero û dişminanê înan ra hez bikero şino cehnemî.<sup>12</sup>

Nesîhet û teblîxan dima wîrdê mirîdan dano.

25 yan 100 Îstîxfar,

25 yan 100 Selawatê Şerîf,

11 Sûreya Îxlasî,

3 Sûreya Feleq,

3 Sûreya Nas,

7 Sûreya Fatîha,

300 Allah,

100 Kelîmeya Tewhîd (Laîlahe îllallah).<sup>13</sup>

Sey lîsteyêk kitabî de ameyê dayene.

Rîpelo peyên de "ettehiyat" a mezhebê şafîyan nusîyaya û nimaj de rûniştîşo verên de heta kamca wanîyena, rûniştîşo peyênî de çi îlawe beno û sewbîna çi wanîyeno nusîyayo.


Xusûsiyeto tewr muhîm, yê nê metnê o yo ke, reya verên a ke yew metno zazakî bi herfanê latînkî û destê şêxêk ra ameyo nuştene û bi nezm nênusîyayo, nuştêyêko nesr o.

#### 4. Mela Mehmed Elî Hunî û Mewlid, Yusûf û Zelîxa, Qesîdeyê Kerbela

Mela Mehmed Elî Hunî, serra 1930 de nahîyeya Hun (Beyhan) de ke qezaya Pali yê Xarpêtî ra girêdaye ya, ameyo dinya. Nameyê ey ê resmî Mehmet Ali Öztürk o. Melayê Hunî, medreseyanê Kurdistanî de wendo û 25 serrî Hun de melayîya fexrî kerda.<sup>14</sup>

Kitabê Mela Mehmed Elî, "Mewlid, Yusûf û Zelîxa, Qesîdeya Kerbela", İstanbul de hetê Weşanxaneyê Vateyî ra 2004 de weşanîyayo. No kitab 119 rîpelî yo.

Kitab bi meqaleya M. Selîm Uzunî ke sernameyê aye "Mela Mehmed Elî Hunî û Edebîyato Kirdkî (Zazakî)" yo, dest pêkeno. Na meqaleya derge de M. Selîm Uzun, derheqê Mela Mehmed Elîyê Hunî, huner û eseranê ey de malumatan dano. Na meqale



ra pey roportajêk ke sernameyê ey "Zûnî Ma Weş o Feqet Maalesef Alimû Heta Inkê Îhmal Kerdo" yo, esto. W. K. Merdimîn û N. Celalî no roportaj, 16.10.2003 de, Çewlîg de Mela Hunî reyde kerdo û 2004 de kovara Vateyî, numre 22., rîpelanê 34-55 de weşanayo.

Kitab, meqale û roportajî ra pey Mewlidê Peyxemberî dir devam keno. Melayî no mewlid, 23 serrî de peyderpey bi herfanê erebkî nušto û serra 1971 de tamam kerdo. (Hunî, 2004: 23) No mewlid panc qismî û pêro pêsero 261 beytî yo. Qismê "Mewlidê Peyxemberî" de peynîya her panc qisman de panc beytê selat û selamî zî bihesibiyê, pêsero 266 beytî yê.

Mewlid, sey heme eseranê Melayê Hunî menzûm o û bi wezin ameyo nuştene. Peymeyê arûzî 8+8=16 hece yê. Mewlidê Melayê Hunî, hetê W. K. Merdimînî ra herfanê erebkî ra tadîyayo herfanê latînkî.

Seke ma cor de zî va, mewlidê Melayê Hunî, panc qisman ra pê ameyo. Sernameyê qismê verênî, "Qicey Peyxemberî" yo û 19 beytan ra pê ameyo. Nê qismî de behsê qicîya pêxemberî beno û wîna dest pêkeno:

*Vernî d' vac namey Homayî, Muhemmed lac pî û mayî / Gerguş bişan ayî ayî, wi yewekê pî û mayî.*

Kitab de mewlid ra pey, hîkayeya Hz. Yusûf (as) pêxemberî ke Quran de sûreya Yusûfî de vîyarta dest

12 Şêx Selaheddîn Firat, Beyatname Sureti, r. 3.

13 çc., r. 7.

14 Mela Mehmed Elî Hunî, Mewlid, Yusûf û Zelîxa, Qesîdeyê Kerbela, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2004, r.3

pêkena. Na hîkaye zî menzûm a; bi wezn nusîyaya. Peymeyê weznê na hîkaye zî sey mewlidî  $8+8=16$  o û pêro pêsero 154 beytî yê. Gerçî, mela beyta çarine, misraya diyine de vano:

*Homay vaw "ehsenu'l-qeses", rindey heketû bik hewes / Beytî ma se w' pancas di bes, hey veyn Yûsufî Ken'anî.*

Tîya de goreyê na misra ganî 152 (se û pancas û di) beytî bibînê, la kitab de ma ewnîyenê ke 154 (se û pancas û çar) beytî yê. Goreyê malûmatê ke M. Selîm Uzun dano, di beytê peyênî destnuştêyê Melayî de çin î, la banta ke şîranê xo tede waneno a bante de nê di beytî estî. Coka kitab de nê di beytî zî îlawe bîyî.

Heketey "Yusûf û Zelîxa" zî bi "Bîsmîllah" dest pêkena. Beyta verên wina ya:

*"Bîsmîllah" vac ak Qur'anî, akir sûrey Yûsuf banî / Heketey Yûsuf biwanî, hey veyn Yûsufî Ken'anî.*

Dima wina dewam keno, vano:

*Mi heketey Yûsuf cawut, pey nezma zazakî vawut / Şima birarû rî şawut, hey veyn Yûsufî Ken'anî.*

Kitab de "Heketey Yusuf û Zelîxa" ra pey "Weqayê Kerbela" dest pêkena. Weqayê Kerbela hîrê qesîde yê. Nînan ra sernameyê a yewine "Weq'ey Kerbelay Hesen, Huseyn", a diyine "Weq'ey Kerbelay Hezret Hesen" û ya hîrêyine zî "Weq'ey Kerbelay Hezret Huseyn"î yê. Her di qesîdeyê diyinî 20, ya hîrêyine zî 30 beytî ya. Heme hîrê qesîdeyî zî sey nuştêyanê Melayê Hunî yê bînan, bi nezm nusîyayî û peymeyê arûzê înan zî reyna  $8+8=16$  heceyin o. Melayê Hunî nê qesîdeyî 1971 de bi herfanê erebkî nuştî. (Uzun, 2004, 80) Transkîrbkerdoxê nê qesîdeyan zî M. Selîm Uzun o. Ma qesîde ra çend beytan numûne bidî:


*Pey namey Homay biwan veyn, Homay vaw "ihdel-husneyeyn", (18) / Yew pey axû yew zî pey guyn, dunya ra şî Hesen, Huseyn.*

*Hesen, Huseyn 'eyîl şêr î, 'eyelanî yî ra vêr î / Wir dî tornî Peyxemberî, dunya ra şî Hesen, Huseyn.*

*Sukey Peyxember Medîna, wir dî tede amey dunya / Wir dî qey dîn îr bî feda, dunya ra şî Hesen, Huseyn. (Hunî, 2004: 74)*

Seke aseno, Melayê Hunî eseranê xo de, hedîseyan wina weş û wecîzane ano ziwan ke, kê vanî qey kê ha mîyan hedîseyî de yê û tede ciwiyenî.

Nê hîrê qesîdeyan ra pey, rîpelê 84 ra heta rîpelê 119î fotokopîyê destnuştêyê nê kitabî zî esto.



### 5.Mela Muhammedê Hezanî, 'Eğidetul İmanî

No kitab bi herfanê erebkî nusîyayo. Malmîsanij û Roşan Lezgînî no kitab herfanê erebkî ra tadayo herfanê latînkî û 2002 de kovara Vateyî, numre 17 de weşanayo.<sup>15</sup>

Mela, tarîxê nuştîşê nê kitabî beyta peyêne de goreyê hesabê ebcedî wina nuseno:

*Tarîxê hîcrî bi qey nezme, bizan*

*Xeyn" û "ta", "bê" pê bimare, ey cuwan.*

Hesabê ebcedî de nê herfan ra "xeyn" vera 1000î, "ta" vera 400 û herfa "bê" zî vara 2 ya. Nê heme hîrê herfê pêsero kenê 1402, yanî  $1000+400+2=1402$ . Naye ra fam beno ke no kitab serra 1402 hîcrî (1981 mîladî) de nusîyayo.<sup>16</sup>


'Eğidetul İmanî, 143 beytî yê. Bi wezin nusîyayê û peymeyê arûzî 11 hece yê.

'Eğidetul İmanî, bi bîsmîllahî, hemdê Homay û pêxemberê misulmanan Hz. Muhemedî rê selat û selamî reyde dest pêkena. Dima yew bi yew panc ruknê îslamî bi wezin vajîyenê. Mesela Mela, Kelîmeya Şehadetî wina ano ziwan:

15 Malmîsanij & Roşan Lezgîn, Vate, Kovara Kulturî, Numre 17, Stockholm 2002, r. 28.

16 çc. r. 41.





*'Ewwilê îslamî de Eşhed bîya  
Pê ziwan vace, qebul ke bê rîya  
Me'na yey: "Eşhed ana, aw yew tenê  
Me'bûdêk qet çinêk o, we w' tenê  
Hem Muhemmed qasid o, qey emrê yê"  
Qelb de bawer ke, tamam ke heqqê yê*

### 6. Mela Kamilê Puexî, Mewlidê Nebî

Mela Kamilê Puexî, Çewlîg ra yo. Puex, nameyê yew mintiqa û eşîre yo.<sup>17</sup>

Mela Kamilî *Mewlidê Nebî*, bi teqwîmê mîladî serra 1999 de bi herfanê erebkî nuşto.<sup>18</sup> W. K. Merdimînî transkîrîbe kerdo, yanî tadayo herfanê latînkî û 2003 de kovara Vateyî, numre 19 de weşanîyayo.

**Mewlidê Nebî** yê Mela Kamilî zî sey mewlidanê bînan bi wezin nusîyayo. Peymeyê arûzî yewendes heceyin o. Şeş qisim û 104 (se û çar) beytan ra pê ameyo.

Peynîya qismê yewinî de beyta peyêne wina ya:

*'Eşq û can ra şima bîyarîn selewat  
Muhammêd ser, al û eshabûn yi pîya  
Peynîya qismê diyînî de:  
'Eşq û can ra vacîn şima selewat  
Muhammêd ser, al û eshabûn yi pîya*

Û peynîya qismê bînan de zî beytê ke peynîya her qismî de sey neqeratî tekrar benî wina yê:

*Eg şima wazên cennet yedî şima b'  
Muhammêd r' selewat bîyarîn dewam.*

### 7. Mela Mehemedê Muradan, Mewlidê Zazakî

Mela Mehemedê Muradan, 1952 de qezayê Çewlîgî ra Dara Hênî, nahîyeya Valêre, dewa Muradan de ameyo dinya.

Mela Mehemed, dersa xo ya verêne pîyê xo Mela Sebrî û dewa xo de Mela Yusuf Kulakî het gêno. Dima medreseyanê Kurdistanî yê klasîkan de gêreno û îlmê xo yê medreseyî tamam keno. Îcazetê xo Mûş de Mela Abdulahî ra gêno. Tira pey 06 Sibate 1976 de wezîfeyo resmî gêno, dest bi melayîye keno.

Mewlido ke Mela Mehemedê Muradan nuşto, 2002 de çap beno la nê çapî de zaf xeletî estê. Çunke nusxeyo ke Mela Mehemed teshîh kerdo o nusxe nê, nusxeyo ke teshîh nêbîyo bi xeletî o nusxe çap biyo. La W. K. Merdimîn û N. Celalî nê mewlidî transkîrîbe kenê, şonî Melayê het, mewlidî danê ey wendiş û bant de qeyd kenê. Dima mewlido ke 2002 de weşanîyayo û o ke înan transkîrîbe kerdo têver nanê û halê peyênî Mela Mehemedî rê wanenê pîya rast kenê û newe ra 2003 de kovara Vateyî, numre 21 de weşanenî.<sup>19</sup>

Mewlidê Mela Mehemedê Muradan de zî qisimo verên bi nameyê Homayî dest pêkeno û wesf û medhê Homa û pêxemberî beno. No qisim 17 beytî yo. Beytê verênî wina yî:

*Allah, nûmê xaliqî mawo 'elîm  
Hem 'ezîm û hem kerîm û hem rehîm.  
Ma pê yi dest kerdî mewlidî nebî  
Ay hebîbî, ay tebibî, ay ummî.*

### 9. Mela Cimayo Babij, Sîyerê Nebî


Mela Cimayo Babij (Cuma Özusan), 1946 de Sêwregî de ameyo dinya. Eşîra Babijan ra, Keyê Osan ra yo. Mektebo sifteyin û mîyanên Sêwregî de wendo. Dima İstanbul de Kolêja Tenduristî ya

17 W. K. Merdimîn, "Mela Kamilê Puexî ra Şîrî", Vate, Kovara Kulturî, Numre 17, İstanbul 2003, r. 69-70

18 Mela Kamilê Puexî, *Mewlidê Nebî*, Vate, Kovara Kulturî, Numre 19, İstanbul 2003, r. 82

19 Mela Mehemedê Muradan, "Ez Ina Zê Yew Mûsîbetêk Vîna", Vate, Kovara Kulturî, Numre 21, İstanbul 2003, r. 4-17

- Murat Çanşad, "Mewlidê Kirmancî", Zazakî.Net, 26 Sibate 2011, <http://www.zazaki.net/yazi/mewlid-kirmanck-136.htm>



Heydarpasha'yî de weneno. Teber ra zî Mektebê Îmam-Xetîbî ra mezûn bîyo û dest bi îmamîye kerdo. Hîlwan û Sêwregî de çar serrî û nê îmamîye ra pey ageyreno memûrîya tenduristîye. Teber ra Unîversîteya Anadolî de lîsanso verên zî qedînayoy.

Sîyerê Nebî, 2009 de hetê weşanxaneyê Nûbiharî ra weşaniyayo.

Kitab 104 rîpelî yo û bi nezm nusîyayo. Peymeyê ey 7+7=14 heceyin û qafîye zî aa, bb, cc, dd, ..., yo. Qismê destpêk û qismê peynî ya pêro pîya 23 qismî û 886 beytî yê. Bi alfebeya latînkî ya Kurdkî nusîyayo.

Qismê "Destpêk"î de nameyê Ellah û hemd û sena ra pey behsê çeçekîya Hz. Muhamedî (asw) û cuyê eyê verê pêxemberîye beno. No qisim 26 beytî yo. Çend beytê verênî wina yê:

Bi namedê Ellahî, mi giroto dest qelemî.

Verî çinê bi çîyên, îcad kerd nê alemî.

Ez şew' û roj Ellay rê, hemdî nêkena kemî.

Zeydê yaxerî varna, ma ser rehm û keremî.

Ereban mîyan ra vicya, jewêndo gird, hem nebî.

Eslê ci pak o, rind o, ney vatê, gird û werdî.

Qismê diyin de behsê halê Mekkeyijan ke îslamîyet ra ver tede bîyê û wehya ke Homa Hz. Muhamedî (asw) rê eşkefte de erşaweno beno.


Seke nameyê kitabî ra zî fehm beno Mela Cima nê kitabî de, her qisim de sere ra heta peynî cuyê Hz. Muhamedî (asw), beyte bi beyte, hawayêk wecîzane nuseno.

Qismê peyên ke sernameyê xo "Peynî" yo, no qisim zî heşt beytî yo. Mela Cima beyta peyên ya nê qismî de tarîxê nuştîşê nê nuştîyê xo nîşan dano, vano:

Ma temam kerd kitabî, newê mengda adarî.

Na serr' dima serr' bena, resena di hezarî.

Na beyte ra fehm beno ke Mela Cima'yî no kitab, 09 adar 1999 de temem kerdo.✎



# Çîrvanokên Kurdî û pirtûka M. Xalid Sadînî

LOKMAN POLAT

**D**i nav hinek rewşenbîr û nivîskarên Kurd de halê ruhiyeta xwebiçûkbûnê heye. Ev ruhiyet ji bindestiyê, perwerdeya dagirkeriyê û hwd, ji gelek sedemên cuda pêk tê. Ew xwe, gelê xwe û hemû dewlemendiyên çand, ziman, edebiyat, dîrok û hemû cureyên folklorîk yên gelêrî û wêjeya nûjen ya Kurdî biçûk dibînin, naecibînin, kêmasî û şaşiyên wê mezin dikin. Edebiyata Kurdî didin ber a cîhanê û navbera wan de muqayese dikin û dibêjin berhemên Kurdî qels in. Li gorê wan romana Kurdî tune, çîroka Kurdî qels e û helbesta Kurdî ji tiştê re nabe. Lê rastî ne wek wan e, berevajê wan e.

Dema ez berhemên edebî yên Kurdî dixwînim û dinirxînim, ez wan kême yên xelkê nabînim. Di nav edebiyata Kurdî de gelek berhemên serkeftî hene ku qet jî ne kême berhemên zimanê Tirkî, Erebî, Farisî û berhemên zimanê Ewropî û Amerîkîyan in.

Dema min pirtûka fablan ya birêz M. Xalid Sadînî xwend, min ew bi hemû cure şeweyan ve kême pirtûkên fablên zimanên din nedît, heta ji yên Tirkî gelek

serkeftîtir dît. Edebiyata Kurdî a devkî gelek dewlemend e û gelek lêkolîner û berhevkarên çîrok û fablên gelêrî yên Ewropî ew ji nav Kurdan kom kirine, civandine û di pirtûkan de weşandine. Binêrin çend çîrvanokên ku dapîra min ji min re gotibû û min naveroka wan zanibû, min di nav pirtûkên Anderson û birayên Grimm de dît. Dapîra min xwendina wê tunebû û qet navên Anderson û Grimm jî nebihîstibû, lêbelê çîrvanokên ku wê qal dikir û Anderson û Grimm qal dikir heman tişt bûn.

Gelek çîrok û çîrvanokên Kurdî yên folklorîk hene ku bi çend varyantên cuda têne ravekirin. Her wekî çîroka Siyabend û Xecê, Evdalê Zeynikê, Gul û Sînem û hwd. Lê çîrok û çîrvanokên ku di pirtûkên Anderson û Grimm de hene eynê wekî yên ku di edebiyata Kurdî a devkî de têne gotin in. Yanê varyantên cuda nînin û heman tişt in. Ev jî dide xuyakirin ku wan van çîrok û çîrvanokan ji ber edebiyata Kurdî a devkî wergirtine, berhev kirine.

Gelek neteweyên cîhanê edebiyata xwe ya nûjen li ser bingeha wêjeya xwe ya klasîk ava kirine

---

Lêkolînan û nivîskar  
M. Xalid Sadînî  
Kurdperwerekî ji herêma  
Hekariyê ye. Ev bîst sal  
in ku ew di kar û xebata  
Kurdewariyê de dixebite  
û diafirîne. Her weha ew  
nivîskar û berhemkarekî  
jîr e û afrîner e. Heta niha  
heşt pirtûkên wî  
çap bûne...

---



Çend bergên kitêbên Xalid Sadîni ên din.

û pêşve birine. Edebiyata Kurdî a klasîk û bi taybetî jî edebiyata Kurdî a devkî pir dewlemend e û ji bo wêjeya Kurdî bingeh e. Naverokên çîrvanokên Kurdî û her weha çîrvanokên ku di pirtûka M. Xalid Sadîni de hene balkêş in, tê de gelek tişt hene. Her wekî mîrxasî, mêvandarî, şîret, evîn, mirovahî, piştgirî, alîkarî, başî, xirabî, pirs û pirsgirêkên malbat, tîkiliyên cîrantî, xeyal, fantazî û bi gelek tiştên din hatine hunandin û bi şeweya fablê, bi hunereke edebî wek çîrvanokên wêjeyî hatine ravekirin.

Naveroka gelek çîrok û çîrvanokên Kurdî li ser civakê bandoreke baş pêk tînin û tesîreke pozîtîf li ser mirov dikin. Têgihîştina folklorîk ji bo mirov dibe wekî deryaya zanîne û tecrûbeyê. Mirov bi vê tecrûbe û zanîne têdigîje, dikemile. Wekî ku kedkarê berhevkerina çîrok û çîrvanokên folklorîk birêz Zeynelabîdîn Zinar jî dibêje "...Dema ku mirov bi têgihîştina folklorîk xwe rewşen dibe, mirov girêdana reha xwe ya nijadî, saxlem dibîne. Mirov êdî xwe bi bav û kalên xwe serbilind dike. Tiştê

herî girîng ev e ku mirov êdî xwe ji kirina xirabiyan dide paş. Her weha baweriya mirov pir zêde bi mirov çêdibe. Mirov pir dixwaze ku şexsiyeteke rind bigire. Mirov dixwaze ku di her karê xwe de serkeftî bibe. Mirov hertim xwe berpirsiyar dibîne ku destên alîkariyê dirêjî belengazan bike. Û bi dehan xesiyetên baş ên wisa... Ji ber van girîngiyên ku hatin gotin, îro pêdiviya Kurdan pir heye ku berhemên folklorîk xwe bixwînin û bi zarokên xwe bidin xwendin. Xasma jî, dê û bavên Kurd, zarokên xwe bi çîrokên Folklorîk Kurdî mezînin bikin. Ji wan re çîrokên rawilan bibêjin, meselokan bibêjin, pêkenokan bibêjin, serpêhatiyên bibêjin, heyranok û payîzokan bibêjin, şîret û nesîhetên bav û kalan bibêjin, şîroveya Gotinên Pêşîyan bibêjin, klasîkên Kurdî bi wan bidin naskirin, herweha sirûsta Kurdistanê jî bi wan bidin naskirin."

Şaristanî, medeniyet, hilbirînên aborî, îcadên hesînî, bi tevahî li Mezopotamyayê dest pê kirine. Bingeha dîroka qedîm û ravekirina çîrok û çîrvanokên

folklorîk di heman herêmê de pêk hatiye. Kelepore Kurdî, çand, ziman û edebiyata Kurdî li ser vê kokê vê bingehê şax daye, geş bûye, pêş ketiye. Çawa ku çîrvanokên, fablên gelên cîhanê hene û ew bi şeweyeke nivîskî hatine ravekirin, her weha çîrvanokên, fablên Kurdî jî êdî bi nivîskî tene ravekirin. Çîrvanok û fablên folklorîk yê gelê Kurd wekî fablên Ezop û La Fontaine bi nirx in, bi qîmet in.

Piştî van çend gotinên gelemperî, ez dixwazim bi kurta hî behsa xebata nivîskariya birêz M. Xalid Sadîni bikim û berhemên wî ya hêja "Çîrokên Gelêrî" bidime danasîne û li gor zanîna xwe binirxînim.

Lêkolînan û nivîskar M. Xalid Sadîni Kurdperwerekî jî herêma Hekariyê ye. Ev bîst sal in ku ew di kar û xebata Kurdewariyê de dixebite û diafirîne. Her weha ew nivîskar û berhemkarekî jîr e û afrîner e. Heta niha heşt pirtûkên wî çap bûne û gelek xebatên wî yê hêja hene ku ew dê di pêşerojê de werine çapkirin. Ew li zindanan deh salan razayê û wî ji xwe re he-

pisxane kiriye wek zankoyê, ango hepîsxane jê re bûye Unîversîte. Niha ew li welatê xwe, li bajarê Hekariyê kar û xebata xwe ya wêjeyî didomîne.

Di hêla berhevkirina çîrvanok û çîrokên gelêrî yê folklorîk de du navên hêja hene, yek jê M. Emîn Bozarslan û yê din Zeynelabîdîn Zinar in. M. Xalîd Sadînî jî bû yê sêyem. Kar û xebatên van hersê hêjayan ji bo edebiyata Kurdî dewlemendiyeke giranbiha ye, bêpayan e.

Pirtûka M. Xalid Sadînî ya bi navê "Çîrokên Gelêrî" di nav weşanên "Nûbihar"ê de derketiye. Pirtûk 111 rûpel e. Di pirtûkê de 44 çîrvanok, fabl hene. Edîtorê pirtûkê birêz Suleyman Çevîk e. Redaksiyon û pêdaçûna wê Mihemed Jiyan raçav kiriye. Berga wê ÎHB Reklam Ajansiyê amade kiriye. Rûpelsaziya pirtûkê jî birêz Dawûd Rêbiwar kiriye.

Wek ku birêz M. Xalid Sadînî jî di pêşgotinê de gotiye, ji vê cure çîrokan re ango çîrokên ku wek fabl in re çîrvanok, meselok, metelok, serborî dibêjin. Lê, bi min mirov tenê çîrvanok bibêje bes e. Xwezî navê pirtûkê "Çîrvanokên Gelêrî" bûya yan jî "Çîrvanokên Kurdî" bûya.

Wekî min got di pirtûka birêz M. Xalid Sadînî de çilûçar çîrvanok hene. Ez behsa naveroka hemû çîrvanokan nekim, tenê ji bo bala xwendevanan bikşînim ser pirtûkê, ez behsa naveroka çend çîrvanokan bikim. Ez ji xwendevanên Kurd daxwaz dikim ku ew pirtûkê bikin û tevahiya çîrvanokên ku di pirtûkê de ne bixwînin.

Di pirtûka birêz M. Xalid Sadînî de gelek çîrvanokên/fablên baş û xweş hene. Çîrvanoka ye-

---

**Wek ku birêz M. Xalid Sadînî jî di pêşgotinê de gotiye, ji vê cure çîrokan re ango çîrokên ku wek fabl in re çîrvanok, meselok, metelok, serborî dibêjin. Lê, bi min mirov tenê çîrvanok bibêje bes e. Xwezî navê pirtûkê "Çîrvanokên Gelêrî" bûya**

---

kem sernavê wê "Riya Azadî" ye û tê de mijareke gelek girîng ku Kurdan eleqedar dike heye. Di vê çîrvanokê de zilma zordar û li hemberê zilmê şer û têkoşîna mezlûman heye. Şerê fîl û çûkan wekî şerê serdest û bindestan, şer û têkoşîna gelên bindest û dewletên dagirker e. Fîl sembola dagirkeriyê, zilmê û tehdarî ye, berxwedana çûkan remza gel û neteweyên bindest e. Ji bo têkoşîneke hevpar, ji bo serkeftinê wekî ku di çîrvanokê de jî tê zanîn, pêşî yekîtiyê û yekgirtina çûkan – ango yekîtiya xelkê mezlûm – pêwîst e. Dema yekîtiyê pêk were ew dikarin li hemberê dagirkeriyê, zilmê bi serkevin. Çûk li hemberê zilma fîlê yekîtiya xwe pêk tînin û hemû bi hev re têdikoşin û fîl têk dibin. Piştî têkçûna fîl û serkeftina çûkan êdî ew azad dibin û bi hev re stranên azadiyê û şadiyê dibêjin û serkeftinê pîroz dikin.

Di çîrvanoka sernavê "Dostaniya Rovî û Eylo/Qertel" de dostaniya rast û ya sexte, bêbextî û tolhildan tê ravekirin. Di piraniya çîrvanokan de rovî heye û her weha di gelek çîrvanokan de lehengê sereke rovî ye. Rovî bi fen û fût e, fêlbaz e, qurnaz

e, canbaz e û bîaqil e. Ew bi hiş û eqilê xwe, bi fen û futên xwe, bi plan û leyistikên xwe yê li hemberê xwe têk dibe. Piling û şêrên bi azamet jî li pêşberê fen û oynên rovî têk diçin. Rovî çiqas ku fêlbaz e, hirç jî ewqas bêeqil e û tim rovî zora wî/wê dibe, wî/wê têk dibe.

Di pirtûkê de çîrvanokên rovî, hirç, şêr, kivroş, beq, mişk, kosî, bizin, dîk, gur, dûpişk, hêştir, qurbeş, werdek, mirîşk, ga, seg, pisîk, mar, legleg û piling hene. Çîrok û çîrvanokên mamê rovî xweş in. Ew hemû heywanan bi fêlbaziya xwe têk dibe û ew dibe axayê malan û bi gundiyan re sohbet dike. Niha ezê ji xwendevanên ezîz re behsa sohbeta rovî û gundiyan bikim, çawa rovî bûye axayê malan rave bikim û dawî li nivîsa xwe bînim.

Rovî û gur dibine hevalên hev û li kar digerin. Ew di ber gundek de derbas dibin û dibînin ku waye hinek gundî li rexê gund civiyane û ji xwe re sohbet dikin. Ew diçine cem gundiyan û silav didine wan. Gundî dibêjin; "Mamê rovî hûn ji ku ve tînin û ku ve diçin?"

Mamê rovî bersîva wan dide û dibêje em li kar digerin. Gundî dibêjin; mirîşkên me û pezên me bêşivan in. Kêfa rovî tê ku behsa şivantiya mirîşkan hatiye kirin, lê ew fêlbazî dike û dibêje "Şivanî karê me nîn e." Gundî jî li ser vê gotinê êdî behsa şivantiyê nakin, lê rovî bi fêlbaziyê mijara sohbetê tîne ser mesela şivantiyê û ji gundiyan re dibêje; "Xwedê, ez ji bo nobedariya mirîşkan û gur jî ji bo şivaniya pezan çêkiriye."

Di çîrvanoka sernavê "Rovî Axayê Malan e" de jî, serpehatiya roviyek tê ravekirin. Roviyeke li

çolistanê pir birçî bûye. Ew ji xwe re li nêçîrê digere. Rovî vir de, wê de çûye û dawî çûye ser bîreke zuhabûyî. Rovî di binê bîrê de tişteke spî dîtîye. Ew çûye binê bîrê û dîtîye ku ew tiştê spî kevirekî girover e.

Rovî xwestîye ji binê bîrê derkeve jor, lê nikaribûye. Ew li binê bîrê rûniştîye. Rovî li binê bîrê mar û kosiyeke dibîne. Ji wan pirsîye ku ew li vir çi dikin? Kosî gotîye “Ax Mamê rovî em jî wekî te ji ber nefsa xwe ketine vir û êdî nikarin derkevin.”

Ji jorê bîrê dengê hatiye. Her sêyan xwe dane koşekê û xwe berşêdane. Wawikek xwe ji jor ve avêtiye xwarê. Wawik jî bi kevira spî xapîyaye û loma xwe avêtiye xwarê. Paşê kurek hatiye û xwe avêtiye xwarê. Piştî gur berazek hatiye û xwe avêtiye xwarê. Paşê hirç, hemû birçî li binê bîrê ne û nikarin derkevin. Ji bo çareserîya birçîbûnê, rovî gotîye ezê heyranokek bixwînim navê kî derket emê wî bixwin.

Heyranoka rovî çawa ye, kîjan heywanan bi dorê dikujin û dixwin, ezê nebêjim, lê ez vê bibêjim heyranoka roviyê wek stranên bi kafiye gelek bi huner e û xweş e. Çîrvanoka herî dawî jî li ser rovî û pilingê diwar e. Divê xwendevanên Kurd van çîrvanokan bixwînin û yên xwedî zarok ji zarokên xwe re van çîrvanokên xweş bixwînin.

Ez birêz M. Xalid Sadîni pîroz dikim ku wî van çîrvanokên xwe berhev kiriye û pêşkêşê xwendevanên Kurd kiriye. Wî bi vê kar û xebata xwe pirtûkeke Kurdî li refê pirtûkxaneyê Kurdî zêde kiriye û edebiyata Kurdî a nivîskî dewlemend kiriye.✽

## Berx û gur

Seyda Ronahî

Berxikek veqetîbû ji kerî  
 Digeriya li çol û berî  
 Rêya xwe kiribû şaş  
 Nedigot daristan nedigot çiya û kaş  
 Rêya wî hat li ber çemekî sekinî  
 Vexwar hinek av ves kir demekê  
 Dengê bihîst li ser piyê xwe zivirî  
 Dît ku gurek li wî dinêrî  
 Çavê xwe teqlo beqlo dike  
 Bi qehr û qotik devê xwe vedike  
 Got; tu çawa ava min dikî şêlî  
 Di tapiya min de ye çem û gelî  
 Berxî got; ez li jêr im tu li jor  
 Ma ezê avê çilo bişînim berjor  
 Gur got; huş be meke peyvên şaş  
 Te di heqê min de kiriye peyvîne belaş  
 Berxî got; hîn ez çar mehî me  
 Ezê çî gotinê bikim ma ne şerm e.  
 Gur got; ez nizanîm vir da wê da,  
 Va ye xirabiya te di bavê te da.  
 Berxî got; guro ez fam dikim nêta te  
 Goştê min nake têra te  
 Tu xwediyê hîle û dubaran  
 Ez nikarim bi te re têkevîm şeran.  
 Bira rihê min bibe bo van çeman  
 Ji te re nemîne ev ziman û ev sima  
 Berxê xwe çekire çem li ber avê çû  
 Gur li hember cesareta wê sosret bû



# Berriya Mêrdînê û rola jinê di civaka Kurdî de

## KONÊ REŞ

**B**erî vê lêkolînê, min di lêgerînên xwe de, Berriya Mêrdînê bi berfirehî daye nasîn. Bi min xweş e ku di vê xepartinê de jî karibim ro-nahiyê berdim ser rola jinê di civaka Kurdan a Berriya Mêrdînê de.

Dibêjin; jin nîvê civakê ye û wek ku diyar e, di vê serdemê de guhdanek mezin bi jinê heye. Nexasim ji rex saziyên sîvîl, dewletên demokrat û Netewên Yekgirtî ve û wiha ev dewlet û saziyên têvel bi hewildan in ku wê zilm û zora ku ji sed salan ve li ser jinê tê meşandin hilînin û nema bikin. Bêguman em Kurd jî beşek in ji netewên cîhanê, gelek zilm û zor li jina Kurd jî bûye û hê jî dibe. Belê zilma ku li jina Kurd dibe dubare ye; ji rexekî ve civakî ye, wek a gelên cîranên me, ji rex rêjîmên kedxwar ve û ji rexekî ve bindestiya ku gelê Kurd bi tevayî tê re derbas dibe ji rex dagîrkeran ve.

Tevî vê rewşa xerab a ku Kurdistan tê re derbas bûye û dibe, gelê Kurd bi rûmetî û rêzgirtinê li jinê mêze kiriye û derfetên berfireh di jiyana rojane de li ber vekirî hiştiye. Di encamê de

jina Kurd di gelek waran de xwe parastîye, serê xwe hildaye û nav û deng daye. Mirov dikare wan waran bi van xesletan bi nav bike: Merdî, mêranî, zanîn û huşmendî, wefadarî, deyx û cangorî...

Ji ber ku mijara min li dor zîlana kar û barên jina Kurd a Berriya Mêrdînê dizivire û gundê min Doda gundekî ji gundên Berriya Mêrdînê ye vêca ezê wek nimûne, ji kar û barên jinên gundê xwe û ji jinên mala xwe, wek ku min dîtîye, dest pê bikim.

Xweş li bîra min e di wan salên biçûkaniya min de car caran zilamên gund ji hev re digotin: Gotina jinê bi serê mêr de diçe wek ku çawa kêr bi seriyê penîr de diçe. Hem jî digotin: Lazim e jin êvarî zû razê û sibeha zû ji xew şiyar bibe. Û digotin: Jin stûna malê ye.

Erê di salên zaroktiya min de a li gundê me Doda, her sibeh bi banga mela re, li ser dengê azana dîkan, xulexula mirîşkan, pêjna şivan û derketina keriyê pez ji hewşê û xirecira her sê jinên malê; diya min Xensê, pîrka min Sara û pîrka

---

Xweş li bîra min e di wan salên biçûkaniya min de car caran zilamên gund ji hev re digotin: Gotina jinê bi serê mêr de diçe wek ku çawa kêr bi seriyê penîr de diçe

---

bavê min Nûrê, ji xew şiyar dibûm. Min didît ku her yek ji wan karekî dike, te digot qey di cengê de ne. Pîrka bavê min Nûra Keye kebanîya malê bû, kar nedikir lê her tişt di destê wê de bû; girtin û berdan di destê wê de bû, ew bû ya emirkar. Kar û barên hundirê malê di destê pîrka min a Sara de bûn, ya ku bi koka xwe Ermenî bû. Karên derî hundirê malê wek bêriya sewalan, malîna hewşê, guhera pez û danûstandina bi cîranan re, di destê diya min de bû. Diya min û pîrka bavê min bi cil û bergên Kurmancî girêdayî bûn û hê jî diya min bi wan cilan e. Lê herçî pîrka min Sara bû, cil û bergên wê terzbajarî bûn, bi Kurmanciyek şikestî xeber dida, tevî ku di ser 50 salên wê re çêbibûn ku di nav mala me de dijiya, lê hê jî xweşik fêrî Kurmancî nebibû. Her dem bi mitale û xemgîn bû, car caran, dema ku bi tena xwe dima, di ber xwe de bi Tirkî dinuhirand. kezeba mirov bi wê nuhirandina wê re dihat şewitandin.

Erê, jinên mala me bi şiyar bûna mirîşkên re ji xew şiyar dibûn û her yek ji wan bi kar û barê xwe mijûl dibû. Bi berbangasibehê re şivan pez dibir çêrê. Hingê diya min mexelê pez rêş dikir. Di pey re sêpiyê dewkilanê rast dikir, meşka xwe dadiliqand û dest bi kilana dew dikir. Li ser dengê meşka dewkilana wê, ez sistovisto û xiloxavî ji xew şiyar dibûm. Di serşokê de bi wî misîne me yê sifir min çengek av li ser cavê xwe dikir û ji ser dika devê derî, min li rêka ku diçe gundê Çewdara û Tilkêfê mêze dikir û li ber sêpiyê dewkilana wê, li qelavîzka rûdiniştim. Bi hêviya ku meşka xwe veke û hinek nîvişk an qeymax li ser nanê min dayne.

---

## Di dawîya çerxê 19an û destpêka çerxê 20an de navê çend jinên Kurd di bakurî Berriya Mêrdînê de bi mêranî, merdî û cegerdarî di civaka Kurdên Berriya Mêrdînê de dihatin gotin, bandora wan li jinên Berriya Mêrdînê hebû

---

Di ber dewkilana xwe re ji me re digot; nehêlin mirîşk, elok, berxik û karik derbasî hundirê malê bibin, wan biqewirîne.

Di wan salan de jinên gundê me wek tevayî jinên gundên Berriya Mêrdînê li gor werzên salê bi kar û barên malê radibûn.

**Biharî:** Di vî werzê salê de bêtir bi pez re mijûl dibûn wek; êmkirina sewalan, paqijkirina mexelê wan, çûna bêriyê, dewkilana mast, çêkirina penîr, hilandina rûn, di gel ku bi zilamên xwe re an bi kesên malê re diçûn çinîn û danheva gihayê biharî. Ew giha didan hev û dikirin rêş bo êmê pez di zivistanî de. Ji rexekî din ve gelek caran xwarina malê ji pincarê çolê çêdikir wek: Kereng, Xerdel, Kurim, Guwîrîz, Harik, Tolik, Qinêber, Sersipîk. Di gel ku tûmên Sorsork bo malîna hundirê malê û tûmên Taliyê bo paqijkirina hewşê û guherên pez ji çolê didan hev û dikirin melkes.

**Havînî:** Karê herî giran ji jina Kurd re di werzê havînê de kişandina avê bû û avdana sewalan bû. Rojê sê danan keriyê pez û cotê qantiran av didan. Di gel ku alîkariya zilamê xwe di paleya dexil û zeviyan de dikir wek; paleya ceh, nîsk, nok, şolik û kizinan. Kişandina sap bi dewaran û şixran ta bi ser benderên gund û gêrekirina wî sapî bi cencerê û dewaran û dawî dêran û jihevderxistina wî sapî bi hatina bayê

nû re. Di pey re kişandina kayê. Jixwe karê herî balkêş çêkirina tepik û kozîdanan bû, ew tepik wek ardû ji bo şewitandina zivistanê dihatin çêkirin û hilanîn.

**Payîzî:** Di werzê payîzê de kar û barê xwe yê zivistanê dikirin; piştî hilanîna benderan dest bi çalkirina genim, kadînkirina kayê û kişandina tepikan dikirin. Her wiha xaniyên xwe diseyandin, kils dikirin û dest bi kelandina savarê dikirin. Piştî ku savarê xwe ji aş tanîn mal, dibû dora jinê ku wî savarî ji hev derxîne; destpêkê didêra, di pey re bêjing û moxil dikir, hurik, sindik û birxul ji hev cuda dikirin û danê xwe di cirin/conî de dikuta. Eger nîskên wê girs bana, ew nîsk bi derstar dihêran. Pê re jî ardiwê malê bo şewata zivistanî amade dikir; wek kişandina tepikan, paqijkirina kadîne, nixumandina qirş û qalan bo şewata zivistanê. Di nav re jî tenûr û tifik ji axa axsorkê çêdikir û bixêrika xwe paqij dikir. Û her wiha bi hiriya ku havînî ji sewalên xwe qusandibûn û şuştibûn, bi wê hiriyê doşek, lihêf, palgeh çêdikirin. Di dawîya payîzê û serê zivistanê de dibû wextê serjêkirina dermalan; dermale serjê dikirin, goştê wan di kesidandin bo xwarina zivistanê û hin jê dikirin qelî bo xwarina zivistanê a bi lez.

**Zivistanî:** Bêtir karê jinê di werzê zivistanî de çêkirina xwarinên têvel bû wek: Goştê

kesidandî û girar, kutilk, eprax, şamborek, rişta, nîsk, hebnîsk, kecelok, helawî, pelûl, tilîşewitî û danheva malê û danînûhılanîna bi cîranan re û êmkirina sewalan derbas dibû. Digel ku di demên valahiyê de bi çêkirina tentene û neqşên bi tayên rengîn derbas dikir. Di ber van karan re jî jinên Berriya Mêrdînê hirî dijenandin, bi teşiyê badidan, diristin û dikirin gulokên ji tayên rengîn û bi wan pengên rengîn gore, lepik û qutik, tûr, xurcezîn, cilik, merş û ferd çêdikirin. Anku barekî giran li ser pişta jîna Kurd, di civaka Kurdî a Berriya Mêrdînê de hebû, li gor ku min dît û ez gihîştim ser dawiya wê serdemê.

Di dawiya çerxê 19an û destpêka çerxê 20an de navê çend jinên Kurd di bakurî Berriya Mêrdînê de bi mêranî, merdî û cegerdarî di civaka Kurdên Berriya Mêrdînê de dihatin gotin, bandora wan li jinên Berriya Mêrdînê hebû wek: Xatê; diya Silêmanê Mistê, ku jinek mêr bû di herêma Xerzan de. Şemê; diya Felîtê Quto, ew jî jinek mêr bû di herêma Pêncînarî de. Perîxanê; diya Omer û Emîne Perîxanê di herêma Rema û Bişêriyê de. Fesla Anter; Diya nivîskarê Kurd Musa Anter di navçeya Nisêbînê de, dibêjin jinek wek axa bû û mixtariya gundê xwe Zivingê dikir. Durra; jina Hemê Mihê ji eşîra Koçeka, dibêjin jinek nandan û sexî bû, deriyê wê ji feqîr û fiqaran re her dem vekirî bû. Sara Hesê; Jina Hesê Şemokî, ji mala Hesê Berekêt, dibêjin ku di herêma Hevêrkan de jinek zana, merd û şaraza bû.

Belê ji jinên Berriya Mêrdînê yên ku di destpêka çerxê bîstan û vir de nav û deng dane, mirov



dikare van çend navên xwarê bîne ziman:

**Xensa Xelecî;** kebanîya Îbrahîm Paşayê Millî: Jinek jîr û jêhatî bû, xwedî kesayetiyek xurt û bi biryar bû. Di heyama mêrê xwe Îbrahîm Paşa de û di pey wî re jî, wê karîbû zarok û êla xwe a Millan di deverên teng re, bi serketin derbas bike. Ew bû ya ku di şerê erebên Iniz û Şemeran de nav di mêrên Millan, Xelecan û Kîkan de dida û ji wan re digot; Yaxên we yaxên guran e. Anku yaxên guran jî pezkuj in, yaxên we jî mêrkuj in. Ew keça Dawid Axa, pismamê Îsmâil Axa serokê êla Xeleca bû, lê bi navê Xensa Îbrahîm Paş dihat naskirin an bi navê Xensa Paşa .Piştî ku di payîza 1908 an de zilamê wê Îbrahîm Paşayê Millî li Sifeya ,nêzîkî Kewkebê Millan canê xwe ji dest da û çû ber dilovaniya Xwedî û zarokên wî li Nisêbînê hatin girtin. Xensa xatûn bi kar û barê êla Millan a mezin rabû û bi zîrekiya xwe zarokên xwe ji zindanê berdan. Xensa xatûn xwedî rêz û rûmet bû li cem axayên Kurdan û keyaxên

Ereban, nîşana rêzgirtina wê ku di hevdfîtan de serê wê maç dikirin.

**Naza Mistê:** Xwîşka Hemê Mistê bû, ji eşîra Millanê Xidir Axa li gundê Moza (Mal Tepe), vê paşiyê hat naskirin ku ev gund şunwarê Hûriyan e bi navê Orkêş. Naza Mistê bi merdiya xwe bo mehcir û belengazan dihat naskirin. Li gundê Girbawî dima.

**Edla Tahirê:** Ew jî wek diya xwe Naza Mistê, navê wê bi merdî belav bibû. Dotmam û jina Cemilê Îbrahîm bû, li gundê Mele Sibat dima.

**Xensa Axê:** Xwîşka Ehmedê Silêman axayê Omeriyan û jina Evdî axayê Xello serokê eşîra Mîrsinan bû, navdariya wê ku jinek mêr û cegerdar bû. Li gundê Topiz dima.

**Sara Hesê:** Ji eşîra Mîrsinan bû, kebanîya Silêmanê Osman bû, navê wê bi merdî, sexîbûn û dilbirehmîyê belav bibû. Li gundê Qoşanê dima.

**Sara Xingê:** Jinek mêr û bi cesaret bû. Di şerê eşîra Mîrsinan

û eşîra Erebên Cibûriya de, wek zilamekî radihişt tivingê û şerê Erebên Cibûriya dikir û gundê xwe Zoncik bi dest wan ve berneda.

**Fesla Sadûn Axayê Gergerî:**

Keça Sadûn axayê Gergerî û jina Micwel Ferhan paşayê Şemerî bû. Navê wê bi jîrbûn û zîrekî di nav êlên Ereb û Kurdan de belav bibû.

**Bêgiya Hacıya:**

Ji wan jinên koçerê Mîran yê cuda bû. Cudabûna wê ku xwedî kesayetiyeke bi hêz bû. Di valahiya mêrê xwe de, wê cihê wî dadigirt û pêwaziya mêvanên wî dikir. Digel ku di Êla Koçerên Mîran de cihê şewirê bû, raya wê dihat girtin. Anku jinek xwedî biryar bû. Nexasim di warê para jinê (Mexsewê) de, anku ew malê taybet bi jinê. Hem jî wek nûjdarekê bû di nav êla Koçerên Mîran de, wê gelek nexweşiyên êlê bi pincarên çolê rehet dikir. Digel ku jêderê bû ji zargotina Kurdî re, nexasim di stranên Koçerî yê têvel de. Ji ber van xisletan roja îro malbata Rîsipîyan bi navê wê (Mala Bêgiyê), tene naskirin. Û gelek navê wê li zarokên xwe kirine.

**Helîma Xaşo:**

Ji mala Xaşo bû li Tirbespiyê dima, navê wê bi zanî û mêranyê belav bibû.

**Edla Kasikî:**

Diya Ehmedê Ûsiv, serokê eşîra Kasika bû, jinek mêr û merd bû. Ta roja îro gelek ji mala Ehmedê Ûsiv dibêjin: Gom Edla, anku malbata Edla.

**Nûra Evdo:**

Pîrka bavê min bû, dema ku li gundê Nicim bûn jê re dihat gotin Nûra Keya, anku wê mixtariya Nicim dikir. Jinek hişmend û xwedî bîr û bawerî bû, wek zilaman bû. Ew û Naza Mistê û Sara Hesê bi hev re dost û heval bûn.

## Ya Muhemmed (s.)

**M.Ziya Miksî**

Ji tîpên Erebî: Cesîm Yolcu

Bêhna te xweştir e ji beybûna çiyar  
Evîndar im ez li ser te ya Muhemmed  
Rûyê te ronahî ye ji heyva esman  
Şewitîm ez ji eşqa te ya Muhemmed

Tu şirîntir î ji hingivînê zeyan  
Evîna dilan î ronahiya çavan  
Lorîka dayîkan î tu dewr û zeman  
Evîndar im li ser te ya Muhemmed

Çilmisîn gulên me giş ji hesreta te  
Fîxan bilbil dîkin ji xerîbiya te  
Serkaniya heyatê j' nav tiliyên te  
Av de me miskîna tu ya Muhemmed

Serê xwe tu rake ji nav rewda nûrîn  
Halê vê ometa xwe carek bibîn  
Wek sêwî yetîm man li rûyê zemîn  
Meded dixwazin em ji te ya Muhemmed

Şewqa te li Medîne da dilê Miksî  
Wek agirê tu zanî dilê'm teyîsî  
Mecnûn im li çolan tu min bipirsî  
Kewsera rehmanî tu ya Muhemmed

**Hecî Hedla Kîkî:** Diya Mihe-med Salihê Hecî Derwêş bû, ji eşîra Kîkan, berê Azîzan. Navê wê bi aqilmendî belav bibû, jinek wek zilaman bû. Ew li gundê Qeremanê dima.

Her wiha gelek jinên din, yê ku navê wan bi merdî, wefadarî, cangorî, dilbirehmî û mêranyê derketine, hene wek: Kehla Kano, Sara Macûn, Sara Macê, Emîna Birê Hiso, Nûra Egêl, Ebta Xello, Hemdiya Beg, Şerîfa ji Amûdê, Hesîna Gênco, Nesîma Gozê, Nûra Silê, Caziya Mihema, Kehroya Hecîsilêmanî, Fatma Ûsiv, Sara hecî Evdê Şemdîn.

Di wê serdemê de navê çend jinên Kurd yê ku navê wan bi welatperweriyê derket û tevî tevgera Kurdî bûn û li kêleka mêrê Kurd têkoşîn kirin û bûn piştgir ji siyaseta medarên Kurd re, mirov dikare van çend navan bîne ziman: Fatma Şernexî; vê jina Kurd wek Kurdperwereke dilsoz gelek caran endamên Partî yê ku ji asayîşê reviyayîbûn di mala xwe de vedişartin û wek endamê partiyê xebat di nav tevgera niştimanî Kurdî de li bajarê Qamişlo dikir. Her wiha jinên wek Stîya Mele Ehmedê Şûzî; Wezîra Têllo, Meqbûla Têllo, Sînem

---

**Di wê serdemê de navê çend jinên Kurd yên  
ku navê wan bi welatperweriyê derket û tevli  
tevgera Kurdî bûn û li kêleka mêrê Kurd têkoşîn  
kirin û bûn piştgir ji siyasetmedarên Kurd re**

---

keça Cegerxwîn, Emîna Çelengî ku van jinan jî wek wê xebata Kurdewariyê dikirin û dikarim bêjim ku ev jinên han û ji bil wan ve jî hene ku di Berriya Mêrdînê de di warê hestê netewî Kurdî de ji pêşengên jinên Kurd bûn.

Bi min xweş e ku serhatiya du jinên Kurd yên ku qederê bi wan lîst, serî li wan hat gerandin û terkedinya bûn; di Hicazê re derketin, da ku malbatên xwe ji eyb û ariyê biparêzin, ji xwendevanan re bînim ziman tevî ku her du jî bêrî bûn:

**Sultana Serhên:** Keça Serhanê Osmên bû û xwişkê Sarûxan bû yê ku jê re dihat gotin Mîrê Zirav. Sultan di zaroktî û xortaniya xwe de bi cil û bergên zilamên çiyayê Bagokê girêdayî bû, tivîng bi milê wê ve berdayî bû û di civaka bav û birayên xwe de mezin bibû, ta ku Abdulkirîmê Eliyê Remo axayê herêma Hevêrkan li gundê Çêlik ew ji xwe re xwest û anî. Lê piştî ku Abdulkirîm ew ji xwe re anî, wek jinek Kurd a orjînal bi kar û barê mala xwe radibû. Dibêjin rojekê Abdulkirîm û mêvanên xwe li ber Kevirê Nîşanê rûniştin û tiving berdanê, kesî ji wan li Kevirê Nîşanê nexist. Tu nabê Sultanê di kuleka xaniyê malê re li wan mêze fikir û di wê kulekê re derbek berda Kevirê Nîşanê û lê xist. Bi lêxistina derba wê re Abdulkirîm got: Ew kî be yê ku derb li Kevirê Nîşanê xistiye ezê wî bikujim. Da ku mêrê wê Abdulkirîm, wê nekuje ji pismamê xwe Elîkê Bettê

re şand û got: Elîko qey mala bavê min qelyane ku ne qelyabana Abdulkirîmê Eliyê Remo newêrîbû wiha ji min re bibêje. Elîk di he-wara wê de hat gundê Çêlik. Ew û Abdulkirîmê Eliyê Reno rastî hev hatin, Abdulkirîm xêrhatin li Elîk da, Elîk lê vegeand û got: Tu sax bî Abdulkirîmo. Tu kewekî nebezandî bû, min got ezê poçkê li te bidim û vegeim. Dibêjin piştî kuştina Abdulkirîmê Eliyê Remo ji aliyê Tirkên ve li Axreşka di navbera Mêrdîn û Diyarbekirê de, Sultan jinbî maye û hatiye Berriya Mêrdînê, gundê Tirbesipiyê cem xwişkê xwe a ku jina Haco bû. Mala Haco nedivîbûn kesî nas mar bike, vêca ew dane yekî Ereb bi navê Nayîfê Şelêl ji gundê Şebaniyê, da ku serêşanê ji wan re çêneke. Lê wê û yê Ereb li hev nekirin û dawî li hev berdan û ji kerba, terkedinya bû. Dibêjin xwe li gundê Xizna, li şêx Ehmedê Xiznewî girtiye û li wir çav bi Şemsa Mihemed Axayê Deqorî ketiye û dîtîye ku derd û kulên herduyan yek in û herduyan bi hev re biryara çûna Hicazê daye û bi rêka Hecacên Mêrdînê çûne Hicazê. Li Hicazê Sultana Serhên bûye mamoste, dersên Quranê daye zarokên Ereba.

Dibêjin Sultana Serhên jinek gewr û boz bû, bi bejn û bal bû, jinek mêranî bû û ta roja îro jinên berriya Mêrdînê, nexasim yên Sinceqa Xelef Axa ji hev re dibêjin; mala minê tu ji min re bûyî Sultana Serhên. Û gelek navê wê li zarokên xwe kirine.

**Şemsa Mihemed Axayê Deqorî:**

Keça Mihemed Axa bû û xwişkê Seîd Axayê Deqorî bû, yê ku bajarê Amûdê bi navê wî tê naskirin û ji Amûdê re tê gotin (Amûda Bavê Mihemed). Şemsa xatûn di maleke têt û tije, bi mêvan û danûstandin de mezin bû û li gor irf û adetên mala bavê xwe serwextî civaka Kurdên Berriya Mêrdînê bibû. Li gor wan adetên, ew dane pismamê wê Şikrî axayê Mihemed Axa. Di sala 1937an de piştî ku serhildana Seîd axayê Deqorî dijî Fansizan li bajarê Amûdê têt çû û Seîd axa ji neçarî ji Sûriyê derket û çû Iraqê, hingê Şikrî axa û kebanîya xwe Şemsa jî pê re çûn Iraqê. Li Iraqê, dilmanî dikeve navbera Şikrî axa û dotmama wî Şemsa xatûn û di encamê de Şemsa dixeyide û bi rêka Êzidiyên Şengalê xwe bi Sûriyê/Berriya Mêrdînê ve digihîne. Li Berriya Mêrdînê xwe li gundê Topiz, Evdî Axayê Xello serokê eşîra Mîrsinan digire. (Yên ku wê hingê ew û mala bavê wê dijminên hev bûn.). Dibêjin, piştî ku mala Xello ew nas kirine, qedrekî zor jê re girtine. Û jê re gotine; em nikarin te li cem xwe bihêlin. Rast e, em û mala bavê te neyarên hev in, lê mana te li cem me şermezariyek mezin e bo me. An emê te vegefnin mala bavê te bajarê Amûdê û an cihê tu dixwazî emê te bibin wir. Vêca wê ji fedyâ û eyb û ariya dinyayê nema dizanî bi ku de terkedinya bibe û here. Dawî ji wan xwest ku wê bibin gundê Xizna bal Şêx Ehmedê Xiznewî. Dibêjin; Mele Eliyê Topiz yê ku şewirdarê Evdiyê Xello bû, pê re şandine gundê Xizna bal Şêx Ehmedê Xiznewî. Li wir Şemsa xatûn çav bi hevala xwe Siltana Serhên a ku qeder li serê wê jî, wek wê geriyabû, ketiye û

ji wir her du bi hev re, di rêka hecacên Mêrdînê re diçin Hicazê, bajarê Mekkê. Dibêjin piştî 30 salî ji mana wê li Mekkê, birayên wê dibihîzin ku li Hicazê ye, yek ji wan diçe serdana wê. Dibêjin; li Mekkê dema birayê wê li deriyê wê daye, wê ji hundir ve gotiye; Derbas be keko. Ji 30 salî ve ez li hêviya vê hatina te bûm. Dibêjin, birayê wê kiriye û nekiriye ku pê re bizîvire Amûdê, razî nebûye û pê re venegeryaye û dawî li wir çûye ber dilovaniya Xwedê.

Tevî jiyana gundîtiyê, cehalet, nexwendin û perîşaniya ku civaka Kurdên Berriya Mêrdînê tê re derbas dibû, jina Kurd li kêleka mêrê Kurd berxwedanek bêrawestan derbas dikir. Bi wefadarî ew qûnaxên çetin û dijwar, bi serketin li pişt xwe hiştin. Wiha jî li gor pêşketinên demê û teknolojiya nû, salên kevin yê cehalet û nezaniyê bi zanîne guhertin. Tevî ku zimanê Erebi astengeke mezin bû li pêşberî zilam û jina Kurd bi hev re, lê wan ew asteng bi vîn û deyaxek xurt ji pêş xwe dane alî. Her evîndarên zimanê xwe bûn. Zimanê xwe jibîr nekirin û hezkirina zimanê Kurmancî bi zarokên xwe re çandin, tevî ku zarokên wan di dibistanên dagîrkeran de fêrî zimanê biyaniyan dibûn û bi wî zimanî li gor heyam û demê xwendin û bi ser ketin. Roja îro, bi saya wê jina Kurd, berî mêrê Kurd bi dehan ji mamosteyan, bervedêran, bijîşkan û endazyaran hene... Sebaretî mala me a ku min behsa biçûkaniya xwe tê de kir, roja îro ji wê dayika min a ku her sibeh ez li ser dengê dewdikila wê şiyar dibûm, em şeş kur û keçek bûne mamoste, abokat û doktor.

## Bahoza Hêrsê

Dilêr Zana

Gava min serê xwe quloz kir  
Min lê nihêrî xwîn dilop dike ji esman  
Dil, dilê xembar bi kovana dinipixe  
Diwerime dibe kelekeka li ser pêla hêstiran

Bahoza hêrsê diweze bê westan  
Dibe bagera rikê hezar salan  
Li ber dagirkeriya hovên kedîkirî  
Gava asta hizrê bilindî esmanan dibe.

Stenbol 05. 04. 2009

Belê di civaka Berriya Mêrdînê de gelek malbat bi navê jinê tene naskirin û ev yek di nav me Kurdan de tiştekî normal e, belê di civaka gelên cîranên me de wek Erebi, Tirk û Farisan de dibe ku şerm be. Wek ku ez zanim, hîç çênabe malbat bi navê jinê bê naskirin. Û eger malbatek hebe, ew malbat di civaka xwe de şikestî ye û bi çavekî kêr lê tene mêzandin. Lê sebaretî me Kurdan bi dehan û sedan ji malbatan di nav me de hene, bi navê jinê tene naskirin û xwedî rêz û hurmet in wek: Mala Silêmanê Zerokê, mala Sara, mala Pîrê, mala Leylê, mala Wetê, mala Henê, mala Fato, mala Zehra, Mala Nûrkê, mala Helîmê, mala Gozê, mala Peyrûza, mala Hezarê, mala Hevsedê, mala Eyşanê, mala Kezîbanê, mala Fatimê, mala Rihê, mala Cirwa, mala Diran

Zerê, mala Nûrê û wiha gelek malbatên din hene.

Erê, rast e wek ku hatiye gotin "Jin nivê civakê ye", lê tevî ku civaka me Kurdan seqet bû, civakek ne azad û serbet bû, di bin destê dagîrkeran de dinaliya, wê jinê beşdariya zilamê xwe di tev warên jiyana rojane de dikir, wiha jî gelek ji wan jinan, di gelek waran de nav û deng daye û her wiha gelek malbat bi navê jinê hatine naskirin û ew malbat bi wî navê xwe serbilind in.

Mebesta min ji vê nivîsandinê ku ez ronahiyê berdim ser rola jinê di Berriya Mêrdînê de, rola jinê di civaka Kurdî de, rola jinê di mala Kurdî de û vê gotina ku bav û kalên me gotiye, "Jin stûna malê ye" biçesipînim. Erê rola mêr mezin e, lê barê giran li ser piştê jinê ye, jin stûna malê ye. ✨

Qamişlo, 17.02.2012

# Hevparên jiyanê Jin û Mêr

**MURAD CELALÎ**

muradcelali@gmail.com

**T**êkoşîna Mirovahiyê  
 Jiyan mirovahiyê ya li vê dinyayê bi Hz. Adem û Hewwa dest pê kiriye. Gava Xwedê Teala ebdê xwe yê pêşîn Hz. Adem afirand, seba hewasiya wî bê, li vê derê tenê nemîne û bibe xwedî zar û zêç, Hz. Hewwa jî afirand û jê re kire heval. Heke Adem (e.) tena serê xwe bima dê îro ev mirovahiya bi qaydê nika pêk nehatiba. Lewra Hz. Adem bi tena serê xwe kêmbû, nikaribû him bibe bav û him jî bibe dê û zarokan biwelidîne, li wan xwedî derkeve û ewan perwerde bike. Xwedê ew mêr afirandibû û fîzyolojiya wî ji bo wan karan rênedida. Loma Xwedê Teala seba ku pê re hevaltiyê bike û bibe hevsera wî Hz. Hewwa afirand. Ew herdu bi tevayî heya demekê li buhuştê jîyan. Paşê ew şeytanê neyarê Hz. Adem yê berê kete rex wana, ew herdu bi tevayî xapandin.<sup>1</sup> Di encamê de wan bi wî bawer kirin, bi derewa wî xapiyan û ji wê dara/fêkiya qedexa xwarin û ji buhuştê daketine ser rûyê vê dinyayê. Ji wê hingê vir ve ye mirovahî ji zuryeta wan

herduyan zêde bûye û belavî li çar aliyên cîhanê bûye.

Ji wê demê mêj ve ye, jin û mêr wekî heval û hevpişk alîkariya hevdu dikin. Ji bo wan tenê neyarekî rastî heye, ew jî şeytanê lenetî ye.<sup>2</sup> Ji ber vê yekê Hz. Adem û Hewwa ji hevdu re bûne alîkar û ji wî re jî bûne neyar.

Lê belê şeytan bo wan têk bibe, hêza wan bişkêne, tele û planeke mezin li ber wan li dar xistiye. Li gor vê plana xwe tevgeriyaye. Mixabin di vê plana xwe ya xeternak de bi ser jî ketiye. Gelo ev plan çi ye? Ev plan ew e ku wan herdu hevalên piştta hevdu dikin, li hember wî tédikoşin berde hevdu, navbera wan xerab bike û wan wekî rikber û neyar nîşanî hevdu bide. Îro ew rikberiya ku di navbera mêr û jinan de tê xuyanê, di encama vê teleya bêbext de derketiye holê. Ji ber vê gava îro meriv li xeberdan û propagandayên herdu aliyan jî dinihêre meriv dibêje qey herdu alî bavkujê hevdu ne, sebebê hemû nerindî û xirabiyan cinsê din e; ango li gor jinan mêr ji bo

---

Di kovara Nûbiharê hejmara 117yan de di rûpela 88ê de bi ser navê “Li gor Îslamê jin û bazirganî” xwîşka Rojbîn Ozkanê li ser paragrafeke ji pirtûka min a bi navê “Jiyana Pêxemberê Me Hz. Muhemmed” nivîsek nivîsiye û dûr û dirêj bi hevokeke min şîrove kiriye

---



mêran jî jin sebebê alozî û neheqîyan e. Lewra îro fikr û bîrdoziya femînîzmê di nav civaka me de jî belav bûye. Gava meriv weha ji derva bala xwe dide wan, meriv dibêje qey mafê jinan diparêzin, li hember zilm û neheqîya li wan tê kirin tevdigerin. Lê rastî qet jî wisa nîne, ev bîrdoziya beşerî jî wekî wan ên din laîsîzîm, kapîtalîzîm hwd. nexweşî û tengasiyê xelet nas dikin û dermanê wê jî xelet kifş dikin.

Wekî me li jor jî qala wê kir, jin û mêr li ser rûyê erdê hevpişk û alîkarê hevdu ne. Ji aliyê fîzyolojî û rûhî ve ji hevdu cihê ne, lê hevdu tamam dikin. Ji ber vê ne dijmin in dostê hevdu ne. Heke ji wan yek nebe yê/ya din nikare bijî, jiyana xwe bi rêk û pêk bidomîne. Lê îro di jiyana rojane de jin û mêr ciyê ku karê hevdu hêsan bike, li ber hevdu dibine asteng. Dema qala rastiya fîzyolojiya wan bê kirin tu dibêjî qey neheqî li wan tê kirin û vê wekî heqareteke mezin tê hesabkirin.

### Angaşteke bêbingeh

Ez van hemûyan çima dibêjim, di kovara Nûbiharê hejmara 117yan de di rûpela 88ê de bi ser navê "Li gor Îslamê jin û bazirganî" xwîşka Rojbîn Ozkanê li ser paragrafeke ji pirtûka min a bi navê "Jiyana Pêxemberê Me Hz. Muhemmed"<sup>3</sup> nivîsek nivîsiye û dûr û dirêj bi hevokeke min şîrove kiriye. Ew hevoka ku ji pirtûkê neqil kiriye ev e:

"Li Mekkeyê **Xeticeya** qîza **Huweylîd jineka** ticar bû. Piştî mirina mêrê wê ev karê bazirganiyê hildabû ser milê xwe. Lê ji ber ku jinango sîwetek bû, **nikarîbû** bi xwe karwanê xwe yê bazirganiyê **bi rê ve bibe**".<sup>4</sup>

Lê divê wekî rêbaz ez vê rastiyê


destnîşan bikim, gava meriv ji berhemekî beşekî neqil bike pêwîst e ku bêyî guherîn, çî rast û xelet wekî eslê wê neqil bike. Heke xeletiyên nivîsê hebin wana jî destnîşan bike. Lê Rojbînê qet guh nedaye vê, hevok serobin kiriye, guheriye, jê kêmkiriye û wisa neqil kiriye. Ezê eslê wê hevokê li jêrê neqil bikim, ciyên hatine guherîn reş bikim û êdfî biryar ya xwendevanan e.

"Li Mekkeyê **Xedîceya** qîza **Xuweylîd jineka** ticar bû. Piştî mirina mêrê **xwe** wê ev karê **wî yê** bazirganiyê hildabû ser milê xwe. Lê ji ber ku jinango sîwetek bû, **nikarîbû** bi xwe karwanê xwe yê bazirganiyê **bi rê ve bibe**".<sup>5</sup>

Nika jî em bala xwe bidine mijara sereke. Li gor wê qaşo di wê hevokê de fikr û baweriya kevnoşopiyên Kurdan yê berê xwe daye der! Jin belengaz hatine nîşandan! Ji ber kevnoşopiya Kurdan min jin piçûk xistine! Lê ya rastî wekî min li jor jî destnîşan kir seba ku meriv ji wê beşê van tiştan derxe divê yan meriv bi niyeteke xirab tevbigere ku -ez vê ji bo Rojbînê rast nabînim- û yan jî gotî mirov gelekî zêde têkeve bin bandora femînîzmê û çavgiirtî li vê meseleyê binihêre û tenê bi hestên xwe tevbigere...

Di wê beşa ku bûye mijara niqaşê de me qala bazirganiyê kiriye. Wekî tê zanîn beriya zewaca Hz. Muhemmed, Hz. Xedîce jinebî bû û ji mêrê wê yê berê gelek mal mabû û loma ew jinek dewletî bû. Hz. Xedîceyê jî ji bo ku malê wê bibin li welatên dûrê mîna Şamê, Yêmen û deverên din bifiroşin hinek meriv bi heq digirtin û wana jî malê wê bi kerwanan dibir difirotin.

Me jî gotiye ji ber  
• ku Hz. Xedîce jin



bûye nikaribûye bi xwe here û li dewsa xwe hinekên din bi heq girtiye û şandiye. Ka piçûkxistin di ku de heye? Lê berevajî di vê pirtûkê de gelek ciyan de muqayeseya jinên dema cahiliyeyê û jinên dema îslamê hatiye kirin. Li gor Îslamê rûmet û mafên jinan hatiye destnîşankirin. Mafê ku Îslamê daye jinan, ciyê wan ê di civak û têkoşîna Îslamê de bi mînakên balkêş di pirtûkê de bi awayekî zelal hatiye nîşandan. Li hember van hemû tiştan gelo di vê hevokê de çi piçûkxistin û kevneperestî heye? Ma ne wisa bûye? Heke dikaribû bazirganiyê bike û derkeve van rêwîtiyên bi roj û mehan diajot Hz. Xedîce çima neçûye? Ev rêwîtiyên ku rastî gelek êrîş û talanan dihatin, hetta gelek mêran jî nikaribû biçin? Li hember vê rastiye, heke meriv hişê xwe ji bîr neke gelo meriv dikare encameke mîna ya Rojbîn Xanim gihîştîyê derxe? Bi baweriya min heya ku meriv bi rastiya xwe qayîl nebe, xwe û beden û rûhê xwe baş nas neke, rabe cinsê dijberê xwe wekî neyar û rikber bibîne dê ev nêrînen bi vî rengî nexweş derkevîne holê.

Rojbîn tenê bi vê jî nesekiniye, rabûye seba îsbata bazirganî û jiyana jinan çend heb bûyer jî mînak nîşan daye. Lê divê ez vê jê re bibêjim, gava ev lêkolîn kiriye gelo çi qasî geriyaye? Tenê lêkolînên wê yên ji bo îsbata angaştê xwe wekî bersiv bes e! Ma gelo divê ez jî jê re seba îsbata kar û şiyana mêran ansîklopediyekê amade bikim? Heke ew di nav jiyana rojane de be, der heqê jiyana kar û barên bazirganiyê de bibûya, dê ferqa di navbera jin û mêran de bidîta, cudayiya qada kar û xebata jin û mêran rind îdraq bikiriba, yê tiştêkî

---

**Nêrîna kesê/kesa misliman ji yê/ya kesên din cihêtir e. Gava li ser meseleyekî bifikire, raman û rexneyên xwe bike divê li gor esil û esasên îslamî, li ber ronahiya Qur'an û Sunetê tevbigere**

---

wisa nekiriba. Qet nebûya hema tenê rêjeya bazirganên gundên xwe yên mîr bianiya bîra xwe ewê têra bersiva wê bikiriba. Lê wê qet bala xwe nedaye wê, çûye mînakên ecêb daye. Gelo dibe meriv bibêje zareke heft salî ji dukana li ber devê derê malê benîştêk û yan nanek kirî, li ser çerçiyê ku hatiye nav gund pêşberî du hêkan de çar pîfîk kirî? Ma qey ev dibe îsbat ku zarokeke heft salî jî bazirgan e? Ji bo safîbûna vê meseleyê divê têgeha bazirganiyê baş bê zanîn. Ji ber ku ev yek ne mijara vê nivîsê ye emê qala wê nekin.

Lê divê rastî neyên berevajîkirin, li ser gotin û ramana hinekên din meriv fikrê xwe bar neke û bi wan nede gotin. Tiştê me qal kiriye rastiyeke giştî ye. Ji bo îsbata wê pêwîstî bi tu delîlan nîne. Lê divê rastî derkevîne holê û xeletî werine serrastkirin.

#### Encam

Nêrîna kesê/kesa misliman ji yê/ya kesên din cihêtir e. Gava li ser meseleyekê bifikire, raman û rexneyên xwe bike divê li gor esil û esasên îslamî, li ber ronahiya Qur'an û Sunetê tevbigere. Ev rexneya han, ne bi nêrîneke îslamî û ne jî li gor rastiya jin û mêran e. Tenê wekî kopyeyeka xirab a van

demên dawîn yên femînîzmê ye. Nêrîna vê bîrdozê li derva wekî dostê jinan tê xuyanê lê di rastiya xwe de ew jî dijberî jinê ye, tenê dixwaze jinê, bi bedena wê derxe bazarê û li gor berjewendiyê civa-ka cahiliyeya modern bi kar bîne. Lewra heke meriv ji vê hevokê û van rastiyan dîrokî encameke wilo derxe, ma gelo ew ayetên qala şahidiya pîrekan dikin, behsa para jinan ya ji mîrata bavê wan maye dikin, zewaca mêran bi çar jinan dikin û hwd. Çawa şîrove bike? Heke ev nêrîn rast be ka em bala xwe bidine Qur'an û Sunetê, gelo em ê van kulliyatên mezin çawa şîrove bikin? Ji bo mînak em tenê sê ayetan destnîşan bikin: "Xwedê der heqê zarokên we de, du para qasî ya keçan ji bo kuran pêşniyaz dike..." (Sûretê Nîsa: 11)

"Gelî bawermendan! Çaxê hûn bi demeke kifş deyn bidine hevdu wê binivîsin. Ji nav we de bila yekî ku dizane binivîse (û) bi dirûstbûna xwe ve tê nasîn (wê) binivîse. Kesê dinivîse bila bi qaydê Xwedê hînî wî kiriye (bi dadvanî) nivîsandinê dîr nekeve binivîse. Bila yê heq/deyn li ser e jî bide nivîsandin. Bila jî Xwedê bitirse, ji wê tiştêkî kême neke. Heke deyndar sefêk, piçûk û di rewşeke nikare bêje bide nivîsandinê de be; bira welî/xweyê wî bi dirûstî bide nivîsandin. Ji zilamên we dudan jî danas bigrin. Ku du zilam tunebin ji yên hûn ê danasiya wan razî bibin zilamek û du pîrek -da ku dema yek xwe şaş bike/ji bîr bike ya din têxe bîrê- (jî dibin)..." (Sûretê Beqere: 282)

"Heke hûn bitirsîn ku hûnê der barê (zewaca) sêwiyan de dadmend nebin, vêca jî pîrekên ji bo we helal in du heb, sê heb, çar heban mar bikin. Lê (heke dîsa) hûn

bitirsin dê hûn ê dadmend nebin, wê hingê bi yekê û yan jî bi ya (qerwaşên) li ber destê we ve (qîma xwe bînin.)” (Sûretê Nîsa: 3)

Heke li hedîsan bê nihêrîn jî der heqê cudahiya di navbera jin û mêran de dê bê dîtîn. Ezê tenê mînakekî bidim. Ebdullah İbn Ebbas (r.) jî radigihîne ku Qasidê Xwedê gotiye: “Gava mahremê wê li cem nebe bila tu jin dernekeve rêwîtiyê.”<sup>6</sup> Ev hedîsa di Buxarî û Muslim de derbas dibe. Li gor vê hezkî çûyîna Hecc be jî jin bi tena serê xwe nikare derkeve rêwîtiyê.

Gava mirov bi çavê vê nêrîna bi nexweşî li meseleyê binihêre, divê bê gotin ku li gor îslamê rûmeta jinê tune. Lewra îslam dibêje ji mîrata bavan zarokên keçî nîvê para zarên kurî hildidin. Her weha mêr dikare çar jinan di heman demê de nikah bike. Dîsa gava pêwîst bike ji bo şahidiyê li beranberî mêrekî du jin divê şahidiyê bikin.

Ya rastî min nedixwest vê meseleyê weha dirêj bikim, lê gava meriv tiştekî dibêje divê bizanibe ka qala çî dîke û ev tê çî maneyê. Lewma yê radibin vê nêrîna ku rastiyeke surîştî ya jinan destnîşan dîke rexne dîkin, bila careke din muhasebeya fikr û baweriya xwe bikin, paşê xeber bidin. Naxwe dê li hember ayet û hedîsan derkevin –ku ew tiştên di ayet û hedîsan de ji wê paragrafê girantir in- ji heddê xwe derkevin û noqî nav kirêtiya cahiliyeyê bibin.✶

## JÊRENOT

1- Li gor rîwayetên ji îsraîliyâtê ya hatiye xapandin Hz. Hewwa ye û di rûyê wê de Hz. Adem xapiyaye. Lê ev angaşt ne rast in. Ji Qur’an û hedîsên sehîh tiştekî wisa dernakeve.

2- “Ji bendeyê min re bêje bira gotîna herî rind bibêjin. Bêguman şeytan navbera wan xerab dîke. Bi rastî şeytan ji bo mirov neyarekî êşkere ye.” (Sûretê İsra: 53)

3- Celalî, Murad, Jiyana Pêxemberê Me Hz. Muhammed, Nûbihar, Stenbol, 2011.

4- Celalî, Murad, Jiyana Pêxemberê me Hz. Muhammed, Nûbihar, r. 71

5- Celalî, Murad, Jiyana Pêxemberê Me Hz. Muhammed, Nûbihar, r. 71, Stenbol, 2011.

6- Buxarî, Muhsar, 37; Muslim, 424 (1341).

# Roboskî

## Zafer Berdestî

Rêwî:

Ezê

Di duwazde saliya xwe de

Cara ewil, di şevêşekê de

Ji kortal û geliyên welatê xwe re derbas bim.

Bazarekê bikim û vegerim.

Eger perê min ber bimîne,

Diya min destûr da

Ez ê bikaribim kewekî ji xwe re

bikirim.

Rêger:

Ezê

Bi şev, nîvê şevê

Li geliyên kûr û bihurekên teng

Li wir, di nav wan de

Wê sîlûeta min bigere

Ezê kewê berdîm

Ewê darên xwe bavêjinê

Eger dar kewê nekeve

Dibe ku kew darê keve

Rêbir:

Ezê

Li ser şiverêyên qedîm

Riya karwên bibirim

Ji bo sucdarekî tê de, agir berdime

keştiyê

Yanî darê xwe kewkitî bavêjim

Jê negire jî

Wê kew darê keve.



# Zîn û keser

**HATÎCE MOLLAKENDÎ**

haticemollakendi@hotmail.com

*Ji bo ku tu min bibihîzî,  
carna peyvên min hindik dibin...*  
Pablo Neruda

**T**u ji wir de dihatî. Ez ji vir de dihatim. Me berî dabû hev. Em ketibûn rê. Tu dihatî ba min. Ez dihatim pêşwaziya te.

Ez li benda sirûştê bûm, ku bi vê hevdîtina me şa bibe...xwe bixemilîne û ji kêfan bifire... tav derkeve mesela... Keskesor ji esmanan re bibe kemberek zêrîn... Bêhna biharê bifire. Û ez di vê hevdîtîna de bibime Zîn...

Naa! Xweza şa nebû. Te digot qey min nanek xwariye, qetek jî dayê. Bi mehde û bi mirûz bû... Ewran girt. Min got ewê şilî bibare. Sirûşt ji şabûnan bigirî yanê... Na negiriya jî. Paşê bû vizzîna bayê... Qirçîna ewran. Pişt re befir barî. Min got ji bo em ber bi hev de diçin xweza xwe bi cil û bergê spî girêdide. Hevdîtina me dibe dîlan ji xwezayê re.

Te tîlefon kir...Bi wî dengê xwe yê ku te ji min diziye, te tîlefon kir û te got:

-Xwe zêde nexemilîne, Xezal! Lê min dîsa jî xwe nîvenîvî xemiland. Lê belê bi xemla Zînek na! Nîvenîvî... Lewre te dengê xwe ji min diziye... Te dengê min ji xwe

diziye. Ez ji Memtiya te bawer û piştrast nebûm. Bi xemlandina Zînek, bi zindîtiya jînek na... Xemlek nîvenîvî... Ji her Zînekê re Memek tune ye. Mema di berhema Xanî de jî tu jî dizanî, ez jî dizanim ku ew qewmek e. Zîn welatek e... Ji her Zînekê re Memek tune ye... Bi xemla Zînekê na... Bi nîvxemlek...

Ez ji bo ku te pêşwazî bikim ketim rê. Tu ji bo ku bihatayî ba min bi rê de bûyî. Di seetek nêzîkê nîvro de bi rê ketibûyî. Qey ku ez bihatama ba te nêzîkê nîvro bi rê diketim?! Bi serê raza dilê me bikim, dê ezê beriya tavê de biketama rê. Dê ewê tavê min bişopanda. Tav neçar bimaya ku min bişopaya... Tu nêzîkê nîvro bi rê dikevî... Kuwene tu nehatayî... Hinek dem hene ku meriv dixwaze ew dem zû destpê bikin... Û qet xilas nebin. Te çima dema hevdîtina me wisa nekir?

Ez ji mal derketim... Çûm... Yanê ber bi te ve dihatim. Qederêk bi rê ve meşiyam. Dîsa ji nû ve paş de vegeyriyam. Lewre min xwe ji bîr kiribû... Deriyê malê

---

Ez li benda sirûştê bûm,  
ku bi vê hevdîtina me şa  
bibe...xwe bixemilîne  
û ji kêfan bifire... tav  
derkeve mesela...  
Keskesor ji esmanan re  
bibe kemberek zêrîn...

---

Rêya ku em bi hev re ketibûnê xilas bû.  
Li aşxanekê ku li devê çiyê avabûye em  
peya bûn. Ketin hundirê aşxanê.  
Te mase hilbijart. Em rûniştin. Dilê min  
li piya ma. Tu hay ji min mayî,  
dilê min hay ji te

min vekirî hêştibû. Jixwe gava berê min dikeve te  
hemû tiştan jibîr dikim. Axaftinê ji bîrdikim mesela.  
Bêdeng û bi beng dibim.

Hatim mal. Min nihêrî ku derî li pişt e, vekirî ye.  
Cînara min derê xwe vekir, keniya, got:

-Qey îro ew tê? Çavên te ronî. Te tîlefon bikira  
dê min ê derê te bigirta. Qey befir zehf dibare?  
Kincên te spî bûye.

-Spas... Belê....Befir zehf dibare... Xatir...

Dîsa derketim derve. Befirê li min kir. Dîsa min  
berî da te. Nava berfa teze de meşiyam. Erebên  
nav bajêr tev di ber min re derbas dibûn. Li min  
dinihêrîn. Belkî min dîn jî dihesibandin...Nizanim...  
Li ba min disekiniyan ku ez siwarê erebê bibim.  
Ez siwarê tu erebê nebûm. Lewre tu nêzîkê nîvro  
bi rê ketibûyî. Esrê ancax dihatî. Rêya min ji ya te  
kûrttir bû jî...Tevî vê hema hema bi te re derketim  
ser rê. Meşiyam... Êşiyam... Gava ku ber bi te ve  
dimeşim, diêşe dilê min. Ku nemeşim, bisekinim jî  
diêşe... Meşiyam... Hatim rawestgeha tirimbêlan...  
Sekinîm... Pêjn ji te nedihat. Tu hêj nedixuyayî...

Rawestgeh li serê sêrêyekê bû. Rêyek tu jê de  
dihatî. Rêyek jî ez û tu dê tê re biçûyana. Rêyekê jî  
ez jê de hatibûm. Li serê sêrêyek tiptenê sekinibûm.  
Te peyamek şand: Nîvseet şûn de li wir im. Min  
jî bersiv da peyama te: Eva nîvseet e ku ez li  
rawestgehê me.

Çavên min man li rê. Befir dibariya. Carna dibû  
vizzîna bayê. Û dengê min tev li bayê dibû. Ez  
distiram... Ji xwe re:

*Dilê min bila tu bihatayî ji der da*

*Ezê hûrik hûrik rabiyam ji ber da*

*Min ê bi delalê dilê xwe re têr xeber da*

*Dilê min loy loy..dilê min loy loy...*

Otobûsa ku tu tê de bûyî nîvseet şûn de hat. Tu  
ji çiyê xwe rabûyî. Hatî ber bi min ve. Ez hatim ber  
bi te ve, ketim hundirê otobûsê. Min got:

-Bixêr xatî.

-Xêrdar bî...

te got...

Kêleka te vala bû. Palkûrsiya li pişt te jî vala bû.  
Te bilêt ji min re jî kirrîbû. Ez çûm, rûniştim. Te stûyê  
xwe xwar kir, nermenerm got:

-Ne min negot, xwe nexemilîne! Kêleka min jî  
vala ye. Tu çima çûyî li pişt min rûniştî, Xezal?

Ez hatim kêleka te.. Jixwe min jî nedixwest ez  
ewqas dûrê te birûnim.

Û erebe bi rê ket. Em çûn. Ez sûkut bibûm. Min  
dîsa axaftin jibîr kiribû. Te yarî dikir. Bawer kim min  
kenê jî jibîr kiribû. Ez diramiyam: Xwedê neke ku  
rê ji berfê bihataya girtin...Û ew jî nehataya...Şikur  
hat. Xwezil aniha jî befir zehf bibariya. Rê bihatana  
girtin. Ewê tu derfet nediya ji çûyînê re. Xwezil rê  
heftêkê girtî bimana...

Rêya ku em bi hev re ketibûnê xilas bû. Li  
aşxanekê ku li devê çiyê avabûye em peya bûn.  
Ketin hundirê aşxanê. Te mase hilbijart. Em rûniştin.  
Dilê min li piya ma. Tu hay ji min mayî, dilê min  
hay ji te. Dilê min li piya mabû. Qey te ji dilê min  
re bigota: Kerem bike, rûne. Çi dibû? Dilê min li  
çaralîyên te dizivirî. Te wî nedidît. Dilê min li piya  
bû. Te wî nedît

Gava me xwarin xwest jî te ji min pirsî: Em çi  
bixwin? Min bersiv da. Te ji du kesan re xwarin  
xwest. Dilê min li piya mabû, ne bes bû, ma birçî  
jî. Qey te xwarin ji sê kesan re bixwesta, çi dibû?  
Dilê min ma birçî, ma bê cîh. Evîna te pêtek agir  
e. Te bi dizî berda nav dilê min. Jiyana min, jiyana  
te bayê sibehê ye. Pif dike wê evîne. Êş geş dibe,  
gur dibe. Pişt re ji xalîtiya me re dilorînim. Te tava  
me diziyê. Tu, stêrk î. Stêrk, ji destê min de şiqitiye!  
Xuriciye! Şemitiye! Şiqitiye û çûye...!

Ew pencereya ku em li hember rûniştibûn zivis-  
tana reş û dirêj nîşanê me dida. Min pirsî:

-Ev zivistan çi dixê bîra te?

-Zivistana welat, gundê me...

-Êdî? Ev zivistan dişibe çi?

-Nizanim.

-Dişibe zewacên li welat.

-Yanê çawa?

-Yanê mêrik ango jinik hew dinhêrin ku di navê de  
nin. Mîna ku tiştêk hatibe serê wan. Ne ku bi xwe hil-  
bijartibin. Û paşê pev re jîn û jiyana pêdivî çêdibin.  
Pev re jînên mecbûrî, zordest...binênevê...



-Rast e. Kes li hevruha/ê xwe nagere. Kes hevruhê/a xwe nabîne. Gava dîtin jî fêhm nakin ka ku çi dîtine. Loma zewac dibin pev re jînên mecbûrî. Hal we ye ku hevîna meriv, hevruha meriv be jî meriv li her derê bêriya wê dike. Li ba wê jî meriv bêriya wê dike, zanî? Meriv li ba wê jî bêriya wê dike!...

Min mijarê guhêrt, û pirsî:

-Xwezil em aniha li welat bûna, na?

-Na! Azadî li welat hindik e, Xezala min. Tu di dewsa nan û avê de azadî dixwî û vedixwî.

Piştê vê mijûlahiyê, te ji çentedesta xwe pirtûkek derxist, da min. Te li ser pirtûkê awha nivîsandibû: 14ê Sibatê roja çîrokê a dinyayê ye... Bi hêviya çîrokên delal û hêvîdayî... 11.02.2012. Swêd

Tu çima qala 11ê Sibatê jî nakî? Ê ne 11ê Sibatê jî roja hevdîtina me a ewil e. Roja ku dilê min birçî û bêcîh maye. Roja ku min li te binêriya jî, min şerm dikir, li te nenhêriya jî şerm dikir min. Û ji xeynê wê, roja 14ê Sibatê qey tenê roja çîrokê ye?! Qey îro ji bo ku ez çîroknûs im, tu hatî? Qey tu jixwe û xweber dibêjî Xezala min! Te qala van tiştan jî bikira gelo dê kevîr ji dêrê de bihatana xwarê?! Ku yekê min jî bixista lehengên çîroka xwe, min jî pirtûk xelat dikir...

Xwarin anîn. Me xwarin xwar. Dilê min ma birçî,

---

Û min nêrîna te a ewil ji temenê xwe re xist e mîlad. Temenê min têrê nekir ku ez li xwe werim mikurê. Navê te a li ba min Keser e. Navê min a li ba te, nizanîm. Nizanbûn, tengavî ye...û diwestim.

---

ma bê cîh. Pişt re çay anîn. Me çay vexwar. Bîskek din şûn de tu jî rabûyî û çûyî. Ez mam bi bêrîkirinê re...Tu çûyî.

Bi bêrîkirinê re mayîn.. Bêrîkirin... Mafê bêrîkirinê... Mafê meriv hebe ku meriv bikaribe bêrî bike... Min qet têra bêrîkirinê nekir... Bêrîkirinê têra li te nihêrandinê nekir... Min bi têra dilê xwe li te nenihêrî. Gava ez bi te re diaxivîm dengê min dibe ku nelerizî. Lerza xwe veşart. Lê belê nêrîna te a ewil min ji xwe re kirre mîlad. Mîlada min têra ku ez li te binhêrim nekir. Têra ku ez gav biavêjim nekir.

Tu ruhên ku ji keserê re evîndar in dinasî? Navê te ê li ba min Keser e. Navê min ê li ba te, nizanîm. Nizanbûn, tengavî ye û diwestim. Ji bo ku tu carkî din jî werî, divê tonekî wext derbas bibe. Û ku tonekî wext derbas bû û tu dîsa jî hatî ezê mîna her gav li erdê binêrim. Mîna ku di navbera dilê me de tu tiştek tune be, ezê dîsa li erdê binhêrim. Rojek em perdan ji navbera dilên xwe hildin. Bila dilên me bi hev re biaxivin. Em ji navbera wan derên.

Û min nêrîna te a ewil ji temenê xwe re kirre mîlad. Temenê min têrê nekir ku ez li xwe werim mikurê. Navê te a li ba min Keser e. Navê min a li ba te, nizanîm. Nizanbûn, tengavî ye...û diwestim. Bi wê westandinê navê te di nav du-ayan de bibîr tînim. Te berdidim nav ibadetê û di nav de divestirê. Hesreta te daye dû min; min qul bi qul dişopîne.

Keser! Keseran çêneke. Were em bêrîkirinê bişewitînin. Navê te ê li ba min Keser e. Navê min ê li ba te...!?! Te negot nizanîm. Nizanbûn, tengavî ye...û diwestim... Tu çûyî. Çûyîna te min dikesirîne... Tu çûyî... Tu çûyî û çûyî...

Aniha navê te bi herfên mijgirtî ji pênuşa min dipeke. Jiyan diherike, diçe.

Navê te bi jan û bi mij ji pênuşa min dipeke... Çi bikim, ev jî halek e...✿

# Şîrîk

ALİ KARADENİZ

**D**erengê payîzê bû, dema çandiniya zeviyan ji zû de hatibû û derbas jî dibû. Xalisê Elo kûr kûr diponijî, fikrekê ew digirt dehan ew bernedidan. Îsal ji xeynê qûtê zarokên wî, genim li mala wî peyda nedibû ku bike tov bavêje zeviya xwe. Çareyek nedîtiba ewê erdê wî maba neçandî.

Salihê gundiyê wî dihat bîra wî lê wê çawa biçûya ji bo çandiniyê xwe, genim jê bixwesta... Paşê fikrek hat bîra wî, rabû çû cem Salih.

Salih merivekî dewletî û comerd bû, kî lê biqesidiya, destvala venedigeriya. Xalis çû ji Salih re hal û hewalê xwe vekir û got:

- Ez hatime bi te re bazarekê bikim. Îsal ji bilî qûtê zarokan tovê min tune, ezê nikaribim zeviyê xwe biçînim. Eger tu qebûl bikî, tu tov bide min, ez û tu, em bi şîrîkatî zeviyê min biçînin.

Salih hinekî fikirî, Xalis mirovekî xuy nexweş bû, di bazarên xwe de navê wî bi nebaşî derketibû, kê pê re karek bikiriba poşman dibû. Di heqê wî de mesele li nav xelkê belav bibûn, mirovan ji hev re digotin û dîkeniyan

mirovan ji hev re digotin û dîkeniyan.

Salih zanibû gellek ji van meseleyan nerast bûn, xelkê lê zêde dikirin, yek dikirin deh, deh dikirin sed û digotin. Dîsa jî seba vê tirsê Salih ket erê-nayê.

Lêbelê Salih ji Xalis hez dikir, wîjdana wî qebûl nekir erdê Xalis bimîne neçandî, rabû bazara wî qebûl kir, lê dîsa jî, ji Xalis re got:

- Baş e, ezê genim bidime te. Madem tu dibêjî emê bibin şîrîk, qebûl, lê tu jî sozê bide, çend elb genim ji zeviyê were, mesrefê jê derxe, yê mayî nêvî min nêvî te, qebûl?

Xalis pirr şa bû, gava şa dibû devê wî li hev digeriya, herf dadîqurtan, peyv şayik dikir û digotin, got:

- Tiştê we dibe biakê (birakê) Salih, eê (erê), şîrîkatî (şîrîkatî) le, em şîik (şîrîk) in, weh!? Genim ji te û edê (erdê) min. Baza (bazar) xwûya ye.

Salih got:

- Ne bera bazara me ji serî de eşkere be, seba em taliyê dilê

---

Salih hinekî fikirî, Xalis mirovekî xuy nexweş bû, di bazarên xwe de navê wî bi nebaşî derketibû, kê pê re karek bikiriba poşman dibû. Di heqê wî de mesele li nav xelkê belav bibûn, mirovan ji hev re digotin û dîkeniyan

---



hevdu nehêlin. Ka bêje tu çend elb genim dixwazî?

Xalis, sî elb genim kire kîsan û bir. Zeviyê xwe cot kir, tov pê wer kir û ma li hêviya baranê.

Roj derbas bûn, dem bû zivistan. Rehmet pîrr bariya, xêr û bereket pîrr bû. Zad şên hatin, roj bi roj bejna wan dirêj bûn û simbil avêtin wan.

Pîştî Xalis genim ji Salih sitend, nema ne careke din Salih dît, ne jî pîrsa wî kir.

Dawî bû havîn, zevî zer bûn û seridîn, bû wextê çinînê. Xalis çû ser zeviya xwe, dest bi çinînê kir. Car bi car depoya bîçerê tijî bû û vala kirin, cardin tijî bû cardin vala kirin, heta ku zevî tev çinîn. Dîsa net bang Salih kir, ne jî haya wî ji tişteki çêkir.

Genimê xwe anî li pêşiya xaniyê xwe ro kir. Sî elb genim avêtibû zevî, lê çend qat genim jê hatibû, belkî bibû hezar elb. Dîsa bang Salih nekîr. Hêdî dest pê kir genim kişand enbara xwe.

Salih li hêviyê bû ku şîrîkê bangî wî ke, lê gava dît va ye Xalis genim dikşîne hundir, êdî nema li hêviya wî, rabû çû cem şîrîkê xwe Xalis, got:

- Xalis, bereket be, te genim çiniye, lê ka emê çawa li hev parê bikin, ma ne em şîrîk in, tu çima bangî min nakî?

Xalis got:

- Te got şîrîk... em şîrîkê hev yê çi ne, Salih? Şîrîkatiya çi?

Salih got:

- Çawa em şîrîkê çi ne, Xalis? Ne tu hatî genim ji min xwest, te got, emê îsal bibin şîrîkê hev?

Xalis got:

- Erê, min genim ji te sitend, lê min genimê te nekîr tov û navêt erdê xwe. Min genimê te xwe re kir nîfçe. Qûtê minê hebû jî min avêt erdê xwe. Min bi deynê xwe sî elb genim ji te sitendibû, va ye ji te re sî elb genimê te.

Salih got:

- Çawa bi deyn Xalis, tu çi dibêjî? Te gotiba bi deyn, tamam, minê bi deyn bidaya, lê te wer negot, te got emê bi şîrîkatî erd biçînin?

Xalis got:

- A niha min tovê te çandiba, heqê te bû... Lê min genimê te neçandiye heyran! Genimê te min xwe re kir nîfçe. Na û tu qebûl nakî, va ye heqî... were em herin heqiyê mehkeme bibin.

Salih lê nêrî ku Xalis ewê genim parve neke, naçar ma got:

- Rabe, rabe em herin heqiyê.

Herduyan berê xwe dan cem melle. Xalis ji melle re got:

- Melle, Salih da'wekê li min dike, em hatine heqiyê.

Melle, pêşî ji Salih pîrsî, got:

- Çi doza te ji Xalis heye?

Salih:

- Em şîrîkê hev in, lê înkâr dike.

Melle:

- Hûn şîrîkê hev yê çi ne, û çima înkâr dike?

Salih got:

- Dawiya payîza sala çû, Xalis hat, ji min re got, îsal tovê min tuneye, ku tov bidî min emê bi şîrîkatî erdê min biçînin. Min jî sî elb genim da wî. Erd çand û vaye havîn hat, zad çinî, niha jî dibêje

min genim bi deyn ji te sitendiye, em ne şîrîkê hev in.

Mela vegeriya ser Xalis, jê pîrsî:

- Ka îcar tu bêje Xalis, mesela we, wek Salih dibêje?

Xalis, berê hesaba xwe kiribû, ku ji mele bigota "seba qûtê zarokan min genim sitendiye" dizanibû ewê heqî ji wî re bikeve, got:

- Erê Seyda, min sî elb genim ji Salih sitendibû, lêbelê seba qût min bi deyn jê sitendibû. Genimê min yê seba qût li malê hebû, min bi genimê xwe zeviya xwe çand, ne bi genimê Salih. Genim seba ku ez bikim qût, min bi deynê xwe ji Salih sitend.

Melê ji Salih re got:

- Salih, tovê te da Xalis, te bi çavê xwe dît Xalis ew bi zeviyê xwe reşand û çand?

Salih got:

- Na, min nedît, ji min tov xwest min jî dayê, lê reşand, ne reşand ez nizanîm.

Mellê got:

- Madem te nedîtiye Xalis genimê te çandiye neçandiye û Xalis dibêje min genimê wî ji xwe re kiriye nîfçe, li gorî heqiyê genimê seba nîfçe tê dan, deyn tê hesêb. Îcar te çiqas genim dabe Xalis, bera li te vegeîne, hûn ji hev safî dibin.

Salih, fahm kir nikare bi Xalis. Xalisê meşhûr bi hîleya gotinê, carek din meharetê xwe îsbat kiribû. Salih got:

- Xalis, tu li Xwedê. Navê xalis li te ye, lê tu şolgeniyekî heram e. Ez nikarim xwe bikim berberî te. Lê vêya ji te re namîne. ❀

# Birca bilind hêlîna xeman

**KASIM BUGURCU**

**E**z dixwazim serhatiyêke kinik ji jiyana seydayê xwe yê bi navê Mele Evdilxefûrê Hezanî bînim ziman. Dema min seyda nas kir jiyê wî 70 salî bû. Dîrokna, qesîdebêj, wêjenasekî hunera Kurdî bû û wisa jî çanda gelê xwe hez kiribû. Li hember vê yekê bi hezaran helbest qeside, bûyerên dîrokî, jiber dixwend û tanî ziman.

M. Evdilxefûr xwedî teqwayeke taybet, hezkiriyê ustad, xelîfê Neqşebendî, hevalê Mele Ebdulqudsê Cemilê Seyda bû. Her sal du sê mehên havînê dihate medreseya me lê dixwend; medresa seydayê şêx Evdurrezaqê Helêlî (k.s). Rojekê piştê nimêja sibê ez ê biçûma metnan dengê seyda bi awayekî şewat kete guhê min. Helbesta Feqiyê Teyran "Bilbil mebêj awazan" dixwend, bi awayekî bêdeng ez çûm binya lingên wî rûniştim min jî xwe hînî qaîdeyan û helbestan dikir.

Seydayê M. Evdilxefûr piştî helbest xilas kir min dî di ber xwe de got, "Ax sevgî ax!" ev bêje gelek caran min ji wî bihîstibû di xemgîniya xwe de ev gotin tanî ziman.

Min got: Seyda bi xwedê kî wateya vê bêjeyê çi ye? Tu dibêjî "ax sevgî ax!" Seyda go, dev jê berde. Mede dû. Min go ez destê seyda maç dikim. Bûyerê ji min ra bi kinasî bêje. Got madem tu mireq dikî ez ê ji te re bêjim.

-Seyda weha dewam kir:

Di bîst saliya xwe de dema ez bûm leşker ez xortekî bejinzirav, porê min zer û kurişkî, çavên min şîn bû mîna deryaya Hurmiz. Ez wisa lihevhatî bûm. Yekî li min binêriya qîma wî û dilê wî bi nêrînekê nediket cih. Ji neçarî du sê caran li min dinêrî.

Ji ber vê portreya li hevhatî serdarekî (binbaşî) ez kirime piyerê (posta) xwe. Di wê dema leşkeriya min de (1945-1950) piyerê mîna navmaliyan bûn. Xwarina mala xwedî rutbe, dan û standina wan hemû bi kar tanîn.

Serdarê min li tevger û rûniştina min mêze dikir. Wî ez gelek ecibandibûm.

Ne bi çavên leşkeran li min dinêrî mîna kurê xwe ez didîtim. Carna jî digot Evdilxafûr haydê

---

M. Evdilxefûr xwedî teqwayeke taybet, hezkiriyê ustad, xelîfê Neqşebendî, hevalê Mele Ebdulqudsê Cemilê Seyda bû. Her sal du sê mehên havînê dihate medreseya me lê dixwend; medresa seydayê şêx Evdurrezaqê Helêlî (k.s)

---

em biçin mala me. Bi hev re em ê şîvê bixwin. Li hemberî van nêrînên wî ên dostane ez jî bi wî re rast û durist diçûm û dihatim. Wezîfeya xwe bi cî tanî.

Rojekê serdarê min got, Evdîlxefûr here mala min bi keça min re here bazarê û wê bîne malê û were.

Min got Serdarê min ji bilî te û bermaliya te kesek dî heye? Got, belê bi navê "Sevgî" qîzika min heye. 18 salî ye. Te hê ew nedîtiye?

Min got, naxêr. Ez çend caran çûme lê bi tenê dengê we hatiye min. Lê min li wê nenêriye. Ta'îm û terbiya min dîtiye li medresan wiha dixwaze û bi vî awayî jî ez ji feqîtiyê çûme tayîna xwe.

Serdarê min got: Xweda hempayê te zêde bike. Xweda te bihêle. Ji dê û bavê te re. Ez rabûm çûme li deriyê serdarê xwe da û min rahişt keça wî ya bi navê Sevgî. Sevgî jî nebêj Sevgî bêje stêrka li ezmanan. Ne kina dirêj, brû qeytan, enî kewe, dev û rû li hev, qirik şûşa lempê, bêvilek çiçilaskî, destên mûm û find, diranên ji sedef, dengê ji neyê û şêrîna hundir...

Min bi xwe mîna xwîşka xwe li wê dinêrî!

Lê "Sevgiyê" na! Ne mîna min bû. Bi evîndarî li min dinêrî.

Çend meh derbas bûn, rojekê Serdar gazî min kir. Got Evdîlxefûr here mala me hinek hewceyiyên maliyan hene. Bi cî bîne û were. Min got, belê serdarê min ez va ye diçim. Rabûm ez û Sevgî em çûne kolanên bajêr û me daxwaziyên wan standin. Dem piştî nivro bû. Sevgiyê got hê ji êvarê re gelek heye. Ka min bibe hêlanê. Wê demê ez mam matmayî lê min

---

**Min got: Serdarê min li min bibûre li welatê Serhedê weke adetekî ye, hefteyek berî ez bêm eskeriyê bavê min ez bi dergistî kirim û ez hatim. Vaye tiliyên min hîn bi hinekirî ne. Wê gavê Sevgiyê ev gotinên min bihîst, serê xwe xîst ber xwe...**

---

nikarîbû bigota em naçin ji tirs a serdarê xwe.

Gava Sevgî ket hêlanê go tu dizanî Evdîlxefûr ez çiqas li rabûn û rûniştina te mêze dikim, tu xortekî bawermend î. Zîrek û pir paqij î. Lê ez mecbûr im itiraf bikim. Ji roja min tu dîtî ve ye ez bûme evîndarê te. Min got tiştên ne di rê de ji min re nebêje û min şiqamek li ser çavên Sevgiyê da. Bi şiqamê re Sevgî ji hêlanê peya bû û çavên wê bi girî çû malê. Min jî dil bi tirs berê xwe da qîşleya leşkerî. Ez hatim nivîngeha xwe. Lê ez pir ditirsiyam. Ji ber ku Sevgî tiştêkî ne di rê de bixistaya stûyê min, ez ê li hemberî serdarê xwe rûsar û şermezar bibûma. Lê min texmîn kir ku dûr nêzîk wê serdar ji bo bûyerê gazî min bike. Min tim dûa dikir. "Xweda, min ji tirs a te û ji fedy a te min bersiva Sevgiyê bi erêti neda. Min biparêze ji bêbextiya jinan."

Di ser bûyerê re qasî şeş-heft rojan derbas bû, rojekê ber bi êvarî Serdarê min gazî min kir. Got Evdîlxefûr naylonê (cip) amade bike û bi min re were em ê biçin mala me. Wê demê bû tep û repa dilê min. Min zanîbû sebeb çiyê û wê çî were serê min. Taliya emrê min e. Serdarê min bi wê min re bixeyîde.

Em çûne mala Serdar li odeya mêvana xonçeyek hebû. Li ser xonçeyê guldanka spî tijî gul.

Serdarê min banî min kir go, were li hemberî min rûnê. Xanima wî li piya sekinîbû.

Serdar: Te çî kiriye bi Sevgiyê, Evdîlxefûr?

Min go: Serdarê min ev çî pirs e? Min şeqamek bi sebeb şûmîtiya wê lê daye û hew. Ji bil vê Sevgî çî ji we re gotibe nerast gotiye.

Serdar: Bersîva min ji te xwest ne ev e. Keça min ne Sevgiya berê ye. Sevgî cil û bergê xwe guherîne û xwe nuxûmandiye. Waye dest bi nimêjê jî kiriye. Heger tu jî qaîl bî ez ê Sevgiyê bidim te û ji te re bikim bermalî.


Serdar: Sevgî were keça min heger bi dilê te be jî ez ê te û Evdîlxefûr li hev mar bikim.

Dema Sevgî kete odayê mîna Bînevşa Narîn bû. Weke hîva li çardehê dibûrisand. Serê xwe nuxumandibû. Hat li hemberî bavê xwe yî Serdar sekinî û got:

Sevgî: Bavo tu dizanî, madem tu dibêjî ez jî erê me.

Evdîlxefûr: Ez rabûm piya bi-bûm mîna evdalan, wek ava kel bi ser min de be, çongên min fisyayan, qûdê min şikest. Çavên min tijî bûn, kelagirî kete qirka min.

Min got: Serdarê min li min bibûre li welatê Serhedê weke adetekî ye, hefteyek berî ez bêm eskeriyê bavê min ez bi dergistî kirim û ez hatim. Vaye tiliyên min hîn bi hinekirî ne. Wê gavê Sevgiyê ev gotinên min bihîst, serê xwe xîst ber xwe. Histêr ji çavên wê hatin xwarê bi bêdengî çû odeya xwe.

Serdar: Kurê min tu û dergistiya xwe li hev pîroz bin. Êdî tu dikarî herî...



# Zivistan

HESEN POLAT

**S**ala çûyînê hîn mehek payîz mabû, berf bariya. Îsal mehek zivistan derbas bû, hîn jî berf nebarîbû. Mêze îşê Xwedê ke. Loma ye ku rîspiyên me dibêjin: “Kî têkilî îşê wî bike dibe kafir.” Xwedê kiriye ku barîn û nebarîna berfê di destên însanan de û gor xwestina wan nine. Wer nebûna her tişt ser û bin dibû. Ji ber ku îsal zivistan dereng ket hinekan kêfxweşiya xwe dihanî ziman, hinekan jî nerazîtiya xwe. Jixwe tu car însan demek dirêj halê xwe şukir nake. Di rojên germ de germê eciz dibe, di rojên sar de jî sermayê. Texmîna min, mirov însan bigire bibe bike cennetê/bihuştê, demekê şûnve ewê li wir jî eciz bibe. Gotinek Êrisan heye ku vê halê însanan pir baş îfade dike. Dibêjin ku: “Cîhê ku tu li wir ninî baş e.” Bi rastî jî çavên mirov pir caran cîhên ku ew di tê de diji nabîne û li cîhên dûr e.

Ez doh pê hesiyam ku ne mezinên gund, lê zarokên gund bi rastî jî îsal hesretî berfê mane. Doh bi destpêka barîna berfê re rûyên me zarokan bi ken bûn. Pêş lêkirina berfê mêrên gund li ser xaniyek di orta gund de li hev civiyabûn. Me hinek zarokan kaw, hinekan jî deq dilihîstin. Hinek mêr daxme dilihîstin. Yên din jî yan ew, yan jî em zarok temaşe dikirin. Çend xort jî li piyan bi hevûdin re sohbet

dikirin. Belûbû ku xort jî bi barandina berfê re kêfxweş bûn. Çima em zarok û xortên gund barandina berfê dixwazin? Çima mêr û jinên gundan ji barandina berfê re weqas kêfxweş ninin? Ezê niha ji we re hinekî behsa sedemên nerazîbûna wan bikim.

Mezin dizanin ku dema berf bibare domandina jiyana di gundan de zêdetir zehmet dibe. Sar û seqem dikeve erdê, av dicemide. Pez û dewar êdî nare çêrê, dikeve hundir. Ger dewar di axuran de bên girêdan. Di serê sibê de binên wan bên paqijkirin, di afirana de ka bê dayîn, rêxa wan bi sepetan heyana serên sergûyan bên havêtin. Nîvroj li derva ser dangiyan gihayên hişkên hatine çinandin û di kadînan de, an jî di lodan de hatine nijinandin bên dayîn. Dû re ger dêwêr bibin ser avê. Êvarê dîsa di axuran de bên girêdan, ka bê dayîn û hwd. Her roj eynî îş û kar.

Di malan de karên jinan jî zêde dibin. Ger sobe bên danîn, her roj çend caran bên vexistin. Şuştin û miştina malê. Pêjandin, kelandin û hazirkirina xwarinê. Ba karên derve ji mêran re alîkarî. Zarok pir caran di hundirê malê de dixwazin bilîhizin. Qal, qir, pewçûn. Êdî di nav çar dîwaran de hiş di serê mirov

de namîne. Wexta zarok derdikevin der jî xwe di nav berfê de digevizînin, xwe şil dikin. Nexweşketin jî zêdetir dibin. Lomaye ku dema berf lê dike xofek dikeve zikên mezinan. Xofa li ber çetiniya rojên bi sar û seqem, li ber girtina rê û dirban hwd.

Bi rastî li serê erdê tu tişt bi yek alî nine. Tav hebû sî jî heye. Barandîna berfê jî wusa ye. Pêvendiya me zarok û xortên gund zêdetir kêfxweşiya berf ji xwe re tîne re heye. Xort ji bo nêçîra kew û çîran ji barandîna berfê re kêfxweş in. Kêfxweşiya me zarokan zêdetir ji lîstîka di berfê de bi berfê re ye, lîstîka me ya li ser xaniyan. Hela kêf û zewqa xijkirinê mirov nikare tarîf bike. Em zarok tu car xijkirinê têr nabin. Cîhên berjêrên bê kevir û bê dar bona me xijonek in. Em xwe di jor de berdidin heta jêr diçin. Lê ger mirov dîsa heyran jor hilbikişe ku cardin xwe berde jêr. Hilkişandîna jor çiqas bi zehmet be jî, kêfxweşiya ku mirov ji xijkirinê re digire wê zehmetiyê dide bîrkin. Dema em êvarê bi kincên/cilên xwe yên şil û carna jî qelişandî tînin mal pevçûna dê û bavên me wê kêfxweşiya me biherimînin jî dora rojê em dîsan li serê xijonekê ne. Carna jî em zarok derdikevin ser xaniyan dilîzin, deng û bêngên nêçîrvanên nêzika gund guhdarî dikin.

Nêçîrvan refên kewan ra dikin û bi dû wan dikevin. Dema hewa hinekî xweş, berf jî nerm be, pişt yêk-dû firan perên kewan şil dibin,

nikarin êdfî bifirin. Neçîrvan dikarin wan bi xweşî pê bigirin. Kesên diçin nêçîrê bi tedarik derin. Gora nêçîra kewan kincan xwe dikin, goreyan û solan/pêlavan pê dikin. Ew cîhên belû belav dibin, refên kewan ra dikin. Kewan dû çend firan re diwestînin, xweşî pê digirin, dikin paşîla xwe û tînin mal. Kewên gozelên ku nikil û ling sor. Di malan de pir caran qefesên nêçîrvanan amade ne. Wan tînin, dikin qefesan. Ji bo me zarokan temaşekirina kewên di qefesê de mîna şahiyek mezin kêfxweşiyê dide me. Dema kewên di qefesê de nanên ku em di destên xwe de dipişîrînin û didin ber nikilên wan kut dikin, êdfî kêf û zewqa herî mezin ye me zarokan e.

Ez hinekî ji we re behsa çend rojên îsal ên pêş barandîna berfê bikim. Hîna pêr jî hewa sayî bû, ezman dibiriqîn. Tîrêjên rojê di nav guliyên daran de xwe ber didan li ser dîwarên xaniyan, di pencirên odan de diketin hundirên malan. Doh sibe em ra bûn ku çî rabin ewrên giran ezman/asuman por kirine. Mirov şaş dibe, di şevê de ewqas ewr di ku de derketin. Ewr giran bûn. Belû bû ku baran bibare. Lê ewê berf be, an şilî be kesî nedizanî. Mezinên ku ji ewran fam dikirin gotin ku: "Va ewrên berfê ne." Ez hîn jî nizamin, wan di kîjan nişitan de derdixistin ku ew ewrên berfê ne.

Bi rastî jî danê êvarê berfê lê kir. Di serî de sivik sivik barî, dû re jî zêde kir. Di mayîna seetekî de her der sipî bû. Ji ber ku hewa germ, yanê nermayî bû ewqas zêde erd negirt. Wexta hewa

hinekî sar bûna ewê bostekî zêdetir erd bigirtana. Devdevî êvarê ronahiya rojê di paş ewran de zû wenda bû. Hinekan gotin, ewê îşev dîsa bibare. Hinekan jî gotin, na berfê sikûn kir, ewê îşev êdfî nebare. Ji ber ku berf bariya bû millet zû kişiya mala xwe.

Nizam çima, lê wexta berf li erdê ye kûçik/sê şev pir dirên. Êvarê zû ketim nivînê. Ji ber ewtina kûçikan xew li min herimî. Çiqas derbaz bû nizam, xew re çûme. Serê sibê dîsa bi ewtina kûçikan hişyar bûm. Di desta rabûm, çûm ketim pencerê. Mêziyam ku şev berf bariye, an na. Ohoo, çî bibînim, gelek berf barîbû, hîn jî hurik hûrik dibariya. Li dara ber derî mêze kir, ser guliyên darê du tilî berf hebû. Bervî kaniyê jî hinek rêç ber bi çavên min ketin. Min jê dernexist ku ew rêçên çî ne. Hinekî ber pencerê sekinîm. Min dît ku bavê min di derê axûr de derket hat. Dît ku ez wame di pencerê de me, xarî erdê bû, hinek berf kir nav kefa destê xwe, hinekî şidand û bi aliyê min de avêt. Giloka/topa berfê cama pencerê ket û pê ve zeliqî. Min xwe şûnve kişand. Pê hesiyam ku hundirê odê sar e. Bazdam ketim cîhê/nivîna xwe. Çend deqîqan şuve bavê min di derê odê de ket hundir. Ji min re got: "Rabe, wexta xewê nine. Dû xurîne re gerek em herin pišta xanî paqij bikin!"

Ez hinekî ji we re behsa xaniyên li gundên me bikim. Pišta hemû xaniyên gund bi xweliyê hatine girtin. Tenê pišta mekteba/dibistana gund û mizgefta/camiya gund bi sac in. Loma wexta berf dibare gerek di serê sibê de pišta xaniyan ji berfê bîn paqijkirin. Berf bi kurtman tînin rêşkirin û di

sivîngên xanî de tîn rijandin. Wexta berf lê bike û bi seetan bibare, wê çaxê di rojê de ger yek-du çaran pişta xanî were paqijkirin ku giranî zêdetir neyê ser kêran û cisiran. Dema zêde berf dibare dora xaniyan tûmikên berfê peyda dibin. Carna em zarok li ser sivîngên xaniyan xwe tûldidin nav berfê. Hinek zarok naxwazin tul bidin. Em ji wan re "tirsonek" dibêjin, bi wan henekên xwe dikin.

Ger pişta xanî were loqkirin ku dilopan neke. Loq ji kevirên reş ê pîrxonek tîn çêkirin. Loq çiqas giran be ew qas baş e. Ji ber ku loqê giran baştir pişta xaniyan didewisîn. Giraniya wî ji bona cisir û kêranan gerek tehluke jî peyda neke. Pêş lêkirina baranê li pişta xanî kaya hûr tê reşandin ku loq sewaxa pişta xanî ji xwe re raneke. Dû re jî bi daloq loq li ser pişta xanî tê gerandin. Daloq ji daran tê çêkirin. Herdû serên loq de koricên kur hene. Herdû aliyên daloq ve jî ji bona va koricana ji darê du guç hene. Va guçana dikevin koricikan, serê daloq jî bi xapikê an jî şirîkê tê şidandin ku guçên daloq ji loq nefilitin û loq di sivînga xanî de nekeve jêr. Dema loq di sivîngê de bikeve, cardin hanîna wî ya li ser pişta xanî gelek zehmet e. Tehlukeya şikandina loq jî heye ku, di nivê zivistanê de peydakirina loqê din herî zahmet e.

Ji ber ku dîwarên xaniyan ji berf û baranan bîn parastin, pişta xaniyan ji her aliyekî ve qasî bostekî li ser dîwaran re derdikevin der. Em ji wan re sivîng dibêjin. Sivîng jî ger bîn dewisandin ku avê bernedîn dîwêr û bi xwe jî saxlem bimînin. Sivîng nayên loqkirin, ger bi şonikan bîn kutandin ku xweliya li ser bidewise. Luqkirin karên mêran, sivîng bi şonikan kutandin jî karên me zarokan e. Di dora pişta her xaniyekî yan yek an jî du çirik hatine darxistin ku ava ku li ser pişta xanî bi çirikan ve berjêr biherike.

Şewên zivistanê dirêj, rojên wî kin in. Roj zû derbas dibin. Dû şîva êvarê em zarok derin ba dapîr û babîrên xwe ku ji me re çîrokan bibêjin. Dapîra min çîrokbêjek meşhûr e. Jinên gund bi çîrokên ku ber devê dapîra min girtine zarokên xwe dikin xewê. Carna bapîrê min jî çîrokan dibêje. Ew zêdetir behsa bûyerên kewn dike. Ew jî bo me mîna çîrok in. Carna jî cîran tîn oda mêvanan. Ser bûyerên wê rojê sohbet dikin, carna jî li ser bûyerên berê.

Di gundê me de cêran tuneye ku televîzyon hebin. Radyoyek me ya bi pîlan dişuxule heye. Em zarok wê guhdarî nakin. Her tişt bi Tirkî ye. Bi Kurdî qet tişteyê nayê gotin. Bapîrê min êvaran ji bo nuçeyên bi tirkî guhdarî radyoyê dike.

Wexta dapîra min çîrokên xwe diqedîne wusa dibêje: "Çîroka min çû diwaran, rehmet li dê û bavên guhdaran." Va jî çîrokan min e, çîroka zivistanê me zarokên gundî. Rojên me yên zivistanê wusa derbas dibin.✶

Stuttgart, 06.03.2012, Sêsem.

## Epîlog

J.Ahmed Yıldız

jîyan li pey xewnekê dibore  
xewn li ser milên rastiyê  
ji jiyane girantir

ne karê demsalan bû  
peyketina peyvan  
peyv li ser zimanekî  
pir çaran ji şûrekî girantir

-her car şûna şûr diêşe-

êş  
peyva êşê  
êşa peyvê  
peyv diêşî  
û  
êş dipeyivî

# Şivanê Kurd

**PAŞA AMEDÎ**

pasaamedi@gmail.com

**D**i çanda Kurdan de cotkarî û ajalvanî gelek pêşve çûye, ji ber ku kar û pîşeyê wan tim ev bûye. Şivantî jî karekî pir cudaye û ne hunerê her kesî ye. Ji bo vê malbatên ku şivantî nekiribin tune ne an jî kesek bê agahî tune ye. Ji ber vê cihê şivantiyê gelek girîng û bi qîmet e.

Em 'ewil pezan nas bikin, sê çeşît rengê pez hene; pezê sor, spî û reş. Xûyê bizinê bi rik û har e, mih jî sernerm û mûlayim e.

Pezê nêr û mê li gor salên xwe tîn binavkirin: Pezên mêşîn/miyê nêr; berxên ku nû zaye berxê virnî, ê ku salekê xwe tijî nekiriye hilû, yê bi ser salekê re kavirê nêr, ê du salî re hogeç, ê sê salî beran, ji vir şûnde beranê qert(maz) tê gotin. Yên mê re; berxa virnî, kavira mê, berinbîr, bizaştir û miha yeksalî, yê din du berî, sê berî û miha qert tê gotin.

Terşê bizin jî: Ê nêr; kar, gîskê nêr, hevûrî û nêrî. Yên mê jî kar, gîska mê, tiştîr, bizaştir û bizin.

Şivan û pez herdu jî heval in, tu car ji hev naqetin. Şivan li pez mêze dike, diçêrîne û xwedî dike. Li berxên biçûk jî zarok lê mêze dikin yanê jê re berxvan tê gotin.

Di tûrê şivan de; kêr, ar/agir, xwêy, şekir tim û tim tê de heye, car jî gobal, şiv an ço, tizbî, û ji bo ku kilamê Kurdî guhdar bike, radyonê ji xwe qet naqetîne. Kulavê xwe tim li xwe nêzîk dihêle çavê wî tim lê ye. Çeka şivan jî tim di ber de ye. Cilên wî çefî, egal û şal e.

Kulav ji şivan re tim star e di her demsalê de, di germ û sermayê de. Çekên/cil şivan ê sermayê tim pê re ye, yan jî li hola dihêle.

Şivan serê sibê şefeqê zû, ku çav der û dorê nabîne, yan hîna şev reş e di hûnikaya sibê de pezê xwe digre hêdî hêdî digre dibe li cihê beyar û pirêzê de, diçêrîne ku pez têr bixwe. Bi roj jî ku hewa germ dibe pez nikare biçire, pezê xwe tîne li ser cirna kaniyekê av dide, paşê jî ku sî hebe dibe bin siyê mexel dike, ku sî tunebe li cihê hênîk mexel dike. Cihê bêriya her kesî diyar e, bêrivan tîn, xwarina şivan tînin şivan xwarina xwe dixwe, bêrivan jî pezên xwe didoşin, şîrê xwe digrin, û xatir ji şivan dixwazin û derin malê.

Şivan li ber êvarê di dema hênîk de pezê xwe digre û dibe

---

Di aqil û heşê şivan de, di jiyana wî de çiqas pez, çêrandin, çol û zîyan û ezman be, jiyana wî tev ev be jî lê hestên wî jî hene, stranên dibêje, kilamên xweş bi bilûrê dibêje, deng û bilûra wî ji pez re wek zingil, ji çolê re jî dibe dengê musîkî. Şivan bi bilûra xwe bi awazekî şêrîn xwe, û hevalên xwe kêfxweş û şa dike

---




çêrandinê, mêrg û zeviyan dever bi dever digêrîne. Êvarê mixurbê jî li nêzîkê hola pez dihewîne, bêrîvan tên şîrê xwe didoşin û karê berîvanan wê rojê li çolê diqede.

Şivan tim li ber pez e û her daîm şiyar e, bi çav, guh û hestên xwe tim bi çarçav e. Pez bi roj û şev tim di talûkê de ye, talûke; diz, gur û dijmin e.

Carna ku şivan ji holan an ji malan dûr dikeve an jî xwarina wî diqede şîr digihêje hewara wî, carna nanê xwe yê hişk hûr dike û dike nav şîr, carna jî ku xwarin hebe an tune be jî şîr tim li cem e û dikare şîrê xwe bidoşe, şekirê xwe têxe nav û vexwe şîrê teze û bi tehm.

Şivan bi şev pezê xwe diçêrîne, çimkî bi şev hênîk e û pez xweş diçêre, wexta ku pez westiya an têr bû, pezê xwe mexel dike. Ji bo ewlehiya xwe û pez, ku şivan radikeve mihekî an bizineke ya ku kerî kiriye (‘elimandiyê xwe) bi bend bi xwe ve girêdide ku bi şev di xew de pez bê xeber û destûra şivan neçe deran û wenda nebe, an jî ku gur û diz werin bi vekîşiyayê an bi çûyîna pez re şivan bi pêz şiyar dibe.

Şivan çiqas şivan be, şivan ne bi tena serê xwe ye, kûçîk jî alîgirê şivan e, kûçîk hevalemî dilsoz e, şivan ji kûçîkê xwe qewetê digire û tîrsa wî diçe. Lê ji bo çî dibêjin “kûçîkê pez.” Kûçîk bi şev an bi roj kûçîk tim ji pez re ewle ye û pezê distirîne, ku kûçîk talûkekê dibîne guhê xwe tûj/mûr dike, çavên xwe jî bi baldar li nav pêz, der û dor mêze dike û digere, ku reşîkek an jî mirovek xerîb bibîne diewite dibe “ewt ‘ewta” kûçîkê. Şivan û pez bi wî dengî şiyar dibin, û dizanin ku talûkek heye û pez



xwe ji wî talûkê distirîne. Ku talûke derbas dibe kûçîk asta alarma xwe dadixîne û dikeve normalê, kûçîk ji pez re dibe destber, pez bi pê ewle dibe û bi rehetî diçêre.

Kûçîkê şivan weke şivan li dora pez digere, dere û tê, û pez berhev dike. Ku kûçîk bêhna xerîbî, gur û cinawir digire di dora pez de dere û tê li pez û xwediyê xwe miqate dibe.

Pez malbata şivan e! Çimkî şivan ji bo pez malbata xwe diterikîne, jiyana wî tim dibe ew. Pez çiqas bê hiş û ziman be jî di navgîna şivan û pez de ragihandinek heye û şivan bi zimanê pez dizane; “Hîrrrrr (ji bo ku pez here.” Ji bizinan re “‘ey ” (ji bo şiyarbûnê), “Tîbvê (ji bo ku pez were)”, li ser avê “dirêyyyy (ji bo av vexwarina pez)”, “hohoho-oooo, hooy (ji bo ku pez komê serhev bibe)...

Şivan li pezê xwe miqate dibe, wek bayterek çî nexweşiya wê hebe li gorî wî derman dixwaze û didiyê. Kijan pez bi xwînê dikeve, xwînê jê ber dide. Dizane ku kîjan peza wî avis e, li ber zayîne ye. Wexta ku pezê wî dizê kar an bexê virnî dide ber dê, mih jî lê

didalêse, paqij dike mîna canê xwe. Şivan pezê xwe derman dike ji bo qijnik û qirnîkan carnan jî serşoyê pez dike. Ji pez re nexweşiya pez a pir xerab tewek e, ku pez bi tewekê bikeve pez tev pê qir dibe...

Di mewsiîma/demsala biharê de dema ku hewa germ dibe pezê xwe bi hevingê diqusîne heriya wî berhev dike xwedî pez heriya xwe dibe mal.

Di aqil û heşê şivan de, di jiyana wî de çiqas pez, çêrandin, çol û ziyar û ezman be, jiyana wî tev ev be jî lê hestên wî jî hene, stranên dibêje, kilamên xweş bi bilûrê dibêje, deng û bilûra wî ji pez re wek zingil, ji çolê re jî dibe dengê musîkî. Şivan bi bilûra xwe bi awazekî şêrîn xwe, û hevalên xwe kêfxweş û şa dike.

Pez bi bilûra şivan wer dibe ku êdî pez bi dengê bilûrê zane ku şivanê wî kê ye. Şivan ewqas ku pêş de diçe ku bi bilûrê pez dajo, vedigerîne û dimeşîne. Bilûr dibe ragihandina pez û şivan. Şivan bilûrê dikemilîne. Çawa ku şivantî hunerê şivan e, bilûr jî ewqas hunerî wî ye.

Şivan li çolê bê lîstik jî nabe, şivanên deverê hin caran tên cem hev sêgavkê, bezandin, çilûlî... dileyzîn û di bazdanê de jî govendê girê didin û şexanî, delîlo... dileyzin û direqisin bi kêf û coş.

Kesek nikare karê kesekî bike û karê yê herî xweş pişe ye. Şivantî ne karê her kesî ye û ne rehet e û gelek dijwar e. Şivan tim şiyar e, aqil û heşê wî tim li ser pez e, pezê xwe nas dike, zane ku pez nexweş e, westiya ye an tî û birçî ye, bi meş û helwesta wan bi pez dizane. Yanê şivanê me yê Kurdan tam şivan e û di karê xwe de hunermend e. 🐾

# Ehmedê Xanî muzîk, armonî û nîzam

**CENGÎZ MAMO**

adarbesyo41@hotmail.com

**F**eylezof, fikirmend û raman-geh Ehmedê Xanî di berhema xwe ya nemir Mem û Zînê de bi zimanekî wêjekarî û bi mejûyekî civakî û bi bang û qêrîneke bi zimanekî şîer hizra xwe digihîne ruh û giyana me. Ramangehê mezin Xanî dema berhema xwe ya nemir û abadîn ava kir xwest ku nîzamekê bide civaka me Kurd û li ser vê nîzamê xwest tifaqeke ava bike û bide çêkirin û xwest li ser vê avadanî û çêkirinê ruh û giyanekê bide civaka me Kurdan û dîsa sêwirmanê hêja Xanî li ser hîmeke civakî ye û angaştakarê mezin û hêja xwest bi sembol, nîşan û karakteran peyam, şîret û hişyariyê bide civak û komela me Kurdan. Jixwe Ehmedê Xanî dema sêwirandina xwe ava kir wî xwest civak û komela xwe hemû bi motîv û metaryalên Kurdistanî ava bike û bingeha xwe ji civaka Kurdistanî bistîne û ji ber evan tiştana Xanî her dem û her car komelparêz e.

Dema em seydayê mezin xwediyê destan û berhema xwe

ye nemir û abadîn a Mem û Zînê dixwînin, em dibînin ku Xanî li pey tifaqeke Kurdan e û ew dixwaze ev tifaqa Kurdan bi civak û Kurdistanî û Kurdewarî bixemilîne. Dîsa zanyar, feylezof, fikirmend, civaknas, niştimanperwer, civakparêz mirovparêz Şêx Ehmedê Xanî li cîhanê û gerdûnê û feyzê û li civak û mirovahiyê tevayî dinêre û dinirxîne, wî tu car diyarde bi yek yek nexist dest û nenirxand; wî bi nêrîneke tevahîkar û berhevkar li cîhan û gerdûn û civakê nerî û xwest ku li gor pîvanê tevahîkar tevbigere û ji ber van tiştina dema sêwirandina xwe ava kir xwest di hundir vê avahiyê civakeke yekdest û tifaqî biçêrisîne û li gor ruh û giyana vê civakê an jî ruh û giyana vê civakê bi armoniyek û bi dengekî dengbêjkarî û bi mûzîk û ahengek Kurd û Kurdistanî disiplîne bike û nîzameke Kurdewarî derxîne pêş.

Weke çawan feylezofê Alman ê navdar Hegel yekdestiya gelê Alman di mejiyekî

---

Xanî di berhema xwe ya nemir Mem û Zînê de bîst û heft meqamên muzîkê bi kar aniye û bîst û du amûr û haletên muzîkê şixulandiye û daye xebitandin

---

yekgirtî de dîtîye û weke çawa feylezof Hobbes di berhe- ma xwe ye navdar Levîathan de gotîye, “Yekitiya civakê di hêzbûn, xurtbûn û li derdor û berhevbûna desthilatdariyê dîtîye” û weke çawa xwediyê îdealîzmê feylezofê Yewnan ye- kitiya civak û gelê Yewnan di tifaqekê dîtîye û gotîye -ji bo ci- vakek yekdest bê avakirin divê zîhn û mejiyê mirov paqij be û ji bo rastî û qenciye amade be, lê li hêla din jî ji bo mejî û zihnên paqij gerek bedena mi- rov jîrek û mahir be û xurt be û ji ber vê yekê gerek civak û komel bi nîzamekê perwerde û hînbûna jîmnastîk û muzîk û armonî û ahenga evan tiştana bê disîplînekirin- her weha xwediyê berhema xwe ya netewî û nemir Ehmedê Xanî jî di Mem û Zîna xwe de gelek caran dixwaze bi xemlên Kurdistanî û bi armoni- yeke Kurdewarî civakê bîne ber nîr û nîzamekê.

Xanî dixwaze bi ahenga sema, govend û bêrîteyê bangî kesayetan bike û evan kesaye- tan bi armonî û ahenga muzîkê û bi geş û tevgera muzîkê tevî tifaqeke civakî bike. Li gor Xanî ruhê mirov bi pênuşa xwe ya pîroz û bi hibra xwe ya derman dirijê ser giyana me û dibêje: Cihê sema, govend û bêrîte lê hebe li wê derê tifaqî û ruhekî ahengî û tevahîkar heye. Xanî dixwaze bi giyanekî viyan bangî kesayetan bike û me weke kesaye bi -reqsê- ji xwe derxîne nav civakê û wan jî tevî govend, sema û bêrîteyê bike û bi van mudaxeleyan xwe yê civakî, komela xwe bike yekdest.



Xanî  
dixwaze bi ahenga  
sema, govend û  
bêrîteyê bangî  
kesayetan bike û evan  
kesayetan bi armonî  
û ahenga muzîkê û bi  
geş û tevgera muzîkê  
tevî tifaqeke civakî  
bike.

*hin mest û hinek dikir di bengî  
xwenende û bezlego û çengî  
her bengî û serxweşê di bohtan  
têk hatine çerx û baz û lotan  
bêrîte sema û saz û govend  
şîrîn û şekerleb û şekerxend  
ezra û rewal û bikr û murdan  
horî û melek û perî û wîldan*

Fikirmend û ramanwarê me- zin û hêja û bêhempa Ehmedê Xanî dixwaze bi bikaranîn û şuxilandina armonî û muzîkê ahengeke Kurdistanî pif ke gi- yana me û nîzameke Kurdewarî radesî mejiyê me dike. Seydayê mezin xwediyê destana netewî û a nemir û abadîn Mem û Zîn bi vê huner û hunermendiya xwe ya bêhempa dersê dide me Kurdan û ji ber vê yekê em jê re dibêjin seyda...

Dema em berhema zanyarê mezin Mem û Zînê dixwînin, em di gelek merhele û qonaxan re derbas dibin û em merhela armonî û muzîka Kurdewarî jî yek ji wan e û em bi van qo- noxan ku Xanî di Mem û Zîna xwe de ava kiriye, şad dibin û em digihêjin tameke xweş. Xanî

di berhema xwe ya nemir Mem û Zînê de bîst û heft meqamên muzîkê bi kar aniye û bîst û du amûr û haletên muzîkê şuxulan- diye û daye xebitandin. Weke em lê dinêrin hîn jî li ax û welatê Kurdan û Kurdistanê ev meqam û halet û amûrên mûzîkê tèn şuxilandin û bikaranîn. Fikir- mend û zanyarê mezin Xanî di Mem û Zîna xwe de xwest ku xwe bigihîne ruh û giyana me. Weke hûn jî dizanin muzîk û armonî û ahenga muzîkê cew- hera giyana kesayet û mirovan e. Xanî van tiştan baş dizane û xweş dahûrandiye û li gor van pîvanan dixwaze bi ahengek û armoniyake Kurdistanî civakê têxe nîzameke tifaqî û dixwa- ze bi muzîk û armoniyeke Kur- dewar giyaneke û komeleyeke Kurdistanî ava bike. Ala ku Xanî bi peyv û hevokên netewî û niştimanî xemilandiye emê hîn bêtir bi jorde pêl bikin...

## Di Kurdî de kurtkirina navên kesan û sedemên wê

EMRE MEHENÎ

**D**ema ku ez zarok bûm bavê min her dem gotineke pêşiyar digot. Gotina wî wiha bû:

-“Bi tayê Elo û Welo danekeve bîrê.” Min her dem ji bavê xwe pirs dikir û min digot:

-Bavo gelo Elo û Welo çi ye? Her dem bersiva bavê min ev bû:

-Ma qey tu nizanî çi ye? Û herdem bi vî rengî pirs min bê bersiv dima.

Dem derbas bû û min dest bi dibistanê kir. Rojekê nameyek hatibû gund. Mamoste ev name ji navçeyê bi xwe re anîbû. Mamoste bang li min kir û got:

-Kuro ma kesekî bi navê “Salih Beg” li gund heye?

Min got:

-Na mamoste, kesekî bi vî navî li gundê me tune.

Çend deqîqe derbas bû û min dît “Apê Salo” hat cem mamoste û wiha pirs kir:

-Mamoste divê nameyek li ser navê min hatiba navçeyê. Gelo te tu agahî jê standiye?

Mamoste jê pirs kir:

-Navê te?

-Salo

-Na bi vî navî tu name tune, lêbelê bi navê “Salih Beg” nameyek hatiye.

-Mamoste ew nameya min e. Ji ber ku di nasnameyê de navê min “Salih e” lê gundî ji min re dibêjin “Salo”.

Û bi vî rengî Apê Salo name ji mamoste

girt. Min di dilê xwe de got: “Apê Salo mamoste xapand.”

Piştî ez çûm mal û min ev mijar ji bavê xwe re vekir. Min got: “Bavo, apê min ê Salo çima mamoste xapand?”

Bavê min got:

-Na kurê min ewî mamoste nexapandiye. Navê wî bi rastî jî Salih e. Lê ji ber ku em Kurd navên hev bi kurtî dibêjin, navên me yê bi rastî gelek caran nayên zanîn. Em gundî ji apê te re dibêjin Salo, lê navê wî Salih e.

Wê demê min fam kir ku Elo; Elî ye û min fam kir ku Welo jî; Welî ye. Dîsa min hîn baştir fam kir ku di Kurdî de navên şexsan bi kurtî têne gotin û ji ber vê yekê jî carinan xeletî derdikeve holê.

Gelo Kurd çima navên hev bi kurtî dibêjin? Ma qey gelek zahmet e ku mirov ji dêvîla Elo bibêje Elî û nebêje Welo, bibêje Welî. Yan jî dema ku mirov ji dêvîla “Salo” bibêje Salih, ma qey wê morîkên mirov birije. Ka sedemên vê kurtgotina navan çi ye? Dibe ku gelek sedem hebin lê li gorî min du sedemên berbiçav û xwedî bandor hene û ez ji yê din bêhtir, li ser van herdu sedeman disekinim. Niha her du sedemên ku min tespît kirine ezê bi we re parve bikim:

Yek: Gelê Kurd di dîroka xwe de tu caran weke milletên din bi rêzimana xwe perwerde nebûne. Ji ber vê yekê her dem mehkûmî peyvên devokî û herêmî/zimanekî zardevkî

**TABLO 1: ŞÊWEYA KURTKIRINA NAVÊN JINAN**

BIKARANÎNA BI KURTÎ	BIKARANÎNA RAST YA BI KURDÎ	BIKARANÎNA BI KURTÎ	BIKARANÎNA RAST YA BI KURDÎ
Bedrê, Bedro	Bedriye(a)	Hemdo	Hemdiye(a)
Beho	Behiye(a)	Hezbo	Hezbiye
Berfo, Berfê	Berfin	Leto	Letife(a)
Cazo, Cazê	Caziye	Meko	Mekiye(a)
Cemo	Cemîle(a)	Meyro	Meyrem, Meryem
Elê	Elîf	Remzo	Remziye(a)
Emo	Emîne(a)	Sako	Sakîne
Ezo	Ezîze(a)	Seyro	Seyran
Fedo	Fedîle(a)	Sito	Sitî
Fato, Fatê	Fatîme	Xeco	Xece
Gulo	Gulseren	Xeyro	Xeyriye
Hêlo	Hêlîn	Weso	Wesile(a)
Hedo	Hediye(a)	Zeho	Zahîde
Helê	Helîme(a)	Zelo	Zelîxan

bûye û ji bilî hinek edîb û dehayan para xwe ji belaxata peyvê nestandine. Ji ber ku Kurd li gorî rêzimana Kurdî neaxivîne beyan û fesahata zimanê wan jî her dem veşartî maye. Ji xeynî çend nimûneyan jî Kurdî nebûye zimanê rewşenbîrî û rewşenbîran. Bi vî rengî Kurd nebûne xwedî zimanekî standart û di encama van sedeman de jî her herêmeke Kurdan li gor devoka herêma xwe navên şexsan kurt kirine. Kurdan çawa jiyana xwe bi koçerî, rênçerî û cotkariyê derbas kirine û şertên jiyana wan dijwar bûye û ji gelek tiştan dûr mane û kêfa wan her dem ji ya hevalên wan kêmtir maye, her wiha navên hev jî, heta ji wan hatiye kin kirine û weke kêfa wan navên wan jî, ji yê heval û hogirên wan kêmtir maye û piştê ev rewş (kurtkirina navan) di nav gelê Kurd de bûye weke tiştêkî xwezayî.

Du: Di dîrokê de gelê Kurd her dem weke eşîr û qebîle bi hev re jiyane. Têkiliyê Kurdan yên xizmî

her dem bi hev re gelek xurt bûye. Ji ber ku gelê Kurd bi piranî li gundan bi cih û war bûne, yan jî li herêmekê koçerî kirine umrek bi şev û roj li cem hev derbas kirine. Di şînan de bi hev re giriyane, di

şahiyan de bi hev re keniyane. Vê rewşê heta îro jî berdewam kiriye. Niha her Kurdek, dibe ku bi hezaran xizmên wî yên ku mensûbê eşîra wî hebe û ne tenê di şîna û şahiyana, her wekî din her gav û seet di her mijarê de bi hev re didin û distînin. Di encama vê hevrebûnê û nêzîkbûnê de Kurd bi hev re gelek samîmî bûne, nêzîkbûnek ku nayê tarîfkirin di nav xwe de tesîs kirine. Têkiliyên wan yên civakî gîhiştine asteke bilind. Îcar çawa dema ku kesek bi pitikekê re, yan jî bi zarokêkê re dilîze û pê re şad dibe bi zimanê wê pitikê, yan jî bi zimanê wî zarokê pê re dipeyive; mîna wê jî milletê Kurd weke delalîyekê, yan weke îfadekirina ji hev hezkirinekê navên hev kin kirine û dema navên hev gotine bi kurtî gotine û bi kurtî bang li hev kirine. (Binêre li Tabloya 2).

**TABLO 2: ŞÊWEYA KURTKIRINA NAVÊN MÊRAN**

BIKARANÎNA BI KURTÎ	BIKARANÎNA RAST YA BI KURDÎ	BIKARANÎNA BI KURTÎ	BIKARANÎNA RAST YA BI KURDÎ
Ado	Adem	Mîsto, Mistê	Mîstefa
Bedo	Bedredîn	Neco	Necmedîn
Beko	Bekir	Neyto	Neytulah
Bro	Brahîm	Osê	Osman
Celo	Celal	Pîro	Pîran
Cibo	Cibrîl-Cibraîl	Qado, Qadê	Qadir
Dawo, Dawê	Dawid	Quto, Qutê	Qutbedîn
Dîzo	Dîzdar	Remo, Remê	Remezhan
Ebo	Ebbas	Reso	Resûl
Eşo	Eşref	Reşo	Reşît, Reşat
Eko	Ekrem	Salo	Salih
Elo	Elî	Silho	Silhedîn
Evdoo, Evdê	Evdîla	Silo	Silêman
Eyo	Eyûb	Sîno	Sînan
Heso	Hesen	Simo	Simail (Îsmail)
Huko	Hikmet	Seydo	Seyidhan
Huso	Hisamedîn	Seyfo	Seyfedîn
Îdo	Îdan	Şêxo, Şêxê	Şêxmûs
Mamo	Mahmûd	Teyo	Teyîb
Maro	Marûf	Ûso, Ûsê	Ûsiv (Ûsib)
Miho	Mihyedîn	Welo	Welî
Mîrzo	Mîrze (Mîrza)	Xeto	Xetîb

# Hişyarî!

MIHEMED SOYSAL

**P**azdeh sal berê bû. Ez û heval carnan, em diçûn taxa jêr. Ji bo sohbetek li ser mijara bîr û baweriyê. Temenê min 25 salî bû. Carna mafê dersdayînê hevalan didane min. Guhdarên li hemberî min piranî karker û cotkar bûn. Wê demê ez mamoste bûm. Di wê demê de dersa Rîsaleyên Nûr tev bi Tirkî dihat kirin. Di wê nezanî û ciwaniya xwe de, min nedivîya ji guhdaran re Tirkî dersê bidim û bixivim. Fitreta min nedixwest. Weke ku min fedî dikir ez dersa xwe bi zimanekî biyanî bikim. Şîroveya meseleyan ji min re giran jî dihat. Lê dîsa jî min li ber xwe dida. Ev nêzî du sal e ku gil û gişek di hiş û dilê min de derbas dibe. Ez dixwazim ji hevalên xwe re û ji raya giştî re parve bikim. Weke ku em tev dizanin, micedidê dema me Bedîuzzeman Mele Seîdê Kurdî:

“Rebê mezin heşra me gişa bi wî re binivîsîne” ku ew bi xwe jiyana xwe bi dualî dike; dibê “Seîdê Berê û Seîdê Nû.” Seîdê berê dema li bajarê Wanê bû, wekî her deverê Kurdistanê di medreseya

Seyda de jî zimanê perwerdehiyê zimanê Kurdî bû. Lewre şagirt tev Kurd bûn. Heta ev çend salên dawiyê jî di medreseyan de karê perwerdehiyê bi zimanê Kurdî dihate kirin. Mixabin ev çend sal e ku em dibînin û dibihîzin, di medreseyan de, dersên olî ku tên kirin û tên dayîn, ji nivî zêdetir bi zimanê Tirkî ye. Pêwist e meriv li ser vê mijarê lêkolîn bike. Her wisa, qeder û sedemên zahirî Seydayê me koçberî Anadolê kir. Wî dest bi nivîsandina Rîsaleyên Nûr kir. Ger li girtîgehê û ger jî li derve Xwedê gelek şagirt nesîbê wî kirin. Ev şagirtên nû, istisna ne tê de, ji Zimanê Kurdî re biyanî bûn û ji Zimanê Kurdî bê xeber bûn.

Seyda bi zimanekî ku şagirt jê fam bikin bi wan re diaxivî û ji wan re dinivîsand. Ev rewş gelek li gorî belexetê bû. Ango Seyda bi zimanê Tirkî bi wan re suhbet dikir. Bi zimanê Tirkî berhemên xwe dinivîsand. Wê demê li gorî rewş û belexetê gotiye ku: “Rîsaleyên Nûr bi Tirkî hatiye tehsînkirin. “Lê piştî demeke kin, hin kesayetên Kurd jî

---

Hê jî hişê me ne li ser vê mijarê ye. Weke ku bi Tirkî ji hev re derskirin, dayîn û standin, li xweşa me tê. Yan jî weke guneh! Weke qebebet! Weke di civatê de birayekî me yê ku Kurdî nizane, ji bo dilê wî nemîne, yan jî, ji bo dilê wan xweş bibe, me Tirkî bi kar dianî

---

Seyda nas kirin û ketin nav tevgera xebatên Îman û Qur'anê, ku Seyda bingeha wî danîbû.

Xeleka tevgera xizmeta Îman û Qur'anê çiqas diçû berfireh dibû. Weke ku Seyda bi nav dike şagirtên Medreset'u-Zehra jî pir dibin. Navendên xizmeta Îman û Qur'anê êdî li bajar û navçeyên Kurdistanê jî vedibin û xwe şanî gelê xwe didin. Gelê xwe vedixwînin nûra asîmanî.

Ev medreseyên Rîsaleyên Nûr ku li bajarên Kurdistanê ava dibûn. Di wan de behsa Xwedê û Pêxember dihat kirin. Pesindariya Ola Îslamê û bilindkirina navên Xwedê armanc bû. Sed mixabin! Bi awayek ecêb û xerîb! Nizanim ji saftiya me! Ev xebata pîroz, bi versiyona Tirkî ket welatê me. Me bi vî formî ew serseran û serçavan kir. Lê em têngihîştin, me fam nekîr ku fêrkirina dersên Îman û Qur'anê bi zimanê me yê xweş jî pêk tê. Ev rewş êdî nêzî belexetê ye. Li welêt bikaranîna zimanê Kurdî û têngihîştina dersên olî bi zimanê dayikê gelekî xweş rûdine û hêsan e.

Li gorî gotina Qur'ana pîroz: "Me çiqas pêxember ji qewman re şandine, me bi zimanê wan şandine". Xweda çêtir dizane, ev rol ji bo jihevdu famkirin çêbibe lazim bûye. Jihev-têngihîştin bi zimanekî biyanî angî bi zimanekî xerîb, nabe. Dîsa di Qur'ana pîroz de derbas dibe ku: "Newekheviya ziman û rengên we, ji ayetên wî ne". Angî bikaranîna zimanê Kurdî li ser tiştên xêrbar, nexasim di karên fêrkirina rastiyên Ola Îslamê de xizmetek qudsî ye û pîroz e.

Mixabin! Me li welatê xwe yê şîrî, ji xort, keç, dayîk, bav, me-

riv û pismamên xwe re bi zimanê Romîyan ji hev re da û stand. Me dev ji zimanê xwe berda. Bi zimanekî xerîb girt. Lê xwediyên vî zimanê xerîb, li Anadolê, li welatê xwe, di medreseyên xwe de, zimanê dayikê ji xort û keçên Kurdan re, qedexe kirin. Gelek ji me ji vê rewşê haydar bûn. Lê wa esefa! Pozê me nedîşewitî. Me nedigot Rîsaleyên Seyda 30 zimanan zêdetir hatiye wergerandin. Em jî wergerînin zimanê xwe. Hê jî hişê me ne li ser vî mijarê ye. Weke ku bi Tirkî ji hev re derskirin, dayîn û standin, li xweşa me tê. Yan jî weke gune! Weke qebehet! Weke di civatê de birayekî me yê ku Kurdî nizane, ji bo dilê wî nemîne, yan jî, ji bo dilê wan xweş bibe, me Tirkî bi kar dianî. Mixabin me ji civata xwe ya ku piranî Kurd bûn tim tawîz wêdigirt. Mafê civata giştî me li ber çav nedigirt. "El hukmu lîl ekser/hikim li gorî piran e." Weke Seyda dibêje, em Kurd tim dixapiyan. Îro jî em dibînin ku di pratîka jiyana me de rola zimanê Kurdî kêmtir xuya ye û baş cih negirtiye.

Li hin deveran min bihîstiye ku dersên olî bi zimanê dayikê tê kirin. Lê ev jî, ji sedan yek e. Dema hejmarên dersên me ji sedî pêncî jortir nîn bin, bawer bikin em di xisarê de ne. Hin kes hene, ji cemaetên Rîsaleyên Nûr in, dibêjin, em li ser warê ziman û neteweya xwe di-sekinin. Em li ser vî mijarê pir he-sas in. Ez dinêrim di medreseyê wan de jî, istisna ne tê de, hema hema giştî ders bi Tirkî tê kirin. Hin rêvebiran ez bi xwe nas dikim Kurdiya wan xurt û zelal e. Dikarin bi zimanê xwe ji cemaeta xwe re ders û suhbet bikin. Cemaeta wan jî pirtirîn Kurd in. Lê

ne ji wan liv heye û ne jî, ji cemaeta wan ev xwestek nayên. Ev halê xirab ji herdu alîyan re jî xweş tê! Xuyaye ku ji hev jî razî ne.

Ez acîzane ev sal û nîv e, îstisna ne tê de. Dersa Îmanê û Qur'anê ya ji orjînalê Rîsaleyên Nûr ji guhdaran re bi Tirkî dixwînim û bi Kurdî şîrove dikim. Yan jî xwerû bi Kurdî ji wergera Rîsaleyên Nûr dixwînim. Ez dibînim ku gelek guhdar jî pê pir kêfxweş in. Dibên ev tiştêkî cuda ye. Fitreta wan ronî dibe. Hin meriv hene dersekî olî bi Kurdî digerin lê nabînin. Ez tim ji xwe re û ji hevalên derdora xwe re dibêjim. Gelo! Seydayê me gişan ku em ji canê xwe zêdetir jê hez dikin Melayê Meşhûr Bediuzzaman îro sax bûya û bihata civata me. Ku civat piranî Kurd in. Civat piranî Kurdî jî dizanin. Gelo! Ewê bi çî zimanî ji me re suhbet bikira. Ez bi eşq û dil dikarim bibêjim, dê bi Kurdî biaxivîya. Lewre ew ji her kesî zêdetir nêzî fitretê bû. Ew jî me bêhtir bi fitretê dizanibû. Seyda bi xwe dibêje: "Sed sal berê ez li Stenbolê çûm qehwexaneyên Kurdan. Bi rêyekê ku ji min fam bikin, min behsa Meşrûtiyetê ji wan re kir."

Gelî hevalan! Ew Ustad e, ku bi awayekî şahane behsa zimanê Kurdî dike. Pesnê Xelîl Xeyalî dide. Bala me dikişîneser zimanê dayikê. Dibêje zimanê Kurdî ji edebiyatê re gelek musaîd e. Ziman li ser insan mohra qedere ye. Bi zimanê zikmakî fêrbûn, weke nexşê li ser kevir jê naçe. Hiş çetel nabe.

Gelî zanyaran! Werin em tev de cardin hêz bidin xwe. Bila kes nekeve dû "kaxezên peritî". Kes nebêje Kurdiya min kêmtir e. Ez pêk nayînim. Ez ji xwe mînak bidim. Zarokî û ciwaniya min tev li nav



mirovên Tirk derbas bû. Yek hevalekî min ê Kurd tune bû. Ew Kurdiya ku min dizanibû gelekî qels bû. Îro komeleyên weke Nûbihar û Kurdî-Der li tevayî bajarên me hene. Ez bîst dersan beşdarê wan atolyeyên zimanê Kurdî bûm. Min gelek Kurdiya xwe bi pêş xist.

Ez niha bi hêsanî dikarim Rîsaleyên Seyda ji hevalan re Kurdî şîrove bikim. Ev rewş, ev kar bila çavên kesî ji me netirsîne. Hêviya min ji heval û hogirên me heye ku, xwedîtî li zimanê xwe yê şîrîn bikin. Ji bîr neyê kirin ku zimanê me, ji hunera Xwedayê mezin tê. Her wisa, xizmet û xwedîderketina ziman jî xêr e.

Kesên vê nivîsara min bixwînin bila ji kerema xwe bidin destên hevalên din jî. Di vê mijara muhîm de dibê ku min kêm yan jî zêde gotibe. Ji kerema xwe hûn temam bikin. Der heqê vê mijarê de hin hevalên din jî gotar û nivîsaran biweşînin. Şewq û xebat, wê bêtir pêş bikeve. Em her tim hevdu şiyar bikin. Mirovahî hewceyê hev şiyarkirinê ye.

Seydayê mezin dibêje: "Kesên kêmasiyên xwe qebûl bike, ew bextiyar e. Ewê qebûl neke bêbext e. Yekê ku bibêje di sitûyê te de dûpişk heye, pêwîst e em spasiya wî bikin." Li gor dîtina min, rexneyên erênî wê me pêş bixe. Banga min di serî de ji oldaran re, ji ehlê hemiyet û însafan re û ji dilsozan re ye. Serkeftin hevalbendê niyeta xalis e.✶

## Sînem<sup>1</sup>

Feqiyê TEYRAN

Transkrîpsiyon: Xweşmêr

Hewar Sînem tenê dar û zevî li min kiriye gûrî  
Hêstirê ji xeman û derdan ji çavê min 'ebdalê digilgilî  
Min ê tu xizmet ji padişahê mezin re nekirî

Min ê Sînem dîtî şeva 'erefatê  
Sînem cil dişûştin ji ava heyatê  
Dê biçim bibînim Sînemê  
Sînem nexweş e li ber wefatê

Çiqa دنیا heye geriyabûmkesê nego Sînem nexweş e  
Ez çûm hicra melan û feqiyên dinivîsan kêl û ferş e  
Hûn tenbihê bidin li mişk û maran  
Bela xêrab nekin zulfê zêrîn çavên reş e

Ay Sînem de tu rabe ev çî dem e  
Te bejn keleha Sigrîtê<sup>2</sup> sing qumaşê 'Ecem e  
Li min hatî mehka remezanê ez fitara ser te me  
Ay Sînem eger tu şêx î ez mirîdê te me

Sînem heyîva nurîn e şewqê daye ûmmetê  
Gerden şûşa hişîn e noqte noqte xal ketî  
Heçiya Sînem bibine bêşek diçite cenetê

### SÎNEM Û ÇERXA FELEKÊ

Wan zeriyan dîwanek danî Sînem hatî temam kir  
Cariyan şerbet gerandin Sînem noqtek jê ta'm kir  
Îsal sala xêrê bû miraz hatibûne hasilbûnê  
Felekê çerxek li da .....dewam kir

Sînem dûrr û yaqut e wî nîveka behrê da  
Di bibim xewas bi çemê t..... ji hutê tê da  
Yeşîn miraz hatibûne hasilbûnê felekê çerxek lida

Sînem ji bejnê ve temam e me 'eşqa dil hebandî  
Ordek golan de mane minê ji xwe re firandî  
Miraz hatibune hasilbunê felekê Sînem revandî

Şah û xwendekar suwar in herdû suwar cengîn e  
Şer kete hewşa xezimê çav reş e benda sulhê ne  
Îsal sala xêrê bu felekê çerxek lida dilê me kir birîn e

1 Ev qewla Sînemê, Feqiyê Teyran ev gotiye li ser wefata Sînemê.

2 Sigrît: Gundekî navbeyna Miksê û Hizanê ye.

Sînem digot îro ji babê xwe dil mame  
Sewda daye serê min ji 'eqlê xwe cuda me  
Felekê li me çep lêda ez ber emrê Xuda me


Ji xula xelqê ez dîn im her daima dirûnim  
Sewda daye serê min şubhê bilbil dixunim  
.....

Ay Sînem ji xelqê dî ye ku xweşiya me pîrr heye  
Xweşiya me qet tunîne derman xasê Xuda ye  
.....

Ez Hîzanê dihebînim salê dû caran bahar e  
Sorgul baxan de kemilîn bişkiwîn belg û dar e  
Mîraz hatibûn hasilbûnê felekê kir xedar e

Ez Hîzanê dihebînim zêde taxa Qenterê  
Feqe û melayê medresê hezar mal dane defterê  
Îsal sala xêrê bû mîraz hatibûn hasilbûnê  
Felekê çerxek li da mîr berê me da seferê

Ez Hîzanê dihebînim zêde taxa Seraşan  
Sorgul baxan da kemilîn berê xwe dane Xaşxaşan  
Yeşîn îsal sala xêrê bû mîraz hatibûn hasilbûnê  
Felekê çerxek lida kûl kete nava oldaşan




## Berfdumsk

### Yavuz Acun

Sala berfa sor bû  
sirrên ecêp fûriyan  
li ser rûyê çiyayan  
Hinekan got sorik in  
Veşartin zarok  
hinkan got mîrkutok in  
qefle qefle reviyân  
Mîn şibaka xwe vekir  
çûkek biçûk qefilî bû  
mîn ba Xwedê kir  
deng dûr çû  
dûr kûr bû  
kûr kor bû  
kor kerr bû  
mîn fedî kir ji xwe  
Berfa kulîsor dibariya  
Berfek hinekirî  
ji paxla ewrên xûmrî  
xwîn dirijiya

Mîn ba diya xwe kir  
-dayê çî hatiye bi van  
çiya  
diya mîn keniya  
-qey bêriya berfdumskê  
kirin  
lawê mîn...  
-qey...



**B**elê Wan bajarekî rojhilat, serhedî, herêma av û tavê, warê Hûrî, Asûr, Med, paytextê Urartuyan û “landika şaristaniyê” ye.

Mixabin di 23ê Cotmehê û 9ê Mijdarê de du erdhejên mezin bi ser Wanê de hatin. Bi rastî min dixwest bibêjim erdhej derbas bû, lê belê Wan hê diheje, dê kengê bisekine Xwedê dizane. Tiştê ji destê me tê dua ye û tevdira xwe standin e, paşê jî emê bibêjin tewekel Xweda.

Gelo di erdhejê de çi hate serê Wanê: Di navbera heftsed û heştad kesî de, meriv çûne ber dilovaniya Xwedê. Qasî hezar kesî jî birîndar bûne (Xwedê rihma xwe li wan bike, ji birîndaran re şifa û nas û dostên wan re sebir dixwazim). Sî hezar avayî an xira bûne an jî ê werin xirabkirin, bi sedan dibistanan xesar dîtine an jî xira bûne, çarsed hezar kesî Wan terikandine, bi hezeran esnafan derê dikanên xwe daxistine, bi hezaran kes bê kar û bê şuxul mane, jimara wan nizamim gelek xwendevan û pispor jî (karmend, karker, bijîşk, endezyar, hunermend, karsaz, hosta hwd.) ji Wanê derketin, ji

derve re tayin xwestin. Hikûmetê jî tayin qedexe kir, rêya revê girt, tişteki zehf baş kir. Lê belê gelek karmendan ev rêya girtî, bi rapor (çendî raporên rast jî hebûn) û hîleyan qul kirin. Camêrên amedeyiya çûyina xwe dikirin, germayiyêke wiha didan ber dilê xwe: “Wan heta deh salan bi ser hemdê xwe ve nayê, ma tu Wan bi hêviya min maye. Zarê min dixwînin, xanim nayê.” Dema meriv bê dilê xwe bû, di hişê xwe de xilas kir, mane zehf in. Ew ên di rojên xweş de hezkerên Wanê bûn, wiha digotin: “Di ser Wanê re kêmbajarên xweş hene. Paytextê Serhedê ye, ev tav û ava (behr) Wanê besî her tiştî ye.” Di tirkî de jî gotineke wiha heye: “Dünyada Van, Ahirette iman! (Di dinê de Wan, di axretê de îman!)”

Piştî erdhejê rewşa Wanê û gelê wê çawa bû? Belê dema ku Wan hejiya, pê re Colemêrg û Gever hejiyan, pê re Bedlîs, Tetwan û Hîzan hejiyan, pê re Agirî, Bazîd û Panos hejiyan, pê re Mûş, Milazgir û Kop hejiyan, pê re Sêrt, Berwarî û Dihê, Şirnex û Cizîr hejiyan...

Piştî erdhejê rewşa Wanê û gelê wê çawa bû? Belê dema ku Wan hejiya, pê re Colemêrg û Gever hejiyan, pê re Bedlîs, Tetwan û Hîzan hejiyan, pê re Agirî, Bazîd û Panos hejiyan, pê re Mûş, Milazgir û Kop hejiyan, pê re Sêrt, Berwarî û Dihê, Şirnex û Cizîr hejiyan...

Ev bajar û navçe tamamî, ji gelek aliyên xwe ve girêdayî Wanê bûn. Gelek kesên ji van bajaran, pismam û xisimên wan li Wanê rûdiniştin. Çiqas kirîn-firotin, hatin-çûyin, mêvandarî, ger û geşt, şîr û şahiyên mezin, civîn, mitîng, daxuyanî, nerazîbûn xwepêşandan, konferans, seminerên zanistî, zanyarî, komeleyên çand, huner û edebî ên herêmî di Wanê de çêdibûn û çareser dibûn. Serê kê biêşya, nexweş bûya, bêhteng bûya, berê xwe didan behra Wanê, kelha Wanê, sûka Wanê, Artemêtê, ciyên geştê, xwaringehên taştê, masiyên Wanê, ciyê firavînê, xwarinên herêmî, (keledoş, kiftê Kurdan, helîse, sengesîr û şorav...). Gotineke Colemêrgiyan a wiha heye "maleke te li Wanê tune be bizanibe tu bêmal î." Taybetiyên Wanê ên çandî û hunerî, bi jimarê xilas nabin. Wan bi der û dorên xwe ve, ji aliyê aborî, çand, huner û sîyasî ve bi hev re hejiyan. Em werin bersiva pirsê xwe; dema ku erd hejiya "Xwedê nîşanî kafir û dijminan neke." Her kesî mal û halê xwe hîştin, reviyên, an jî pismam û xismên wan hatin û ew birin. Wan vala bû, dema ku dibû êvar meriv bi bêkesbûnê, xirabûnê, bê cînarbûnê (ew cînarê ku te jê hez nedikir, bê selam di ber re derbas dibûyî, niha çavê xwe lê digerinî ka ku derketa, min selam bikira dibêjî) çî feyde ye xêncî se û kûçikan, diz û şêlankeran di kolanên Wanê de kes tune, ronayî tune, meriv tune ne, tarîfî heye bêkesî, bêcînarî, bê heval û hogirî....

Wek xewnekî bû, bavê min ez şiyar dikirim "Kurê min gumana xwe ji Xwedê nebirin. Çi te jî wî, tu kes tune be jî Xwedê heye, bes e." bi vê gotinê ez dihatim ser hemdê xwe. Dema ku min hal û dîmenê Wanê wiha didît gotineke pêşiyên dihat bîra min, "Mekan xweş e bi mekînan". Tu dibê qey ev gotin ji bo erdheja Wanê hatiye gotin.

Ewil bajar û navçeyên derdorê Wanê hatin alîkariyê, paşê jî însanên dûr alîkariyên xwe şan-

din. Gelê Kurd bi dil û can, zar û zêçên xwe ve alîkariyêke dîrokî kirin. Kurdistana Başûr û gelê wê, Serok Mesûd Berzanî û Weqfa Mele Mistefayê nemir û komelayên din, ji tevayiya wan re gelê Wanê minetdar e, Xwedê ji wan razî be. Ji bo desthevgtin, yekîtiya me tiştêkî girîng kirin. We rûyê xwe û rûyê me tev spî kirin. Hûn her hebin. Xwedê rojên wiha neyine serê we. Em spasîya xwe ji bo gelê Tirkîyê, hemûyan re dikin. Wan jî bi dil û can alîkarî kirin. (Bi rastî hinek nîjadperest kêfxweş bûn, em wan hewaleyê Xwedê dikin.)

Gelî nas, dost, cînar, heval, hogir, xism, pismam û hembajarî tevî xwe. Bi zanebûn, plan, proje, rastî, durustî, aqlî û ciwanmêrî em destê hev bigirin. Bi alîkariya Xwedê em Wanê rakin ser piya. Hûn nekin, dê hinekên nebaş bikin, hûn neyên hinekên nebaş ê werin. H. Rifat Paşa, gotineke wî ya wiha heye, "Warê tu neçûyî, ê te nîne". Sibê tu nikarî bibêjî ev cî û warê min e. Ew warê ku we terk kiriye li wê derê Feqiyê Teyran bi helbestên xwe, Memduh Selim Beg bi evîna welatê xwe, Yaşar Kemal bi nivîsarên xwe yê dewlemend ve behsa wê dike. Bila Îhsan Colemêrgî ser Kelha Wanê ji we re behsa dîroka Êrartûyan bike, Evdalê Zeynikê bila ji we re;

*"Evdal dibê Temo lawo*

*Stêrkên asûmanan bilind û geş in*

*Refên qulinga tên ji deşta û zozanan*

*Hindava Behra Wanê xweş dimeşin"* dibêje.

Şivan bi kilama "Behra Wanê" û Kazo bi strana "welatê min xweş e Wan"ê ji we re bibêjin. Hemzeyê Miksî bi simbêlê qeytan, bi çavên belek û biriyên reş û bi Kurdewariya xwe ve hêviya we ye. Li serê Çiyayê Başê Mîr Hesenê Welî bi duayên xwe ve, Şehidê rûken Mele Îzzedîn û ustadê wî Mele Seîdê Kurdî li Medresa Zehrayê mijara darsa wan "xwendin, xwendin, xwendin, desthevgtin, desthevgtin, desthevgtin e" li benda we ne. Werin guhdar bikin.

Belê bi kurtasî: "WAN LI BENDA WE YE!" 🐾

# Prensesa bizinan

## ELVEDA

**B**erê sibê bû, diya wê li derî da û got:

-Rabe bizinan bidoşe, dereng e. Melheze kir Binevşê!...

Ax dê çi bûya ku rojekê jî tu kesî li derî nedabûya, negotibûya rabe. Cihê wê germ, xew jî têra xwe xweş bû. Serê xwe êxiste nav balgihê de, çankê tu tişt sehnekirî çavê xwe quça.

Gaveke kêma piştî wê diya wê dîsa derî quta, gotê:

-Rabe! Şûnda derî vekir, bi dengê qêr:

-Rabe, dê bizin biçine çiyayî; şivan li hêviya te ye.

Binevşê bi hêrs, lihêf ji ser xwe avêt, rabû sekinî; got:

-Ez rabû me.

Diya wê piştê wê cabê, derî pê veda û çû.

Binevşê fîstan di serê xwe re kir, êlek wergirt û gore kêşane pê xwe. Wêra destê xwe avête şalpê, derket...

Ber derî, bayekê sar di nav çavî da. Şalpe girêda, satil rakir û çû aliyê govê. Hey diçû, hey digot:

-Xuda belaya xwe bide van bizinan, ev çiyê ez dikêsim. Hemî

kes di nav nivînên germ de ne, ez di vê sermayê de weke xidaman, di nav peyînê de me...

-Xuda xira ke...

Gihîşt nav deriyê govê, kire gazî şivanî:

-Fexedîîn...

-Fexedîîn.

Fexedîîn:

-Lebê ez xulam.

Binevş:

-Te nêrî dakiriye?

Nêriyekî wan yê boçker hebû.

Binevş jê ditirsiya. Heke danekirî bûya, ew ji boçê nêrî xilas nedibû.

Fexedîîn cab da:

-Belê, nêrî wê di eywana paşî de. Binevş, ber wê cabê çû, rûnişte ser kevirê bêriyê.

Fexedîîn, lib lib bizin anîn, wê jî dotin.

Di der re, bêhna peyînê tijî kezba wê de bû; têre nekir, kêç tijî bûne nav cilê wê de.

Piştê dotinê, satilek şîr wê, yek jî Fexedîîn bi destê xwe girtin û birine malê. Şîr danîne ser kevirê milbexê, çûn...

---

Binevş bi vê dehfê ve şulipî; piştpiştîkî kete nav teştê avê. Ber sermahiya avê recifî; dilê wê tijî bû û rondik di çavî de hatine xwar... Tu kesê berê xwe nedayê... Hemî dixebitiyan...

---

Ferxedîn derket. Binevşê jî berê xwe da hemamê. Diya wê dema ku radibû, soba hemamê berdidayê/vêdixist. Îro jî wisan kiribû. Gup gupa soba hemamê bû.

Binevşê serê xwe şuşt, pêjgîr li xwe aland, revî bi oda xwe ve. Bi lez cilên xwe wergirtin, xwe avête nav nivînan de.

Got:

-O xweş, razan çendî xweş e...

Her roj halê wê ev bû. Heke serê xwe neşuştiya, cilên xwe veneguhertiba, dê kêçan qira wê bibira.

Qasê saetek şûnda, qêra babê wê hat:

-Rabiin, mêvan hene.

Vê carê nedikarî seh neke! Ew jî weke hemî malbatê, ji Omer begê ditirsiya. Hêdî hêdî dengê çir çira deriyan, şup şupa şekalan dest pê dikir.

Car jî, fistanek di serê xwe de kir, karê xwe pêk anî, derket.

Diya wê di milbexê de, sertêştta palan pêk anîbû... Fik fika semawaran bû.

Gote diya xwe:

-Xanim, ez çî arî te bikem?

(Malbatê, digotine diya wî Xanim. Navê wî ew bû; zarokên wî jî wisan hûre bûbûn. Wan jî wisan digotinê)

Xanimê cab da:

-Çay dem ke. Ya palan, bila di çaydana çingû de be.

Binevşê çay dem kir. Çaydan danîne ser demkêşan...

Herdu alê semawaran de, ji ber kelana avê, şuran belav dibû.

Wê, zehf hez ji çaya semawarê dikir.

Piştî ku palan sertêşt birin û sertêştta mêvanan jî çû, ewan jî ji xwe re sîfre danîn, rûniştin.

Di sertêştê de tune tunebû. Tû, hingivîn, mastê pezî, penîr, arxavk, hêk, jajî, nanê tenûrê û te çî bivê...

Tav hêdî hêdî derdiket...

Serê çiyayan, di nav mijê de winda bûbûn. Beyar ji ber şewqa tavê, nav hişînahiyan de dibiriqiyân.

Bizin ji niha ve gihabûne lîça jorê.

Mala wan dev çiya bû. Piştî xanî çiya, berî jî gund bû. Ew li ser singekê bilind dimana. Babê wê xanî li wê derê çêkiribû. Dormendarê wan cîran mîran tune bûn.



Pênc şeş zeviyê wan hebûn. Dormedarê zeviyan spîndar danîbûn. Ji bil spîndaran, darê fêkiyan û darê bej jî hebûn.

Heke westiyan tunebûya, cennetek bû mala wan, dormedarê wan...

Aha, îro jî mêvan hebûn.

Evrehman, piştî stûyê du gîskan girtibû, kaş dikire binê gûzê. Xulamê wan bû Evrehman; ji piçûkahiya xwe ve rex wan bû.

Binê gûzê, cihê serjêkirina pezî bû. Dengê qêrîna gîskan, tişteke nas bû ji wan re.

Maliyan, piştê sertêştê dest bi şixulan kirin. Şûştina firaxên şefeqê, borekçêkirin behra wê ketibû.

Firaxên xwe pêk anîn. Hêkên xwe şikandin, hevîrê borekê kir.

Di wê navbenê de herdu gîsk hatibûne gurandin û qetqetkirin.

Xwîşka wê jî xurtoma avê danîbû ser teştta mezin, tê de goşt dişûşt.

Navê wê Serfiraz bû; sê salan ji wê mezintir bû. Pênc birayên wê jî hebûn. Ji kuran re ser rehetî hebû. Tu kesî, tu hêvî ji wan tunebû...

Xwarin wê bêne çêkirin; kiftên bilîsî, qelîsêl, boreka avê, birinc, doxeva û selete bû îro.

Mêvanê malê jî walfi...

Dema ku roj pê ve çû, seet bû duwanzdeh, pêqaba Omer Begê li ber derî sekinî.

Li malê hemî tişt çêkiribû.

Heke hal wisan neba, kêmasiyek çêbibûya wê gavê kî keça babê xwe bûya, bila ketiba destê Omer

Begê. Ewil mêvanan paşê palan, maliyan, taştê; şûnda jî firavîn xwaribûn û firax têx bûbûn.

Mala wan, maleke mezin; babê wê jî, begê bajêr bû.

Seba wê jî kî dihate bajêr, li mala wan bû...

Wan jî, ji mêvanan re tev qedir, qîmet digirtin.

Şixulê malê jî, yê mêvanan jî gelek zehmet bûn...

Bû merxeb, babê wê di destî de qezete/rojname, li hewşê rûniştibû çay vedixwar. Birayê wê yê mezin jî, li ber wî, çarmêrgî vedabû, çay tê dikir.

Binevşê di nav derî de li wan temaşe kir, ka tiştêk hewceye yan na.

Omer begê qezeta xwe bi deng dixwend.

Ji kurê xwe re digot:

-Ew nivîskar duhî pêr hate laha/vê derê, li bîra te têt?

Kurik cab da:

-Belê ez xulam.

-Aha wî, îro der heqê me de nivîsiye. Guh bideyê:

(Bi deng xwend)

-... ..!

Binevş, ji tiştê sehkirî ve ma heyrî!..

Nivîskarê ewil behsa spehîtahiya bajarê wan kiribû.

Paşê jî der heqê malbata wan de; siyanetgirtina mêvanan, desvekirîbûna Omer Begê, xwarinên xweş.... Nivîsîbû hey nivîsîbû....

Di behsa babê wê de gotibû; ew begê bajarê xwe ye. Beg, yanê prens.

Heke dewra Osmaniyan dom kiriba, wê Omer Beg jî Prens bûya.

Li ber van sehkirinan, çiq çembil ji serê Binevşê çûn.

Çankî/Çawa dibe!.. Qey, babê wê prens e?

Mîna çîrokên televizyonê!.. Ev melheze zehf li xweşa wê çû. Bû rup rupa dilê wê; rehtbûna canê xwe wê gavê ji bîr kir. Dîsa melheze kir!...

Êêê kêwe!..(Kêwe, ew jî keça babê xwe bû û ew jî Prens bû)

Pêşa xwe berhev kir, xwe bi şahiyê ve avête ber derî. Bezî rex xwiha xwe.

Xwihê, sîtlên xwarinan dişuştin. Ji ber rehtbûnê halê wê tunebû.

Binevşê bi şahî ve got:

-Serfiraz! Serfiraz!..

Serfiraz:

-Çi ye?

-Ezê tiştêkê bêjime te, tuyê bimînê heyrî!..

Serfirazê qet temaşa wê nedikir. Xurtom di destekî de, bi destê dî jî sîtil paqij dikir.

Binevş jê aciz bû. Gotê:

-Çima tu guhdariya min nakî? Ez tiştêkê giring dibêjime te.

Serfirazê dîsa berê xwe neda wê. Binevş hêrs bû; milê wê girt û hejek da xwiha xwe. Gotê:

-Di qezetê de gotiye, Omer Beg, Beg e; yanê Prens e. Kêwe, ez û tu jî prenses in. Çankê filîman de.

Serfiraz rabû, sekinî.

Xurtom avête erdê. Sîtla şuştî rakire ser milê xwe û bi aliyê bereqa sîtlan ve du gav avêt. Guhdariya xwiha xwe nedikir. Rex wê ev xebirdan tiştê beredayî bûn.

Ji ber rehtbûnê, gavên wê jî televajkî diçûn.

Binevş, dîsa nesekinî; êlekê Serfirazê bi piştê ve kêşa, bi hêrs gotê:

-Em prenses in, dibêjime te!..

Sebra Serfirazê hate xilasiyê. Zivirî û dehfeq li Binevşê da. Gotê:

-Here wê ve, Prensesa bizinan.

Binevş bi vê dehfeqê ve şulipî; piştpiştîkî kete nav teştê avê. Ber sermahiya avê recifî; dilê wê tijî bû û rondik di çavî de hatine xwar... Tu kesê berê xwe nedayê... Hemî dixebitiyan...

Binevş, bêçare, çû odeya xwe; cilên xwe veguhertin, rûnişte nav kulekê. Kulek, seranser hatibû hesinkirin. Di navbena hesinan de, serçiya, stêr dixuyan.

Ber çavê wê çiya, stêr û hesinê kulekê... Dîsa histêr di rûyê wê de nişûv bûn, ji xwe re hêdîka got:

Ez Prensas im!\*



# Rexne

MEHMET ŞÎRÎN FÎLÎZ

**D**ema ku nivîs hate vedîtin, ligel vê yekê hest û ramanên mirovahiyê jî ji gotinê derbasî nivîsê bûn. Dema ku gotin derbasî nivîsê bû di heman demê de edebiyata nivîskî jî pêş ket û edebiyatêdî wek zanîneke sistematîk derket pêşberî mirovahiyê. Piştî ku çanda nivîskî di nav civakên rojavayî de pêş ket beranberî vê yekê rexne jî pêş ket. Rexne di sedsalên 18emîn û 19emîn de di nav cûreyên edebî de bi awayekî balkêş pêşket û di van sedsalan de bi awayekî sistematîk derket pêşberî civakê.

Di rastiya xwe de wek cûreyekî edebî rexne di demên antîk de dest pê kiribû. Fîlozofên Yewnanî Arîstoteles, Platon û Sokrates li ser pirsgirêka edebiyateke çawa sekinîbûn û nêrînên xwe anîbûn zimên. Platon digot, edebiyat pêwîst e ku heqîqatên cîhanê nîşanê me bide. Lê edebiyat çawa bike jî nikare vê yeke bike ji ber ku ev cîhana ku em tê de dijîn ne cîhaneke rasteqîn e û hunermend encax kare qopiyeke xirab ya vê cîhanê çêbike. Ji

ber van sedeman Platon hunerê tiştêkî neyînî dibîne û di nav cîhana xwe yî îdeal de cih nade hunerê. Arîsto wek Platon nafikirê û dibêje ku heke huner ji hemû nebaşiyên bê xalîkirin û xizmeta başiyê bike wê bê qebûlkirin û têgeha katharsîs davêje holê û vê nêrîna xwe di pirtûka xwe ya bi navê Poetikayê de sistematîze dike. Heya qirna navendî jî ev nêrînên Arîsto û Platon ji bo Rojavayîyan bûn çavkaniyên se-reke. Lê di sedsalên 18emîn û 19emîn de gelek bizavên edebî dest pê kirin, tevî bizavên edebî gelek cûreyên rexneyê jî derketin pêşberî me. Di vê sedsalê de Sainte Beuve cûreyê edebî ji nû ve sistematîze kir û hin pîvanên rexneyê ava kirin.

## Rexne pîreyek e di navbera xwende û nivîser de

Rexne di navbera xwîner û pirtûkan de bû wek pîrek. Gelek başî û nebaşî pirtûk û nivîskar bi awayekî objektîf raxistin ber çavê xwîneran û asoya xwîneran bi vî awayî hîn fireh kir. Rexne her

---

Di rastiya xwe de wek cûreyekî edebî rexne di demên antîk de dest pê kiribû. Fîlozofên Yewnanî Arîstoteles, Platon û Sokrates li ser pirsgirêka edebiyateke çawa sekinîbûn û nêrînên xwe anîbûn zimên. Platon digot, edebiyat pêwîst e ku heqîqatên cîhanê nîşanê me bide

---

çiqaş di hişmendiya civakê de were wateyê neyînî jî, rexne ji bo edebiyatekê wek ava heyatê ye. Ji ber ku edebiyat çawaniya berhemên edebî radixe ber çavan, berhemên baş û nebaş ji hevdu vediqetîne. Rexnegir ji her aliyê ve çawahiya berhemê vedikole û wek endazyarekî dixebite. Tiştê ku xwîner rasterast nabîne û çawahiya berhemên edebî radixe ber çavan. Bi kurtahî bêyî cûreya rexneyê avakirina edebiyatekê jî ne mîmkûn e. Ji ber vî sedemî jî gelek çarçûn her edebiyat dema ku hatiye avakirin beranberî vê yekê rexne û rexnegirê xwe jî ava kiriye. Wek mînak, dema edebiyata Tirkî pêşket rexnegirên edebiyata Tirkî jî derketin holê û li ser pirsgerêkên edebiyata Tirkî sekinîn û ji bo van pirsgerêkan çareser bikin xebitîn. Wek cûreyê edebî rexne piştî Tanzîmatê di nav edebiyata Tirkî de derket holê. Di vê demê de cara yekem Şînasî wek nivîsên rexneyî nivîsî, lê paşê bi dehan rexnegir ji nav edebiyata Tirkî derketin û wek endazyareke edebî li ser pirsgerêkên edebî sekinîn. Wek mînak, Mehmet Fuat Köprülü, Mehmet Kaplan, Cevdet Kudret, Berna Moran û hwd.

Rexne cûreyê edebî ye, helbet, diviyabû ku hin pîvanên vê cûreyê jî hebin. Rexne û rexnegirî ji ber ku endazyariya edebiyatê ye êdî rexnegirî wek lêkolîneriya edebiyatê jî tê zanîn. Di rastiya xwe de jî wiha ye, rexne ne xerakirin e, rexne ji nû ve avakirina edebiyatê ye, pîvanên wê hene û cûreyê sîstematîk e. Gelek cûreyên rexneyê hene wek mînak; rexneya femînîst, rexneya marksîst, rexneya arketîp, rexneya sosyolojîk, rexneya dîrokî, rexneya psîkolojîk û hwd. Lê bi pirani

ev cûreyên rexneyê bi sê sernavî tînesfirkin, rexneyen ku di navenda wan de xwîner hene, rexneyên ku di navenda wan de berhem hene û rexneyên ku di navenda wan nivîskar hene. Em ê di vê meqelê de li ser cûreyên rexneyê tesnîfkirina wan nesekinin. Tenê em ê bi çend xalan taybetiyên rexneyê vebêjin.

Nivîseke rexneyî li gor planekê tê nivîsandin. Nivîskar pêwîst e ku bi berhemê ve girêdayî be û berhemê bi tevahî bigire dest. Dema ku rexnegir qala başî û nebaşîya berhemê kir divê ku nimûneyên xwe ji berhemê derxe. Rexnegir hewce ye ku girêdayî pîvanên rexneyê be û di nêrînên xwe de objektîf be. Wek mînak, rexnegir nikare bêje min jê zewq girt ewqas bes e. Pêwîst e ku rexnegir pîvanên xwe jî raxê ber çavan û li gor kîjan pîvanên vê biryarê daye vebêje. Sê goşeyên/alîyên rexneyê hene; yek xwîner, yek berhem û yek jî nivîskar. Divê rexnegir ev her sê goşeyan/alîyan bigire ber çavan û bi vî awayî nêrînên xwe bîne ziman. Em ê vê mijarê di vir de kurt bikin û derbasî di edebiyata Kurdî de rexneyê bin.

Wekî ku me li jor jî anî zimên di sedsala 18emîn û 19emîn de gelek bizavên edebî dest pê kiribûn tevî vê yekê cûreyê rexneyê jî pêşketibû. Ev sedsal rastî şoreşa Frensîzî dihat û di vê demê de gelek têgehên wek azadî, wekhevî, edelat û serfirazî derketibûn holê. Evan têgehên xwe di qada teoriyên edebiyatê jî nîşan dabû. Êdî gelek netewên bindest hêza gotinê ji xwe re kiribûn şûr û mertal û şerên serfiraziyê di hemû qadên jiyand

dest pê kiribû. Şoreşa Frensîzî ji vê mînakê herî baş e. Edebiyatê di ketibû bin xizmeta netewaya azad.

### **Bindestiya Kurdî li wêjeyan wan jî xist**

Helbet Kurd jî ji vê pêla azad-bûnê bêpar nemabûn û xwe gihandibûn hêza gotinê. Lê mixabin edebiyata Kurdî ji ber pirsgerêkên siyasî û civakî li ser derengmayînekê şîna hat. Kurd ne neteweke bê esl û binyad bûn her wiha xwedî çandê mezîna û mîraseke gelêrî bûn. Lê dema xwestin ku li ser vê çanda hezar salî edebiyateke bêhempa ava bikin, sînorê welatê wan hatibû parçekirin; alim, rewşenbîr û zanyarên wan hatibûn sirgûnkirin. Kurd mabûn bê zanyar û rewşenbîr û di ber pêla asîmilasyonê werbûbûn. Welatê bêdeng bû hemû zanyarên wan koçî derveyî welêt kiribûn û tîkiliya wan û gel qut bûbû. Lê beranberî vê yekê li derveyî welêt çandê edebî dest pê kiribû ku wê bûbûna xezîneya edebiyata Kurdî. Yekî li Qefqasyayê dest pê kiribû ku bûbû navenda edebiyata Kurdî, yê din jî di bin pêşengiya Celadet Alî Bedîrxan de li başûrê biçûk dest pê kiribû.

Lê vê rewşê hem bandoreke erênî hem jî bandoreke neyînî li ser edebiyata Kurdî kir. Lewma ku me berê jî anîbû ziman ji bo ku em qala pêşketinekê di edebiyata Kurdî de bikin diviyabû ku tîkiliyek di navbera xwîner, berhem û nivîskar de çêbibe. Lê mixabin berhemên di vê demê de hatine nivîsandin ev tîkilî qut bûye. Ji ber ku di van salan de nivîskar bêyî berçavgirtina estetîka edebî pirani xwestine spat bikin ku bi zimanê Kurdî jî berhem dikarin bînin nivîsandin. Wek mînak Firat Cewherî pirtûka

xwe ya bi navê Wêje, Huner û Edebiyat de cih dide roportajeke bi Osman Sebrî re û pirsra zanîna edebiyata wê demê vedike. Osman Sebrî dibêje, heyra me xwest ku em rêya zimên vekin yana zanîna me ya edebiyatê ew qas ne zêde bû. Lê zanîna edebiyatê ya Celadet Alî Bedîrxan hebû, Celadet Alî Bedîrxan mirovekî zimanzan û hêja bû. Jixwe barê kovara Hawarê dabû ser milê xwe û di vê kovarê de bi gelek navên mûstear nivîsandibû. Mirovên derdora xwe teşwîqê nivîsandinê dikir û bingeha gramera Kurdî avêtibû.

Edebiyata Kurdî hîn bi çapûlûçka diçû û hêza gotinê ji vê demê şûnde ketibû bin xizmeta azadî û serfiraziyê. Edebiyata Kurdî ji ber hindê bibû edebiyateke polîtîk. Bazarekî fermî ya zimanê Kurdî tunebû loma jî ziman û edebiyata Kurdî her ku diçû polîtîze dibû û têkiliya di nav xwîner û nivîskaran qut dibû. Kurd mecbûr bûn ku bi zimanekî qedexe edebiyatekê ava bikin, vê jî careke din edebiyata Kurdî polîtîze dikir. Zimanê Kurdî di bin pêkûtiyên netewên serdest de bû û Kurdan jî hemû peyv û gotinên xwe bi awayekî polîtîk dianîn ziman. Îfadeyên Kurdan ên ji rêzê jî diketin teşeyekî polîtîk. Wek mînak, fikandîna Kurdî ya Apê Musa û ceza xwarina wî.

Helbet ji ber vê rewşa polîtîk nivîskarên Kurd ji bo îspatkirina zimanê xwe yê dewlemend bi sedan pirtûk nivîsandin û diyarî edebiyata Kurdî kirin. Lê mixabin ku civaka ku van pirtûkan bixwîne tunebû. Ciwanên Kurd di bin pêla asîmîlasyonê de mabûn. Edebiyata Kurdî hebû û lê xwînerê wê tunebû. Loma jî yekem rexnegirê edebiyata Kurdî

# Meke!

Mehmed Emîn Hêvîdar

*Ji bo Fexriyeyê*

Barê eşqê giran e, baran li min dikî; meke!  
Tu, dilan bi êş û awiran dax dikî; meke!  
Ez mêvanê dilê te me, diltengiyê dikî; meke!  
Min bihistiye tu dil dikî min jê biqewirînî, meke!

**Têbînî:** Ev çarîn (ruba'î) li ser wergera kek Hayrullah û li ser çarîna hevalê xoşewîst Zilkîf, nazîre ye.

Remezhan Alan di Bendnameya xwe de digot, nivîskarên Kurd ji xwînerên Kurd bêhtir in.

Êdî edebiyata Kurdî hebû û li xwînerê xwe digeriya. Lê mixabin pirsgirêkên edebiyata Kurdî neqediyabûn. Di vê demê de nivîskarê Kurd Mehmed Uzun bi dehan pitûkên Kurdî nivîsandibûn lê mixabin xwînerên Mehmed Uzun, pirtûkên wî ne bi zimanê Kurdî bi zimanê Tirkî dixwendin. Vê jî pirsgirêkeke din derxistibû holê. Jixwe werger karekî ji nû ve avakirinê ye. Her çi qas êdî xwînerê Kurd dest bi xwendina Edebiyata Kurdî kiribin jî, ji ber ku bi zimanê Kurdî nedixwendin têkiliyê xurt di navbera xwîner û nivîskar de çênebûbû. Mehmed Uzun jî ji vê yekê aciz bûbû loma jî du sal destûr nedabû ku pitûkên wî bîn wergerandin.

Ji bo edebiyata Kurdî ev qonaxê nû bû û ne pirsgirêka Edebiyata Kurdî lê ya Edebiyata Zimanê Kurdî derketibû. Lê dîsa jî pira di navbera xwîner û nivîskar de qut mabû. Helbet ji bo rexne û rexnegiriyê rast û durist ava bibe pêwîst bû ku ev têkilî ava bibûya.

Ji ber ku rexne di pêşvebirina edebiyatekê de xala girîng e.

Lê ji ber ku xwînerên edebiyata Kurdî kêma in rexneya edebiyata Kurdî jî qels e û karekî zor û zehmet e. Ji ber ku rexnegir zêde nayên hezkirin û nayên pejirandin. Rexnegirî karekî zehmet e lê hêja ye. Her kes nikare xwe bixe bin vî barê giran. Nivîsandin hîn hêsan tê ji bo nivîskar û xwînerê Kurd. Lewma jî kesên ku dest bi xwendin û nivîsandina Kurdî dikin pêşî dest bi nivîsandina romaneke din dikin.

Lê her çi qas rexneya edebiyata ji hin aliyan ve qels be jî, nivîskarê me yî hêja ye bi navê Remezhan Alan rê li ber vî karê zor û zehmet vekir û tovê xwe li vî cûreyê edebiyatê reşand. Mamoste wek endazyarekî edebiyatê hûr û kûr xebitiye û pirtûka xwe yî hêja Bendname dariştiye. Mirov dema vê pirtûka mamosta dixwîne bi rastî jî rastî ruh û serpêhatiya edebiyatekê tê. Ev edebiyata ku bi dehan salan e ku li ber pêla asîmîlasyonê li ber xwe dide û li xwînerê xwe digere ku rojekê wê xwînerê xwe jî bibîne. 🐾

# Weşanên Nûbiharê

	<b>Kitêbên Kurdî</b>
Adat û Rûsumatnameê Ekradiye / M. M. Beyazîdî .....	17.50
Antolojiya Çîrokên Nûbiharê/Ayhan Geverî .....	12.50
Aqilê Hevpar yê Mirovahiyê/M.Xalid Sadîni .....	20.00
Cildên Kovara Nûbiharê (10 Cild, cildi) .....	30.00
Çarîn/ Sabah Kara .....	6.00
Çil Hedîs / Îmamê Newewî .....	5.50
Çîrokên Mesnewiya Şerîf... /Sadîk Yalsîzuçanlar .....	11.50
Çîrokên Gelêri/M.Xalid Sadîni .....	8.00
Derwêşê Evdî/Eyûp Kiran .....	13.00
Destana Şerrê Kundan û Qijikan/Gernas Koçer .....	11.50
Di ronîya Quranê de Dîroka Pêxemberan/Murad Celalî .....	9.00
Dîwan/Perto Begê Hekarî .....	15.00
Dîwan/Şêx Muhemmed Hediye Qewmanî .....	12.50
Dîwan/ Seyîd Eliyê Findikî (Çapa Nû) .....	15.00
Dîwan/Mela Zahirê Tendûrekî .....	15.00
Dubeytî/ Baba Tahirê Uryan (Çapa Nû) .....	12.50
Ebdullahê Minyeyî / Hekimoğlu İsmail .....	10.00
Elîfba û Tecwîd/Mela Ehmedê 'Eynberanî (Digel DVD) .....	10.00
Eqîde û Fiqha Zelal/Mela Burhanê Hedbî .....	14.00
Evîna Pinhan/ Sabri Akbel .....	6.50
Feqîyê Teyran (Çapa Nû ya Berfireh) / M. Xalid Sadîni .....	20.00
Ferhenga Çapemeniya Kurdî .....	14.00
Ferhenga Kurdîstanî/Elî Ekber Kurdîstanî .....	12.50
Ferhenga Pirzimanî .....	15.00
Guldân/Seydayê Mela Husnî .....	10.00
Gulîstan/Şêx Sadiyê Şîrazî/M. M. Garsî .....	11.50
Gulşenê Raz/Şêx Mahmud Şebuşterî /M. M. Garsî .....	8.00
Hebana Berxvan/Raufê Bêçare .....	10.00
Heyranokên Kurmançî/M.Xalid Sadîni .....	12.50
Jiyana Pêxemberê Me Hz. Mûhemmed/Mûrad Celalî .....	20.00
Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn/Casimê Celîl & Emerê Celalî .....	7.00
Kelîle û Dimne/Beydaba .....	12.50
Leyl û Mecnûn/Siwadî .....	7.50
Leyl-name/ Ayhan Geverî .....	6.50
Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane/Prof. Î. A. Orbelî .....	8.00
Mamîkên Kurmançî/M.Xalid Sadîni .....	12.50
Meqamat / Herîrî (Werger M. Ehmed Meylanî) .....	6.00
Mewlûd / Melayê Bateyî (Latînî-Erebî, şamûa) .....	8.00
Meala Firûz û Şerha Qur'ana Pîroz /M.M.Garsî Farqîni .....	25.00
Mela Huseynê Bateyî / M. Xalid Sadîni .....	15.00
Mem û Zîn/Bi rave û şîroveyeke nû .....	35.00
Mem û Zîn/Amadekar: Huseyn Şemrexî .....	17.50
Melayê Cizîrî/Amadekar: Selman Dilovan .....	17.50
Neynika Nimêjê/Mele Mûhemmedê Neynikî .....	10.00
Neynika Xeman Mele Mûhemmedê Neynikî .....	8.00
Nimêj Dikim/ Komisyon .....	7.00
Nûra Qelban-Tefsîra Qur'anê (Cildek) .....	30.00
Peyîva Bîst û Sêyemîn/ Seîdê Norsî .....	4.00
Peyîvên Piçûk/ Seîdê Norsî .....	6.00
Pêxemberê Ummedê Hz. Mûhemmed/ Ebdilhadî Botî .....	8.50
Pêkenokên Kurmançî/M.Xalid Sadîni .....	??00
Pênc Rîsaleyên Îmamê Xezalî/M. M. Garsî .....	8.00
Rîsala Biratîyê/ Seîdê Norsî .....	4.00
Riyadû's Salihîn/ Werger: M.Salihê Dihê .....	35.00
Ronahiya Qurana Pîroz/ M. Muhammed Hekarî .....	25.00
Rubaiyat/ Omer Xeyyam .....	6.00
Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal/ Siyahpoş .....	15.50
Siyerê Nebî / Milla Cimayo Babîj .....	6.00
Siyera Nebî/Ebû'l Hesen En Nedwî .....	9.00
Sorgul/İbrahîm Sunkur .....	13.00
Şev û Rojên Mubarek/Ayhan Meretowar .....	10.00
Tûrikê Pîrê Kal / Pîrê Kal .....	7.00
Vateyê Qijekî / Seîdê Nursî .....	4.00
Yezdan Dizane / Mezher Bozan .....	6.00
Zêna/Mezher Bozan .....	10.00
	<b>Bi herfên Erebî</b>
Baxçeyê Jiyana Piştî Mirinê/ Seyda Mele Yasînê Yusrî Amedî .....	12.50
Defteroka Şîrin/(Berhevkar) Mûhemmed Mehsûm .....	6.00
Diyariya Kurdî Fiqha Şafî .....	6.00
Dîwana Hezîn/ Seydayê Mela Huznî .....	15.00

Eqîde û Tecwîd/Xelîfe Yusuf .....	5.00
Fiqha Şafî / S.M. Husnî Hezîn .....	15.00
Mecmeul Mesaîl/ Xelîfe Yusuf .....	30.00
Mewlûda Gundî/Seyyid Bedreddin .....	3.00
Mem û Zîn/Ehmedê Xanî (Şerh: Huseyn Şemrexî) .....	17.50
Mewlûd/Ertûşî (Bi cild-du reng şamûa) .....	15.00
Nûbihar/Ehmedê Xanî (Şerh: Huseyn Şemrexî) .....	8.50
Kulxaniya Veşartî/S. M. Husnî Hezîn .....	6.00
Reng û Rûyê Pêxember M. Husnî Hezîn .....	12.50
Rîsaleyên Eqîde û Exlaq û Edeb .....	15.00
Serkanî/Mele Mûhemmedê Mehsûm .....	8.50
Tuhfetul Sibyan/Xelîfe Yusuf .....	7.00

## Kitêbên Kurdî-Tirkî

Diwan/ Melayê Cizîrî (Şamua-Kurdî-Tirkî) .....	30.00
Ez Kurdî Hîn dibim-Pratik Kürtçe Dersleri .....	20.00
Gotînên Pêşyan û Botan/Abdulkadir Bingöl .....	15.00
Melayî Cizîrî Divanî'nın Şerhi/A. Septioğlu .....	9.0
Mersiye-yên Rojhilat-Dogü Ağıtları/ Sabah Kara .....	6.50
Nameyên Bêcewab-Karşılıksız Mektuplar/ Sabah Kara .....	6.50
Sempozyûma Bedîuzemman Seîdê Nursî (Sempozyumu) .....	25.00

## Kitêbên Tirkî









Asilerin Dönüşü / Gülîstan Çoban .....	6.50
Bediüzzaman'ın Volkan Yazıları/ Osman Resulan .....	4.00
Çağdaş İnan Şiiri Antolojisi/ Sabah Kara .....	6.50
İslam Tarihinde Kürt Kadını / Muhammed Hayr Yûsuf .....	6.50
Kürtler ve Kürdistan Tarihi .....	35.00
Melayî Cizîrî Divanî ve Şerhi/ Prof. Abdulkaki Turan .....	35.00
Şerefname (2.Cild Osmanlı İnan Tarihi) .....	15.00
Turabidin'den Beriyye'ye / Altan Tan .....	25.00

## LİSTEYA PIRTÛKÊN KENTÊ

Aşk ve Savaş / Necdet Karasevda .....	11.50
Babam /M. Saîd Ramazan el-Bûtî .....	12.00
Bediüzzaman'ın Hayatı/ Abdurrahman Nursî .....	6.00
Bütün Yönleriyle Arabkendi / M. Şerif Eroğlu .....	12.50
Tarih,Kültür ve Cizre/Abdullah Yaşın .....	20.00
Cumhuriyet Öncesi Diyarbakir'de Maârif .....	12.00
Çığır Açan Şark Alimleri/Abdullahi Timurtaş .....	8.00
Çığıla Duran Sözcük / Misbah Hicri .....	6.00
Divan/Molla Ahmed-i Ceziri .....	16.50
Divan/Kiğılı Seyh Selim .....	10.00
Diyarbakir Eğitimi Tarihi/ Mehmet Şimşek .....	8.50
Duru Su Rüyasi/ Mehmet Özer .....	12.00
Elma Kokusu (Yola Adanan Şiirler) Gülîstan Çoban .....	7.00
Eski Diyarbakir'de Gündelik Hayat/ M.Şefik Korkusuz .....	9.50
Eski Saîd'in Ehemiyetli Talebesi Hamza / Veysel Aydeniz .....	9.00
İlk Vatandan Gelen Sürgün/ Hasan Hüseyin Çevik .....	10.00
İnsanlığın Ortak Aklı/ M. Halit Yalçın .....	30.00
İslâm'ın Anadoluya Gelişi/ Ahmet Demir .....	12.00
İslam Aleminde Vakıf Kütüphaneciliği .....	10.00
İtrafçı/ Gülîstan Çoban .....	6.00
Kolay Farsça/ Osman Aslanoğlu .....	25.00
Kuruluş Döneminde Eyübîler / Ali Beyyümi .....	12.00
Mazideki Suruç / A. Kadir İkbâl .....	9.00
Mazlum Halepçe / Müştehir Karakaya .....	7.00
Medreseden Meclis'e Meclis'ten Medreseye/ G. Emre .....	15.00
Mem û Zîn /M. Saîd Ramazan el-Bûtî .....	8.50
Muhafazakar Kürt Yoksullar, Mehmet Bozgan .....	6.00
Molla Muhammed Zıvıngî/ Abdülhadi Timurtaş .....	7.00
Seyahatnamelerde Diyarbakir/ M. Şefik Korkusuz .....	30.00
Sırr-ı Hanımın Divanı/ M.Şefik Korkusuz .....	10.00
Siyamend/ M. Saîd Ramazan el-Bûtî .....	8.50
Sonsuzluk Histerisi / Mehmet Bozgan .....	5.00
Kon Kapı / M. Zahir Ertekin .....	8.00
Süryaniler ve Diyarbakir/Mehmet Şimşek .....	14.00
Tarihin Adı Urfa/Misbah Hicri .....	8.50
Tezkire-i Meşayih-i Amid/M. Ş.Korkusuz .....	30.00
Urfa ve Çevresi Eyubiler Tarihi/ Ahmet Demir .....	11.00
Urfa Efsaneleri/ Mehmet Kurtoğlu .....	12.00
Vadedilen Günlük / Taha Hüseyin .....	9.00
Zamana İthaf/Mehmet Bozgan .....	6.00
Zembilfiros/Gulistan Çoban .....	8.00



Ji Nûbiharê! berhemên nû!



" Habere ilkeli yaklaşım "

ilkehaber.com

info@ilkehaber.com  
0532 261 34 89





Heski  
Foto: Weysel Aydeniz